

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

BEŞA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



REXNA CIVAKÎ DI ROMANÊN BABÊ NAZÊ DA
(MÎNAK: STOKHOLMÊ TE ÇI DÎT BÊJE Û XWEŞÎYA BI ÊŞ)

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

MOHAMMED ISSA SALIH

ŞÊWIRMEND

DOÇ. DR. NESİM SÖNMEZ

VAN- 2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENİSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



YÜKSEK LİSANS TEZİ

BABÊ NAZÊ'NİN ROMANLARINDA SOSYAL ELEŞTİRİ
(ÖRNEK: STOKHOLMÊ TE ÇI DÎT BÊJE VE XWEŞÎYA BI ÊŞ)

HAZIRLAYAN
MOHAMMED ISSA SALIH

DANIŞMAN
DOÇ. DR. NESİM SÖNMEZ

VAN- 2019

Teza Lîsansa Bilind

MOHAMMED ISSA SALIH

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

Îlon - 2019

REXNA CIVAKÎ DI ROMANÊN BABÊ NAZÊ DA

(Mînak: Stokholmê Te Çi Dît Bêje û Xweşîya Bi Êş)

KURTE

Rexna civakî girîngîye bi naveroka berhem û peywendîya navbera edeb û civakê û rengvedana arîşên civakî di nav berhemên edebî da dide.

Di despêkê da me amaje daye jîyan û berhemên Babê Nazê. Di beşa yekê ya teorî da bi navê edeb û civak û rexna civakîye. Li despêkê me amaje daye peywendîya navbera edeb û civakê da. Ê rexna civakî ji layê zarav, pênase, mêtûya serhildanê, araste, pêgîrbûn û binemayên rexna civakî. Di beşe duye ku piraktîke bi navê rengvedana arîşên civakî di romanên “Stokholmê Te Çi Dît Bêje û Xweşîya Bi Êş” daye.

Herdu roman li dîf rexna civakî hatine şîrovekirin. Ê ew mijar û arîşên di nav herdu romanên da hatine azrandin û xistine ber çavan. Herdu romanên Babê Nazê wek mimbereka civakîne, romannivîsî têrwanînên xwe bi rêya wan arasteyî civakê kirine. Bi mebesta guherîn û hişyarkirina civakê.

Peyvên Sereke : Rexna Civakî, Dab û Nerîtên Civakî, Babê Nazê, Roman, Qeyrebûn, Kultûr, Arîşên Civakî, Mafê Jinê, Derdên Koçberîyê.

Hejmara Rûpelan : 166

Şewirmendê Tezê : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Yüksek Lisans Tezi

MOHAMMED ISSA SALIH

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Eylül - 2019

BABÊ NAZÊ’NİN ROMANLARINDA SOSYAL ELEŞTİRİ

(Örnek: “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” ve “Xweşîya Bi Êş”)

ÖZET

Sosyal eleştiri edebi eserler içinde toplum ile edebiyat arası ilişkilere ve edebi eserler içindeki sosyal problemlere önem verir.

Bu çalışmamızda başlangıçta, giriş bölümünde roman yazarı Babê Naze'nin hayatı ve eserleri hakkında kısa bilgi verildi. Birinci bölüm olan teori kısmında ise toplum ve edebiyat ile toplumsal eleştiri kısmına yer verildi. Fakat başlangıçta toplum ve edebiyat arası sosyal eleştiriye işaret etmekle birlikte lehçe yönü ile sosyal eleştiri, sosyal eleştiri tanıtımı, sosyal başkaldırı tarihi, vefa, toplumsal eleştirinin temelleri göz önünde bulunduruldu ve sosyal eleştiri bakımından değerlendirildi. İkinci bölüm olan pratik kısmında ise “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” ve “Xweşîya Bi Êş” adlı romanlardaki sosyal problemler dile getirildi. Her iki roman sosyal eleştiri ile birlikte açıklandı. Bu konu ve her iki roman arasındaki sosyal sorunlar açıklanmış ve üzerine dikkat çekilmiştir.

Babê Nazê'nin bu iki romanını toplumun bir aynası gibidir. Roman yazarı duygularını bu yolla toplumu değiştirmek ve uyarmak için topluma havale etmiştir.

Anahtar Kelimeler : Sosyal Eleştiri, Toplumsal Örf ve Adetler, Toplumsal Sorunlar, Naze'nin Babası, Roman, Evde Kalma, Kültür, Kadın Hakları ve Göç Sorunları.

Sayfa Adedi :166

Danışman : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Master Thesis

MOHAMMED ISSA SALIH

YUZUNCU YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF THE LITERATURE OF LIVING LANGUAGES

KURDISH LANGUAGE AND CULTURE DEPARTMENT

SEPTEMBER - 2019

SOCIAL CRITICISM IN THE NOVELS OF BABÊ NAZÊ

(Example: “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” and “Xweşîya Bi Êş”)

ABSTRACT

Novel as a literary genre can take social problems as its subject. Social criticism, on the other hand, gives importance to the relationship between society and literature in literary works.

In this study, social criticism of the two novels of Babê Nazê, who has been stated with his real name below, “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” and “Xweşîya Bi Êş” has been taken as main subject. After the foreword, brief information about the life and works of the novelist Babê Naze has been given in introduction part. Then, in the first part, which is the theory part, social criticism with society and literature were included. At the beginning however, together with social criticism to society and literature; introduction of dialect, social uprising, reproach, history and roots of social criticism were taken into consideration. In the second part, which is the practical part, social problems in novels of “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” and “Xweşîya Bi Êş” has been mentioned.

Novels of Babê Nazê “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” and “Xweşîya Bi Êş” has been chosen as subject and they were evaluated in terms of social criticism. Along with this topic, the social problems between the two short novels were explained and attention was drawn on them.

Key Words : Social Criticism, Social Customs, Social Problems, Naze’s Father, Novel, To Remain a Spinster, Culture, Women's Rights and Immigration Problems.

Number of pages : 166

Thesis Advisor : Lecturer. Member of Dr. Nesim SÖNMEZ

NAVEROK

	Rûpel
KURTE	i
ÖZET	ii
ABSTRACT	iii
NAVEROK	iv
KURTEBÊJE	vi
PEŞGOTÎN	vii
DESTPÊK	1
1. JÎYAN Û BERHEMÊN BABÊ NAZÊ	1
1.1. Jîyana Wî	1
1.2. Berhemên Wî	5
1.EDEB Û CIVAK Û REXNA CIVAKÎ	8
1.1.Edeb û Civak	8
1.1.1. Nerîna Têorîya Hunerê Ji Bo Civakê	9
1.1.2. Kesên Ku Huner Di Xizmeta Civakê Da Didîtin	9
1.1.3. Nerînên Ku Dibêjin Edeb Pêwendîya Xwe Gel Civakê Nine	10
1.1.4. Nerîna Têorîya Hunerê Ji Bo Hunerê	10
1.2. Zaravê Rexna Civakî	13
1.3. Têgeh û Pênasên Rexna Civakî	14
1.4. Mêjûya Serhildana Rexna Civakî	17
1.5. Arastên Rexna Civakî	25
1.5.1. Arastê Dîyalêktî	25
1.5.2. Arastê Binyatgerîya Pêkhateyî	28
1.5.3. Arastê Sosyolojîya Edebî	34
1.5.4. Arastê Sosyolojîya Têkistên Edebî	40
1.6. Pêgîrbûn	45
1.7. Binemayên Rexna Civakî	54
2. RENKVEDANA BABET Û ARÎŞÊN CIVAKÎ DI ROMANÊN “STOKHOLMÊ TE ÇI DÎT BÊJE” Û “XWEŞÎYA BI ÊŞ” DA	58
2.1. Babet û Arîşên Civakî	58

2.1.1. Kurtîya Romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje”	59
2.1.2. Kurtîya Romana “Xweşîya Bi Êş”	61
2.2. Renkvedana Babet û Arîşên Civakî Di Romanên “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşîya Bi Êş” Da	63
2.2.1. Tawanbarkirina Bi Bêbextî	63
2.2.2. Şîretên Jîyanê	68
2.2.3. Perwerdekirin	78
2.2.4. Dêrdên Koçberîyê.....	83
2.2.5. Kultûr	91
2.2.6. Qelsatî û Destvekiribûn	97
2.2.7. Hejarî û Deyîndarî	97
2.2.8. Dizî û Fêlbazî.....	99
2.2.9. Eşkencedan û Nebûna Azadîyê.....	100
2.2.10. Berdan.....	103
2.2.11. Mafê Jinê û Neazadîya Wê	104
2.2.12. Hevgezbazî	112
2.2.13. Hevalînî	115
2.2.14. Evînî.....	117
2.2.15. Xîyanet	125
2.2. 16. Nexşên Erotîkî	131
2.2.17. Qertbûn Yan Qeyrebûn	137
2.2.18. Destdirêjîkirin Yan Laqekirin	140
ENCAM	142
ÇAVKANÎ	146
JÎYANAME.....	155

KURTEBÊJE

k.t. : Komara Tirkîyê

ç. :çap

g. :gotar

h. :hejmar

hwd. :her wekî din

s.x.l. :slava Xwedê lêbe.

j. :jimare

r. :rûpel

t. :tercume

ta. :tabî'

w. :wergêr

pz. :pêşîya zayînê

yd. : Yên din

z. :zayînî

PEŞGOTÎN

Roman ew janrê edebîye dişet ketware jîyana civakî di nav xwe da hembezbike û bi rêya ziman rengvedana mijar û arîşên civakî dike. Romannivês wek endameke di nav civakê da dikeve jêr karîgerîya civakê û hewil dide bi rêya berhemên xwe karîgerîye li civakê bike. Roman weku mînbereka civakîyê ku romannivês bi rêya wê peyama xwe digihîne civakê. Romannivês li ser ziman kesayetîyên romanê helwesta xwe beramber arîşên di nav civakê da hene radigihîne. Çi bi ber çavkirina wan arîşan yan jî bi ber çavkirin û çareserkirina wan di nav berhemên xwe da. Romannivês hewil dide bi rêya romana xwe xwandevan ji arîşên di nav civakê da hene hişyar bike.

Ev xebat li jêr navûnişanê “Rexna Civakî di Romanên Babê Nazê da Mînak: Stokholmê Te Çi Dît Bêje û Xweşîya Bi Êş” daye.

Egerê hîlbijartina vê babetî li dîf lê gerîyan û difçûna me heta niha çî vekolînên akademî li ser romanên Babê Nazê nehatine encamdan ji ber ku herdu romanên Babê Nazê “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşîya Bi Êş” ketwar mijar û arîşên civaka Kurdî di nav xwe da hembezkirine. Herdu romanên wî li ber sibera realîzmê da hatine nivêsin. Ji ber ku rexna civakî jî girîngîyê berhemên bi vî awayî dide me bi guncayî dîtîye. Em vê metoda rexneyî li ser herdu romanên wî piraktîze bikin û li dîf binemayên rexna civakî herdu romanên şîrove bikin. Romanên wî dokumantaxoneke civakî tene danan ku rengvedana arîşên civakî di nav xwe da berceste kirine.

Ji ber ku çî vekolîn û name bê arîşe nînin, ev arîşên di vê xebatê da ketine pêşîya me wek kêmsîya jêderan bi zimanê Kurdî ji bo pirkirina vê walatîyê me pena birîye ber jêderên bîyanî.

Lê derbareyê rebaza vêkolînê bo xistine ber çava layenê teorî û piraktîkî me mîfa ji metoda wesfî û şîrovekarî wekirtîye. Me di vê xebata xwe da metoda rexna civakî li ser du romanên Babê Nazê “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşîya Bi Êş” piraktîze kirine. Li dîf binemayên rexna civakî ev herdu romanê şîrovekirine.

Heykelê vekolînê ji du pişkan pê tê. Digel pêşgotin, destpêk, encam û lîsta jêderan.

Pişka yeke teorî bi navê “Edeb û Civak” û “Rexna Civakî” ji van mijaran pêk tê. Edeb û civak, Zaravê Rexna Civakî, Têgeh û Pênasên Rexna Civakî, Arastên Rexna Civakî, Pabendbûn û Binemayên Rexna Civakî.

Pişka duye piraktîk bi navê “Rengvedana Arîşên Civakî di Romanên Stokholmê Te Çi Dît Bêje û Xweşîya Bi Êş” da. Ku piştî şîrovekirina herdu romanên li dîf binemayên rexna civakî çend mijar û arîşên civakî li gorî naveroka herdu romanên hatine parvekirin û dest nîşankirin.

Spasî bo Xwedayê mezin û birêz Dr. Nesim SÖNMEZ ku erkê şewirmendî û serpereşfikirina nama min kirîye û bi amojgarî ditin û nerînên xwe rê li pêşîya min ronkirîye, çavderîyeka zanisti, dif çûneka berdewam dikir bo dumahîk înanê evê namê bi rengê akademî û baştirin şewe û Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtûya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî dikim.

Herwisa Mamoste Ehmed SERHEDÎ ku sereraskirina vê namê da di warê rastnivêsinê da hevkarîya min kirîye. Herwisa hevalên min mamoste Ridwan, Omer û Yehya bo herkesekê harikarîya min kirîye ku nedîşîyan daye navê hemîyan derbas bikim û nivîkar Babê Nazê bo hevkarîya wî digel min da.

Herwisa dayîk û Babê min heta ku di jîyanê da mame qerdarê wanim, hevala jîyanê, hevjinê min û hemî kes û karên min.

MOHAMMED ISSA SALIH

Van -2019

DESTPÊK

1. JÎYAN Û BERHEMÊN BABÊ NAZÊ

1.1. Jîyana Wî

Romannivîs Babê Nazê “navê wî Mihemed Ebdullatife, navê Babê wî Ebdullahe û navê bapîrê wî Ebdulrehîm e. Yê navdare bi “Babê Nazê”. Li sala 1946 li gundê “Koçuka” giredayî parezgeha Mêrdînê ve li Serxetê ji dayîk bûye. Ji binemaleka oldare bav û mamê wî Hamîd û birayê wî yê mezin Mihemed Sidîq mela bûn û li devera Omerîyan bi binemala melayan têne nasîn. Li ber destê Babê xwe dest bi xwandina Qur’anê kirîye. Û sala 1953 diçe binxetê, li bajêre Amûdê li mala birayê xwe yê mezin Mihemed Sidîq dest bi xwandina seratayî dike. Li sala 1957 mala wan bi temamî binxetê bajêre Amûdê niştêcîh (akincî) dibe” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Li piştra jî mala wan tê veguhastin jibo bajêrê “Heseke” li sala 1961 heta sala 1967 dibistana amadehî bajêra Heseke birîye seri”(Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019). Herwisa ji layê hizba sosyalista Sûryayê ve tê virêkirin bo Rusyayê jibo xwandinê. Li sala 1969 diçe Yekîtîya Sovyet jibo xwandine. Li sala 1980 li Zankoya Mosqûyê ya fermî kolîja edebîyatê nama doktorayê di warê edebîyatnasîyê da wergirtîye” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Lê di derbareyî jîyana dayîka wî da navê vê ‘Eydê’ bû di koka xwe da Ermênî bû. Her jî zarokanî mamê Babê Nazê mela Hamîd ev xanima xwedan kiribû. Piştî dema karwanê wan li gundê wan ra derbas dibe dayîka wê, wê emanetî jineka gundî dike. Ji ber hêjarîye ev jinê jî emanetî mala mela Hamîd dike kû xwedan bike. Lê dema dayîka wî mezin dibe li sala 1925 mele Hamîd li xwe mar dike. Yek zarok bi navê Mihemed Sidîq jê dibe. Lê piştî vê mele Hamîd tê kuştin (1926- 1927) ji layê birayê wî Ebdullahê va dayîka Mihemed Sîkîq tê markirin. Babê Nazê ji bilî birayê xweyî mezin Mihemed Sidîq ku kûrê mamê wî bû. Lê bi layê dayîkê vê birayên hevbûn. Dû bira bi navê Ebdulatîf û Edulrehîm û sê xweşîk bi navê Emîna, Sa’dîyê, Fatîma hebûn”(Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Herwisa Babê Nazê jîyana hevjinîyê du caran pêkanîye. Cara yekê li sala 1971 li gel keçeka Rûsî bi navê “Lîdya Gorçagîna” ku nûjdar bû, piştra jî ji hev veqetîyanê niha ji digel hev najîn. Herçendê du zarok ji wê hebûn bi navê Nazê ya kû 1972 ji dayîk bûye û mastêr bi derûnnasîyê qedandîye. Keça din “Darîya” 1983 da ji dayîk bûye. Vê kêça wî jî diplomaya perwerdehîya zarokan a du

salê dest xistîye (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Babê Nazê bi navê keça xwe ya mezin kû navê wê Nazêyê xwe daye nasandî û navdar bûye. Dîsan bo cara duyemîn jî jîyana hevjinîyê pêkanîye. Li sala 1997 ligel keçeka bi navê “Albîna” yek zarok jê heye bi navê “Narîn” di sala 2001 ji dayîk bûye. Ev keça niha jî enistitûya nûjdarîyê qonaxa yekê xwandekare. Babê Nazê niha jî digel hevjinê xwe ya Albîna dijî (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018).

Lê derbareyê jîyana sîyasîya Babê Nazê “Li sala 1961 tevî refên hîzba sosyalîsta Suryayê dibe. Ji ber çalakîyên wî yê sîyasî li Suriyayê du caran tê girtin. Li sala 1962 bo deme sê rojan tê girtin. Dîsan li sal 1964 bo heyvekê tê girtin. Ji ber bêşdarîya wî di kar û çalakîyên hîzbî da. Û xwandina hukumî tê derxistin û xwandina taybet berdewamîyê dide xwandinê. Û sala 1966 di meşekê da tê birîndarkirin. Ji ber ku endamekî çalak bû di nav hizbe da beşdarî hemî xwepêşandanên li hizbe nêrazîbûnê dijî dest hilatê dibû. Li sala 1969 dihetê şandin bo xwandinê welatê Rusyayê. Ta kû sala 1979 dest ji endamîya vê hizbe berdayê. Ji ber ku daxwaz kiri bû bendekê li peyrewên hizbê zêdebike ku giredayî mafên Kurdan be. Ji ber cihneînana vê xwesteka wî dest ji emdamîya vê hizbe berdaye (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019). Herwisa ji ber ku li def yasayên welatê Rusya pêdivî bû xwandkar piştî temam kirina xwe wergerin welatê jê hatîye. “Ji ber vê çendê jî piştî xwandina xwe temam dike li sala 1981 dizvire Suryayê” (Babê Nazê ra hevpeyvîna Kanala WAAR, 2017). Herwisa ji ber nebûna azadîya sîyasî li sala 1985 penayê dibe ber jîyana koçberîyê li welatê Swedê. Egerê koçberîya xwe jî jibo vê çendê vedigerîne.” Taybet pirsê sereke ez bikaribim xebatekê di warê edebîyata Kurdî da bikim. Ev mercên hane, ji beri her tiştî li Suriyayê tinebûn. Ez wan kesan bûm çûmê Swedê bi armanceke em dest pêbikin pirtûkan wergerînin bo zimanê Kurdî. Herwisa jî afirandin bi zimanê Kurdî. Bi vê armancê ez çûm lê mixabin em negihîştin armanca xwe (Babê Nazê ra hevpeyvîna Kanala Dinya, 2013). Ji ber ku deme “li sala 1985 diçe Swedê li wêre dijît. Li sal 1986 tê gumanbarkirin bi kujtina “Olof Palme” serokwezîrê Swedê. Belê piştî vekolîna bûyera bo deme deh heyvan bêgunehîya wî tê xuyanîkirin ku dest vê kiriyara kuştinê de nîne. Di sala 1988 da verdigere welatê Rusyayê” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019). Dîsan “li sal 1993 tê bajêrê Hewlêrê bêşdarî kongireyên “PDK” dibe. Û sala 2003 pêve li Duhokê akincî dibe. Li Zankoya Duhok û Zaxo dibe beşa zimanê Kurdî wana di warê edebîyatê da bi taybetî

jî teorîya Edebîyatê da dibêje. Ta sala 2013 xanênişîn dibe. Niha jî li gundekê bi navê Polîyana ya li ser bajêre Yaroslavî li Rusya li gel hevjinê xwe Albîna dijî. (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018).

Herwisa derbareyî jîyana wî ya rewşenbîrîyê “li Rusya li sala 1977 li gel sê hevalên xwe gorbihuşt Rizo, Doktor Evdo al-Necarî û Se’dedin Mela komela Kawa ya çanda Kurdî damezrandîye. Her bi rêya vê komelayê berhemên xwe belavkirinê. Û bi kare wergeran û belavkirin ra bûne (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019). Herwisa Babê Nazê yekem çîroka 1972 bi navê “Navê Min Xweş Navê” nivîsiye. Herçendê berî wê sala 1971 çîrokek nivîsîbû bi navê “Min Çawa Newroz Naskir” lêbelê berdest nemayê ji ber ku radestî Ordixanê Celîl kirîbû dema ku wê çîrok Lenîngradê xwandî bû. Li sala 1978 yekem romana xwe “Çîyayê Bi Xwenî Avdayî” bi zimanê ‘Erebî nivîsiye û belav kirîyê. Sala 1988 ev roman bi zimanê Kurdî hatibû nivîsîn û belav kirin. Dîsan yekem romana xwe bi navê “Stokholmê Te Çi Dit Beje” sala 1987 bi zimanê Kurdî belav kirîyê (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019). Herwisa Babê Nazê bi nivîskarên Kurd û bîyanî karîgerbûye wek Ehmedê Xanî, Maksîm Gorkî, Resul Hemzetov û klasîkên cîhanê ji edebîyata Rûsî, Firensî û Îngilîzî. Babê Nazê berhemên xwe di çarçoveya rebazeka edebî da nivîsîne û di vê mijarê da dibêje: “Ez dikarim bêjim ew arasteya edebî kû rîyala jîyanê dide xuyakirin rêbaza realîzmê bi taybetî jî realîzma sosyalîzmê di bin sîwana vê dibistanê da min berhemên xwe nivîsandinê. Nivîskarên vê rêbazê karîgerîya xwe li min kirine wek Tolstoy û Dostoyevskî (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Herwisa Babê Nazê bi îdolojîya Maksî karîger bûye. Di vê mijarê da dibêje “ji men ra dihat gotin lazime mirow hemî tamam wek hevdû bin. Hizra serekîya wê yeksanî bû. Lazime hemî wek hev bijîn çê nabê yek ji yê din çêtir bijî û çî mirovê hebe. Ji me ra dihat gotin eger şîyû’yet (hev jîyan, komînîzm) çêbibe yê mafê Kurdan jî bidin” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019). Herwisa Babê Nazê dide xuyakirin “jîbo cara yeke sala 1964 min beşdarî ahenga newrozê kirîyê li Sûryayê kû wê çaxê newroz qedexê bû. Divêt kû hizra mîrovayetîyê û netewayetîye li def mirow li ser her tiştî ra be” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Babê Nazê têkilî digel kesan hebû wek Pirofîsor Lazer, Hisir Tîyan, Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl û Erebê Şemo. Heta niha jî Babê Nazê yek ji endamên çalakên yekîtîya nivîskarên li Duhokê. Çendîn gotar û vekolîn di kovar û rojnameyên navxweyî wek kovara Peyv û Metîn û rojnama Waar belav kirine. Dîsan

çendîn gotar û vekolîn di rojnamê û kovarên derve jî belav kirine wek Berbang, rojnama Armanc li Swedê û rojnama Axîna Welat berpîrsê çandî bû ku li Moskoyê di nav bera sala 1995 û 1998 da diweşîya” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019). Herwisa çendîn berhem di ware afirandin, amedekirin û wergeranê da hene û belav kirine.

Li derbarê nasnavê wî bernîyas bûna wî bi Babê Nazê di vê mijarê da dide dîyarkirin: “Ji ber ku di nav civakê da wihaye kû zêdetir xwe bi navê kuran didin nasandîn, min jî xwe xwastîye ez xwe bi navê keçe bidim nasandîn. Ji ber ku navê keça min ya mezin navê wê Nazê ye. Min jî xwe bi Babê Nazê daye nasandîn” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2019).

Lê derbareyê cihê Babê Nazê di nav romana Kurdên Sûryayê da Helîm Yûsiv di pêrtûka xwe da ya bi navê “Romana Kurdî” da romana Kurdî ji bo çend qonaxan dabeş kirîye. Wek qonaxa romannivîsên destpêka pêvajoyê (1930-1980) û qonaxa romanîvîsên “Navbeynkar” an yên “Pir” (1980-1990) ku ev roman li dîf sala weşandina wan hatine rêzkirine ku romanên Kurdên Tirkîyayê û Kurdên Sûryayê di nav hev da hatine rêzkirin. Romana Babê Nazê “Stokholmê Te Çi Dît Bêje”li rêza heyştan da hatîye. Di nav romannivîsên vê qonaxe da navê Babê Nazê rêza heftan da hatîye. Bi vî awayî hatine rêzkirin:

Em li vê derê dibînin ku Helîm Yûsiv qonaxa “Navbeynkar” an yên “Pir” 1980-1990 wiha rêz dike:

“Romannivîsên Navbeynkar an yên Pir 1980- 1990. Li wira emê li gor sala weşanê bi mînan çend romanên vê qonaxê destnîşan bikin.

- Romana Rêwî ya Sehîdê Îbo -1979.
- Romana Xanê ya Birîndar - 1982.
- Romana Soro ya Birîndar -1983.
- Romana Pala Bêşop ya Xemgîn Temê - 1983.
- Romana Hêlîn ya Mahmûd Baksî -1984.
- Romana Tu ya Mehmed Uzun - 1984.
- Romana Dê û Dêmarî ya Egîde Xudo -1986.
- Romana Stokholmê Te Çi Dît Bêje ya Babê Nazê -1987.
- Romana Wendabûn ya Şahîne Soreklî - 1987.

-Romana Zevîyên Soro ya Nûrî Şemdîn -1988 ku ew roman bi xwe ya Nacî Kutlay e” (Helîm Yûsiv, 2011: 45).

Anko em dikarin bêjin Babê Nazê tê hijmardin kesên destpêke ji nivîserên Kurdên Sûryayê dest avêtîye nivîsina romanê. Destpêke bi zimanê ‘Erebî romana “Çîyayê Bi Xwînê Avdayî” di sala 1978 belav kirîye bi zimanê Kurdî jî di sala 1988 ev romana bi zimanê Kurdî belav kirîye. Herwisa romana Babê Nazê “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” divê neye bîrkirin ku ev roman li sala 1987 hatîye çapkirin ku vê demê nivîsandina berhemana bi zimanê Kurdî hê gelek kêmbû. Û Babê Nazê jî yek kesên pêşîne ku berhem dane wêjeya Kurdî (Îbrahîm Seydo 2014: 288). Kewatê Babê Nazê tê hijmartin ji roman nivîsên destpêke ji Kurdên Sûryayê. Dest avêtîye afrandin û nivîsina romanê bi zimanê Kurdî. Babê Nazê bi romanê xwe tê naskirin û karîye bala xwandevanan bikêşe ser romanê xwe. Herwisa rexnegirek derheqê wî da dibêje “Babê Nazê realîstekê dijware, lew hindê xurt û xwe bawere (Omer Dilsoz, 2010: 43). Babê Nazê ji ber ku piranîya berhemên xwe bin sîbera realîzmê da nivîsîne ew mijarên di nav civakê da pê êşîyayê di nav romanên xwe da rengvedane. Qeyd û bendên civakê nebûnê rêgir û hêlên sor rêya afrandîna wê da heta niha jî di nivîsina romanê da berdeewame.

1.2. Berhemên Wî

Berhemên Babê Nazê van bûwaran bi xwe vê digirin:

1- Di Warê Afrandinê Da

A- Roman :

1. Çîyayê Bi Xwînê Avdayî - roman- 1978 bi zimanê ‘Erebî, bi zimanê Rûsî -1981, bi zimanê Kurdî -1988.
2. Stokholmê Te Çi Dît Bêje - Kurte roman -1987 bi zimanê Kurdî, bi zimanê Swedî - 2015 bi zimanê Rûsî-2018.
3. Mirîyê Heram - roman - bi zimanê Kurdî 2008, bi zimanê Rûsî- 2018, bi zimanê ‘Erebî 2019.
4. Dara Pêlweşîyayî - roman - 2011 bi zimanê Kurdî tîpên latînî.
5. Hêlîna Pêpûkan - roman 2016 bi zimanê Kurdî tîpên ‘Erebî.

6. Xweşîya Bi Êş- Kurte roman 2016 bi zimanê Kurdî tîpên 'Erebî, 2017 bi tîpên latînî.
7. Xewna Bi Hevî- roman- 2019 bi zimanê Kurdî tîpên 'Erebî.
8. Hewara Nêbihîstî- roman -2019 bi zimanê Kurdî tîpên 'Erebî.
9. Hêsirên Gotina Bê Gotin- kurte roman- 2019 bi zimanê Kurdî tîpên 'Erebî.

B- Çîrok

1. Hêsir û Baran- koma çîrokan 1985 bi zimanê Kurdî .
2. Govênda Ber Mirinê- 2015 bi zimanê Kurdî

C- Şano

1. Mirina Mêrxasî-2017 nivîsîn, 2018 hatîye listin û pêşkeşkirinê li Duhokê.

D- Di Warê Amadekirinê Da

1. Teorîya Edeb -2010 bi zimanê Kurdî tîpên 'Erebî.
2. Dîroka Edeba Kevnare - Edeba Yunanî, berge yekê - 2010 bi zimanê Kurdî bi tîpên 'Erebî.
3. Dîroka Edeba Bîyanî- Dîroka Edeba romanî, berge duyemîn - 2013 bi zimanê Kurdî bi tîpên 'Erebî.
4. Dîroka Edeba Bîyanî - Edeba serdema navîn û vejînê, bergê sêyem 2013 bi zimanê Kurdî bi tîpên 'Erebî .
5. Dîroka Edeba Bîyanî- Edeba Sedsal 17 û18 z., bergê çaremîn- 2013 bi zimanê Kurdî bi tîpên 'Erebî.
6. Dîroka Edeba Bîyanî - Edeba Sedsal 19 û 20 z., bergê pêncemîn- 2013 bi zimanê Kurdî bi tîpên 'Erebî.
7. Ferhenga Termên Wêjeyî - 2012 bi zimanê Kurdî bi tîpên 'Erebî.
8. Rêzimana Kurdî bo zarokan -1996 bi zimanê Kurdî bi tîpê latînî.
9. Rêzimana Kurdî (Teorî û Piraktîk) - 2013 bi zimanê Kurdî bi tîpên 'Erebî.

E- Diwarê Wergerê Da

1. Îştîşad el-Baltal el- Kurdî, Fîyodur Litekin - 1997 werger ji zimanê Rûsî bo 'Erebî.

2. el-Çîbal û el-Sîlah, Ceymîz Oldiriç - roman 1978 digel Ebdî Hecî û el-mihendis Ehmed Hemo Dawid- ji zimanê Rûsî bo zimanê ‘Erebî.
3. Îtîfazad Şeyh Saîd, hisiretîyan, mêjû1981 ji zimanê Rusî bi zimanê ‘Erebî.
4. Nedahet el-Ekrad el-Kawmîye el-Seqafîye- mêjû 1985 ji zimanê Rûsî bo ‘Erebî.
5. Kurdistan Mabeynî Herbeyîn digel Sa’deddin mela 1988 ji zimanê Rûsî bo ‘Erebî.
6. Barzanî we Şahadet et-Tarih-2004 digel ‘Ebdî Hacî ji zimanê Rûsî bo ‘Erebî. Pêk hatiye ji komeka vekoleran û goteraka Bazê Nazê jî di nav daye pêrtûk li ser navê vê gotara wî berbelav bûye.
7. Pêşekîya Dîroka Kurdistanê ya Mela Mehmûdê Bazîdî ji zimanê Rûsî bo Kurdan.
8. el-Nehzad el- Sakafîyet fih Kurdistan fih Nihayet el-Karin, el tasih ‘eşar bidayet el karn al ‘eşrîn - digel Welato Omer, Mihammed el-Ebduh el-Necar- bi zimanê Rûsî bi zimanê ‘Erebî.
9. Meslehîyet Îzop li katî Arjantînî, hatiye listin û pêşkeşkirinê li Duhokê.

F- Di Warên Vekolînên Belavkirî Da

1. Ehmedê Xanê, Pêşgotin Babê Nazê, ravêkirin Ebdurahman Durre-2008.
2. Ber Bi Zimanê Yek Bûyî Ve - Senterê Vekolînên Kurdî li Duhokê belavkirîye.
3. Çi Bi Kurdistana Sor Hat- 2010 Senterê Vekolînên Kurdî li Duhokê belavkirîye.
4. Roman çîye?
5. Pêşwazîya Edeb - roman : Di nav bera teori û piratikte da, belav bûye rojnama Waar da û radio ya Waar li Duhokê.
6. Hevpeyvîn bi Erebê Şemo ra li bajêrê Lênîngradê -1972.

G- Di Warê Afirandinê Da Berhemên Nêbelavkirî

1. Rêya Derbirînê- Metelok û rawkirina wan bo zarokan.
2. Bîrewerîyên Babê Nazê - Bîrewerîyên xwe nivîsîne dixwaze piştî mirina wî benê belavkirin.

1. EDEB Û CIVAK Û REXNA CIVAKÎ

1.1. Edeb û Civak

Pêwendîya di navbera edeb û civakê dizivire serdemên kevnar. Wan serdemên kevnar ku mirovan bi rêya wênekêşîyê li ser dîwarên şikeftan derbirîn ji xwe dikirin. Bêguman eve rêyaka derbirînê bû ji civakê destpêkê miroveyatîye ye. Lê heger em edebê bidine nasandin, rexnegirekî bi vî rengî pênase kirîye: “Edeb bi piştrastîyane, hunerê derbirînêye ji serbora mirovan dûv pîverên edebîyên destnîşankirî” (Semîr Seîd, 2001: 36). Pênaseka din jî di ferhenga Rûsî da dibêje; “Edeb birîtîye ji hunerê peyvên nivîsî û nenivîsî yan jî beşeke ji hunerê wêneyê jîyana me, bo me dikêşe” (Şukrîye Resul, 1989: 7). Anko hemî ew berhemên têne nivîsîn û çapkirin, naçine xana edebîyatê. Çunkî edeb regez û binyadên xwe hene. Birîtîne ‘bîr, soz, xeyal, endîşe, şêwe, rûxsar’ji van danasînan jî bo me xwuya dibe. Edeb derbirînê ji serbora mirovan dike û wêneyê jîyanê dikêşe. Belê bi rêya zimani anko edeb bi wênekirina jîyanê radibe û edeb jî bi civakî ve girêdaye. “Edeb derbirînê ji jîyanê dike û alavê wê jî zimane” (Îzedîn Îsmail, 1978: 22). Belê nivîskar jîyanê bi renekî fotografî wêne nake ka çawa heye belkî nivîskar helwestê xwe beramber civakê bi rêya berhemê xwe bi rêyaka hunerî çî bi şîr yan çîrok yan jî roman radigehîne. Ji ber ku “Edeb dezgehekê civakîye, alavê wê zimane û ji afirandina civakê ye” (Rînye Wîlîk, Ustin Warîn, 1987: 97). Nivîskar bi civakê karîger dibe û karîgerîyê jî li civakê dike; “Edeb derbirînê ji civakê dike” (Î’zeddin Îsmail 1978 : 35). Nivîskar bi rêya berhemê xwe helwestê xwe beramber civakê radigehîne. Nivîskar bi civakê karîger dibe û paşî hewil dide karîgerî li civakê bike. Anko “Naveroka babetên edebî yên civakê piştbestinê nake li ser ketwarê jîyana civakê bi renekê rastewxwe di rastî da belê ji helwest û cîhanbînîya nivîskarîye ji jîyana wî civakê” (Î’zeddin Îsmail, 1978 : 45). Peyama edebê peyameke ji nivîskar ku takeke ji civakê û berev takekê dihête arastekirin ji xwandevanî ra ku endameke ji civakê ye.

Feylesof û hizirvan di hundirê sedsalan de mijûlî pîrsa peywendîya edeb digel civakê bûne. Di bersiva van pîrsan da du nerîn û boçûnên dijber hebûn.

Ya Yekê: Edeb derbirîna civakêye û neynika wê ye.

Ya Duyê: Edeb, xebatek mirovayetiya xwe bi xweyî ye. Ji takekesî dertê û çî armançek xwe ya civakî nîne” (Faîq Mistefa, Ebdulriza Elî, 1989: 49).

1.1.1. Nerîna Têorîya Hunerê Ji Bo Civakê

Li gor xwediyên vê nerînê huner bi giştî û edeb bi taybetî armançên xwe yên civakî û exlaqî hene. Ew jî ji bo derbirîna îdyalê bilinde, di civakê daye û bo pêşkeftina wî ye. Reh û rîşalên vê nerînê dizivirin bo serdemê feylesofên Yunanî Soqrat û Eflatun “Soqrat huner, rewîşt, ciwanî û mifa pêkvegirêdane, ciwanî li def wî ew tişte yê mifayê bigehîne. Belê Eflatun huner bi rastî ve girêdaye” (Faîq Mistefa, Ebdalriza Elî, 1989: 49). Dîsan romanusê Rûsî jî di pertûka xwe ya bi nave “Huner Çîye” da piştevanê nerîna navbirîye, dibêje: “Edeb baştirîn rêya bo peywendîkirinê û lêk nêzîkirina kesayetên civakê û rewîştî gêrana rolê çaksaziyên civakî û rewîştî” (Faîq Mistefa, Ebdalriza Elî 1989: 50). Herwisa bi dîtina Marksîyan jî; “Edeb rengvedana ketwarî û xudîka wê ye” (Ebdulkerîm Mistefa, 2012:89). Belê ne rengvedaneka fotokopîya ketwarîye. Belê dahêneraneye nivîskar pê radibe û ne rengvedaneka sadeye bo wî ketwarê ku xudîka mirî pê radibe. Herwisa hinek rêbazên edebî jî piştevanîyê li vê nerînê dikin weku rêbaza realîzmê, bi taybet jî realîzma sosyalîstî “Daxwazê ji nivîskarî dike ku berhema wî helgirê peyameka mirovayetî berz bît û derbirîne ji ketwarê jîyana civakî bike” (Nahîde Husên, 2010 : 73). Ji ber hindê jî rêbaza “Huner bo Huner” red kir ku daxwaz dikir edeb xwe ji hemî erkekê civakî û rewîştî dûr bixe, tenê pêxemet ciwanîyê.

1.1.2. Kesên Ku Huner Di Xizmeta Civakê Da Didîtin

Ev kesên ku huner di xizmeta civakê da didîtin belgên wan eve bûn:

1- Reh û rîşalên hunerî bagirewend û çavkanîya wan civake, ne bi tenê takekese. Ji dab û nerîtên (Urf û ‘edetên) civakî hebûna xwe wergirtîye û pêş de çûye. Heger edeb ji civakê hatîye der, evca ewê çawa ji civakê re nebe derbirîn?

2- Ji xwe dema nivîskar berê xwe dide afirandinê, ew bi armanca ku hest û hizra xwe bigehîne civakê, dinivîse. Ew xweşiyê bi nivîsîna xwe neke, heger negehite xwandevan û civakê. Êdî wê çawa berhemê edebî ne di xizmeta civakê de be? (Faîq Mistefa, Ebdalriza Elî 1989: 50).

1.1.3. Nerînên Ku Dibêjin Edeb Pêwendîya Xwe Gel Civakê Nine

Her çî nerîn ku dibêjin edeb pêwendîya xwe gel civakê nine, belgeyên wan eve bûn:

1- Pîverên civakî û exlaqî her dem di guhirînê de ne. Ji ber vê çendê, ew ne çespondîn û her qonaxek ji ya din cûdaye ku hat edeb û huner bi pîverên civakê bêne girêdan. Ev jî tê wê yekê ku nirxên wê yên bilind ne runiştîne. Bi vê jî huner nemirina xwe winda dike. Lê pirsîyar aya hemû pîverên civakî neçespondîne? Helbet na, çunkî ew nirxên bilind weku rastî û wekhevîyê, nemirin û ji qonaxeke dîrokî derbazî qonaxên dî dibin.

2- Dema pîverên civakî û exlaqî li ser nivîskar têne sepandin, bi vê ew azadîya xwe di afirandinê de, winda dike. Ev jî dibe egerê hindê ku edeb geş nebe. Bêguman, nabe destdirêjîya azadîya nivîskarî bibe. Ji ber ku pêdivîye ew tiştê ku dihête xwestin binivîse, ne ku ew tiştê ku li ser tê sepandin (Babê Nazê, 2009:132). Ya xwuyaye bi dîtina rêbaza huner bo civakê pêdivîye berhemê edebî armançek hebît û guherînekê di civakê da peyda bike. Anko divê edeb di xizmeta mirov û civakê da be.

1.1.4. Nerîna Têorîya Hunerê Ji Bo Hunerê

Xwedîyên vê têorîyê dibêjin; ne merce karê edebî meremeka taybet û destnîşankirî bi xwe ve bigire belkî ya girîng di berhemê edebî da ciwankariye. “Ku kirin û xebata mirovî xwe xweyî ye û yasayên xwe yên taybet hene ku bi bingeên civakî û exlaqî ve ne girêdayîne li dev van hizirvanan tu armanç ji bilî zatîyeta xwe nine. Anko ji bo edebê tu dilêma civakî û exlaqî peyda nabe. Û dilêma wê ya sereke heger wezîfa wê hebe ciwanîye û tenê ewe” (Babê Nazê, 2009:133). Bi xwe jêderê vê têorîyê vedigerit ser hizra feylesofê Elmanî Kant, ew dibêje: “Huner dê ciwan bît heger ne bi mifa bît û kengî bi mifa bû dê ciwanîya xwe winda bike” (Faîq Mistefa, Ebdalriza Elî 1989:52). Yekem nivîskarê ku cara yekê ev diruşme huner ji bo hunerê bilind kirî hozanvanê Firensî “Tîwfil Cutîye” weku bersîvek li ser helwestê romannivîsan ku edeb weku alavek ji bo derbirîna hesta kesayetî didîtin. Heger em berê xwe bidene herdu têorîyan bi hizra rexnegiran şaşîyek di herdu yan da heye.

Ya ku dibêje huner ji bo civakê musexere û ya din ku dibêje armanca hunerê, huner bi xwe ye; “Ji ber ku ji hunerê re, çawa ciwanî pêwîste, weha jî pirsên civakî û exlaqî û ne bi şaşîye ka çawa armanca edeb ciwanîye weha jî zanîn û perwerde kirine” (Babê Nazê, 2009 : 133). Anko pêdivîye berhemê edebî ji layê naverokê ve bi mifa bît bo civakê û ji layê rûxsarê ve jî ciwan çêjbexş bît.

Wesa dîyar dibe her têorîyekê ji wan ji riwangeh û îdolojîya taybet bi wê têorîyê berê xwe daye vê peywendîya navbera edebî û civakê. Ji encamê vê çendê jî komeka têorîya peyda bûne weku têorîya ‘‘lasayîkirdin, derbirîn, dahênan û rengvedan’’ê. Sebaret têorîya lasayîkirinê: Eflatun (227-347 pz.) damezrênerê têorîya lasayîkirinê ye, pênasa edebê kirîye dibêje; edeb lasayî kirine. “Di nerîna Eflatunî da siruştê hunerî lasayîkirina cîhana hestîye. Ew jî lasayîkirina cîhana nimûneyîye” (Hesen Yusif, 2013 : 10). Bi vê çendê jî dibînit dû pêngavan ji rastî dût dîkeve çunkî bi dîtina wî hunermend pişt didene eqilî û ber bi soz û hestan ve diçin. Belê sebaret têorîya derbirinê: Dibêje edeb derbirîne ji takekesî. Anko ‘‘derbirîne ji takekesî û hest û sozên wî dîke, edeb zanistê hest û sozane, dil tîşka rastîya ne, ne ku eqil. Erk û armanca edebî, xwe di wirijandina hest û helçûnan da dibîne (Hesen Yusif , 2013 : 11). Di vê têorîyê da takekes û hestên wî cihê girîngîne û li pila yekê dihên. Belê têorîya afirandinê: Edebê girê nadet bi çî tiştêkê derekî wek ‘‘ayîn, zanist, civak’’ temaşeyî edebê dîke bi çar ramanan:

Ya yekê weku xweşî û demborandin...

Ya duwê edeb teknîke...

Ya sîyê huner bo hunerê, şîr bo şîrê...

Ya çarê edeb berhemeke nivîskarî afirandîye, alava wê jî zimane û kiryara dahênan û afirandinê di edebê da serbeste” (Hesen Yusif, 2013:12). Anko piştgîrîya têorîya huner bo hunerê dîke.

Belê têorîya rengvedanê: Ji her sê têorîyên dî lasayîkirin, derbirîn û bi taybet jî berûvajî têorîya afirandinê. Pitir girîngî bi peywendîya navbera edebê û civakê dide. “Zanayên têorîya rengvedanê cextê li ser delaletên civakê karê edebî, hunerî û peywendîya navbera edebê û civakê dîkin. Wek di nivîsînên Bîlxanof, Lukaş, Êrnist

û Fîşer û hinekên dîtir da” (Şukrîye Resul, 2010: 91). Anko têoriya rengvedanê jî piştgirîya têoriya huner bo civakê dike. Ji serencamê van boçunan bo me dîyar dibe ku edeb peywendî bi takekesî ve heye û takekes jî beşeke ji civakê. Jê nahête cudakirin, bi vê ramanê jî anko edeb peywendî bi civakê ve heye. Zanistek jî peyda bûye vekolînê li ser civakê dike bi navê civaknasî yan jî sosyolojî ku feylesofî Firensî Ogîst Kunt (1798-1857) ev zarave di pertûka xwe ya bi navê “Çend Vekolîn Di Derbareyî Felsefa Pozitivîzmê Da” cihgîr kirîye. Civaknasî “Ew zanisteye ku peywendî û pêkhata civakê û dîyardên civakê vedikolît” (Newzad Ehmed, 2015: 253). Yan jî civaknasî “Vekolînê li ser komelên mirovan û reftarên kesan di nav civakê da dike”. Anko civaknasî jî vekolînê li ser kesên civakê dike, nivîskar jî keseke ji civakê. Ji ber vê çendê jî tayek ji civaknasî bo vê layenê hatîye terxankirin ku bi civaknasîya edebî dihête naskirin.

Civaknasîya edebîyatê “Biwareke peywendîya berhemê edebî û kawdan û doxê civakî şirove dike. Civak berî berhem hebûna xwe heye nuserî pêgîr dike. Nivîskar kawdan û doxê civakî dinexşînit wêne dike û hewil dide biguhurit. Hebûna civakê karîgerîya civakê û nexişandina civakê di berhemê da dibînit. Civak piştî nivîsîna berhemê dîsan hebûna xwe heye” (Komeka Nivîskaran, 2009: 75). Civaknasîya edebîyatê li sê binemayên edebî vedikulît “nivîskar, têkistê edebî, xwandevan” da ku taybetmendîyeka civakî pê bibexşit. Nivîskar peywendî bi xwandevanî yan wergirî dike bi rêya berhemê edebî di sosyolojîya edebî da peywendî navbera xwandevanî û têkistî û civakê da bi hêze.

Têkistî edebî ji layê nivîskarî ve dihête afirandin ku ew jî keseke ji civakê, ji ber hindê weku her kesekê civakê bi rûdan û arîşên dewrûberê xwe karîger dibe dê berhemê wî da reng vedide. Têkistê edebî derbirîne ji helwestê nivîskarî beramber civakê bo hişyarkirina û guherîna civakê jî wî ketwarê tê da dijît bo ketwarekê civakeke baştir. Çunkî berêxwedan û cihanbînîya nivîskarî cîyawaze jî wî cihanbînî ya di nav civakê da berbelav ji ber hindê jî hewil dide bi rêya berhemê xwe îdolojî û cihanbînîya xwe bigehîne civakê.

Peywendîya navbera edebê û civakê dîyalektîye edeb bi civakê karîger dibe berûvajî jî civak jî karîgerî li edebî dike. Ji ber ku nivîskar kurê jîngeha xwe ye pê karîger dibe û kartêkirîne lê dike. Edeb xudîka tak û civakêye derbirîne ji nax derûn

û ew jîngeha mirov tê da dijît. Edeb nuneratîya jîyanê dike. Edeb berhemê hizra nivîskarî ye nivîskar jî berî hozanvan yan çîroknivîs yan romannivîs bît gîyandareke ji civakê di nav xîzan û civakê da dijît. Nivîskar dişê zimanihalê arîşên civaka xwe bît û bi kûrî biçîte di nav wan kêşan da, destê xwe didanîte ser wan dîyardên paşkevî yên civakî û hewla çareserîya wan bidet. Bi vê çendê jî dişê peyama mirovayetî û dadperwerîyê di nav civakê da serbêxît. Û yekgirtinekê bi dirustî navbera edebî û civakê da çê bike bi vê çendê jî em dişên bêjin edeb derbîrîn û rengvedanê ji civakî dike. Di puxteyê da em dikarîn bêjin ku edeb ji civakê ye û bo civakê ye. Anko civak egerê ji dayikbûna edebê ye û pêdivîye eve edebe alavek bît bo berev pêşbirina jîyana civakê. Ji ber ku edeb jî dîyardeka mirovayetîye takên civakî bi ewê dîyardê radibin lew beşek ji rexnegirên edebî gehîştine ewê boçûnê ku berhemê edebî li jêr roşnaya civakî bihête şirovekirin. Dumahîkê jî ev eger bûne rêxweşker bo hêvênê serhildana curekê rexne di cîhana rexna edebî da ew jî rexna civakî ye.

1.2. Zaravê Rexna Civakî

Rexna civakî ji wan teorîyên rexneyî ye ku piştbestinê li ser hokarên derveyî têksitî dike. Bo şirovekirina têksitî weku “nivêser, mêjû, civak, jîngeh” ew kawdanên berhem tê da hatîye afirandin. Bi taybetî jî ew civakê têksit tê da hatîye afrandin, ew civakê nivêser tê da jîyayî karîgerîya berhemî ser civakê. Dîsa karîgerîya civakê li ser nivîkarê berheme. Piştbestinê û vekolînê li ser hevbenîkirina edebî bi civakê ve dike. Çunkî edeb weku xudîkekê ye rengvedana civakê dike. Bi hemî dîyardên xwe yên sîyasî û civakî û kultûrî ve. Kewate rexna civakî girêdayî semta ji derve ya semtên teorîyên rexneyî ye ku desthelat pitir bo nivîserê berhemî û civaka nivîskarî ye. “Rexna civakî wateya vê navlêkirinê weku xwe dide dîyarkirin, rêrewekê rexneyî ye. Kewate bikaranîna şirovekirin û helsengandina berhemê edebî ye, bi heve girêdana peyva “rexne” digel peyva bineretî yan serekî “civak” ramana rexna civakî yan sosyolojî didine çarçovekirin. Weku rexneyek damezrandî li ser şirovekirineka civakî di têkistan da (Bol Aron û Alan Vîyala, 2013: 92). Anko civak bo xwe dikete pirek bo şirovekirina têksitê edebî. Herwisa “zaravê rexna civakî bi rêjeyî nû ye. Belê kevne weku hizr bi wateya “şirovekirina edebî û dîyarda edebî di wan civakan da yên berhemînay werdigirt û kar tînin” (Azade Mintazîrî û Axrun, 2012: 6). Dîsan zaravê rexna civakî weku teorîyeka rexneyî xwe di nav gurepana

rexna edebî da bercestekirîye. Di zimanê Kurdî da zaravê “rexna komelayetî, rexna civakî” (Lêjina Edebî Li Kurê Zanyarî Kurdistan, 2006:52) û hinde caran rexna sosyolojî tê bikaranîn. Beramber di zimanê ‘Erebî da ‘’alnaqid alicitma’î” (Mîcdî Wehbe û Kamil el-Muhendis, 1984: 417) tê bikaranîn. Di zimanê Îngilîzî da zaravê “Social Criticism” (Mîcdî Wihbe û Kamil el- Muhendis, 1984: 417) tê bikaranîn. Herwisa di zimanê Firensî da zaravê “Socio Ciritique” (Semîr Se’îd, 2001: 121) tê bikaranîn. Di zimanê Farsî da “ Neqil Îctima’î “ (Îyirna Rîma Mikarîk, 2009 : 472) tê bikaranîn. Di zimanê Turkî da jî “Sosyolojik Eleştiri” (www.turkedebîyati.org) tê bikarînan.

1.3. Têgeh û Pênasên Rexna Civakî

Rexna civakî ji layê rexnegiran ve bi gelek curan hatîye pênasêkirin, lê hemî li ser berçavgirtina layenê civakî û kartêkirina dîyalektîya di nav bera edebî û civakî da dikokin ji wan pênasan jî:

Rexna Civakî: Birîtîye ji wê “xwandina mêjûyî, civakî, îdolojî, rewşenbîrî” di nav têkistî da. Dîsan peywendîyeka mukim bi wî ketwarî ve heye yê ku di nav da hatîye afirandin” (Ebdî Hacî, 2008: 29). Di evê pênasê da bo me kartêkirina civakê li ser têkistê û dîsan berûvajî kartêkirina têkistê li ser civakî dide dîyarkirin û herwisa dide dîyarkirin ku ev mêtoda rexnê pitir girîngîyê bi naveroka têkistê afirandî dide û ew civakê ew têkist tê da hatîye afirandin. Anko xwandineka rexneyîye bo layenê mêjûyî, civakî, îdolojî û rewşenbîrî bi armanca têgehiştina têkistê edebê.

Rexna Civakî: “Ew rexneye ku li jêr kawdan û barûdoxê civakê hewla şîrovekirin û ravekirina têkistê edebê dide. Bi dîtina vê rexnê têkistê edebî xwedan siruştêkê civakî ye” (Karzan Kerîm, 2009: 27). Anko ev mêtoda rexneyî ew civakê têkist tê da hatîye afirandin bo xwe dike amrazek bo têgehiştin û şîrovekirina wî têkistî çunkî bi dîtina vê rexnê têkistê edebî xwe dan siruştêkê civakî ye. Civak rêyake bo têgehiştina têkistê edebî.

Rexna Civakî: “Li ser binemayê pêkvegirêdana edeb û ketwarê jîyana mirovî bi tak û komê ve kar dike. Û bi wî çavî berê xwe dide edebê ku rengvedana hizr û bîr û boçûn û êş û arîşên nav civakî ye. Her ji vî riwangehî têkistê edebî şîrove dike û heldisengînit” (Fuad Reşîd, 2005: 166). Anko edeb rengvedana ketwarî û arîşên

civakî ye ka çawa nivîskar di nav berhemê xwe da amaje pê daye û êxistîye berçav da ku xwandevan li bihête agehdarkirin yan jî pêkula guherîn û çareserkirina wan arîşan daye. Hewil daye çareserî bo xwandevanî bi rêya têkistî xwe bêxite ber çav. Bi rêya berhemê xwe pêşbinîya civakekî baştir dike.

Rexna Civakî: Kilud Duşîye bi vî awayî pênase kirîye: “Têkistî bi xwe dike armanc ku ew cihe yê maytêkirin tê da dihête kirin û siruştêkê civakî dîyar dike” (Mecmuet Mîn el-Kuttab, 1997: 167). Anko ev rexne pitir girîngîyê bi têkistê dide hewil dide layenê wê yê civakî berçav bike.

Rexna Civakî: Ew mêtoda rexneyê ku “peywendîya navbera edeb û civakî vedikolît, yan ew zanisteye wek dîyardeka civakî li edebê temaşe dike, li vê derê edeb dihête pêgîrkirin bi wan kawdanên civakî tê da dijît” (Newzad Ehmed, 2015: 257). Li vêrê wisa daye xuyakirin ku ev mêtoda rexneyê di peywendîya navbera edeb û civakî vedikolît. Wisa temaşeyî edebê dike ku dîyardeka civakîye. Divêt edeb rengvedan û pêgîrbûnê bi wan kawdan û arîşên civakê bike ku di nav civakî da hene û di nav berhemê da bihêne rengvedan.

Rexna Civakî: Pîyer Barbêrs dibêje: “Hizra rexna civakî ji wê têorîyê serçawe girtîye ku edeb wek dîyardeka civakî dibînit nivîskar bi xwe edebê na afirînit, belkî her ji wî demê hizir li nivîsîn dike û paşî dest bi nivîsin dike û tamam dike bo civakê berhemê diafirînit” (Besam Qidus, 2011: 81). Navbirî wesa daye xuyakirin ku her ji destpêkê nivîskar berhemê bo civaka xwe dinivîse. Û divêt bi rêya berhemê xwe helwesta xwe bigehîne civaka xwe. Ev mêtode temaşeyî berhemê dike weku dîyardeka civakî.

Rexna Civakî: “Ev mêtode hewil dide têkistê edebî di nav wan kawdanên civakî yê têkist di nav da ji dayik bûye vekolîn bike. Dihête têbinîkirin edeb jî dîyardeka civakî ye weku dîyardên dî yên civakî ye bi civakî karîger dibe û karîgerîyê li civakê dike” (Şitlax Ebod, 1998: 231). Ya xuyaye ev mêtode tîşkên xwe yên rexneyê bi rêya wî civakê ew têkist di nav da hatîye afirandin berdide ser têkistî. Pêdivîye rexnegir kartêkirina civakê li ser têkistê û berûvajî kartêkirina têkistê li ser civakê bizanît.

Rexna Civakî: “Bi hizreka civakî têkistê vekolît bi rêya her sê binemayên edebî: Nivîskar ji layê kar û taybetmendiyên wî yên kesokî, têkistê edebî ji layê wan babetên ku wek çareserî dêxîte berçav, xwandevan jî ji layê çawanîya wergirtina karê edebî” (Aware Kemal, 2012: 14). Li vêrê jî hatîye xuyakirin rexna civakî li têkistê vedikolît têkist pira navbera nivîskarî û xwînerîye. Bi rêya têkistê nivîskar peyama xwe digehînite xwînerî û cîhanbînîya xwe sebarek kêşeyên civaka xwe dêxîte berçav. Nivîskar neşet hember wan arîşên di nav civaka xwe da dibînit xemsar bît bi rêya berhemê xwe helwestê xwe beramberî wan radigehîne û digehînite xwandevanî.

Herwisa “Can Îv Tadîye” sebarek (derbarê) rexna civakî dibêje; “Sosyolojîya edebî bo çend beşan dihête dabeşkirin. Rexna civakî yeke ji wan beşan ku karê wê serekî birîtîye ji vekolîna têkistî” (Can Îv Tadîye, 1993: 226). Anko rexna civakî wek beşek ji sosyolojîya edebê dihête hijmartin. Û pitir girîngîye bi vekolîna têkistê bi xwe dide.

Rexna Civakî: “Ev mêtode cextîye li ser delaletên civakî di edeb û hunerê da dike. Peywendî û karîgerîya di nav bera edeb û civakê da dîyar dike ew civakê têkist tê da peyda bûyî. Di şirovekirin û hêlengadina xwe da jî nav berhemê edebî delaletên civakî derdixît” (Faîq Mistefa, Ebdilriza Elî, 1989: 179). Weku dîyar ev mêtode girîngî bi wê çendê dide ka çend civak rol gêraye di afirandina berhemê edebî da û ka çend nivîskar bi rêya berhemê xwe dişet karîgerî li ser civakê dirust bike. Di hêlengandina xwe da piştbestinê li ser wan delalet û dîyarde û arîşên civakî dike ku di nav berhemê da hatine rengvedan.

Rexna Civakî: “Karîgerîya edebîyatê li ser civakê herwisa berûvajî karîgerîya civakê li ser edebîyatê dêxîte ber vekolînê” (Hîmdad Husên, 2007: 22). Ji vê pênasê dihête xuyakirin pêdivîye rexnegirê edebî kartêkirina civakî ser têkistê û berûvajî kartêkirina têkistê li ser civakî bizanît çunkî li dûv rexna civakî pêdivîye ev karîgerîye bihête dîyarkirin.

Ji van nasandinên ku bo rexna civakî hatîne kirin, em dikarîn bêjîn; rexna civakî ew mêtoda rexneyîye ku pitir girîngîye bi naveroka berhemê edebî dide. Dê kujîye civakî ra berê xwe dide têkistê edebê weku rengvedana wî civakê ew têkist di nav da hatîye afirandin. Ji ber ku ew peywendîya ku di nav bera edebê û civakê da

heye, peywendîyeka dîyalêktîye, herdu kartêkirinê li hev dikin. Li dûv rexna civakî pêdivîye ev karîgerîye bihête dîyarkirin. Herwisa ji riwangeha peywendîya têkistê edebê bi civakê ve pirosa rexneyê encam dide. Ya xuyaye li dûv vê mêtoda rexneyî pêdivîye berhemê edebî di kujîyê wê yê civakî ra bihête vekolîn, hêlsengandin û dûvçûn li ser delaletên civakîyên di berhemê da bihête kirin. Çunkî nivîskar ne bes dişê bi rêya berhemê xwe civakê xwe wêne bike. Belê dişê bi rêya dîyarkirina arîşên di nav civaka wî da hene di berhemê xwe da amajê pê bidet û rolê di çareserkirina wan da bigêrît û civakekê baştir di nav berhemê xwe da pêşbînî bike.

1.4. Mêjûya Serhildana Rexna Civakî

Zanistên mirovayetî peywendî bi rexna edebî ve heye, rolekê girîng gêraye di pêşvebirina rexna edebî da. Çunkî “rexnê peywendîyeka bihêz bi zanistên mirovayetî heye ewê vekolînên li ser mirovî dikin weku mirov wekî felsefê û mêjû û zanistên civakî û derûnnasî. Her serdemê Yunanîyan rexne hevbend bû bi felsefê ve. Belê serdemê nû da rexne pitir hevbend bû bi istîtakîyê “zanistê ciwanîyê” ku ew jî beşeke ji felsefê. Li dûvra jî rexne hevbend bû bi zanistên mirovayetî û rexne jî li gel wan zanistan berev pêş çû mifa jê wergirt (Omer Mihemed, 1993: 168). Anko li destpêkê rexne li jêr bandora felsefê dabû belê dûvra mifa ji zanistên mirovayetî bi taybet jî sosyolojîya wergirtîye û pêşveçûye. Piranîya rexnegiran wesa didine xuyakirin ku ‘rexna civakî ji bawêşa rexna mêjûyî derkevîye û hinek ji binemayên xwe yê destpêkî ji ewê wergirtîne” (Sêlah Fazıl 2005: 32). Anko perwerker û dirustkerê rexna civakî, rexna mêjûyî bû. Bi taybet ji layê ewan hizirmend û rexnegiran ve ku bawerî bi hizra mêjûya edebî û girêdana wê bi civakên cîyawaz û gorankarîyên wan li dûv cîyawazîya jîngeh, kawdan û serdeman heye. Bo dîyarkirina sînorî di nav bera rexna mêjûyî û rexna civakî da ji ber ku sînorên wan bi serhev ve diçin di vî bîyavî da Lukaş (1885-1971) dibêje: “Heger lêkolînên rexneyî berev mêjûya kevin bir, dê bîte mêjûyî û eger berev mêjûya nû bir di şîyan daye li wî demî em nav bikên bi civakî” (Salah Fazil, 2005: 27). Anko ji encamê berev pêşçûna rexna mêjûyî rexna civakê serhildaye ku hişyarîya mêjû hatîye guhartin bo hişyarîya civakî. Rexneya mêjûyî pitir girêdayî rûdanên mêjûyî bo ew gorankarîn bi ser civakî da hatîn belê rexna civakî pitir civakî bo verêja karê edebî û şîrovekirina berhemê li berçav digirît. Belê reh û rîşalên destpêkî bo rexna civakî vedigirîte ve bo çemkê

Eflatunî (429-347 bz.) lasayîkirinê di pertûka wî da, ya bi nave “Komar” da. Yekem rexnegire girîngî bi layenê civakî daye ji ber ku bi pîverek dibînît bo pesendikirina helbestê. Helbestvana ji komara xuya nimûneyî derdike çunkî rewîştî têk diden. Belê evên bo berzkirina wireya cengaweran helbestê dinivîsin, divêt rêz lê bihête girtin” (Îbrahîm Mehmud, 2003 : 66). Eve jî berêxwe daneka civakîye bo edebê.

Herwisa ji layê mêjûyî ve pêngava hizirvanê Îtalî Jean Baptiste Fîku (1668-1744) di pertûka wî ya navdar da “Binemayên Zanistên Nû” li sala 1725 ku bi yekem pêngava bername dariştî dihête hijmartin bo hevbendikirina edebî û ketwarê civakî. Jean Fîko xwedanê hizra xolên mêjûyî bû bi hizra wî her şaristanîyek xuleka jîyana tamam heye. Fîku janrên edebî bi ketwarê civakî ve hevbendikirîne rabûye bi ‘girêdana dastanên qeremanî bi civakê eşaîrî ve weku dastana Homeros bi civakê eşaîrî ve û girêdana çîrokan bi civakê cotyarî ve û derketina şanoyî digel dirust bîna bajêran û derketina romanê di gel serdemê çapemenîyê û belavbûna zanist û zanyarîyan û dirust bîna çîna burjuwazî û sermayedarî” (Sebrî Hafîz 1981: 66). Anko Fîkuyî di vekolîna xwe da pitir girîngî bi tewerê demî daye. Herwisa Fîku dibêje; “Edeb riha civakî ye, edebê civakê baştirîn derbirîne bo vê rihê” (Qusy Husîn 2009: 19). Herwisa piranîya çavkanîyên rexneyî wesa daye xuyakirin bi rengekî dîyar serhildana rexna civakî li Ewropa vedgerît bo destpêka sedê nozdê bi taybet jî piştî derkeftina pertûka Madme Destaelê (1766-1817) ya bi navê “Edeb Peywendî Bi Dezgehên Civakî Ve” (De La Littérature Considérée Dans Rapports avec Les Institutions Sociales) ku bi yekem pêngav dihête hijmartin li Firensa bo pêgvegirêdana edebî bi civakî ve. Madme Destaelê li gotara destpêka vî berhemî da dide xuyakirin ku” gelek pêdivîye temaşeyî wê çendê bikeyîn, nerît û yasa ta çend karîgerê li ser edebî dikin edeb jî ji layê xwe ve ta çî radeyekê karîgerê li ser ayin û nerît û yasan dike” (Newzad Ehmed 2009: 110). Berê vekolerî didete wî dewrûberê kartêkirin li têkistî kirî. Madme Destaelê piştbestin bi têgehên civakî serdemê Montisîko (1689-1755) û hinek bîr û boçunên hev serdemê xwe yê Elmanî Hîrdir (1744-1803) bestîne ku dibêje “her karekê edebî di nav jîngeheka civakî û coxrafî da reh û rîşalên xwe dibete xarê ku hinek erkên destnîşan kirî encam dide. Peywistî bi çî biryarîn helsengandinê nake, her tiştêk heye çunkî pêdivîye hebît (Sebrî Hafîz 1981: 67). Anko pitir Madme Destaelê berhemê edebê bi wê jîngeh û civakê ve girê dide ku di nav da hatîye afirandin yan nivîskar endameke ji wê civakê ya ku di nav

berhemê edebî da amaje pê hatîye dan. “Ji ber ku wesa dibînit ku her karekê edebî hevbende bi jîngeha civakî û kawdan û barûdoxên mêjûyî yên wî serdemî” (Newzad Ehmed, 2015 : 261). Anko di vekolînên xwe da berhemê edebî bi dîyardên civakî ve girê dide. Herwisa Madme Destaelê wesa dibînit ku “Edeb dihête guherîn bi guherîna civakan û li dûv berev pêşçûna azadîyê. Her weku li Firensa piştî şoreşê 1789 her tişt hatine guherîn, edeb jî di nav da (Ehmed Seqr, 2001 :208). Anko ew edebê li welatekê dihête nivîsîn ku nivîskar tê da azade cîyawaze ji wî edebê ku li welatekê dihête nivîsîn ku nivîskar ne azade di derbirîn û nivîsinê da her weku ew edebî berî şoreşa Firensî hatîye nivîsîn cîyawaze ji wî edebî piştî şoreş hatîye nivîsîn. Herwisa Bonald di rojnama Tard Firensa “Le Marcure France” dibêje “Edeb derbirînê ji civakî dike (Ehmed Seqr, 2001: 208). Herwisa bi boçuna Madme Destaelê bi guherîna civakî, edeb jî dihête guherîn. Herwisa bi zêdebûna rêja azadîya takî û giştî, edeb jî pêş dikevît belgê wî jî bo vê çendê “edebê Firensîye ku li serdemê pêş şoreşê ... asoyên mêjûyê li ber hatibûn girtin. Bi pîçewane piştî şoreşê ku ji ber guherîna civakî û zêdebûna azadîya takekesî edebî jî guherînên mezin bi xwe ve dîtin. Ev azadîye berfireh bû, hemî Ewropa girt û van gorankariyên edebê Ewropa jî bi xwe ve girt” (Îbrahîm Mehmud 2003: 67). Herwisa Madme Destaelê di pertûka xwe ya bi navê “Li Dor Elmanya” li sala 1810 berawirdî kirîye di nav bera kesayetîya Firensî û Elmanî da” vekolîn kirîye li ser radê rengvedana van cîyawazîyên kesayetî li ser edebî û peywendîya wan bi jîngeha siruştî û civakî ve” (Sebrî Hafiz, 1981 : 66). Herwisa Madme Destaelê dibêje em neşên di berhemê edebî bigehîn û bi dirustî tam û çijê jê werbigirîn heger em ewan barûdoxên civakî nezanîn ewên bûne egerê ji dayikbûna ewî berhemê edebî. Anko Madme Destaelê pitir girîngî bi tewerê jîngehê daye û kargerîya wî li ser edebî. Eve ji bilî hindê her heman nivîskar dide dîyarkirin ku keş û hewa û ketwarê civakî ji hokarên serekî yên cîyawazîya milletane, evê jî rengvedana cuda di edebê da heye. Bo nimune xelkê bakur û başurê Firensa di helbijartina wêneyê siruştî û derbirînên hest û soz û araste û bûyerên jîyanê ji hev cudane. Ji ber ewî siruştê xelkê bakur bi xwe ve hembêz kirîye. Hozanên wan bi daristan boş û kanîyên zelal wêne kirîne, kartêkirina evî siruştê bûye eger hest bi lêgerîyana hizrê bikin. Belê milletê başur kêr di mjûlî xweşîya jîyan û neteweyîne. Jîngeha ewan ya dest bi serdagirtî û zorîya lê kirî” (Întîsar Necîp, 2016: 50). Anko Madme Destaelê pitir girîngîyê bi tewerê jîngeha

siruştî û jîngeha civakî û azadîya di nav civakî da daye û karîgerî û rengvedana wî li ser berhemê edebî.

Madme Destaelê di vekolînên xwe da hinek zarav bikarhînaye ku girêdayîne bi berêxwe dana wê bo xwandina edebî ku peywendîya navbera edebî û civakê di sê zaravan da dîyar dike:

1. Xwandina Li Dûv Yek Da: “Madme Destaelê dibînit ku edeb dihête guherîn, bi guherîna civakan û li dûv pêşkevîna azadîye û bi pêşkevîna zanistî û hizrê û hizrên civakî. Edeb hemî dema rexneye û daxwazîye bo tişteke dê yek demî da. Bo nimune edebî Firensî piştî şoreşa Firensî 1789 bi guherîna sîyasî edeb jî hate guherîn. Û her jî wî demî ew pirsîyara derbareyî nivîskar, derbareyî çî dinivîsin çihê pirsyara nivîskar çawan dinivîsin digire” (Mecmu'el min el-Kuttab, 1997 : 176). Kewate pitir girîngîyê wî babetî dide ku nivîskarî derbarê wî nivîsîye û girîngê bi şewazî nivîsîn nadet. Belkî ew têkistê dihête nivîsîn divêt derbareyî kêşe û girftên nav civakê bêt û di xizmeta çînên civakê da bît.

2. Xwandina Wargehî: “Siruştê wargehî û radê azadîya wargehî wekî karîgerîya siruştî li ser edebê bakurê Firensa. Navbirî wesa dibînit rêja azadî li dev nivîskar û dahêneran karîgerîyeka baş dike ser astê dahênana wan weku ew berhemên tene nivîsin li Firensa ku welatekê azade û Elmanya û Brîtanya dahênan dihête guherîn bi guherîna wargehî” (Ehmed Seqer, 2001 : 208). Kewate karîgerîya wargehê siruştî û wargehê civakî ji layê azadî ve karîgerî dike ser dahênana nivîskaran di civakê da.

3. Hevdijîya Navbera Edebê Pêdivî û Edebî Ketwarî: “Firensîya nû pêdivî bi edebekê nîştimanî û civakî heye derbirîn bît ji çînên nû yên civakî û daxwazên takekesan. Belê “Madme Destaelê zîka hest bi ketwarekê nû kir li serdemê Napolyonî berzbûna takrewîyê û daxwazên kesokî” (Mecmu'el min el-Kuttab, 1997: 177). Kewate digel her gorankarîyekî divêt edebekê nû û nîştimanî û civakî ji dayik bibît. Çunkî nabît civak pêş bikevit û edeb her edebî kevin be ku li serdemê piştî şoreşa Firensî edebek pêdivî bû bihête nivîsîn. Belê serdemê Napolyonî ku ketwarekê di serhildaye edebekê di dixwazît bo vî ketwarî.

Dûvra jî van bocûnan geşekirin bi xwe ve dît li dev rexnegirên Firensî “Sainte Beuve û Adolph Taine”. Sainte Beuve Firensî (1804-1869) girîngî daye bi jîyana nivîskarê berhemê edebî, dibêje: “Edeb birîtiye ji lêgeryana mirovî di nav nivîskarî da” (Nebîl Raxib, 2003 : 322). Anko mirov dişêt kesatîya nivîskarî nas bike bi rêya xwandina berhemê wî. Sainte Beuve pitir girîngî bi jîyana nivîskarî û xêzan û barûdoxên jîyana wî dî dide û kesatîya nivîskarî û ew kawdan û rûdanên karîgerî li ser kesayetîya nivîskarî kirîn û di nav berhemî wî da rengvedane. “Kesayetîya nivîskarî û berhemê wî hevbend dikir wesa didît ku kesatîya nivîskarî kilîlekê dîyare bo têgheştina berhemî” (Kemal Me’ruf, 2012: 38). Eve jî bi ewê ramanî ku jîyana nivîskarî di nav têkistî da reng vedide zanîna jîyana nivîskarî rêxweşkere bo têgheştina berhemê edebî. Bi vê çendê jî Sainte Beuve sebarett dîvçûna jîyanama nivîskaran boçunên xwe yê derunî û civakî têkel kirîne. Herwisa Adolpîh Taine ê Firensî (1828-1893) girîngî daye bi her sê hokarên regez û jîngeh û serdemî û çawanîya kartêkirina evan hokaran li ser nivîskarî û rengvedana ewan di nav berhemê edebî da. Di pîşekîya pertûka xwe da “Mêjûyî Edebî Îngilîzî -1863” wesa dibînît sê hokar karîgerî li ser edebê dikin û di nav berhemê edebî da rengvedidin. Ew hokar evene:

1. Regez yan Nejad (Race): Mebest ji regezî komeka taybetmendîyane ku dibine eger her regezek ji regezekê dî cuda bît. Anko ew sîfatên bomaweyîne nivîskar ji gelê xwe werdigirit. “Mebest pê ew nivîskarên ser bi yek regez yan nejad yan ew nivîskarên li yek welat da ji dayik bûne. Di gelek hizir û hest û têgheştina xuya rewşenbîrî da wekî yekin” (Çarles Bireslêr, 2002: 67). Anko ew saluxetên hizirî û bomaweyî yê hevpişkin yê ku di nav bera takên civakî da hene ji regezekê dest nîşankirî anko karîgerîya navxuya derunê nivîskaran li ser berhemê edebî. “Û layenê fîzyolojî civakê bi xwe ve digirît ku kar dike ser hest û hişyarîya takekesî” (Karzan Kerîm, 2009: 24). Anko Taine wesa dibînît ku bi rêya dîvçûna kesayetîya nivîskarî û civakê nivîskarî ji layê kultûrî û rewşenbîrî ve di pitir şên têkistî wî nivîskarî bigehîn.

2. Jîngeh (Wargeh) (Environment-Milieu): Jîngeh duyem hokarê karîgere “mebest pê dewrûberê nivîskarîye karîgerên siruştî weku ew herêma tê da dijît û karîgerîn sîyasî û civakî li ser hizra nivîskarî û ev tewere karîgerîyê li ser nivîskarî dike ji layê ji derve (Mihemed Xenîmî, 1953: 58). Anko jîngeh “Birîtiye ji wî cihê

cografî ku nivîskar tê da jîyaye. Hev têkilîyeke di nav bera nivîskarî û xelkê û siruştî û keş û hewayê wê jîngehê rû dide û karîgerî li ser nivîskarî dike. Çunkî ne bi tenê her nivîskar, belkî çî mirov neşên dûr ji xelkê û civakê bi rengêkî dûrperêz jîyanê derbaz bikin” (Rêbîn Xelîl, 2009: 13). Anko bi dîtina Taine jîngehê kartêkirina li ser nivîskarî heye. Ji ber hindê pêdivîye vekoler agehdarê jîngeha nivîskarî bît li demê vekolîna berhemê edebî ta ku baştir di ewî berhemî bigehît. “Bi rêya dûvçûna kultûrê nivîskarî em dişên baştir dê wan hokarên kultûrî û rewşenbîrî bigehîn bi rengêkî haşa helnegir di têkistê nivîskarî ve dîyarin” (Çarles Bireslêr, 2002 : 67). Anko bi rêya vekolînê li ser cihê nivîskar têda jîyayî ew kultûrî di nav da jîyayî dişên pitir dê têkistê nivîskarî bigehîn û rengvedana wî di berhemê nivîskarî da dîyar bikin. Çunkî jîngehê karîgerî ser nivîskarî heye û di berhemê wî jî da reng vedide.

3. Serdem (Lomoent): Mebest bi serdemî jî ew kawdanên civakî û rewşenbîrîne ku di nav civakî da berbelav li wî serdemê nivîskar tê da dijît yan ew serdemê berhemê edebî tê da derkevîye. Komeka barûdoxê sîyasî û rewşenbîrî û hunerî û ayînî yên serdemekêne ewên kartêkirinê li têkistî dikin (Şewqî Zeyîf, 1992: 91). Çunkî her serdemekê taybetmendîyên xwe hene. Taine dibêje pêdivîye pêzaninan derbareyî wî serdemî peyda bikin yê têkist di nav da hatîye afirandin ji ber ku “ew pêzanîn bo me dîyar dikin li ewî serdemî çî bîr û bawer di zal bûn û xelkê çî û çawa hizir dikir û ji çî dinalîn, eve di harîkarin ji bo baştir têgehiştina têkistî û aşkerakirin û vedîtina ramanên veşartî. Eve hindê digehînît ku çî têkist di valahîyê da nahêne nivîsîn, belkî her têkistek berhemê mêjûyekê ye” (Întîsar Necîp, 2016: 81). Anko ew serdemê berhem tê da dihête nivîsîn karîgerî li ser nivîskar dike û ev karîgerîye di nav berhemê wî da rengvedidin. Û dîsan têkist di serdemên cuda da kartêkirinê li wergirî dike. Nivîskar ji encamê karîgerîya sê teweran vî berhemî davirînit. Ew jî riviştê yan nejad nivîskar jê peyda bûye, ew jîngeha di nav da dijît û ew serdemê di nav da jîyayî. Bi vî rengî Taine di vekolîna nivîskar û têkistê edebî da pişt bi van sê hokaran dibestît bo têgehiştina berhemê nivîskarî. Anko Taine vekolîna edebî dikir ji pêxemet dîyarkirina karîgerîya van her sê teweran jîngeh, regez û serdem li ser berhemê edebî vedîtina delaletên civakî.

Belê Sainte ji pêxemet vedîtina karîgerîya delaleta nivîskarî li ser berhemî layenekê dî ku rêxweşker bû serhildana rexna civakî ku yek ji binemayên hizrên vê

rexnê dihête qelemdan ew jî boçunên feylesofê Elmanî Hegel (1770-1830) ku berexwedaneka dîyalêktîkî li ser cihanê hebû di wê bawerê da bû “cîhan ji layê geşekirinê ve gehîştîye qonaxa kamilbûnê... cîhan her dem di gorankarî û pêşkevîtinê daye û binemayê û palderê hemî geşesendinekê hevdişî û nesazî û lêk neçûne. Goranên çendî dibîne egerê guherînên çûnyetî, girêdana peywendîya navbera janrên edebî bi wan civakan ve ku tê da ji dayîk bûne” (Elî Cewad, 1979: 44). Herwisa Hegel “derkevîna romanê bi gorankarîyên civakê ve girêdaye û veguhastina ji dastan bo romanê ji encamê derkevîna çîna borjuwazî bû” (Abdulhadî Ehmed, 2009: 13). Herwisa bi dîtina Hegelî gîyan serçavê serekê gorankarîyane. Çunkî peywendî bi hizrê ve heye hizir rolê serekî di hevrikîyan da dibînit... naveroka têkistê edebî bi taybetî layenê îdeolojî pêkhateya serekî ye, têkistê edebî derbirîne ji hizrê formê edebî tenê di çarçovê hizrê da hebûna xwe peyda dike. Anko bi dîtina wî layenê serekî di berhemê edebî da hizre. Ê hizr serçavê gorankarîyane anko dîyalêktîkî li dev Hegelî îdeolojî bû.

Van bîrûboçunên Hegel derbareyî jîyan, civakî û gorankarîyan kargerî li ser Marks (1818-1883) jî hebû. Marksî şîya van bîrûboçunên Hegel pêşve bibet û rehendekê mêtodî û kurahîyeka hizrî bi rexna civakî bibexşît. “Di bineret da markîsîzm têoriyeke derbare aborî û sîyasî ku Karl Marks di naverasta sedê nozdê da bi hevkarî digel Firederîk Engilîs (Friedrich Engels) (1820-1895) deynayê ” (Besam Qutus, 2011: 79) ku kakila vê felsefê ewe ‘Madme Material’ serokanîya hemî tiştêkê ye di siruştî da. Made bi naxê wan gorankarîyane ku dewrûberî da peyda dibîn made serçavê gorankarîyane. Anko dîyalêktîkî li dev Marksî matiryalî bû. Di felsefa dîyalêktîyî materyalîstî ya Marks da, her civakekî du binyat hene. Ew jî jêrxan û serxan. “Jîyana civakî li ser dû binemayan radiwestît jêrxan ku birîtîye ji berhemê madî ku daynemoyê jîyanê û gorankarîyane. Serxan ku dibe sîstemê sîyasî û damezrawên hizrî û rewşenbîrî ku bi rengekê yê yekê dahênerê duwê ye. Her gorankarîyek lê peyda bibe li yê duwê da rengvedidet... kar û berhemê edebî diçine xana serxanê da” (Heyder Hacî, 2005 :32). Anko jêrxan layenê aborî bi xwe ve digirît û serxan layenê hizrî û edebî bi xwe ve digire. Her guherîneka di layenê aborî da dibe egerê guherîna di layenê hizrî û edebî da. Anko bi dîtina Marksî peywendî di navbera jêrxana civakî û serxana civakî ji layê berhemê edebî û rewşenbîrî ve, peywendîyeka karlêkere û her ji ber hindê jî bi peywendîyeka dîyalêktîkî danît”

(Aware Kemal, 2012: 59). Anko “huner bi dîtina Marksîyetê beşeke ji serxana civakî... û huner jî beşeke ji îdolojîya civakî” (Têrî Egilton, 2008: 26) ku edeb jî beşeke ji hunere. Nivîskar bi rêya berhemê xwe derbirîne ji îdolojîya civaka xwe dike ku bi dîtina Marksî “huner beşeke ji serxan civakî, beşeke nahête cudakirin ji îdolojîya civakî” (Nebîl Raxib, 2003: 561). Anko têkistê edebî derbirîne ji îdolojîya civakê dike. Herwisa Marks dibêje ne merce layenê îdolojî serxana civakî û layenê aborî jêrxana civakî rengvedaneka rastewxwe bît. Marksî navek bo danaye ew jî “dîtina çerxên demdirêj” û ev dîtine ewê çendê digehînit ku peywendî di nav bera binyatên civakî ji layekê ve û binyatên rewşenbîrî û dahênanê ji layekê di ve, ne ku peywendîyeka yeksere û bi leze, lê encamên ewê bi hêdî dîyar dibin” (Salah Fazil, 2005 : 33). Anko karîgerîya jêrxanê layenê aborî li ser serxanê ku layenê îdolojî edebî bi xwe ve digirît ne rengvedaneka rastewxweye belê encamên wê hêdî dîyar dibin. Herwisa Marks dibêje “huner amrazêke ku mirov dişê civakê xwe pê hişyar biket, xudîkeke ku civak tê da sehdiye bizavên xwe ku bi rêya hunerê hizrên nû peyda dibin” (Yehman Mihemed, 2017: 97). Markîzmê du xal li ber çav wergirtin: Ew jî siruştê edebî û armanca edebî. “Belê sebarete siruştê edebî Marksîyan wesa didît ku rengvedana ketwarî ye... belê armanca edebî li dev wan girêdayî bû bi helwestê nivîskarî ji wê hevdiyîya di nav bera çin civakî da (Îbrahîm Mehmud, 2003: 68). Anko pêdivîye edeb rengvedana civakî bike û armanca edebî jî şikandina sermayedarî li ser destê çîna kirêyaran bît û damezrandina civakekî sosyalîstî vala ji çewsandinê. Anko daxwaza pêgîrbûnê ji nivîskarî dike helwestê wî sebarete kêşên civakî.

Herwisa mebesta Marksî bi dîyalêktîya mêjûyî ew bû veguhastina civakê mirovayetî ji civakê seretayî bo bendayetî û pişra jî bo derebegayetî, dûvra jî bo sermayedarî û dumahîkê jî bo civakekî sosyalîstî. Herwisa Borîs Borsov sebarete rolê Marksîyetê dibêje “mezintirîn destkeftên Marksîzmê yekxistina sosyolojîya û zanistê mêjûyê bû” (Karzan Kerîm, 2009: 27) ku binaxên rexna civakî tene hijmartin. Besam Qutus dibêje: “Bawerîya me wesaye ku ne bi sanahî ye mêtoda civakî vezivirînin bo pertûkekê yan du pertûkan, belkî em wesa dibînin berhemê pêşveçûnêka mêjûyî û sîyasî û civakî û şoreşgêrîya wê ye” (Bisam Qutus, 2011: 78) ku vê mêtodê bi xwe ve dîtîye. Bi vê çendê jî em dikarin bêjin rexna civakî qonax bo qonaxê werar kirîye. Nivîskarên navbirî bûne hêvinê hizra vê mêtoda rexneyî û bûne

rêxweşker bo serhildan û peydabûna rexna civakî û dûvra jî bîrûboçunên “Corch Lukaş, Lusyan Goldman, Dîskarib û Mîxayîl Baxtîn û Bîr Zima” ku bi pêşengên rexna civakî têne hijmartin rolekê girîng gêraye di pêşvebirina rexna civakî da û peydabûna çend arastan di nav rexna civakî da.

1.5. Arastên Rexna Civakî

Rexna civakî di nav xwe da çend çeq û araste (şax) jê peydabûne, her arastekê jî taybetmendî, rexnegir û pêşengên xwe hene ku ji encamê berev pêşcûna vê rexne peydabûne. Anko “ev metoda rexneyî bi çend qonaxekan da derbazbûye û li her qonaxekê jî da arasteyekê diyarkirî bi xwe ve dîtîye” (Fuad Reşîd, 2005:166). Her yek ji wan jî riwangeh û boçûn û felsefa taybet bi xwe ve peywendîya navbera edeb û civakê şîrovekirîye ku van arastayên jêr bi xwe ve digire.

1.5.1. Arastê Dîyalêktî

Gelek caran ev arasteye bi rexna Marksî jî tê navbirin. Despêka serhildana vî arasteyî di nav rexna civakî da bo hizrûbîrên feylesofê Elmanî Hegel (1770 -1830) dizivirin. Çunkî “têrwanîneka dîyalêktî li ser cîhanê hebû di wê bawerê da bû ku guherînên çendî dibine egerê guherînên çunyefî, serhildana janrên edebî girê dide bi wan civakan ve ku tê da ji dayîk bûne” (Aware Kemal, 2012: 34). Dûra jî bo hizrên Karl Marksî (1820 -1895) dizvire ku binyatê civakî di Marksîye da ji bû du binyatan pêk tê jîrxan û serxan. “Jîrxan ku layenê aborî bi xwe ve digire ...serxan jî layenê huner, zansit û edebî” (Seyîd al-Bahrawî, 1992: 22) bi xwe ve digre ku bi dîtina Marksî her gorankariyek di jîrxan da peyda bibe li serxan rengvedide ku bi peywendîyeka dîyalêktî tê navbirin. Belê ne merce ev rengvedane rastewxwe be ku Marksî bi serdemî dem dirêj navkirîye ku bi dîtina Marksî edeb derbirîne ji aydolojîya çîna nivîskarî dike.

Di nav rexnegirên Marksî da du araste hebûn yê yekê ku bawerî bi rengvedaneka rastewxwe hebû di navbera jîrxan û serxan da weku “Bier Yegirsêf” ku dibêje: “Her têkistekê hunerî bi şewekê rast û dirust derbirîne ji jîrxan aborîya civakî dike” (Karzan Kerîm, 2009: 30). Yê duwê bawerî bi renvedaneka rastewxwe nebû weku Corc Lukaşê Hengarî (1885 - 1971) “Lukaş wesa dibêje ku civak

rastewxwe di edebî da rengvenade belê layenê rengvedanê bende bi helwestê nivîskarî sebarete geşesendina civakê” (Hejar Silêman, 2015: 29).

Corc Lukaş bi pêşengên vî arasteyê tê nasîn ku mezintirîn feylesofê waqîyetê yan ketwarêye ji nîva duyê ji sedê bîstê tê hijmartin. Herwisa Lukaşî amaje daye sosyolojîya janrên edebî ku serhildana wan bi berev pêşçûna jîyana civakî û rûşenbiriya civakan ve girêdide ku dibêje: “Serdemê Yunaniyan bûye egerê serhildana dastanê û serdemê borjuwazîye bûye eger serhildana romanê ku ev janre ji sedemê hevdişîya borjuwazîya digel derbegayetîyê” (Abdulvehab Şe’lan, 2008: 47) serhildaye. Her çende berî Lukaşî, Hegel jî amaje daye wê çendê ku “roman dastaneka borjuwazîye” (Abdulvehab Şe’lan, 2008: 45). Kewate pêşengên vî arasteyî girîngî daye bi girîdana naveroka karên edebî bi hişyarî û îdolojîya çînên civakî ve, li ser binemayê ku peywendîyeka dîyalêktî û rengvedanê di navbera karê edebî û ketwarê civakî û siyasî û aborî da heye bi piştbestin ser hizra Marksî bi taybetî jî jîrxan û serxan. Curc Lukaş” vekolîn kirîye li ser peywendîya navbera edebî û civakî weku rengvedan û nîneratîya jîyanê ... ku di vê vekolînê da siruşt û peydabûna romanê girîdaye bi sermayedarîya cîhanê û serhildana borjuwazîya Ewropî ve (Abdullah û Turc Sehrabî, 2017: 35). Lukaş amajedaye cîhanbînîyê girîngîya vî têgehî di wê çendê daye “weku zaravek cîyawaze ji zaravê îdolojîya ku ramana hizran bi rastewxuyî nade belku di nav xwe da hest û sozan jî bi xweve digire” (Seyîd al-Bahrawî, 1992:24). Herwisa peywendîya rastewxwe ya navbera jîrxan û serxan reddike. “Li wênê ketwarî di nav edebî da nagerît ... belê li hizrkirina nivîskarî bo ketwarî digerît bi rêya cîhanbînîya wî, her çende rehûrîşalên ketwarî bo cîhanbînîya wî hene. Belê her dimîne cîhanbînîyeka taybet bi nivîskarî, heger xwe derbirîne ji çînekê yan grupekê bike û şîwarên wê di nav mêjuyê da” (Seyîd al-Bahrawî, 1992: 27). Kewate Lukaş pitir cîhanbînîyê bo nivîskarî bixwe zivirînit her çende amajê dide rolê çîna nivîskar ku navda jîyayî. Lukaşî girîngî daye dû têgehên serekî:

A- Rengvedan: Lukaş li dîv hizra Marksî çûye bo girêdana hişyarîyê bi binyatê aborîye destnîşan kirîve. Di pertûkên xwe da amaje daye peywendîya dîyalêktî di navbera delaletên berhemên mezin û delalatên binyatên wan yên civakî. Wesa bînit edeb dîyardeka mêjûyîye xwe di nav xebata çînên civakî da dibîne (Sare

Qucîl, 2016 : 24). Her çende bawerî bi rengvedaneka rastewxwe di navbera jîrxan û serxan da nebû.

B- Realîzm: Pertûkên wî sebare (derbare) realîzmê bi baştirîn pertûk têne hijmartin li vê mijarê, realîzm li dev wî hestkirine bi ketwarê civakî û çawanîya derbazbûnê ji wî ketwarî” (Sare Qucîl, 2016: 24).

Herwisa Lukaşî pitir karên wî sebare romana sedê nozdê bûn bi taybetî ew berhemên ser bi rêbaza realîzmê ve “ edebî bi rengvedana barûdox û rastîya civakî û aborî danît, belê ew wê boçunê jî red dike ku dibeje peywendîyeka rastewxe di navbera edebî û layenê civakî û aborî da” (Bextyar Secadî, 2000 : 89) heye. Herwisa bi dîtina Lukaşî ji ber ku edebîyat pîşanderê ketwarê civakî û mêjûye ye “her ji ber vê çendê jî berhemê romannivîs weku Sêr Waltêr Sîkan û Belzakî bi nimûneyê here başê roman danît” (Bextîyar Secadî, 2000: 51). Ji ber ku Belzakî di berhemên xwe da “rengvedana hevdijîyên ketwarî bi rastî û emanet kirine, xwe heger hevdijbin digel hizr û bîrên wî yê takekesî jî” (Mecmu'el Min al- Kuttab, 1984 : 161) herwisa Lukaşî di pertûka xwe da ya binavê “Teorîya Roman”ê li sala 1920da li Berlînê belavkirîye ku vê pertûkê da geşekirina edebî bi geşekirina civakî ve girîdaye. Wate her renekê edebî bi qonaxekê ji qonaxên mêjûya civakî ve girîdaye... cextîye li ser hevrikîya navbera rewîştê takekesî û rewîştên dezgehên civakî kirîye” (Rêbîn Xelîl, 2011: 66). Herwisa navbirî di pertûka “Kêşên Realîzmê” da dibeje “ew edebê lasayî kirina ketwarî dike û wêne dike eger hatû dîtinek yan berewxedanek bo guherîna wî ketwarî tê da nebît ev edebe nerealîstîye, heta eger palpiştîye li wî ketwarî jî bike, ji ber hindê realîstî di edebî da bo peywendîya navbera edebî û ketwarê wêne dike nazvirîteve. Belku bo wê berêxwedan û dîtina mêjûyî ku paşerojê jî bi xwe vedigirît ku berhemî di nav xwe da hembêzkirîye” (Rêbîn Xelîl 2009: 18). Herwisa navbirî di pertûka “Romana Mêjûyî” da têrwanîna mêjûyî û civakî têkelî êkirîne. Lukaş wesa dibêje “ku têgehiştin rewîştên kesayetên romana mêjûyî da derdikevin karekê girane, eger hatû tenê me zanyarî ser nivîskarî hebîn, belê divêt me zanyarî ser rewîştê civakê jî hebîn, eve jî pêwîstî bi lêkolîna wî demê mêjûyî heye ku wêne dike” (Rêbîn Xelîl, 2011: 67). Kewate ji bo şirovekirina berhemekê edebî navbirî wesa bînit ku ji bilî komkirina zanyarîyan li ser jîyana nivîskarê romanê pêdivîye em

zanyarîyan li ser civakê nivîskarî û zanyarîyan li ser wan rûdanên mêjûyî ku di nav berhemî da amaje pê hatîye da kom bikin.

Herwisa Lukaş di pertûka xwe da ya bi navê “Vekolîn Realîzma Ewropî” rexnê li rêbaza naturalîzmê digire bi taybetî berhemên Emîl Zola. “ Ji ber ku mirovî weku gîyandarekê organî yan baylojî ji gorankarîyên mêjûyî û jîyana civakî û rewîştî cuda dike” (Rêbîn Xelîl, 2009: 18).

Herwisa rexnegir wesa didine xuyakirin ku gorankarî ser hizra Lukaş da hatîye. Despêkê li jêr karîgerîya Kant da bû. Dûra jî Hegel li dumahîkê bi Marksîyetê karîger bûye. Ev çende jî di nav pertûkê wî da xuya dibe. Serencam em şên bêjîn ‘şoreşa ketwarî û civaknasî di edebî da dizvire bo berhemên Lukaşî, lê zanîn û şarezayîya Lukaşî dê wê çendê da ye ku civaknasîya edebî digel civaknasîya klasîkî hevbend dike. Li ser dîyalêkteka Kant û Hegel û Marksî dadrêjît” (Komeka Nivîsêran, 2006: 321). Lukaş ew têksîtê edebî kutinê rengvedana arîşên ketwarî dike pesend nake. Eger digel da jî çareserî jî ne êxîste berçav. Navbirî layengirê realîzmê ye belê wê realîzmê pesend nake ku nivîskar tenê arîşên civakê bêxîte berçav û xwandevanî û xelkê lê agehdar bike belê digel hindê daye digel vê çendê jî çareserîyeka dest nîşankirî jî bêxîte berçavê xwandevanî, bi vê çendê jî daku edeb bişêt karî di guhertîna civakî da bike.

1.5.2. Arastê Binyatgerîya Pêkhateyî

Lusyan Goldman (1913 -1870) bi damezrênerê vî arasteyî tê danan, belê pêdivîye amajê bidine role “komelek bîrmend û rexnegirên Marksî vîyayine lêk nizîkîyekê di nav bera binyatgerîyê bi rengê formalsitî li gel binemayên hizra dîyalêktîya Marksî da dirust bikin, ew divê bowarî da kar kirîne ji wan jî “Curc Lukaş” û “Bîr Bordîo”... herwisa “Can Bayace” karîgerî li ser Goldmanî hebûye bi taybetî di dîyarkirina zaravê binyatgerîya pêkhateyî da” (Elî Tahir, 2007: 95). Her çende pitir Goldman ketîye jêr karîgerîya Corc Lukaşî belê Goldmanî hewil daye têkelîyekê di nav bera binyatgerîya zimanvanî û hizra Marksî da bike, bi rêya têkelkirina binyata têksitî digel binyatê civakî. Mebest ji binyad “binyad zeynî yan hizrî ye di têksitê edebî da” (Aware Kemal, 2012: 63). Herwisa mebest ji pêkhateyî wate ew yeka hunerîye ku naveroka têkistî bi rêvedibet” (Aware Kemal, 2012 : 63).

Herwisa bi rengê cuda serederî digel teorîya rengvedanê kirîye peywendîya navbera edebî û civakî şîrovekirîye wesa dibine ku “ew ketwarê çîneyetî ku nivîskarî tê da dijît di binyatê hizra nivîskarî da rengvedidet, di mîyanê berhemînana têkistekê edebî û hunerî, ew nivîskar cîhanbînîya wê koma civakî dêxîte berçav ku ew bi xwe nav da dijît” (Aware Kemal, 2012 : 63). Kewate nivîskar bi têrwanîna wî derbirînê ji wê çîne dike yaku ew bi xwe endameke ligel dijît. Herwisa bi wî rengî berixwe dide berhemê edebî ku berhemê çîneka civakî ye. Eve jî ne bi wê ramanê ku komeka mirovan pêkve berhemekê binivîsin. Belê “mebesta wî ewe takê nivîskar yan hunermend, dirastî da toxim yan kerestê berhemê xwe ji serdemê xwe werdigirt ... rol û karkirina takî di wê çendê daye ku van toxim yan kerestên materyalî sazgar û tukmeyî ye pê dibexşît” (Komeka Nivîskar, 2006 : 315). Ev çendê jî rexnegir bi nivî mirina nivîskarî didine nasîn ku pitir di afirandina berhemî da rolî bo civakê nivîskarî dizvirînit. Çunkî Goldman wesa dibêje ku “her reftareka mirovî xudan binyatekê wata dare û nazvirîteve bo takekesî belê zivirîteve bo wî komê yan texê” (Mecmu’el min al- Kuttab, 1984 : 51) yaku nivîskar navda dijît. Ji ber hindê jî Goldmanî girîngî bi vekolîna karê edebî didet, ew binyatê hizrî di berhemî da hatiye rengvedan ku derbirînê ji wê çîna civakî dike ku nivîskar navda dijît. Herwisa Goldman di hinek layenan da binyatgerîya pêkhatayî digel şîrovekirina derunî hevpişke weku her reftareka mirovî beşeke ji binyatekê ramandar. Pêdivîye têgehistin li vê reftarê têkel kirina wî ye gel wî binyatî. Em neşîn vê binyatê bigehîn îla bi rêya pêkhata wê ya takekesî û mêjûyî. Goldmanî hewildaye “navbera hizra Marksî û binyadgerî da metoda xwe avabike. Ji layekê Marksîyet girîngê bi hokarên civakî û aborî didet wek kargerîyek bo berhemên edebî, ji laye kê dî ve binyadgerî tenê girîngê bi binyatê têksitî didet” (Derya Cemal, 2013: 8). Kewate mifa ji hizrîn Marksî û binyatgerî wergirtîye û binyatgerîya pêkhatayî avakirîye. Arastên binyatgerîya pêkhatayî pişt bi komeka têgehan bestîye bo şîrovekirina berhemên edebî:

1- Cîhanbînî

Têgehê cîhanbînîyê yan dîtina cîhanê li dev Goldman bi tewerekê serekî tê hijmartin bo şîrovekirina berhemê edebî ji riwangeha civakî ve. Dîtina cîhanê li dev wî birîtîye “ji serkoma wan hizr û hevîyu û hest daxwazîyane ku endamên komeka civakî pêkve kom dike. “Grupek ku pitir weku çîneka civakî tê hijmartin” ewan

beramber û dijî komeka civakî ya dîtir da didanît” (Racêr Wêbistir, 2006 : 128) yan jî birîtîye ji “curekê destnîşankirîyê hizrkirinê ku di kawdanên taybet da xwe bi ser desteyeka xelkê da sepînt ku di baredoxekê aborî û civakî hevbeş da dijîn”(Resul Heme, 2013 : 30). Kewate Goldman cîhanbînîyê zivrînîte bo deste û çîneka civakî ku nivîskar bi xwe navda dijît. Ji ber ku “cîhanbînî bi rêya wê fêrkirin û perwerdekirin û ruşnibîrkirina takekes tê da jît dihîte avakirin” (Derya Cemal, 2008: 12). Eve jî bi wê ramanê ku nivîskar wê cîhanbînîya di nav civaka xwe da vediguhêze nav berhemê xwe. “Feylesof û nivîskar hest bi vê cîhanbînê û têrwanînê dikin yan hest pêdikin... Li ser astê hizr yan hest bi rêya zimanê derbirînê jêdikin” (Komek Nivîskar, 2008:178). Bêguman ew dewrûberê nivîskar tê da dijît kar li hizra wî dikin ev kartêkirine jî bi gelek rengaye dişêt bi rengê xwe guncandinê bit, dişêt bi rengê karvedaneka bi hêma û yaxîbûn werbigirt yan dişêt têkelîyek bît ji wan bîrûboçûnên ku jîngeha dewrûberê wî berbelav. Ji ber vê çendê jî Goldman pitir rolê çînen civakî berçav wergirît di avakirina cîhanbînîyê ya di nav berhemê edebî da û bo çîneka civakî dizivirît. Goldman ev têgehe li rexna edebî da bikarîname daku destnîşana cîhanbînîya wê grupê yan çîne ya civakî bike ku nivîskar di nav da dijî. Kewate ‘roman derbirîne ji cîhanbînîyê û têrwanîneke di nav grupekê yan çîneka destnîşankirî di peywendîya wan gel ketwarî û hevdişîya wan gel komên dî tir da” (Hamîd al-Hamedanî, 1990: 66). Kewate roman jî derbirînê ji cîhanbînîya wê çîne dike yaku roman nav da hatîye afrandin.

2- Hişyarîya Belav (Ketwarî) û Hişyarîya Çalak (Dişîyan) Da

Goldman bi vî şêweyî hişyarîyê pênasedike. ‘Dîyardeke dest nîşankirina hemî reftarên mirovayetîyê ye li dûv dabeşkirina karî da tê’ (‘Usman Yasîn, 1998: 24). Belê pênasîya hişyarîya belav: ‘Hişyarîyeka ketwarê jîyana rojane ya grup û çînen civakî ne, bi ramaneka dîtir ew hişyarîya baroduxê jîyana xelkê ya rojane derdêxît. Li dûmahîkê ev hişyarîye dibe hişyarîyeka belav yê wan çîn û grupên civakî ku li nav civakî da”(Heval Selîm, 2006 : 99).Kewate hişyarîya belav ‘girêdayî wan arîşa û kêşane ku çîn û komên civakî nav da dijîn.Bi rêya peywendîya wan ligel çînen dîtir da”(Cabir Usfur, 1981 : 85). Ew hişyarîya di nav ketwarî da belav ku komeka hizrane ku li dev grupekê sebarek jîyan û çalakên wan yê civakî û peywendîya wan gel grupên dîtir da. Belê hişyarîya çalak di nav hinavên hişyarîya

belav da serhildide “girêdaye bi wan çareserîn bineretî ku çîn pîşkêş diken bo çareserkirina arîşên xwe” (Cabir Usfur, 1981: 85) dibe egerê gorankariyan di nav civakî da ji ber ku piraniya caran “ne li dev kesên asayî ye di nav komê da, belê tenê li dev kesên xudan revşanbirîyeka berfirehin weku feylesof, nivîskar û siyasîyan” (Hamîd al-Hamdanî, 1990: 69). Girîngiya vê hişyarî dê wî çendê daye ku “sererayî hişyarîya ketwarîya grupekê ye, hişyarîya nivîskar û hunermendî û dahêner êxistîye ser” (‘Usman Yasîn, 1998: 24). Kewate ew hişyarî ye têksitê edebî da derdikevît demê nivîskar di nav berhemê xwe da derbirînê ji kawdanên grupa xwe dike. Ji ber vê çendê jî Goldman edeb û hunerê romanê bi şewekê taybet bi hişyarîya çalak grupekê ve girê dide. Kewate nivîskar bi rêya romanê derbirînê ji hişyarîya çalaka çîneka civakî dike di nav berhemê xwe da. Anko hişyarîya belav ew hişyarîye ya di nav civakî da berbelav belê hişyarîya çalak ew hişyarîye ya nivîskar di nav berhemê xwe da amajê pêdike bo çareserkirina wan arîşên di nav civakî da berbelav.

Belê Goldman vê hişyarîyê dizvirînit bo wê çîna nivîskar di nav da dijî. Bi vê çendê jî diyardibe cîhanbînî “di bineret da hişyarîya komêye ewa nivîskar berçav dike û veguhêzît ji hişyarîya belav li dev komê bo hişyarîya çalak di nav berhemê nivîskarî da” (Seyîd al-Bahrawî, 1992 : 28). Anko hişyarîya belav yan ketwarî pitir girîdayî ketwarê civakêye ku nivîskar nav da dijît girêdayî demê borî û nuke yê civakê tê da jîyaye. Belê hişyarîya çalak girêdayî paşerojî ewe ya nivîskar bo guherîna civakî di nav berhemî da amajê pê dike” ji riwangeha Marksî da bi wî hişyarîya derewîn û hişyarîya rastîn navdêrkirîne” (Komeka Nivîskar, 2006 : 316) ku hişyarîya derewîn mebest pê hişyarîya ketwarîye di berhemê nizim da berçav dibe. Belê hişyarîya rastîn mebest pê hişyarîya çalake di berhemên mezin da berçav dibe.

3-Têgehiştin û Şîrovekirin

Di metoda binyatgerîya pêkhatayî da Goldman dibeje pêdivîye pabendê dû astê vekolîn û tuwêjînê bîn ew jî têgehiştin û şîrovekirine.

Têgehiştin: Birîtîye ji “dîyarkirina binyatekê delalî xudan raman di karê edebî da... belê şîrovekirin birîtîye ji danana binyatê delalî di nav binyatekê berfireh da... Anko têgehiştin hemî dema nav têksitî vekolîn ser tê kirin û tê encamdan. Belê

şîrovekirin ji derveyî têksitî tê encam dan ... pêdivîye bizanîn her tiştêk dîyar dibe li ser astê peywendîya têksitî bi rastîyên derveyî wî ve vêca çi ev rastîye girêdayî bît bi komeka civakî yan girîdayî bît bi saykolijîya nivîskarî” (Lusyan Goldman, 1981: 105). Kewate pêdivî ye rexnegir di qonaxa têgehiştinê da “pêkhatekê xudan raman ... bişêt ta radekê mezin hemî têksitî ravebike. Bi rengekê hemî deqî berçav bigirit û toxmekê derekî lê zêdeneket” (Komeka Nivîskaran, 2006: 328) û helibijêrît. Dîv da jî di qonaxa şîrovekirinê da peywendîya wî pêkhateyî xudan raman digel çîneka civakî girê bide. Kewate li qonaxa têgehiştinê li dîv binyadê delalî digêrît ji nav têksitî dernakeve.

Şîrovekirin: Belê di qonaxa şîrovekirin da “rexnegir radibe bi şîrovekirina wan regezên derveyî têksitî ku peywendîyeka dîyalêktîyane digel regezên binyadên delalî di nav têksitî da ewên hene (Heval Selîm, 2003: 99). Di mîyanê têgehiştin û şîrovekirinê da cîhanbînîya wê koma civakî dîyardibe ku avakerên têksitî ne. Bi vê çendê jî têgehiştin û şîrovekirin temamerên êkin bo têgehiştin û şîrovekirina berhemî edebî. Bi vê çend em dişên bêjîn Goldman bawerî bi avakerê ku yê berhem heye. Berhemê afirandî bo pêkhata mêşki yan hizrî yan çînen civakî dizivirînit ya ku nivîskar di nav da dijît.

Herwisa Goldman di pertûka xwe da ya binavê “Pêxemet Zansitê Civakî Roman” romanên Endireh Malero û Alan Robe Xerîbeh şîrovekirine piştbestin li ser hinek binemayan kirîye bo şîrovekirina van berheman wesa dibêje “binyatî romana nû pêkhatekê danûstandinêye digel binyatê lêkguherînê di sîstemê sermayedarî da. Û li ser vî binemayî Goldmanî berxudaye romanê weku têkreseka ciwanî nahête cudakirin ji sosyolojîya giştî ... wek qahremanê arîşedar ewe ku weku mirovê tak di civakê sermayedarî da... Û têgehê bihayî û pêlên hişyarîyên cîyawaz weku hişyarîya îdolojî bo hişyarîya çalak û cîhanbînîyê” (Abdulvehab Şe’lan, 2008: 73). Kewate Goldman romana nû digel civakê sermayedarî hevbend kirîye. Qeremanê vê romanê jî derbirînê ji mirovê serdemê sermayedarî dike. Herwisa Goldmanî di pertûka xwe da ya bi navê “Xwedayê Berze” demê cîhanbînîya tirajedî def Rasîn û Baskal” (Abdulvehab Şe’lan, 2008: 67) di nav berhemî wan dîyar dike ji girîngtirîn karên wî yê rexneyî ye bo piraktîkirina têgehê cîhanbînîyê di berhemê Rasîn û Baskal da. Bi kurtî em dişên bîrûboçunên Goldman di çend xalan da kurt bikin:

1- Goldman wesa dibêje ku “berhemê edebî derbirînê ji takî nake, belê derbirîne ji hişyarîya çîn û desteyên nav civakî, wate raste nivîskar takekeseke, belê di nav wijdana civakê xwe da dijî” (Salah Fazil, 2005 : 41). Wate demê nivîskar berhemê xwe dinivîsit neşet ji derveyî xêzan û civaka xwe hizr bike. Pêdivîye hişyarîya civakî di nav têksitê wî da bê bercestekirin taku xwandevan li demê xwandina wî berhemî weku takekê civakî xwe di nav berhemî da bibîne.

2- Berhemên edebî “têne cudakirin bi binyatê delalîyê giştî ev binyad delalî ji berhemekî bo berhemekî din jêk cudane ... demê em ji xwandina berhemî bi dumahîk dihên hizrek li ser binyatî delalîyê giştî berhemî peyda dibit. Ev hizre jî beramberî wê hizrêye ku li dev nivîskarî û civakî heye” (Salah Fazil, 2005: 40). Kewate demê em berhemekê dixwenîn hizreka giştî û desnîşankirî sebareî wî berhemî li dev me peyda dibe ev hizre jî bi dîtina Goldmanî dizivirte bo nivîskarî û civakî.

3- Herwisa “xala peywendîkirinê di navbera binyatê delalî û hişyarîya komê yan çînê, ji girîngitirîn têgehane li dev Goldmanî ku navlêkirîye cîhanbînî. Her karekê edebî cîhanbînekê di nav xwe da hembêz dike ... û bi rêya cîhanbînê em dişên bibînîn bi şîwekê ron û aşkara çawanîya peywendîya avakirîya navbera karê edebî ji layekê ve û ketwarê civakî derekî ji layekî dîtirve” (Salah Fazil, 2005 : 41). Kewate bi têrwanîna Goldmanî cîhanbînî bo civakî vedigerît kewate dahênan takekesî dahênaneka civakîye. Berhemê edebî bi civakî ve girdaye bi rêya cîhanbînî ye.

4- Herwisa “peywendîya cewherî di navbera jîyana civakî û dahênanana edebî girêdayî naveroka her dû tewera nîne, belku girêdayî binyatê cesteyîye, lewma ev dîyarde ne ditakekesî ne, belku girêdayî civakî ne, li vêrê amajeka dîyalektîye di navbera civakî û berhemê edebî da” (Zozan Sadiq, 2015: 95) heye. Kewate Goldman birêya dîyarkirina binyatî delalî di nav têkistî da û girêdana wî bi binyatê mêşkî yan hizrî di nav civakî da. Goldman bi rêya têgehê cîhanbînî edeb û civakî bi hev re hevbendike.

5- Goldman didete xuyakirin “peywendîya serekî di navbera dahênanana edebî û jîyana civakî li ser binyadî zeynî yan mêşkîye. Binyadên zeynî dîyardên civakî ne, ne takekesîne, ji berku serbora takekesî kurt û sînordare neşet binyadekê zeynîyê

xelkî dirust bike” (Ehmed Mehmud, 2016: 53) ji ber ku Goldmanî jî bawerî bi wê çendê hebû ku “her sosyolojîyeka hizran bawerî bi karîgerîya jîyana civakî li ser dahênana edebî” (Mecmu'e min al- Kuttab, 1984: 13) heye ku her hizreka def mirovî peydabît bo civakî zivirînit. Ji berî hindê jî Goldman cîhanbînî bo takê ku yan komê dizivirînit. Herwisa ev çende jî dî jêr karîgerîya Marksî jî da. Her divê mijarê da civaknas Durkhayim di wê bawerê daye ku, hizr bi tenê berhemê çalakîya mêşkê mirov nîne, belê encamê ew jîngeha civakî ye ku mirov beşeke tê da” (Azad 'Ebdulwahid, 2005: 83). Eve jî wê çendê dupadike ku mirov kur jîngeha dewrûberê xwe ye, bêguman kêm yan zêde ew dewrûberên nivîskar nav da dijît karîgerîyê lê dike û di nav berhemê wî da rengvede.

1.5.3. Arastê Sosyolojîya Edebî

Arastekê dîtirê rexna civakîye hewil dide ji riwangehê aborî ve li hokarên çendatîyê û çawanîya çap û belavkirina kitêban vêkolîn. Herwisa ev arasteye bi zansîtê civakî dîyardên edebî jî tê navkirin ku “arastekê ezmûngerî ‘embirîqîye yan taqîgehîye, mifa ji teknîkên şîrovekirinê werdigirît ku programên zansîtê civakî da bi karhatîne weku amar datayan û şîrovekirina zanyarîyan, ravekirina dîyardan pişt bestin bi binemayên çend zanyarîyên destnîşankirî, paşî bi rêya ravekirinê û şîrovekirinê vekoler komeka encaman bi dest xwe ve tîne” (Salah Fazil, 2005: 34). Karê vî arasteyî pitir pîverîye û sînorê çendîyê berhemê edebî da kardike. Her ji tîraja berheman û jimara xwandevanan û jimara çapên berhemî ji ber hindê jî ew rexna li vî arasteyî têgirtin ewe ku “encamên ji vî arasteyî bi destvedihên komeka amar û zanyarîyane ku pitir di xizmeta zanayên civakî dane û vekolîn wan pitir ji hindê ku di xizmeta rexnegirên edebî û taybetmendîyên wê da bît” (Salah Fazil , 2005 : 39). Ji ber hindê jî em dibînin hinek rexnegirên edebî li demê behiskirina mijara rexna civakî gelek giringî bi vî arasteyî nedaye her çende amaje pêdayîne û li ser rawestîyane. Ji pîşengên vî arasteyî Alber Mîmî û Rober Iskarpîte. Alber Mîmî di wê bawerê da bû di biwarê sosyolojîya edebî em dişên pişt bestinê li ser sê teweran yan stûnan bikin: Nivîskar û berhem û xwandevan pêşniyaz dike ew layenê girêdayî nivîskarî ku vekolîn li ser bêkirin weku layenê aborî, karê (pîşe) wî, çîna civakî û hizra grupên edebî, belê yên girêdayî karê edebî pêdivî dibînit vekolîneka sosyolojî bo çar teweran: Janr û rengên edebî, babet, taybetmendî û kesayetî, şewaz yan rêk û

li dumahîkê pêşnîyaz dike bo xwandevanî vekolîna hizra xwandevanî, kiryara peywendîkirinê û serkevîna karê edebî û rexneyî” (Seyid Yesîn, 2007 : 96). Belê Dîskarib di pertûka xwe da ya bi navê “Civaknasîya Edebî” ku li sala 1958 z. çapkirîye sosyolojîya edebî bi ser sê teweran da dabeşkirîye ‘berhemînan edebî, belavkirin, bikaranîn” destpêdike bi girêdayî biberhemînanana edebî bi destnîşankirina rêya helbijartina pertûkê bo vekolîna sosyolojî danûstandinê li ser arîşa çîn û grupên edebî, anko demê li despêkê berçav digirit. Dûra vekolînê li ser nivîskarî di civakî da pişandide. Cihên peydabûna pertûkan û arîşa desteberkirina xercîyên jîyanê û karên nivîskaran ... eve jî wê çendê dîyardike ku Alber Mîmî vekolîn li ser van mijaran kirîye di bin navê nivêserî da. Belê Dîskarib giringîyeka taybet dete arîşa belavkirinê, eve jî dîyardibe di vekolîna wî da li ser tewerê duwê dev wî ew jî belavkirina edebî danustandinê li ser peywendîya belavkirinê bi dahênanê û tor yan baznên belavkirinê û girîngîyê dide cîyawazîya navbera baznê roşenibîran û baznê millî. Û dumahîkê di bwarê bikaranîna edebî peywendîya dû layenya yan dîyalektîya navbera karê edebî û xwandevanî pişandide. Delîlên serkevîna berhemî, vekolîn ser palderên bikaranîna edebî û kawdanên li dewrûberên xwandina edebî” (Alsayîd Yesîn, 2007 : 97). Dîskarib bi pişengê vî arasteyî tê danan belê Alsayîd Yasîn çarçovê Alber Mîmî ji yê Dîskarib baştir dibêje di pertûka xwe da ya binavê “Şîrovekirina Civakî bo Edebî” li sala 2007 her çende dibêje di hinek xalan da dê mifay ji Dîskaribî wergirîn. Kewate sosyolojîya edebî vekolînê li ser dayîk bûn û belavkirin û bikaranîna edebî di nav civakî da dike. Dîskaribî di pertûka xwe da ya binavê “Civaknasîya Edebî” li sala 1958 z. belavkirîye. Dê vê pertûkê da ‘’ bo nimune wergirtina 937 nivêserên Firensî, di navbera salên 1490z – 1900 z. da ji dayîk bûne ... ev mînak wergirtîne dibîne binemaya pitirîya wan têbinîyan ku ji virpêve dêxîne berçav”(Rober Sikarpît 2018 : 72). Dîskarib wesa dibêje her berhemekê edebî pêwîstî bi hebûna sê hokaran heye: ‘Nivîskar, pertûk, xwandevan yan bi ramaneka dîtir dahêner, berhem, xwandevan” (Robêr Îskapît, 1999: 56) Bi vê çendê jî boçuna Dîskaribî û Mîmî nêzîkî êk dibit. Lê digel hebûna cîyawazîyan di navbera çarçovê her dû yan da. Bi vî çend jî ev arasteye vekolîna xwe da pişt bestinê li ser sê layenê karê edebî dike. Ew jî sosyolojîya nivîskar, pertûk, xwandevan, weku ya dîyar nivîskar (daner) bi rêya karê edebî (têksit) peywendîye digel xwandevanî (wergir)î girêdet. Çunkî di sosyolojîya edebî da. “Peywendî navbera xwandevanî û têkistî û civakî peywendîyeka bihêze li ser

binemayê dîyalukê û lêktêgehiştne hatîye damezrandin” (Azad 'Ebdulwahd, 2005: 30). Ji ber ku ev sê tewere nivîskar, pertûk û xwandevan bi rehendên yan mewdanên vekolîna sosyolojîya edebî têne navkirin. Dê hewildayîn bi kurtî li ser her yêk ji wan bisekinin:

1- Sosyolojîya Nivîskarî

Di sosyolojîya nivîskarî da “rehendê dahênana edebî zivînteve bo nivîskarî” (Komeka Nivîskaran, 2006: 310). Karê edebî bi dirêjîya mêjûyê ji berhemê xebat û renca ... nivêseran pêkahtîye” (Aware Kemal, 2012: 72). Kewate berhemê edebî berhemê hizra nivîskarîye bo wî vedigerît ew afiranderê berhemê edebîye. Dê vî tewerî da dê amajê deyne çar rendan.

A- Barûdoxê Aborî

Di barûdoxê aborî da dîyarkirina astê aborî nivîskarê berhemê edebî ji layê rexnegirîve ka çend kar li berhemê wî kirîye. Nivîskar jî helbet weku her takekesekê civakî pêwîstî bi paran heye daku jîyana xwe derbaz bike. Em dişên vê çend dîyar bikin “bi şewekê giştî bi rêya ew peywendî û girêbestin nivîskar ligel dezgehên belavkirinê kirine” (Aware Kemal, 2012 : 72) û dîyarkirina barûdoxê aborî nivîskarî û karîgerîya wan li ser berhemê nivîskarî.

B- Barûdoxê Kar Yan Pîşeya Nivêserî

Eve jî kar û pîşeya duwê ya nivîskarî digirîte xwe. Ji berku piranîya nivîskaran neşên bi berhemê xwe jîyana xwe derbaz bikin. Her weku “tête zanîn jimareka kêma nivîskaran jîyana xwe derbaz diken bi rêya dahatê berhemê xwe yê edebî” (el-Seyid Yesîn, 2007: 103) ji ber hindê jî “karê duwê bi kêma zîyantirîn rêgeçare zanîn” (Rober Îskarpit, 2018: 99) ku nivîskar bo birêvebirina jîyana xwe penayê bibîte ber. Belê serarîyî vê çendê jî karê duwê başî û xirabîyên xwe hene. Ji başîn wê ewe ku bi azadî her tişteka bivêêt dişêt bêjît. Bê ku tirs ji nan birîna xwe hebît . Belê ji xirabîyên wê jî ewe neşêt demekê baş bû karê nivîsînê terxan bike. Eve jî dê kar li ser afrandin û berhem înana wî ket di biwarê edebî da.

C- Çîna Civakîya Nivîskarî

Bi destve îmana zanyarîyan li ser wê çîna nivîskar di nav da dijî dibe harîkar daku rexnegir pitir şareza be û di hizr û bîrên nivîskarî da ji ber ku gelek caran nivîskar derbirînê ji îdolojîya çîna xwe dike. Belê ser hindê ra ‘‘pêdivîye amaje bideyin wê çendê ku yeksanîyeka dirustî di navbera bîrûbawer û îdolojîya ku nivîskarî bawerî pê heye. Û hevbendîya wî ya dirustî da’’ (el-Seyid Yesîn, 2007: 105) ku çîna wî ya civakî da heye û hemî dema da nîne. Bi wê wateyê ku çîdibe nivîskar ji çîna xwe yaxî bibît û rexne lê bikirit. Derbirînê ji îdolojîyekê bike ku cuda bît ya li dev çîna nivîskarî bi xwe heye.

D- Texên (Cîl) Edebî

Komeka nivîskara bixwe ve digirit ku demekê dîyarkirî da berhemên edebî hene. Em dişên bi komeka nivîskaran jî ku hevdemên yekî jî navlêbikin. ‘‘Vekoler yan rexnegir hewil dide ku pêpulînekê nivîskaran bo çend grupekan dabeş bike ku ji layê temenî ve nezîkê hev bin’’ (el-Seyid Yesîn, 2007: 106). Di vî rehendî da pêdivîye wan hokarên sîyasî û aborî û civakî jî berçavbigrin ku rol di derkeftina texên edebî da hebû.

2.Sosyolojîya Karê Edebî

Berhemê edebî jî dibêjinê yan em dikarin bêjin ew berheme ku nivîskarî afirandîye. Karê edebî xala pêkvegirêdana nivîskarî û xwandevanîye. Wate ‘‘ eger têksit nebît êdî kenalek namînit ku xwandevan kesekê nasbike bi navê nivîskar’’ (Kanyaw Rehman, 2015: 37). Ev tewere jî van rehendîyan bi xwe ve digirît:

A- Sosyolojîya Janrên Edebî

Mebest ji Sosyolojîya janrên edebî ewe ku her janrekê edebî ji dayîk buyê serdemekê dîyarkirîye û di mêtîyaya mirovayetî da. Kewate şewê têksitî jî bi pê serdeman gorankarî bi serda dihên weku ‘‘efsane ku hizra mirovê despêkîye. Dastan jî dayîk bûya wî serdemîye ku taze civak dirust bûye û cîyawazîya çîneyetî aşkerayî dîyare. Stranên şivanîyê kevintirîn deqên edebê folklorine. Roman dastana serdeme her weku Corc Lukaş jî dê wê bawerê daye’’ (Kanyaw Rehman, 2015: 38). Kewate erkê rexnegirê civakî ewe ewan hokaran berçav bike ku di nav civakî da rêyek

xweşkirîye bo serhildana janrekê nû ya edebî di nav civakî da. Her serhildana romanê û girêdana wê bi serdemê burjuwazîyê ve.

B- Sosyolojîya Babetên Karê Edebî

Sosyolojîya babetî dişê bête egerê hindê “ku peywendîya navbera babetekê dîyarkirî û deste û komeka dîyarkirî da derbixê” (el-Seyid Yesîn, 2007: 116). Gelek caran doxekê civakî dibe eger ku pitir babetek ji layê nivîskaran ve giringî pê bêdan. Di nav berhemê xwe da pitir amajê pê biden. Bo mînak weku li Firensa babetekê wek “ edebê bergêrîyê ji layê nivîskaran ve di mawê salên dagîrkirina Firensa ji layê Elmanya nazî ve di nav berhemên wan da pitir amaje pêhatîyedan” (el-Seyid Yesîn, 2007: 116). Li ser demê dagîrkirinê karîgerî nivîskaran kirîye. Bûye egerê ku di nav berhemê wan da rengvedan hebît. Kewate hinek caran li serdemekê rûdaneka civakî yan sîyasî rû dide. Kar dike ser nivîskaran û dibe babetê gelek têksitê nivîskaran li wî serdemî.

C- Sosyolojîya Taybetmendîya Kesayetîyên Karê Edebî

Vekolîna Sosyolojîya taybetmendîyên kesayetîyên karê edebî “bi têrwanîneka civakî di şîyandaye gelek layenên civakî û aborî û sîyasî yên civakekê dîyar bike. Di serdemekê dîyarkirî da. Û hinek kesayetî taybetin bi hinek civakên destîşankirî ve. Ne girêdayî çî civakên dîtirin” (el-Seyid Yesîn, 2007 : 117). Bo mînak hinek kesayetî, di nav romanên Kurdî da di hêne amaje pêkirin. Mirov hestpêdike ku rastewxwe ji nav civakê Kurdî wergirtîne. Ji ber ku taybetmendîyên kesayetîya Kurdan di nav xwe hembêzkerîne û bîne tîp yan numûneyên civaka xwe. Kewate nivîskar bi rêya berhemê xwe û li ser zimanê kesayetîyên berhemê xwe amajê dete gelek mijar û rastîyên civakî û hewildide bigehînite xwandevanî. Kewate rexnegir dişê bi rêya berixwe daneka hîr bo kesayetîyên romanê gelek rastîyên civakî û aborî û sîyasî yên wê serdema têksitê têda hatîye afrandin bête bercav ku li ser zimanê kesayetîyê romanê amaje pê hatîye dan. Herwisa qareman wesa tê temaşekirin ku gelek taybetmendîyên civakî û serdemê xwe di nav xwe da hembêzkerîne.

3- Sosyolojîya Xwandevanî

Xwandevan yan wergirê berhemê edebî ku rehendê sêye ye ji sosyolojîya edebî. Berhemê edebî li dumahîkê xwe layê wî bînit û bo wî tê arastekirin. Ji ber vê çendê jî “sosyolojîya edebî tinê giringîyê bi nivîskarî û karê edebî nade. Belê ew giringîye pêdane xwandevanî jî bixwe ve digrît ku xwe di sosolojîya xwandevanî û îstatîka wergirî jî da dibînîteve” (Can Ayiv, 1993: 253). Sosyolojîya edebî sê rehênd bi xwe ve girtîne ku evene :

A- Xwandevan

Dîskarib bi wesa dibêje ku “her nivîskarek li demê nivîsînê xwandevanî li berçav wergirît. Eger ev xwandevane xwe dê yek xwandevan jî da bibîne ... Ew take xwandevane nivîskar bi xwe jî bît” (Rober Îskarpît, 2018: 189). Nivîskar berhemê xwe bo xwe nanivîsit, belê bo civakî yan çînekê ji civakê dinivîsit. Daku peyam û helwestên xwe sebareet mijarên civakî bigehînin civakê. Nivîskari dîlê xwandevanê xwe ye. Bi hinek alavan nivîskar bi xwandevanî ve tê girêdan birîtîne ji “hevberdîya kultûrî û hevberdîya hizr û bîr û baweran hevberdîya zimanî” (Robir Îskarpît, 2018: 198). Xwandevan jî bi guherîna babetan dihîne guherîn ka “ew babete ta çî radekê ligel zewq û hizra xwandevanî diguncît, karîgerî li ser zorbîn û kêmbîna rêja xwandevan heye” (Kanyaw Rehman, 2015: 40). Ji ber ku her xwandevanek hej ji xwandina curekê babetan û curekê edebîyatî dike.

B- Peywendî

Ev mijare jî amajê bi wê çend dike ku boçî berhemekê pitir ji layê xwandevan ve pêşwazî lê tê kirin? Li demekê da pêşwazî li berhemên dîtir nahêtekirin? Bersîva vê pirsyarê ewe ku evî berhemî “wêneyekê zîndîyê komeka bihayên nimûneyên di civakê da êxistîne berçav ku hêjayî hindêye ji layê xwandevan ve giringî pê bêdan” (Aware Kemal, 2012: 81). Kewate şîyaye wesa berhemê xwe ava bike. Demê xwandevan wî berhemî bixwune xwe di nav da bibîne.

C- Serkeftin

Mebest ji serkeftinê serkeftina nivîskarîye di çawanîya amadekirina berhemên xwe da. Herwisa di çawanîya pêşwazîkirina xwandevan li berhemî. Dîskarib dibêjît

serkeftinê çar ast hene: “Şikestin yan ji destdana serkeftinê. Eve jî li demê firotina pertûkê bibîte cihê zîyanê bo belavkerî û pertûkfiroşî. Serkeftina rêjeyî anko demê pertûk têçuya xwe derdîxît, serkeftina asayî yan baş ku firoştina pertûkê li dîv pêşbînî belavkerîye û li dumahîkê pertûka pîrfiroş eve jî demê pertûk tuxîbên bo hatine pêşbînîkirin derbaz bike” (Rober Îskarpît, 2018: 208). Kewate Dîskarîb serkeftina berhemê edebî girêdaye bi hijmara firotina berhemên edebî ku amajeyeke bo serkeftina nivîskarî û karê edebî bi xwe ye jî. Ev arasteye pitir berê xwe dide berhemê edebî weku kerestekê bazirganî.

1.5.4. Arastê Sosyolojîya Têkistên Edebî

Ev arasteye ku giringîyê bi navenda rasteqîneya navbera edebê û jîyanê dide û ew navende jî zimane. Çunkî ziman madê edebîye û madê peywendîkirinêye di jîyanê da. Kewate ziman di têrwanîna sosyolojîya têksîtê edebî da “hatîye hîlbijartin daku bibe pira rastîyane ku vekolîna rexneyî bi wirdî li ser bêkirin ku dişêt hevbendîyekê di navbera edebî ji layekê ve û jîyanê ji layekê dîtir ve bi rêya nawçeyeka pêkvegirêday. Û bi karînanana ziman weku nawçeyek bo vekolîna rexneyî di sosyolojîya têksîtê edebî da” (Selah Fezl, 2005: 43). Kewate ev arasteye pitir giringîyê bi zimanê têksî dide û dîyarkirina rehendên civakên zimanê têksîtî edebî û dîyarkirina rehendên civakên zimanê têksîtê edebî. Anko piştbestinê li ser ziman weku hevbendîyek di navbera edebî û civakî weku senterê şîrovekirina rexneyî di karê edebî da “sosyolojîya têksîtî weku arastekê rexneyî rohin xwedî binema dîyar nebîye îla bi rêya vekolîn Bîr Zima (Pierre Zime) ku ji xwandkarê Goldman bû, belê pa damezrînerê rastî bo vî arasteyî Mîxaîl Baxtîne (Mikhail Bakhtine) ji ber ku berî Zima berhem di vê buwarî da pêskêşkirîne” (Enîse Ehmed, 2016 : 29). Armanca sosyolojîya têksîtî “vekolîna têksîtê romanêye weku binyatekê ziman bi rêya astê pêkhateyî û ferhengî û delalî, di pêxemetî dîyarkirina hevdişîna civakî û devokên civakî di nav têksîtî da” (Enîse Ehmed, 2016: 24). Kewate sosyolojîya têksîtî pitir giringîyê bi ziman dide û dîyarkirina delalatên wê yê civakî di têksîtî da.

1- Mîxaîl Baxtîn (1895 -1974)

Baxtîn tê hijmartin ji girîngtirîn formalîstên civakî ku hewildaye lêk nêzîkîyekê di nav bera Formalîstîyê û Marksîstîyê da dirust bike. Hewildaye regezên

civakî û îdolojî di çarçovê ziman da bixwene. Pertûka wî ya binavê “Marksîyet û Felsefa Ziman” wesa dîyar dike “ku ziman weku delalatên pêkvegirdayîne di çarçovekê destnîşankirî da, di heman dem da îdolojîyaye, rengvedana madiye bo peywendîkirina civakî ji ber hindê vekolîna delalatên ziman, wateya wê çendê dide. Di heman dem da serederîkirin digel peywendîn civakî û aborî û digel îdolojîyên di nav ketwarî da heye” (Seyîd el- Bihrawî, 1992: 49).Kewate girîngî dan bi ziman dibe egerê dîyarkirina delalatên civakî li ser astê ziman.

Herwisa Baxtîn “serhildana romanê bo kernevala millî li dumahîka sedê naverast û despêka sedê rînîsansê” (Eduluhvehab Şe’lan, 2008: 83) dizvire. Kerneval “rûdaneka cemawerî û rexnegiraneye beramber ferhenga fermî ...serhildide” (Komeka Nivîskaran, 2006:448). Sê taybetmendiyên serekî yên rûdana kernevalê hene dû çeşnî (ambivalehce) firedengî (polîyphonie) û xende yan gîrnîjîn. Baxtînî berhemên Franiswa Rabîlye (F. Rabelais 1494 - 1553) û Botîqay Dostayevskî li ser binemayên kernevalê ravekirîne. Kewate bi dîtina Baxtîn kerneval ferhengeka rexnegiraneye ku dab û nerîten civakî û bihayên desthelatdaran diêxîte ber pisyarkirinê bi rengê pêkenîn û gîrnîjînê. Anko xelk kernevalê da yarîya bi ferhenka fermî dike. Taybetmêndiyên rûdana kernevalê evin:

1- Dû Çeşnî

Anko komkirina dû bihayên dijwarin (Komeka Nivîskaran, 2006: 451) wek jîyan û mirin û şah û dîn pêkvegîrêdide bi vê çendê jî behayên fermî yên desthelatê û tiştên pîroz red dike.

2- Xende (Gîrnîjîna) Kernevalî

Xende ya kernevalî “nerîtan red dike ... beramber xwe parêzîya çerxê naverast gîringîyê bi leşê mirovî dide û li ser rolê sêksî pêdagîrîyê dike. Rûgîrîjîya ferhenga fermî bi pêkenîn û yarî pêkirinê red dike” (Komeka Nivîskaran, 2006: 451). Kewate bi xende û yarî pêkirinê yasayên nenivîskî yan jî dab û nerîten civakî û ferhenga fermî red dike.

3- Fire Dengî

Baxtîn amaje dide fire dengîyê di romanê da û romanên Dostoyevskî bi fire dengîyê navkirîne. Bi wê ramanê ku kesayetîyên di romanê wî da azadane derbirîne ji îdolojîya xwe dikin bê ku bikevne jêr desthelata nivîskarî. Kewate roman “lîdev Dostoyevskî mîna perlemanekê bû ku cureha deng di nav da hatîne derbirîn” (‘Ebdî Hacî, 2008: 96). Ji ber hindê Baxtîn romanên wî bi romanên danûstandê dane nasîn. Navbirî yê rijde li ser hindê ku pêdivîya nivîskar “yê bê layen bît. Di romana fire dengî da çî îdolojî li ser îdolojîyên dî zal nebin. Belku wesa lê bike. Di nav îdolojîya giştî yan jî koma îdolojîyên di têksitî da bibojît” (‘Îzzedîn Bobîş , 2003 : 90) yan jî belav bibît. Kewate her kesayetîyek bi azadî derbirîne ji xwe dike bê ku dengîyê nivîskarî li ser dengê kesayetîyan zal bît.

Herwisa Baxtîn sebarek romana tak dengî monolokî dide xuyakirin ku ew romane ku dengê romannivîsî li ser dengên kesayetên romanê zal bît weku romanên Tostoy. Belê Baxtîn ev boçuna xwe sebarek romanên Tostoy guhartîye dibêjît romanên wî jî cure danûstandinek têda heye. Herwisa navbirî dibêjît em berêxwe nadeyine ziman tenê weku pêkhateka rêziman. Belê “dê serederîyê digelkeyîn weku zimanekê îdolojî weku têgehek bo cîhanê” (Abdulvehab Şe’lan , 2007 : 84). Kewate Baxtîn ziman hevbend kirîye bi îdolojîyayê ve. Helbet îdolojîya jî derbirîne ji nivîskarî û çîneka civakî dike. Kewate nivîskar di romanê da berhemhênerê îdolojîye û her peyveka ji layê wî ve di berhemî da tê derbirîn dîtineka taybet li dor cîhanê pêşkêş dike û ber bi wateyeka civakî ve diçe. Ji berku her tiştekê îdolojîya be jêderekê bixwe ve digire û tê veguhastin bo tiştekê ji derveyî xwe ku ew jî ketwarê civakî ye.

2- Bîr Zima

Em dişên bêjîn rexnegir Bîr Zimaî zaravê “Sosyolojîya Têkistî” yan jî zansitê civakê têksitî bikarînaye. Di pertûka xwe da ya binavê “Jibona Yan Pêxemet Sosyolojîya Têksitê Edebî” li sala 1978 da her çende Zima bi Baxtîn karîgerbûye belê mifa ji karên qutabxana Frankfurtê û Marksîyan jî wergirtîye. Herwisa mifa ji metodên rexneyî yê dîtir wergirtîye weku binyatgerîyê û zimanewanîyê û şîrovekirina derunî wergirtîye û sosyolojîya têksitê edebî pêşvebirîye. Sosyolojîya

têksitî edebî dev Zima girîngî dide û “hewildaye çawanîya bercestekirina berjewendiyên civakî û arîşên wan di karê edebî da li ser astê delalî û pêkhatê û vegêranê vekolît” (Pîr Zima, 1991 : 12). Kewate navbirî girîngî daye dîyarkirina delalatên civakî li ser astê ziman di têksitî da. Herwisa Zima dibêjît zanistekê civakê taybete bi têksitî ve girîngîyê dide bi girêdana edebî bi civakî ve bi rêya zimanî” (Bîyar F. Zima, 2013: 49)

Herwisa Bîr Zima dibêjît girêdana edebî bi civakî ve li ser astê ziman projekê formalsitê kevne. Amaje dide rolê Mîxaîl Baxtîn û herwisa Tînyanuf (Tînyanov) di gotara xwe ya navdar da derbareyî rojnama “Pêşkeftina Edebî” ku dibêjît “jîyana civakî peywendiyê û hevbendiyê dirust dike digel edebî, bi rêya siruştê ziman, dê astê yekê da”(Bîyar F. Zima, 2013: 50). Kewate ev arasteye girîngîyê dide peywendîya navbera edebî û civakî li ser astê ziman. Ziman dibe pira navbera edeb û civakî. Kewate “li vêrê ziman ji ristê dibe zimanê derbirîna desteyekê yan komeka xelkê bo nimûne her hîzbek û zimanê taybet bi xwe heye. Marksîyan zimanekê taybet bi xwe hebû. Li vêrê devokên çînên civakî peydadibîn. Wan devokan peyvên taybet bi xwe hene ku rengvedana wê çînê û îdolojîya wî kesîye” (Heme Mentik, 2018: 73). Kewate demê ew nivîskarê tîkistekê romanê yan helbestê binvêsit îdolojîya wî û çîna wî di nav da rengve dide. Bi rêya wan peyvên ew bikartîne. Em dişên îdolojîya gotara têksitî dîyar bikin. Ji ber ku “her grupeka sîyasî û civakî... weku bizotnewên sosyalîstan û grupên mesîhîyan û sendîkayan û nunerên xwedî kar, komeka peyv û destewajên cîyawaz bo şîrovekirina dîtina xwe û bergêrîkirin ji têrwanîna xwe bikartînin” (Qusey el-Hisên, 2009: 221). Kewate her grupeka civakî xudan curekê gotareka taybet bi xwe ve ye. Taku bi rêya wê gotarê derbirîne ji bîrûboçunên xwe û berjewendiyên xwe bikin di nav civakî da. Kewate lêkolîna edebî ji riwanga sosyolojîya têksitê edebî, devokên civakî bi çarçovê wan yê civakî ve hevbend dike. Herwisa Bîr Zima di şîrovekirina xwe da bo piraktîzekirîne li ser romanê çend astê ziman dîyarkirîne weku:

1- Astî Ferhengî: “Peywendî navbera peyvyan û ketwarê civakî da hejayî girîngî pêdanêye ... ji ber ku peyv beramberî beşek ji civakîye ... wek paşa, zengîn, împarator, wezaret, girtin, nîneratîya ketwarê civakî dikin di vî warî da” (Bîyar F.

Zima, 2013: 80). Kewate peyv rengvedana ketwarê civakî dikin û gelek caran hevdijîn çinayetî li ser astê peyvên diyardibin di nav têksitî da.

2- Astên Devokên Civakî: Ku axavtina grupekêye xudan lîsteka ferhengîya taybetin ku her grupeka civakî, sîyasî yan dînî yan pîşeyî be. Komeka peyvên taybet bikartînin ku cîyawazin, zimanê wan cîyawaze ji grupên dîtir” (Bîyar. F. Zima, 2013: 89). Anko devokên civakî komeka gotarane, tiştê hevpişk lîsteka ferhengîye û sîstemekê kodên delalîye ku taybete bi her grupeka civakî ve . Kewate devoka civakî “zimanekê îdolojî rêxistîye li ser astê ferhengî û delalî û pêkhateyî di berjewendîya grupeka destînşankirî da” (Ruveydî 'Edlan 2018: 35) ku her grupek peyvên taybet bi xwe diafirînin. Daku derbirîne bi rêya wan peyvên ji îdolojîya xwe biken û ramaneka taybet didine wan peyvên yên bikartînin.

3- Astê Îdolojî: Bîr Zima îdolojîya daye nasandin “weku binyatekê gotarî ji dayîk bûye ji devokeka civakî ji verêja sîstemekê kodî yan hêmayî û ji lîsteka ferhengîya taybet ... derbirîne ji berjewendîyên grupekê dike, ji dayîk bûye ji devokeka civakî ya taybet. Di şîyan daye nav lê bikin îdolojîya” (Bîyar F. Zima 2013:91). Kewate Bîr Zima îdolojîyê jî di têksitê edebî da bo devokeka civakî dizvirîne.

4- Astê Hevtêkistîyê: Bîr Zima amaje daye hevtêkistîyê dide xuyakirin “ku rêyê dete bi hebûna hinek devokên civakî û gotaran di nav têksitê xeyalî da” (Bîyar. F. Zima 2013: 95). Kewate xuyadibe kiryara hevtêkistîyê “kiryara mêhtina devokên civakîye ji layê têksitê edebî ve” (Pîyar Zima, 1991: 204) Bîr Zima bîr û bûçunên xwe li ser hinek romanên piraktîzekirine. Ji wan jî weku romana Îtalyo Kalfînu ya binavê “Herweku Rêvinkek Dişveka Zivistanê Da”. Kewate ev arasteye pitir giringîyê dide têksitê edebî û gotara romanê û hevbendîya wê bi civakê ve li ser astê ziman.

Her çende her arasteyekê ji van arastan layenên baş û kêmasîyên xwe jî hene. Belê li ser vê çendê ra jî van arasteyan rolekê girîng gêraye di pişvebirina rexna civakî da. Her çende hinek rexnegirên edebî di pertûkên rexneyî da amaje daye arasteyekê dîtir jî binavê “arastê waz’î” ye yan bineretî di vî arasteyî da amaje daye rolê Madem Dîstaelê û Taine ku me di nav mêjûya rexna civakî da amaje daye hizr û

bîrê wan. Lê me dê tewerê arastên rexna civakî da me amaje daye çar arasteyan ji ber ku pirañya rexnegirên edebî di pertûkên xwe yên rexneyî da. Ewên me li ber cavan derbazkirin amaje bi çar arasteyan dabûn. Heger em nav li arastê wez'î bikin arastê kevin ku pitir pîşengên vî arasteyî ji civakî berev têksitî ve diçûn. Bo şîrovekirina têksitî û bo dîyarkirina hevbendîya navbera civak û edebê da. Belê her çar arastên nû pitir ji têksitî berev civakî ve diçûn. Bo şîrovekirina têksitê û dîyarkirina hevbendîya navbera edebî û civakî da.

1.6. Pêgîrbûn

Ji têgehên girînge di rexna Marksî da. Rexna Marksî jî arasteyeke ji rexna civakî di zimanê Kurdî da. Bo vî têgehî zaravên weku pêgîrbûn yan pabendibûn têne bikaranîn. Lê hinek caran jî zaravên weku ‘îltîzam, peyamdari, berpîrsayetî, helwîst, derwestî’ (Sirûşt Cewher, 2015: 9) têne bikaranîn. Pêgîrbûn bi wê ramanê tê ku ‘nivîskar pêgîrbît di karê xwe yê edebî da bi bîr û bawerekê ji bîr û baweran yan bnemayekê ji binemayan, yan felsefekê ji felsefeyan li dîv biçît û alayê wê raket. Li pila yekê helwestê hizrvanî yan nivîskarî yan hunermendîye ... ji ber ku edebê pêgîr edebekê armancdare, nivîskar bi rêya wî arîşên milletî çareser dike’ (Mixtar Welid, 2014: 8). Kewate peyva pêgîrbûn di nejat da têgehekê felsefye bo hizr û îdeolojîyeka dîyarkirî. Anko xwe girêdane bi têrwanîneka dîyarkirî ve di jîyanê da. Nivîskar bi hemû rengan bergêrî jê dike di berhemî xwe da. Kewate pêgîrbûn ew helwîstê nivîskarîye ku werdigirît beramber her dîyardeka civakî. Nivîskar xudan nameka civakî ye. Derkeve ji wê bawerîya ku heyî bi hişyarî û berpîrsîyarane beramberî civakê xwe û mirovayetîyê. Eger em bêjîn pêdivîye nivîskar yan romannivîs bi çi ve pêgîribît? Di bersîvê da em şên bêjîn ‘pêgîribûn bi civakî û ketwarê gel û milletî dihêt bo gorankariyan û baştirkirina civakê’ (Sirûşt Cewher, 2015: 19). Kewate romannivîsî divêt bi rêya berhemê xwe peyama xwe bigehênîte civaka xwe û helwîstê xwe beramber arîşên di nav civakî da radgehînit.

Pêgîrbûnê çend armancek hene ji wan jî:

- 1- Guherîna cîhanê.
- 2- Rawestîyan digel zulim lêkiryan û lêk nêzîk kirina mirovan li hevdû.

3- Hişyarkirina hesta sîyasî û zivirandina xwandevanî bo azadîya wî (Umyemir Nesîmit û Sîllî E‘mare, 2015: 7).

4- Herwisa edebê nivîskarî bibe alavek bo xizmetkirina jîyanê û guherîna civakê berev baştir.

Kewate nivîskar berhemekê armanclar binivîsit. Xudan helwîst bît beramber arîşên civaka xwe. Eger em vê pisîyarê bikin bêjîn romannivîs bo kê dinivîset? Derbareyî çi nivêstî? Di şîyandaye bêjîn bo milletî nivêstî û derbareyî civakî. Ji ber ku edeb wergêr û rengvedana barûdoxê civakîye. Bi vê çendê jî nivîskar hewildide pabendîbe bi civakî û bo civakê binivîst.

Pêgîrbûn “azadîya hîlbijartinê ye ku radibe bi dest pêşxeryeka pozetîv û azad li xudan wê bi xwe” (Newzad ‘Ebdulla, 2007: 52). Kewate têgehê pêgîrbûnê wateya pêgîrkirinê û sepanînê nadet. Ew pêgîrbûna ku nivîskar azadîya xwe ji dest bidet di karê edebî da. Belê ramana azadîya hîlbijartinê ye bi wan mijarên nivîskarî bawerî pê heye. Kewate nivîskarê pêgîr nivîskarekê azade. Dîsan “pêgîrbûn ramana wê çendê nadet ku civak hizr û bîr û bawerên xwe li ser nivîskarî bisepînit” (Mixtar Welîd, 2014: 11) yan jî li dîv yasayên nivîskî û nenivîskîyên civakî û dab û nerîtan bêçît, yan jî layê dezgekê sîyasî ve li ser nivîskarî bihîte sepanîn. Belê divêt nivîskar bi azadane hest bi berpîrsîyarîyetîya xwe bike beramber civaka xwe hewilbidet. Edebê xwe bêxte di xizmeta civaka xwe da bê ku ji layenekê ji derve li ser bê sepanîn. Ji ber ku pêgîrbûn “bi wateya bikarînanana edebî di xizmeta xelkê da” (Nurî Hemûdî, 1979: 6) dihêt. Romannivîs romana xwe bike alavek bo guherîna civaka xwe. Romanên wî rengvedana arîşe û êş û azarîn xelkê bin. Kewate “pêgîrbûn bicîh dihêt li wî demê nivîskar berhemekê pêşkêşî xelkê dike. Bi renekê rastew xwe girêdayî jîyan û arîşên wan bît” (Fuad ‘Umir, 2004: 13) daku xwandevan xwe di nav wî berhemî da bibînit. Bi helwîstê nivîskarî beramber wan mijarên di nav berhemî da hatîne azirandin karîger bibît. Bi armanca hişyarkirina xwandevanî bi arîşên di nav civaka wî da.

Eger ji layê edebî ve pênasa pêgîrbûn bikin, dişên bêjîn pêgîrbûn “birîtîye ji pêgîrbûna nivîskarî bi pîrsên civakê û hewildan bo çareserkirina pêwîst bo arîşan” (Sirûşt Cewher, 2015: 4). Anko nivîskar bi rêya berhemê xwe amajê dide arîşên

civaka xwe. Hewil dide çareserî jî bo wan arîşan berçav bike. Wate pêgîrbûn hestkirin bi berpîrsîyaretîyê tê. Beramber rûdan û arîşe û gîrdavên civakî. Nivîskar xwe beramberî civakê berpîrsîyar bibîne. Edebê wî rengvedana xemên civaka wî bît.

Herwisa di ferhenga Robîr ya biçûk bi vî rengî hatîye pênasekirin. Pêgîrbûn: “Kar yan helwîstê roşenbîrî yan hunermendîye. Ew bi hişyarîya xwe bi hevbendîya xwe bo civakê û cîhana serdemê xwe dest ji kawdanê berêxwedanê berdide û hizr û huner xwe dike di xizmeta keysekê da” (Bonwa Donî, 2005: 37). Anko nivîskar ji ber ku kesekê hişyare di nav civakî da neşet bêdengîyê helibijîrît. Beramber wan arîşe û girêdavên di nav civakî da. Helwîstê xwe beramber wan mijarên civakî radigehînît. Herwisa pêgîrbûn “mebest pê pêgîrbûna nivîskarîye bi arîşên sîyasî û civakî û her hizreka dîtir ku pêdivîye weku helwîst di nivîsînên wî da rengvedan hebît, eve jî berovajî xwegîrdanêye bi daxazên deshelatê û guhdarîkirina bê helwîst” (Azad 'Ebdulwahid, 2013:167). Ji ber ku pêdivîye nivîskar yê azad bît. Bi azadane di nav berhemî xwe da li ser mijarên civakî birawestît. Bê ku ji layekê derekî ve li ser bihîne sepandin.

Kewate “nivîskar bi vê wateyê xudan nameyeka agehdarkirinê ye ...bi wateya beşdarîkirinê di arîşe û keysên xelkê da û karkirin li ser çareserîkirina arîşên wan” (Bedevî Tebane, 1984: 15). Anko pêdivîye li ser nivîskarî di nav berhemê xwe da amajê bi arîşên civakê bike. Xwandevanî ji van arîşan hişyar bike û çareserî bo dîyar bike. Kewate “mebest ji pêgîrbûna nivîskaran lanedana wane, ji mijarên giştî û nîştîmanî û xistine berçava hêvî û daxazî û xweşî û nexweşîyên milletî (Refîq Şîwanî, 2008: 28). Anko demê nivîskar berhemê xwe dinivîsît. Divêt berjewendîya gel û civaka xwe li ber çav werbigirît. Edebê wî bibe alavek bo berev pîşvebirina civakî û guherîna civakê berev baştir. Pêxemet xizmet kirina civakê û hişyarkirina wan xistine berçava êş û azar û xweşî û nexweşîyên wan. Herwisa “pêgîrbûn di edebî da xwe girêdaneka hûşyaraneye bi şariştanîyeta serdemî û daxwazên gelî û armancên dîr û nêzikên mirovê çewsandî ” (Kake Mem Botanî, 2008: 12). Pêxemet civakekê azad û serbexwe bê çewsandina mirovî. Kewate pêgîrbûn birîtîye ji wê peywendîya nivîskarî bi civakî ve girê dide. Hestkirin bi berpîrsîyaretîyê bi mijarên zîndîyên civakê xwe girêdan bi ketwarê serdemî û hewildan bo derbirîna arîşên nav civakê.

Ev ketwarê têda dijî bi renekê rastîyane. Herwisa destinişan kirin û xistine ber çava çareserîn pêdivî.

Pêgîrbûn di rexna civakî da bo wî edebî bi kardihêt ku nivîskar bi azadane pêgîr bît. Bi helwîst wergirtinê beramber arîşe û ketwarê jîyana civakî. Herwisa xwe girêdan bi îdolojîyayeka taybet ve pêxemet pêşvebirina civakî. Belê di nav rexna Marksî da ku arasteyeke ji rexna civakî û pitir bendikirina edebîye bi gîyanê hizbayetîyê, bicihînana erkekê hizbayetî.

A-Pêgîrbûn Rêbaza Di Realîzmê Da

Belê sebareet rêbazên edebî yek ji wan rêbazên ku rengvedana pêgîrbûnê di berhemê wê da derdikevît rêbaza realîzmê ye ku ev çende jî di nav da hatîye weku armanceka bilind û hêvîyeka pîroz bo pêşvebirina civakî. Bi taybetî jî rêbaza realîzma sosyalîstî ku cukeke ji rêbaza realîzmeye ku li sala 1934 da li kongirê êkê yê nivîskarên Sovyetê bi awayekê fermî hatîye damezrandin. Bi vî rengî hatîye danasandin “realîzma sosyalîstî metodeka bineretîye bo edeb û rexna Sovyetî ku daxwazê ji hunermend yan nivîskarî dike ku nivêsen xwe da bi renekê rastgoyane pabendî ketwarî bît bo pêşvebirna şoreşê, helwîst û pêgîrbûna hunerî bo ketwarî pêdivîye bê girêdan bi kirêkaran û handana wan bi gîyanekê sosyalistane” (Karzan Kerîm, 2009 : 31). Anko armanca vê cukê perwerdekirina cemawerî bû bi gîyanê sosyalîstîyê çespendina hizrên wê li ser civakî. Bergêrîkirin ji çîna kirêkara û mafên wan. Ji ber hindê jî Stalîn “nivîskar bi endazîyarê derunê mirovî” (Selah Fazil, 1980: 78) dayîne nasîn ku radibin bi perwerdekirina kirêkaran bi riha sosyalîstîyê. Yek ji wan nivîskarên dîv vê rêbazê çûyî Maksîm Gorkî (1868 - 1936) bû bi taybetî jî bi romana xwe ya bi nave “Dayîk”. Gorkî “tê danan bi êkem kesê zaravê realîzma sosyalîstî” (Reca' 'Id, 2000: 132) bikarînaye. Navbirî piştigirî li çîna kirêkaran dikir. Derdeserî û nexweşîya mirovî di nav berhemê xwe da wênekirîne.

Ji taybetmendîna rêbaza realîzma sosyalîstî ku “wênê jîyanê pêşkêş dike, wênekê rexnegrane ku binemayek yan binçîneyek bo bi destveînana dahatî, kewate çareserîya ketwarî dike di nuke da derbaz dike berev berê xwe dana dahatî” (Sirûşt Cewher, 2015: 66). Kewate ev rêbaze pabende bi berçavkirina arîşên civakî û dîyarkirina çareserîya wan di nav berhemê edebî da.

Yekem car sependina pêgîrbûnê li ser edebî bi rengekê bihêz û vebir zivirîte bo lînîne demê digot “li ser edebî pêwîste bibe hizbî, nivîskarên nehizbî bikevin. Ew nivîskarên xwe li ser xelkê ra dibîn, pêdivîye li ser edebî bibe beşek ji karê hizba sosyalîstîya demokrat” (Amil Dîbo, 1982: 5). Anko pêdivîye li ser nivîskarî bi erkê hişyarkirina çîna kirêyara bi hizra sosyalîstî rabibît. Edeb bibe alavek bo xizmetkirina çîna kirêyara û bi destveînana armancên hizba sosyalîstî ku dadperwerî bû di navbera çînen civakî da. Avakirina civakekê sosyalîstî dir ji çîneyetîyê. Kewate “nivîskarê pêgîr bi dîtina wan. Ewe ewê edebê xwe dike rengvedana ketwarî li ber tîşka binemayên sosyalîstîyê. Bi vê çendê jî nivîskar ji vî riwanga pitir ji pêgîrbûn nêzîkî pêgîrkirineye” (Muxtar Welid, 2014 : 17) ji ber ku bergêrkirin ji binemayên sosyalîstê dibe rêgir beramber azadîya nivîskarî ya takekesî li demê afrandina berhemê edebî da. Ji ber ku daxwazîya pêgîrbûn ji layê hizbekê ve hatîye xwastin ji nivîskarî yan hatîye sependin, bi vê çendê jî dest dirêjîya azadîya nivîskarî dibe. Bi vê çendê jî nivîskar pitir ji pêgîrbûn nêzîkî pêgîrkirinê dibe.

B-Pêgîrbûn Di Riwangaha Sarterî Da

Di felsefa bûngerayîyê da hebûna her kesekê girêday wî kariye yê dike. Bi wateya mirov ew kare yê dike. Herwisa hebûna mirovî peywendîya wî bi hebûna ji derve. Dîsan reftarên mirovî hebûn pêkhata wî diyar dikin. “Bûngeran piştbestin li ser sê têgehên kirîye di karê xwe da: Azadî, berpirsîyaretî û pêgîrbûn” (Muxtar Welid 2014:19). Têgehê pêgîrbûnê hatîye girêdan bi felsefa bûngerayîyê ve di edebî da. Bi taybetî digel Jan Pol Sartir (1905 - 1980) navbirî tê hijmartin. Yekem kesê zaravê pêgîrbûnê azrandîye “bû derbirînê li ser berpirsîyaretîya nivîskarî, bû tekîdikirinê ku axivtina edebî nebitinê valekirineka derunîye yan bitenê derbirîneka hunerîye. Belê ev helwîsteke pêxemet yan ji bona guherînê” (Muxtar Welid, 2014: 17). Anko nivîskar berpirsîyare ji civaka xwe. Pêdivîye xudan helwîst bît. Daku civaka xwe biguhurît berev baştir. Ji ber ku nivîskar pêxemet civakî dinivîsit. Li ser guherîna civakî kar dike. Ji ber ku nivîskar ne bo xwe dinivîsit. Belê bo civaka xwe dinvîsit bi wê armancê ku gorankariyekê di wijdana civakê da dirust bike. Çavê xwandevanî veket li ser ketwarî berçavkirina kêmasîyan bi merema yaxîbûnê beramber wî ketwarî. Kewate berpirsîyaretî li dev Sarter ewe “ew rûdanên ku li ketwarî da rûden ji ber mirovî, nabît weku hestekê mirovayetî lê bêdeng bîn û xwe berpirsîyar ne

zanîn” (Sirûşt Cewher, 2015 : 80). Kewate Sarter dê wê bawerê daye divêt nivîskar xudan helwîst bît. Xwe berpîrsîyar bibîne. Beramber her rûdaneka civakî da rûdidet. Helwîstî beramber wergirît.

Sarter di pertûka xwe da ya binavê “Edeb Çîye?” ku li despêkê sala 1947 di govare “Serdemê Nû” da belavkirîye. Dûra jî piştî salekê 1948 bi serbexwe weku pertûk belavkirîye . Di nav vê pertûkê da hewildaye bersîva sê mijarên serekî bidet. Nivêsin çîye? Bo çî dinivêsin? Bo kê dinivêsin? Di beşê nivêsin çîye? Gehiştîye wî encamî ku hest bi wê çendê bike ku berhemhêner kesekê serekîye ne zêdeye. Û di beşê bo çî dinivêsin? Tekîd dike ku derfeta bi cihînana azadîye ye. Di beşê bo kê dinivêsin ? Dumahîkê em nivêsin bo bergîrkirin ji wan bîr û bawerên me bawerî pê heyî” (Fuad ’Umer, 2004: 28). Ji ber ku her nivêsinêk weku gazîyekêye ji nivîskarî bo xwandevanî tê arastekirin. Bi armanca hişyarkirin û berev pîşvebirina civakê. Naveroka edebî di nav xwe da helwîstin takekesîne li ser zimanê kesayetîyên romanê bi merema guherîna paşerojê bi azadî û berpîrsîyaretîyane. Kewate nivîskar berpîrsiyare beramber civaka xwe.

Pêgîrbûn li dev Sarterî hatiye girêdan ‘’bi pexşanê ve, ne bi hunerên dîtir weku hozan, muzîk û wênekêşî, bi wê bawerê ku pexşan pitir delîva hizrkirinê û ketwarî ye” (Mixtar Welid, 2014 : 20). Ji ber ku bi boçuna navbirî peyvên pexşannivêsi rastewxwe derbirînê ji rastîye dike . Belê hozanvan bi rêya peyvên xwe derbirînê ji hest û sozên xwe dike. Helbet zimanê hozanê cudaye ji zimanê pexşanê.

Pêgîrbûn li dev bûngeran “pêgîrbûneka takîye û kesokîye lê tinê wî bi xwe nagrit, belê hemî kesên dîtir ji vedigire. Wate despêkê bûngera bargiranîya xwe di takekesî mirovî da dibinit, takekes binçîneyê hizr û serûkanîya dahînana hunerî ye” (Sirûşt Cewher, 2015 : 90). Wate pêgîrbûn li dev Sarterî pêgîribûneka kesokî ye. Takekes jêderê hizr û serûkanîya hunerîye. Hizr nerengvedana madeyîye weku di Marksîyetê da. Kewate “divê jî da beruvajî Marksîyetê ye çunkî tak dibe dilopeka helyayî di deryaya civakî da” (Sirûşt Cewher, 2015 : 90) di nav Marksîyetê da. Edeb dibe beşek ji serxana civakî û beşeke ji îdolojîya civakê ku rengvedana jîrxanê ye ku layenê aborî ye. Pêgîrbûn bi bûçuna Sarterî birîtîye ‘’ji derbirîna bîrurayan ji layê nivîskarî bixwe derbare ew ketwarê têda dijî bi mercekekê parêzgarîye ji serbexweya xwe bike” (Sirûşt Cewher, 2015: 90). Ji ber ku Sarter wesa dibinit.

Nivîskar berpirse ji wan hemî tiştên dinivêsit. Peyameka heye bo guherîna civakî. Herwisa Sarter dete xuyakirin “mebesta edebî hewildan û têkûşan û xebate. Hewildan û xebat bû bi destveînana hişyarîyê, dîyarkirina rastîyê û azadîya mirovî ji vî rûyive nivîskar beramber ewa nivêsit berpirsîyare: Bo çî dinivêsit? Çi kirîye, ewî karî bo paldaye dest bavête nivêsinê? Çunkî gotin di hukmê encamdana karî daye” (Jan Pol Sarter 2009:35). Sarter di wê bawerê dabû ku nivîskar beramber ewa dinivêsit berpirsîyare her çî dinvêsit divêt pêgîr bît. Dur bikevît ji gêrana rolekê nebaş di nav civakê da.

Sarter di pertûka xwe da ya bi navê Edeb Çîye? Di beşê yekê da bi navê ramana nivêsinê çîye ? Pitir dakokîyê li ser pêgîrbûna pexşanê dike. Herwisa di beşê bo çî dinivêsin ? Dibêjît armanca hunerî nûkirina sîstemê cîhanê ye. Her karekê edebî bangeşeyeke arasteyî xwandevanî tê kirin. Dîsan dete xuyakirin edeb nivîskarî dikêşite nav şerî bo bergîrkirin ji wan bîr û bawerên bangeşê bû dike . Herwisa Sarter dibêjît “nivêsin rêyake ji rêyên bo bi destveînana azadîyê” (Jan Pol Sartir, 2009 : 124). Kewate bi boçuna navbirî nivîskar divêt di berhemê xwe da pêgîrbît. Ji bergîrkirin ji azadîyê di nav civakî da. Herwisa di beşê sê da: Bo kê dinvêsin? Dibêjît nivîskar “nivîskar berexwe nade te xwandevanekê cîhanî, belku berexwe dete xwandevanekê taybet di welatekê da di helwîstekê taybet da... Û wijdana nivîskarî li demê beşdarîkirinê di hevrikên civakî da” (Jan Pol Sarter, 2009: 127). Kewate nivîskar berhemê xwe arasteyî xwandevanê civaka xwe dike. Nivîskar bo xwandevanî berhemê xwe dinivêsit. Herwisa Sarter di wê bawerê daye ku hemî karên hizrî wênekê wî xwandevanî li xwe digire ku bo hatîye nivêsin. Daku xwandevan xwe nêzîkî wî berhemî bibîne. Ji ber ku nivîskar wênê civakî pêşkêşî civakî dike. Belê piranîya caran helwîstê nivîskaran rexneyîne bo guherîn û avakirina civakekê baştir.

C-Pêgîrbûn Di Roman Da

Em şên bêjîn roman weku janrekê edebî Ji ber rûberê xweyê mezin ji hemî janrên dîtir, pitir şîyanên rengvedana civakî û pêgîrbûne hene. Roman weku janrekê edebî her çende heta nuke bi awayekê tevgir nehatîye pênasekirin ji ber ku berdewam di guherînê daye. Belê ji bo cudakirina romanê ji janrên dî yên edebî hatîye pênasekirin ku roman “têkistekê pexşankî aşupî vegêrayîyê realîzmê ye, behra pitir li

dor wan kesan dizivrit ewên di bûyereka giring da hatîne hingavtin, roman niwandina jîyanê û serbor û wergirtina zanînê ye” (Emîn 'Ebdulqadir, 2012: 17). Roman ji ber siruştê xwe yê berfireh dişt bi rengekê berfireh û rengvedana ketwarî û civakî bike. Roman nivêş bi rêya kesayetîyên di nav romanê da dişt li ser zimanê wan helwîstê xwe beramber mijarên civaka xwe derbibirît. Herwisa di ferhenga Oxford da hatîye pênasekirin ‘’roman vegêrana pexşaneka xeyalî ye yan çîrokekê ye dirêj ya berçav heye ku tê da xistnerûya kesayetî û rûdanên jîyana rasteqîneya borî û nuke wêne dike di giryeka gelek yan kêma alozî da’’ (’Eta Qeredaxî , 2017: 15). Kewate roman ya pêgîre bi wênekirina jîyana nuke û borî wênekirina jîyana kesayetîyên civakê û ew rûdanên di jîyanî da bi serê wan hatîn.

Herwisa Orhan Pamuk dibêjît “roman jîyana duwê ye. Ew jî weku xewnên şa’îrê Firansî Girard Dê Nirval, reng û alozîyên jîyana me pîşan didet’’(Orhan Pamuk, 2016:15). Bi vê çendê jî romanê şîyanê wê zîdene bo pêşkişkirina hîrkariyên jîyanê bi hemî rastî û gumanên xwe ve ku behsê wan arîşan bike ku takekes tuş dibe û demê têkelîyê digel kesayetên dîtir da. Herwisa ‘’yek ji xasyetên girîngên sosyolojîya romanê ewe ku rê dide arîşên civakî û sîyasî nav civakê bêne nav edebî romannivîs Zuma yan berê kamîra xwe arasteyî cergê jîyanê dike. Ji wêrê wêne kesayetî û mîlmilanan digrît. Paşî bi rêya boçunên xwe helsengandinê bo dike’’ (Necim Elwenî, 2018: 45). Dîsan romannivîs penayê bete ber xeyalê bo avakirina cîhanekê ku xewnê pêvedibînît. Xeyal weku Maryo Fargas Yusa amajepêkirî direweke rastyeka kûr vedşêrît, ew jîyane ku nebîye û mirov hezdike divêt dest bikevît. Ji ber hindê naçarbîye rêya xeyal û peyvan biafirînit. Pêxemet vemrandina wan hez û vîyanên ku jîyanê neşyaye têr bike’’ (Necim Elwenî, 2017: 32) Romannivîs rexnê li ketwarî digire. Wêne ketwarekê baştir dixête berçavê xwêneran ku nivîskarî divêt cîhanekê ava bike di ketwarê realistî da nîne. Ji ber ku ‘’roman ev şêweye ewê civakek têda gengeşê li ser xwe dike’’ (’Ebdulkerîm Mistefa, 2015: 88). Romannivîs wêne civakê dikêşît bo civakî belê netnê bi wênekirina wî civakî radibe. Belê hewildide wêne wî civakê jî bikêşît ku cihê civakê realistî jî bigrît.

Ji ber ku nivîskar endameke di civakî da arîşên wî yê taybetî jî beşekin ji arîşên civakî. Kewate karê edebî derencamê karîgerîya di navbera takê nivîskar û civakî daye. Roman jî derbirîne ji helwîstê nivîskarî beramber arîşên di nav civakî

da. Romannivîsê pêgîr penayê bete ber romanê da ku helwîstê xwe beramber arîşên civakê bigehînite xwandevanî. Ev pêgîrbûne ji layê romannivîsî ve di romanê da bi dû rengan dîyar dibe:

1- Pêgîrbûn Bi Baskirina Arîşên Jîyanê

Ev pêgîrbûna romannivîsî di romanê da bitenê di wê çendê daye “agehdarê pirsgirekên jîyana civakî bît. Wan girûgriftan pişan bidet û bêxte berçav” (Perêz Sabîr, 2006 :50) di nav romana xwe da. Wate erkê romannivîsî di romanê da tenê bi wê çendê tê dîyarkirin ku tenê bahsê arîşên civakî bike. Bêku çareserîyekê bo wan arîşan dîyar bike. Pêdivîye romannivîs di nav civakê da bijît daku hest bi êş û azar û arîşên civakê bike. Herwisa bi zimanê wan biaxive bibe zimanihalê civaka xwe. Romanên wî rengvedana jîyana xelkê civakê wî bît. Romannivîs bi vê çendê jî pitir nêzîkî rêbazeka edebî dibe ku giringîyê bi wênekirina ketwarê jîyana civakî dide. Ew rêbaze jî rêbaza realîzmê ye ku rêbazeka edebî ye rengvedana rastîya jîyanê dikin. Bi taybetî jî “realîzma rexnegirane ewa berbelav bûyî li sedê 19 ku bitenê behsê nexweşî û xemên mirovî dikir” (Reca’ ‘Îyd, 2000: 142). Kewate ev rêbaze bitenê bi wênekirina arîşên civakî radîbû bêku çareserîyekî bo wan arîşan dîyar bike. Têrwanîneka reşbînane bo ketwarî hebû. Hewla çareserkirina arîşên civakê nedida. Tenê romannivîsî behsê wan arîşên civakî dikir. Di nav berhemê xwe da dixistine berçavan. Bêku amajê bi çareserkirina wan bike.

2- Pêgîrbûn Bi Baskirina Arîşên Jîyanê û Vedîtina Çareserîyan

Ev pêgîrbûna romannivîsî di romanê da bitenê li ser wê çendê ranawestît ku erkê romanê baskirin û berçavkirina arîşên civakî bît. Belê erkê romannivîsî di romanê da ewe jî ku “çareserkirina wan arîşan bike bi rêya beşdarbûnê di guherîna ewî ketwarê nalebarê heyî û kêşana wênê wî ketwarê ku pêdivîye dirust bibît û cihê ketwarê kevin bigirît” (Ebdulkerîm Mistefa, 2012: 89). Kewate romannivîs hewildidet bi rêya romana xwe derbirînê ji arîşên xwe yên kesokî yan jî ji arîşên kesîn nava civaka xwe bike. Rêge çareyekê bo wan arîşan dîyar bike. Ev çende jî di nav rêbaza realîzmê da hatiye weku armanceka bilind û hêvyeka pîroz bo pêşvebirina civakê ku kar dike li ser ronkirina jîyanê bi rêya jinav birna arîşên civakê bi rêya realîzma sosyalîstî” (Reca’ ‘Îyd, 2000:143). Kewate rêbaza realîzma sosyalîstî bi vê

çendê jî têrwanîneka geşbînane hebû beramber ketwarê jîyana civakî ku hewildaye çareserîyê jî bo wan arîşên di nav civakê da di nav berhemî da dîyar bike.

Çunkî erkê romannivîsî tenê ew nîne rexnê li civakî bigirît. Yan jî têbigehînit ev rêya li ser diçe ya xelete û ne rêya pêşkeftinê ye. Belê divêt rêya rastîyê bo dîyar bike û bêxite ser rêya rast. Her weku “Cigerxwxin” dibêjît “hozan û edîb weku kesekê zana û bisporekê pîroz nexweşî û dermanê miletî didê xuyakirin tîne berçavan. Bi kurtî hozan gereke xwe bimirînê daku milet nemrê. Xwe bide kuştin daku mirovayetî neête kuştin” (Perêz Sabîr, 2000 : 517). Ji ber hindê jî erkê romannivîsî tenê ew nîne berhemekê hunerî ciwan binvêsit. Belê divêt li serbarî vê çendê jî divêt romannivîs giringîyê bi naveroka romanê jî bidet ku xizmeta civakî û mirovayetî bike. Herwisa Şîrko Bêkes dibêjît “edebê nû hunermendê evro, wê dinyayê ava dike ku wî bi xwe bawerî pê heye û di xeyalawî daye, ne ew dinyaya têda dijît berdewam divêt ... bi cihbihlêt û sînoren wê bişkênît, ew dinyaya ew reddike ji ber ku tamam nîne, ji ber ku hatîye pîskirin. Ji ber ku divêt paqij biketve û bigehînite wî astê nimûneyî ew xewnê pêvedibinî” (Perêz Sabîr, 2006 : 519) bi vê çendê jî kewate divêt romannivîs pabend bît. Bi guherîna jîyana civakê û xwe berpirsîyar bibînit. Beramber arîşên civaka xwe û xudan helwîst bît. Bo avakirina civakekê ku romannivîs xewnê pê ve dibînit.

Kewate roman ji civakî ye bo civakî ye. Anko civak egerî ji dayîkbûna romanê ye û pêdivîye ev romane bibît pirek bo berev pêşvebirina civakî. Kewate pêgîrbûn helwîst wergirtin û hestkirin bi berpirsîyaretîya azadane ye beramber arîşên civakê. Bê ku ji layê derekî ve li ser romannivîsî bê sepandin. Daku bibe edebê propagendê û bangeşekirinê bo layenekê dîyarkirî. Anko edebê pêgîrbûyî bi taybetî roman ji layê endamekê civakê ku romannivîse tê afrandin. Tê arastekirin bo xwandevanî bi armanca hişyarkirin û guherîn û berev pêşvebirina civakî.

1.7. Binemayên Rexna Civakî

Her metodeka rexna edebî dema serhildet, komeka binemayan diafirînît. Daku li ser ronahîya wan têksit bê şîrovekirin û serederê digel têksitê edebî da bike. Dê bizavê keyin binemayên rexna civakî di çend xalan da dîyar bikeyên:

1- Metoda rexna civakî ‘biwarê civakî bi serokanîya wate û nivîsîna têkistî danît. Giringîyeka mezin bi peywendîya navbera edebî û ketwarê civakî û şaristanî

dide. Wate edeb rengvedana wê cîhanbînîyê û mîlmilanêye ku di ketwarê civakî da heye” (Heme Mentik, 2018: 73). Belê nivîskar rengvedana hişyarîya ketwarî bi renekê rastewxwe nake. Belê hişyarîya çalak ku ji layê nivîskarî ve tê derbirîn dîxîte ser ku ji encamê helwîstê nivîskarî ye ji wî ketwarî ku bi cîhanbînîya nivîskarî yan jî ew çîna nivîskar di nav da dijî tê nasîn. Herwisa wê çendê dîyar dike, çawa nivêsinê rivişteke civakî wergirtîye. Kewate pitir girîngîyê vekolîne li ser hevbendîya edebî bi civakî ra dike û karîgerîya dolayenîya yan dîyalêktîya wan li ser hevdû.

2- Rexna civakî “ew rexneye ku li dur edebekê civakî digirît û behsê xemên miletekê bike û biwêrî li ser dab û nerîtan û zulmê û bin destîyê rabiwestît” (Bengîn Îbrahîm, 2014 : 35). Kewate pitir girînge bi wî edebî didet ku mijarên civakî di nav xwe da hembez kiribin. Herwisa edebî bi civakî ve hevbendike, berê xwe detê weku zimanihalê civakî ku derbirîne ji jîyan dike. Ji ber ku jîyan kerestê edebîye û babetên xwe jê werdigirît. Edeb derbirîne ji civak û xem û arîşên mirovî dike.

3- Yek ji binemayên dî yên rexna civakî “ewe ku bahs li arîşên civak dike ku behra pitira xelkê pêdinalin ta ku hişyarîya cemawerî bike û bibe palderek ewan arîşan bi her rêyakê çareser biken” (Îhman Mihemed, 2017: 100). Ji ber ku armanca rexna civakî baştirkirina civakîye û dîyarkirina kêşe û arîşên civakî û dîyarkirina çareseryan bo wan. Kewate daxwaza pêgîribûnê ji nivîskarî dike ku xudan helwîst bît beramber arîşên di nav civakê da.

4- Rexna civakî “metodeka rexneyîye pitir girîngîyê bi naveroka têksîtê edebî dide” (Karzan Kerîm, 2009: 33). Kewate rexneka naverokîye girînge bi naveroka têksîtê edebî dide û li ser radiwestît di vekolîn û şîrovekirîne da. Wesa dibinê edeb nameka civakîya armancdare yan jî siruştêke civakî heye.

5- Metoda rexna civakî bi giştî û arastê rexna Marksî bi taybetî du binemayên serekî hene “yê yekê siruştê edebî yê duwê armanca edebî” (Îbrahîm Xelîl, 2002: 53). Sebaret siruştê edebî ewe ku têksîtê edebî rengvedana ketwarê civakî ye. Belê derbareyî armanca edebî. Girêdaye bi helwîstê nivîskarî sebaret wê mîlmilanêya nav civakî da heye. Herwisa ev arasteye edebî bi serxana civakî ve girê dide ku rengvedana jîrxan aborîye. Herwisa edebî beşek ji îdolojîya nivîskarî û civakî dibinît.

6- Li dîv rexna civakî “pêdivîye berhemê edebî di kujîyê wê yê civakî ra bê vekolîn û dûvçûn li ser delaletên civakî û derbirînên edebîyên berhemî bêkirin” (Ni’metullah Hamid, 2011: 84). Herwisa ewan rihurîşalan destînîşan dike ewên berhemi têda peydabûyî. Ramanên berhemî li ber ronahîya ewî civakê nivîskar tê da jîyayî rave dike. Kewate civak rêya têgehiştinêye bo têksitê nivîskarî.

7- “Dîyalêktîya peywendîya kartêkirin û karîgerya edebî û ketwarê civakî û şaristanî, ew jî bi ramana retkirina wergirtina karê edebî bitenê wek rengvedan bo vî ketwarî” (Mihemed Hafiz, 1983 :66). Kewate tîora rengvedanê ku binemayekê girînge rexna civakî ye ku têrwanîna wê wesaye têksitê edebî rengvedana ketwarê civakîye. Belê ne veguhastineka rastewxwe ye. Belê helwîstê nivîskarîye sebarete vî ketwarî. Kewate rengvedaneka rêjeyîye. Kewate berhemê edebî kartêkirinê li civakî dike û civak jî kartêkirinê li berhemê edebî dike.

8- Rexna civakî “rexneka şîrovekarîye berev naveroka karê edebî ve diçe ... rexnegir hewildidet bi rêya dîyarkirina delaletên civakî û mêjûy û derunî yan hinek dîtir jî di vî karî da, ji wî riwanga hî ku edeb rengvedana civakîye. Û rexneka biryarî û hewsengadinêye ji bihayê wî nivîskarî bilindike ku pêgîrbît bi keysên civaka xwe û derbirînê jê bike” (Welîd Qesab, 2007: 39).

9- Rexna civakî “jîngeha civakîya nivîskarî li ber çav wergirît. Herwisa dupatîyê li wê çendê dike ku berhemê edebî derbirînê ji wê çînê dike. Ya ku nivîskar bi ser ve û ew fakterên civakên bûne eger bo afrandina berhemê edebî. Çunkî her nivîskarek endameke di civakî da, di şîyandaye weku canewerekê civakî bê vekolîn kirin” (Ehmed Yasîn, 2015:104). Kewate ya pêdivîye xwandina berhemê edebî dê wê jîngeha civakî da bikin. Ewa berhem tê da hatîye afrandin. Ji ber ku nivîskar jî endamekê civakîye. Ew dîyarde û arîşe û rûdanên di nav civakî da serhildayîn dibine palderek bo afrandina hestên wî û afrandina berhemekê edebî. Çi babet û mijarên berhemên xwe ji serbora xwe ya kesokî yan jî ji civakê di nav da dijî wergirît.

10- Li dîv rexna civakî “nivîskar demê rengvedana kawdanên civakê realîstî dike. Helwîstê xwe yê hizrî û felsefî jivan kawdanan pêşkêş dike. Her weku veguhêzrêner û rexnegir” (Welîd Qesab, 2007: 37) hewildide civakekê nimûneyî di nav berhemê xwe da amajê pêbike. Rexnê li civakê realîstî bigrît bi merema

pêşkeftina civakî. Ji ber ku edeb di şîyandaye weku amîretekê bo parastina rêxistina civakî di nav civakî da rolê xwe bigêrît.

11- Di nav rexna civakî da têgehê cîhanbînê têgehekê girînge ku tê nasîn bi têrwanîn û berxwedana nivîskarîye yan wê çînêye ya ku nivîskar di nav dijît. Kewate “edeb û felsefe derbirîn cîyawazin ji cîhanbînîyê, cîhanbînî tenê têrwanîn û rastîya takekesî nîne, belê têrwanîna civakî jî ye” (Heme Mentik, 2018: 71) bo ketwarê civakî û cîhanê ku hizr û hest û daxwazîn wê çîn bi xwe ve digrin ya nivîskar di nav da dijît. Ew cîhanbînîye jî ya ku nivîskar di nav berhemê xwe da amajê pêdike bo çareserkirina kêşên civakî. Kewate cîhabînî hişyaryeka çalake ji encamê hişyarîya ketwarî peydabûye. Ji ber ku edeb tê derbirîn bi rêya ziman û peyvan û cîhanbînî helwîstê nivîskarîye ji civakî û cîhanê.

12- Rexna civakî ew civakê nivîskar di nav da jîyayî yan ew civakê berhemê xwe di nav da afrandî dike kilîlek yan pirek bo têgehiştin û ravekirina berhemê nivîskarî. Kewate civakî dike rêya têgehiştina berhemê edebî. Herwisa ya fere rexnegir palderê nivêşîna berhemî ji layê nivîskarî ve dîyar bike. Evca çî palderên civakî bin yan kesokî bin. Mebesta nivîskarî ji nivêşîna wî berhemî çîye û vîyaye çî peyamê bigehênîte civakê bi rêya berhemê xwe.

13- Rexna civakî pitir girînge bi edebê pêgîrî dide. Ew nivîskarê xwe dan helwîst bît beramberî arîşên civaka xwe. Pêgîribûna nivîskarî bi rengvedana civakê û helwîstê nivîskarî ji arîşên di nav civakî da. Pişandana arîşên civakî û dîyarkirina çareserîyan bo wan arîşan. Herwisa girînge dete zimanê gotara romanê û berçavkirina delaletên wan yê civakî. Dîsan girîngîye dete xwandevanî ji ber ku nivîskar berhem û peyama xwe bo wî araste dike bi armanca hişyarkirina xwandevanî bi wî civakê di nav da dijît û guherîna civakî û avakirina civakekê baştir.

14- Rexna civakî şîrovekirineka civakîyaneye di têksitê edebî da. Civak gelekî dergehan bo rexnegirî ve dike bo şîrovekirina têksitî. Vêca çî ev civakê nivîskar navda jîyayî yan jî berhemê xwe di nav da afrandî.

2. RENKVEDANA BABET Û ARÎŞÊN CIVAKÎ DI ROMANÊN “STOKHOLMÊ TE ÇI DÎT BÊJE” û “XWEŞÎYA BI ÊŞ” DA

2.1. Babet û Arîşên Civakî

Rexna civakî pitir girîngîyê bi naveroka berhemê edebî dide. Bi taybetî jî babet û arîşên civakî di berhemê edebî da. Ji ber ku “ naverok jî ew hizra ku di bingehê kerestê da cî girtîye”(Babê Nazê, 2010: 13). Anko ew hizre ya di nav berhemî da hatîye derbirîn. Naverok jî, weku kurbûna bingehê berhemê ji sê elementan (waran) dihête avakirin:

1- Têmatîk (Babetî) : Anko hizra bingehîn di berhemî da.

2- Prublomatîk (Arîşayetî) : Anko arîşa ku ji babetî dertê.

3- Palder (Pafus) : Anko hest û helwesta afrînêr (nivêser) beramberî arîşe, çî di çareserkirinê da û çî di pêşkêşkirina wê da” (Babê Nazê, 2010: 16). Kewate babet û arîşe û digel helwesta nivêser beramber arîşên civakî ji elemêntên naveroka berhemê edebî ne. Babet “ ew tiştê ku dibe hizra sereke, di berhemê edebî da û li gora nêrîna nivêserî peydabûna arîşe” (Babê Nazê 2010: 30). Anko babet komek ji arîşên jîyanêye ew buyerên ku nivêser li ser dinivêsit. Û pêdivîye di nav wê mijarê da ya li ser dinivêsit û li ser radiwestit arîşeyek hebît. Belê arîşe ew pris û arîşên ku ji layê nivserî di berhemê edebî da, tînedanan û pêwîstîya xwe bi çareserkirinê hene. Dişet nehête çareserkirin û dişet bihête çareserkirin. Kewate arîşe “ji bêjeya Yunanî a “problema” hatîye û wateya muhume, armanc distîne” (Babê Nazê 2012: 55). Kewate arîşetî ew arîşene ku dihundirê babetê berhemê edebî da peydadibin. Evcar ew arîşên serekî bin yan lawekî bin. Weku arîşên civakî exlaqî sîyasî aborî... Herwesa nivêser helwest û cîhanbînîya xwe beramber wan arîşên civakî di nav berhemê xwe da derdibrît. Çî bi berçavkirina wan yan jî bi çareserkirina wan jî bît. Kewate babetên civakî naveroka wan arîşeka civakî li xwedigre. Arîşên civakî “ birîtîye ji wê nerêkî û nehevsengîya ku tuşî binyatê civakî dibît. Pêdivî bi çareserkirinê ye” (Fuad Reşîd, 1995: 12). Herwesa arîşên civakî “ rûkareke ji rûwaletên nebûna rêkxistna civakî yan helweşyana civakê. Bi rengê giştî kardikine ser takekesî û komê û civakê... rêkeftinek li ser wê çendê heye eger me vîya dîyardeka civakî bi arîşeka civakî bi hejmêrîn. Pêdivîye civak hest bi hebûna wê biket. Li dîvra jî pêdivî ye karkirineka bi kom rêkxistî hebêt bu çareserkirin û rizgarbunê ji xirabên wê” (Îhsan Mihemed, 2012: 470). Anko her dîyardeka civakî bi arîşeka civakî nahête hijmartin. Romannivêser jî weku kesekê hestîyar di nav civakê da zûtir hest bi arîşên nav civakê diket.

Hewil dide bi rêya romanên xwe civaka xwe ji van arîşan agehdar yan haydar biket. Yan jî çareserkirina wan arîşan jî bixête berçav. Miletê Kurd jî ji encamê çend egerên civakî û sîyasî û mêjûyî rûbirûyê gelek arîşe û pirsgirêkên civakî bûye. Van arîşe û pirsgirêkan di nav romana Kurdî jî da rengvedaye.

Romannivês Babê Nazê jî beramber arîşên di nav civakê da bêhelwest nebûye. Arîşên civakî di romanê wî da rengvedaye. Emê hewilbidin ew babet û arîşên di romanên wî “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşya Bi Êş” da hatîne azrandin berçav bikin. Herwesa cihanbînî û têrwanîn û helwestê wî yên rexney sebare van babet û arîşên civakî di her dû romanên wî da amajê pêbideyîn bi deyin xuyakirin. Bi rêya amajedan bi wergirtina wan peregirafan ku xizmeta vê mijara vekolîna me biket. Dîsa dê li dîf binemayên rexna civakî herdu romanên Babê Nazê “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşya Bi Êş” dixîne ber tişka rexneyên xwe.

2.1.1. Kurtîya Romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje”

Navûnîşanê romanê ji navê bajêrê Stokholmê ku cihê bûyerên romanê lê hatîne rûdan hatîye wergirtin. Weku pisyarekê hatîye arastekirin bo vî bajêrî “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” rengvedana naveroka romanê diket. Navûnîşanekê balkêşe bo mijara navxwe ya romanê. Ji ber ku girêdayî pîrsa vekolîne ye bi Babê Nazê ra li ser kuştina serokwezîrê Swedê Olof Palme. Romannivês vîyaye bêjît her weku di nav romanê jî da dibêje Stokholmê te wê şevê çî kesek dîtîye serokwezîr kuştîye bêje. Stokholmê tenê tu rastîye dizanî û kanê tomikên te da rastî bête holê. Stokholmê bo çî tu bêbextîyê qebûl dikî. Li berî despêkirina romanê bi hozan Abdulrehman Mizûrî, ya bi navê " Eger Ez " hatîye nivisîn:

Ew landika nav daye min

Ew kanîya av daye min

Ew dara sîtav daye min

Dar û bera tê wer nakim

Tê wernakim (Babê Nazê, 2012: 9).

Ev hozane jî rengvedana naveroka romanê diket û penda Kurdîya demê bavî Bêkes amojgarîgarî li diket dibêjît:

"Kurê min, çala ku tu avê jê vedixweyî, kevir neavêjê!" (Babê Nazê, 2012: 70).

Anko Kurd wisa hatine perwerdekirin di kultûra wan da jî wisaye heger ava welatekê vexwar êdî bera di xelkê wî welatî wernakin. Zerere nadene wan kesê qencî lê wan kirîye. Babê Nazê jî dibêjît ji ber ku Swêdê weku koçber li welatê xwe hewandim min ava welatê we vexwar êdî dê cawan zerere gehînîme hawlatîn we ev çende ne ji dab û nerît û kultûra Kurdaye. Ev romane weku helwest wergirtinekê beramber tawenbarkirina xwe bi bê bextîyane nivêsiye. Bo gehandina peyama xwe weku alavekê bo bergêrkirinê ji xwe û Kurdan bi giştî nasandina kultûra Kurdan bi xwandevanê bîyanî û nasandina kultûra rojavayî bi xwandevanê Kurd. Dîvda jî romanê dest pêkirîye bi wesifkirina kesayetîyê serekê romanê ku navê wî Mustefa ye û nasnavê wî Bêkes belê di romanê da pitir weku Bêkes derbazdibe, bi xwandevan daye nasîn:

"Mirovekî nav û ser, bejin dirêj, difin beranî, bi çavên hingvînî û bêwate, xwedî dîmek ne grover, ndrêj û purekê bi ser reşayî ve diçû, ji avayîyek mad tal derket" (Babê Nazê, 2012: 9).

Kesayetên di romanê da Bêkes û bav û deyîka wî û pîreka wî û mamê wî, komîsar û Lîza Rusî û kurê wê Edward, kalkê wî, Katya Rusî, Îva ya Swêdî, wergêr, Comerd Kurd û Vîra hevjinî Comerd, zarokên wê, Îvan, Tanya û kurê wê, Sonya, Birîgîta, hunermend, jinka deyîka Bêkes xwedî kirî. Lê piranî axivtin ser zimanê Bêkesî û komîsar û bavî û Lîza û Katîya derbazdibin di romanê da û Bêkes û Lîza weku kesayetî serekî di romanê da xweya dibin. Yê din jî weku kesayetên lawekî xweya dibin di romanê da. Û bi vî rengî Lîza daye nasandin wesf kirîye.

"Jinek navûser bi dîmek ne li hevhatî, lîvên mezin û terkî û didanên firk derî ji Comerd û Bêkesî revekir" (Babê Nazê, 2012: 78) .

Cihê rûdanên romanê bajêrê Stokholmê ye li welatê Swedî. Bûyer yan rûdana romanê bûyereka rasteqîneye ku bi serê nivîskarê romanê bi xwe hatiye ku Babê Nazê ye demê li welatê Swêdê koçber. Piştî kuştina Olof Palme serokwezîrê Swêdê, Babê Nazê

dihête gunehbarkirin bi kuştina Olof Palme vekolîn digel dihête kirin. Babê Nazê di vê romanê da bi hurgulî balê dikêşîne ser vê bûyer û vekolîna komîsar ligel wî ew dîyaloka di navbera wan da derbazbûye behisdiket. Vedgere zaroktîya xwe jîyana xwe ya zarokî û xîzana xwe bahsdiket û amojgarîyên Babê wî bo wî. Balê dikêşîne ser egerê gunehbarkirina xwe. Herwesa nasîbûna xwe bi Lîza ya Rûsî ra ew egerên hiştîye Lîza gileyîya wî biket li dev polîs Swêdê û vekolîn ligel bihêtekirin. Herwesa behsê mayina xwe li mala Lîza diket û ew şevibêrîkên li mala wê dihatine li darxist û eger derketina xwe ji mala wê û taku li dumahîka romanê bê gunehîya Bêkes dihête xweya kirin dihête berdan piştî vekolînê pêra. Di nav romanê da balê dikêşîne ser kultûrê Kurdî û herwesa kultûrê rojavayî. Di nav da jî balê dikêşîne ser gelek arîşên civakî li jîyana koçberîyê. Roman bi vî rengê bi dumahîk hatîye. Demê Bêkes li ser rêya veeger di pasê da bu mala xwe jineka Swêdî temaşe wî diket. Ew jî ditirist careka dî agehdarî bidet polîsan ji ber vê çendê Bêkes li ser dikete qêrîn. Jinaka Swêdî jî dibêje:

“ *Dîne me nebesê mebûn, dînen bîyanîyan jî li me zêdebûn!* “ (Babê Nazê, 2012: 153)

2.1.2. Kurtîya Romana “Xweşîya Bi Êş”

Navûnîşanê romanê balkêşe dişet serenca xwandevanî bo xwe bikêşît. Ji du peyvên dijberîhev xweşî û êş pêkhatîye. Evê çendê jî ciwanîyek daye navûnîşanî. Dîsan rengvedana naveroka romanê jî diket ku hatîye avakirin li ser xweşî û ne xweşî û êşa keçê di nav civaka Kurdî da romanê bi vî rengî dest pêkirîye. Bi wesifkirina kesatîyeka serekîya romanê ew jî mamoste Şahîne bi vî rengî bi me daye nasandin.

“*Eve bûye pênc sal ku mamosta şahîn, hevîna xwe wînda kirîye. ligel ku dû zarokên wî bibûn xwedî mal û zarok û temenê wî hema bêje bi ser şêst salî ketibû, lê her jineke dî ji bo xwe nexwest û mabû*” (Babê Nazê, 2016: 5).

Dîsan kesayetîya duwê jî ku Sûlave bi vî rengî bi me dête nasîn:

“*Keçeke ku nivê temenê wî kirbû, di heman destgeha karê wî da dest bi xebata xwe kir, Bi rastê jî, Sûlavê ji sinêltîya xwe, heta qertibûna xwe ku bi ser sîhsalî ketbû. Her dem şermoktî jêre dibû heval û weku poşîyê wê digirt ser rûyê wê*” (Babê Nazê, 2016: 6).

Kesayetên di romanê da beşdar; Şahîn mamosta zankoyê, Sûlav xebatkar li zankoyê bav û dayîka wê, Medya hevala Sûlavê û bav û dayîka wê, keça hevala Medyayê ku Medya bîranîn wê dixwene ku amaje bi navê wê nedaye. Hevala wê keçê xwedîya naman bi navê Sekîne û mamostayê dibistanê. Lê kesayetîyên serekî divê romanê da mamosta Şahîn û Sûlav û Medya ye. Evên dîtir weku kesayetên lawekîne di romanê da. Cihê bûyerên romanê dibistan û zankoye lê amaje bi navê bajêrî nehatîye dan. Lê tene amaje bi peykerê Ehmedê Xanê hatîye dan. Bûyera sereke li ser hejêkirina di navbera mamosta Şahên û Sûlavê da ye ku keçeka qeyreye. Anko roman bi hejêkirina Şahîn bi Sûlavê ra destpêdîket. Dîvda jî Sûlav vedgere jîyana xwe ya zarokatîyê li bîra xwe dînêt. Nasbûna xwe bi hevala xwe Medya li dibistanê. Herwesa birêya xwandina bîrînan û namên keçekê ku hevala Medyayê balê dikşîne ser desdirêjîya siksî di jîyê sinêleyê da li ser wê keçe û evîna wê bi kurekê fileh ra ku Sûlav û Medyayê xwe nêzîkî wê keçe didîtin. Sûlavê ji layê dest drêjîkirinê ve û Medyayê ji layê hejêkirina bi kurekê fileh ra. Dibe jî Sûlav û Medyayê vîyaye behsê xwe biken bi rengekê nerastewxwe ji ber ku di civakê da behiskirina her dû mijaran hêlên sor dihêne hijmartin. Birêya name û bîrînana keça hevala Medya balê dikşîne ser van mijaran ji ber ku Medya dibêjit Sûlav ev keçe wekî min û te ye bi taybetmendîyên xwe. Sûlav egerî qeyrebûna xwe bi me dide nasîn. Amajê dide dab û nêritên civaka Kurdî û neazadîya keçe di nav civakê da. Dîvda jî Sûlav behsê hejêkirina kurekî diket ku dil ketbûye wê û egerî nerazîbûna xwe dete dîyarkirin bi evîna wî kurî. Dîsan Medya jî behsê heşkirina xwe bi kurekê ra diket pişt ra jî diçîte Ewropa ligeli wî kurî dijît. Dîsan roman vedgere ser hejêkirina Sûlav û Şahîn li zankoyê xwastina destê Sûlav ji layê Şahîn ji wê bi xwe pişt ra jî ji Babê wê razîbûna wan. Roman bi pêkênana hevjinîya Şahîn û Sûlav bi derbirîna hesta evînê dihundirê Şahîn û Sûlav bi dumahîk dihêt. Demê Şahîn hesta xwe derdibirit dîvda jî Sûlav bi vî rengî:

“ û ewî bê hemdî xwe, di hinava xwe de got : ” dîyare, egerê berdewamîya jîyanê eve! ” Sûlavê jî bê şerm derbirîna hesta hinava xwe dîyarkir : ” wey Xweda! Min çqas xweşî, ji jîyana xwe winda kir! û nuka jî, ez têgehiştim, “Xweşîya Bi Êş” çî ye! ” ” (Babê Nazê, 2016: 88).

Ev xweşîye jî;

“Ew hingvandina gîyanê wî bi gîyanê wê re û pêre givaşandina dû laşan ji hevi re”
(Babê Nazê, 2016: 88).

Li demê du gîyan û dû rih Şahîn û Sûlav biryar dan hevînyê pêk bîn. Laş û gîyanê xwe li hev têkel û parvebiken. Û jîyanka bi hevira pêkve biborînin. Di çarçovê xêzanekê da weku navunîşanê romanê bi xwe ku “Xweşya Bi Êş” e dixweşî û nexweşyan da bihevira bijîn û jîyana xwe derbaz biket. Ji ber ku pêkînana jîyana hevînyê hîvîya her keçekê û kurekê ye di nav civakî da. Dê vê romanê da jî hêvî û xweşî û êşa keçekê di nav civaka Kurdî da bi me daye nasandin. Tîşxistîye ser çend arîşên civaka Kurdî bi taybet jî yên bi keçê ve girêdayî di nav civakî Kurdî da.

2.2. Renkvedana Babet û Arîşên Civakî Di Romanên “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşya Bi Êş” Da

Renkvedana babet û arîşên civakî di romanên “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşya Bi Êş” da ev arîşên jêrîn jî di nav xwe da hembezkirîne:

2.2.1. Tawanbarkirina Bi Bêbextî

Mijar û babetê serekîyê vê romanê ji bûyereka rasteqîneye hatîye wergirtin ku li welatê Swêdê li jîyan koçberîye li bajêrê Stokholmê bi serê nivêserê vê romanê Babê Nazê bi xwe hatîye. Romannivês li despêka romanê di gotarekê da bi navê “gotinek divê” tîşxistîye ser vê rastîyê demê dibêje “bi kuştina Olof Palme, em Kurd ji du alîyan ve êşîyan, ji alîyekê ve me dostekî hêja winda kir û ji alîyê din ve bi her awayî pêkol dibe ku ev kuştina bêrûmet hûstîyê gelê me kevne. ... Ji ber vê yekê, bi kuştina Palme êşa me dû alîye”(Babê Nazê, 2012: 7).

Demê li sala 1986 li 28 Sibatê li se'et yazde û çarêkekê şevê serokwezîrê Swêdê Olof Palme li bajêrê Stokholmê ligel hevîna xwe ji sînemayê derdikeve. Ji layê kesekê nenîyas ve dihête kuştin. Babê Nazê jî yek ji wan kesan dibe yên vekolîn digel dihête kirin. Dibêje “ ez mutem bûm û gunehbarbûm bi kuştina Olof Palme tehqîq yan vekolîn ligel min kirin. Û piştî heşit rojan ji vê bûyerê min dest bi nivsîna romana xwe kir”(Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 22.11.2018). Romannivês egerî gunehbarkirina xwe li despêka romanê bi vî rengî dete dîyarkirin.

“li welatê wî mirovî, qîşla polîs weha bi nav dikirin. ew derket bêy ku bizanibe, di heman rojê de, wêneyê kesê bi nav kujdarê serokwezîr, yê ku rewîştên wî bi xwe, têde dihatin bercestekirin, hemû rojnamên stokholmê de belav bibû” (Babê Nazê, 2012: 9).

Ji ber ku ew şahidên li demê kuştina serokwezîrî kujdar dîtûn birêya vegêran wesifdayina wan ji kes kujdar ra polîsan wênekê xeyalî ji kujdarî ra çêkribûn û di rojname televizyonên wî welatî da belav kir bû. Dê vê peregrafê da amajê pêdiket:

“di ber kîşka rojinemeyan re derbaz bû. Bi derbazbûnê re, bê hemdî wî awirên wî, li wêneyekê ketin. Bi nerîna pêşî jî wî xisletên demê xwe têde dîtin” (Babê Nazê, 2012: 13).

Anko Babê Nazê jî bi xwe danpêdanê diket ku ew wênê xeyalîyê hatîye çêkirin bi xesletên xwe wekî yên wî bi xwe bûn. Herwesa di peregrafa pişra jî dibêje,

“ bi çavên ne bawerkirî temaşeyî wêneyî kir. Ew weha mîna wî bû, heya wî bi xwe, Ji xwe re got :” ev ji birayê min bêtir di şibe min... “...Û ewî ji xwe re got : “loma li min digerîyan! (Babê Nazê, 2012,13).

Belê seray wê çendê Babê Nazê di peregrafeka dîtir da dibêje;

“ ew wêne ji xeyalên çend şahidane û bi harîkarîya teknîka nû ” aşop bû heyîn û realîtê “... Her yekê dihişê xwe de, demê mirovê pêrghatî datanî ber wênê bi nav kujdar. (Babê Nazê, 2012: 15).

Babê Nazê hest pêdiket ku mafê wî hatine pêşîlkerin bê bextî lê hatîye kirin. Û digel bajêrê Stokholmê da dikevite dîyalokê dibêje

“ Stokholmê, tenê li ser te maye, de bêje wê şevê te çî dîtîye! Ma çima tu bê bextîyê pesend dikî? ” (Babê Nazê, 2012: 40).

Bi renekê rexnegrane helwestê xwe li ser tawanbarkirina xwe bi bêbexî derdebirît. Ew jina Babê Nazê di mala wê da li jureka xanîyê wê da aknicî bî bû ku wê jinê Babê Nazê yan jî bîkes weku xuştivîyê xwe dihesiband. Ji eger xîyanetê di navbera wan da demê Lîza Bêkes di mala xwe da bi keçek dîtir ra dibînit. Herwesa jî Bêkes jî Lîza bi kurek ra dibînit. Dibe eger têkçuna peywendî di navbera wan da. Belku her ji ber van nakokîyan jî bît Lîza gileya wî kirbît li dev polîsan. Ji ber dilmayîna wan ji hevûdû ji ber ku Bêkes got bû Lîza êdî ez li mala te namînim wê şeva serokwezîr hatîye kuştin ji mala wê derket bû. Polîs vê pisyarê ji Bêkes diket:

“Çawa te Lîza naskir û te kengî naskir? Û çima di heman roja kuştina serokwezîr de, tu ji mala wê derketî? Ji bo ku Bêkes li ber polîs xwe dûrî pêwendîyek evînî bike, mebesta komîsar ji vê pîrsê çî ye ravekir û ev delîlek ji delîlên reva ji pîrsê bû” (Babê Nazê, 2012: 63).

Li vir romannivêş bi me dete xweya kirin neviyaye polîs bizanît ku peywendîyeka evînî di navber Lîza û Bêkes da ye lê ji berdewamîdana romanê dîyardibît evînî yek heye heger evîneka yek layî jî bît ji layê Lîza bu Bêkes li Bêkes evîna xwe bu Lîza dîyarnaket. Di nav romanê da. Her çende li mala wê maye pêra razaye danpêdanê bi vê çendê diket demê Bêkes ligel keçeka dî dibînit dibe eger şere devê di navbera wan da. Dîvda jî bi vî rengî amajê pêdiket di vê peregrafê da:

“ Wê roja ku Bêkes ji mala Lîza derket, bi şev, li ber nîvê şevê serokwezîr bi destê hinekan hate kuştin. Paşî sê rojan ji bûyera kuştina serokwezîr Bêkes vegehiya male da ku hûr û morên xwe li mala Lîza bibe û wî nizanîbû ku roja duyê ji kuştinê, Lîza telefon ji polîs re vekrîye û agahî daye wan “ ku mirovekê Kurd bi navê Bêkes li cem bû û ji şeva kuştina serokwezîr nehatîye malê. Bi vê danana agahîye Bêkes kete deftera polîs, bê ku ew zanibe. Tenê gava ew hate mala Lîza, ewê bi car car jê re got: Polîs li we Kurdan digere û li te jî... Li min? Bêkes bi tirs pîrsî. Erê li te... Çima li min? Ezi ç zanim, here cem polîs bela ew ji te re bêjen çima. ... Bêkes... zû bi zû, bi harîkarîya hevalê xwe, li ser cîyê xwe polîs agehdar kir” (Babê Nazê, 2012: 145).

Herwesa Bêkes li ser vê mijarê dibêje:

“ vê bê Babê çî derew kirîye û hebe nebe, wê barê min li cem polîs giran kirîye. Nedûre ku egerî derketina min ji mala wê bi kuştinê girêdaye” (Babê Nazê, 2012: 70).

Bi vê çendê jî xweya dibe ku Lîza agehdarî daye polîs li ser Bêkes heta ku vekolîn ligel kirîye. Ev êk ji wan egerên tawanbarkirina wî ye. Lê hindek egerê dî jî hebûn di vê peregrafê da dîyardiket dibêje:

“ kê gelacîya min kir û heger ez ne Kurd bûma, we yê guhbida gelacîya li ser min? (Babê Nazê, 2012: 146).

Babê Nazê egerêkê dî tawanbarkirina xwe dizivrîne wê çendê ji ber ku Kurde egerî serekî ev çende bû. Eger wê ne nehatiba tawanbarkirin bi vê guştinê. Ji ber vê çendê jî Bêkes ji komîsar pirsyar diket:

“Komîsar, ma çî berjewendîya Kurdan bi kuştina serokwezîrê we heye? ... Komîsar bi rêya wergêrî li Bêkes vegerand - mane hûn bûn, ên ku cara pêşîn paşî sî sed salî ji kuştina sîyasî li welatê me, hûn bi kuştina polîtîkî rabûn. Bê guman heger we berê li hundirê paytexta me kuştin ne kirba, me nuka şop nedbire ber derê we ...” (Babê Nazê, 2012: 30).

Bi vê çendê jî komîsar amajê bi wê çendê diket ku Kurdan salên berî nuke jî li Swêdê li ser sîyasetî hindê kes kuştine ji ber vê çendê jî şopa xwe birîye ser Kurdan. Bi vê çendê jî egerî tawanbarkirina Babê Nazê bu me xweya dibe. Êk ji ber haydarkirina polîsan ji layê Lîza ve ku gotibû wê şeva serokwezîr hatîye kuştin Babê Nazê ne vegeyîyaye mal. Dibe Lîza bi vê çendê rabubît ji ber nakokî di navbera wan da weku tolhildanek dijî xîyaneta Bêkesî beramberê wê ligel jineka dîtir da. Yan jî bu bi destxistina xelatê bû ku dîyarkirina kujdarî hatîye terxankirin. Du ji ber ku Kurd bû û berî wê serdemê jî hindê kes bi destên Kurdan hatbûn kuştin li ser mijarên sîyasî. Ya sê jî ji ber ku bi xeslet û taybetmendiyên xwe Babê Nazê weku wênê xeyalîyê kujdarî bû. Ev her sê egerne hiştîye Babê Nazê bi hête tawanbarkirin bi kuştina serokwezîr Swêdê bi bêbextîyane. Bê ku çî belgeyn dîtir li ser hebin. Pişra jî bê gunehîya wî ji vê kuştinê dihête dîyarkirin bê guneh derçît. Ev çende jî arîşeka civakî ye demê kesk bê ku belgên pêdivî li ser hebin bihête tawanbarkirin bi kuştinê. Ji ber vê çendê jî di vê peregravekî da dibêje:

“lewra vê bûyerê ne tenê destdirêjîya mafên wî wek mirov kirbû û weha jî guhertinek xistbû nerîn û bawerîyên wî” (Babê Nazê, 2012: 37).

Ev bûyera divê romanê da hatîye rengvedan ku bûyereka rastîye bi ser nivêserî vê romanê bi xwe hatîye. Romannivêsi ev bûyer kirîye hêvênê avakirina romana xwe. Herwesa Babê Nazê divê peregrafê da dibêje piştîkûlbûna wî ne ku ji şubheta bi " kujdar " re, lê ji ber navê Kurdan bû. Lewra, di salên dawî de, çend kuştin bi destên wan li Ewropa qewmîbûn. Wî di got:

“ heger hat û di sitûyê mexên, ne dewleta me heye ku me bihewîne û ne jî dostê dilşewat ...” Ji bo vê yekê, wî despêka kuştina serokwezîr, ji xwe re d'a kir : " Hema ne bi

destê bîyanîyan hatibe kuştin û ku hat û ew bin, de bela navê Kurdan nekeve nav pirsê ...”
(Babê Nazê, 2012: 14).

Li vir romannivêş jî axivtnê komîsar li ser mijara kuştina bi destê Kurda li eworpa pesendiket li wî serdemê berî kuştina Olof Palme serokwezîr Swêdî. Herwesa Babê Nazê dibêje:

“ heger xwedîyên min hebûna, ezê ne li vira bûma û ku xwedîyê me Kurdan hebûya, emê di radyo, televîzyon û rojnamên Swêdîyan de, divê pêlê de emê bê rûmet nebûna ” (Babê Nazê, 2012: 19).

Babê Nazê behsê ragehandina Swêdê diket dibêjît Kurd weku kujdar di ragehandina wan da di hatne pişan da. Bi renekî nerastewxwe nerazîbûna xwe li ser vê çendê radigehînit dibêje heger dewleta me heba wê ev çende di derheqa me da ne hatiba gotin. Ji ber vê bê xwedîya xwe jî li jîyana koçberî û navê qehremanê romana xwe jî kirîye Bêkes. Derbirîne ji Bêkesîya romannivêşî bi xwe dikeve li jîyana koçberîye. Bi vê çendê jî ew serdemê romannivêş tê da jîyaye karêgerîya xwe li ser wî kirîye û bandora xwe li ser romana wî jî kirîye. Herwesa regezê wî jî weku Kurd rolê xwe di tawanbarkirina wî da hebûye. Bi vê çendê jî romannivêş gelek êşyaye carekê ji ber rewşa xwe tawanbarkirina bi bêbextî. Carekê jî ji ber rewşa gel xwe diket. Herwesa Babê Nazê hest bi wê çendê kirîye te'day li wî hatîye kirin. Ji ber ku kesekê bêguneh bû çî peywendîya wî bi mijara kuştinê ve nebû. Babê Nazê dibêje:

“ kevrên qor zîbran û kevrên din nabin wek hev. Bi herfandina kevrên qor zîbiran, avayî heldiweşe û tê xwar. Heger mirov bi çûna xwe, wê tenê zîyanê bigehîne gîyanê xwe, êdî ew bi destê xweye. Lê belê, eger çûna wî, zîyanê bigehîne malbat û civakê, hîngê ew ne bi destê xweye ... ” (Babê Nazê, 2012: 37).

Li vir Babê Nazê amajê bi wê çend diket. Bi wê ramanê ku balê dikşîne ser wê çendê ku kuştina serokwezîr Swêdî ne tenê zîrar gehandîye wî bi xwe. Belku zîrar gehîştîye civak û malbata wî jî. Babê Nazê jî amajê bi wê çendê diket ku heger vê tawanê bêxine stuyê wî wê ne zîrar bigehe wî bi xwe. Lê dê zîrar bigehe civak û milletî Kurd bi tevahî. Babê Nazê penabirîye ber nivêşîna romanê weku helwest wergirtinek. Beramber tawanbarkirina wî ya bi bêbextî. Weku qêrîn û gazîyeka nerazîbûnê bû. Beramber wê rewşa derunîya ketîye di nav da. Ji bo rizgarbûn ji vê rewşê penabirye ber nivêşîna romanê

daku helwest û nerazîbûna xwe bi rêya romanê bi rengekê hunerî bigehîne xwandevan. Romannivêş penabirîye ber nivêşîna romana jîyanameyî. Parçek ji jîyana xwe û ew bûyer bi serî hatîye kirîye hêvin û kerestê romana xwe. Dibe ji ber wê çendê bît daku bê sansur li ser her mijarekê biaxivît. Rastî û xeyalê têkel biket. Belku nedişîya bi azadane di jîyanama xweyî da behsê gelek mijaran bike. Ji ber ku yek ji taybetmendîna jîyanama xweyî rast goyîye. Ji ber ku nivêskar neviyaye hemî mijaran bi rengekê rastewxwe li ser zimanê xwe bêjît. Penabirîye ber nivêşîna romana jîyanameyî ku delîva têkelkirina rastî û xeyalê di nav da heye. Û li ser zimanê qehremanê romanê ku Bêkes cîhanbînî û helwesta xwe derbirîye. Ji ber ku her weku rexnegirê Rûsî Bîlînsikî li ser romanê dibêje “ roman dastana jîyana taybete ku li ser qedera mirovekê taybete” (Omer Dewran, 2010: 52).

Romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” jî li ser ew buyera bi serê Babê Nazê hatîye li jîyana koçberê li welatê Swêdê hatîye nêvîsandin. Parçek ji jîyana wî tê da hatîye rengvedan.

2.2.2. Şîretên Jîyanê

Şîret weku rêyekê dihêne bikarênan. Ji layê şîretkarî ve bo baştirkirin û haydarkirina endamên civakî kesê şîret lêkrî. Bi merema nîşandana başîyê rêya rast û dirust dihêne bikarênan. Da ku takekes yan endamên xêzanê yan civak ji xeletîna jîyanê durbikevin. Ji layê kesên xudan serbor ve dihêne derbirîn û pêşkîşkirin. Şîret tovekê başe şîretkar belavdiket. Pêxemet berjewendîya kesê beramber yan civakê. Kewate “şîret li dîvçuna karekî yan axiftnekêye, merema wê rastikirin û başîye bo xudanê wê” (Cîhan Îsma’îl, 2011: 24). Di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amaje bi gelek şîretên jîyanê hatîne dan ku ji pend û serpêhatîna folklorê Kurdî li ser zimanê Babê dihêne vegêran.

“ Serpêhatîya ku Babê her dem ew pê şîret dikir bi bîrê hat : ” gava ga dikeve erdê, kêr lê pir dibin.” Babê ev serpêhatî bi serpêhatîyek din rave dikir : ” hevalê kesê barketî tûneye” (Babê Nazê, 2012: 10).

Anko Babê wî agehdar kirîye bizanibe kes ne hevalê mirovê ketî ye vêca hişyar xwe be di jîyanê da. Babê Nazê roman xwe bi pend û serpêhatîyên Babê xwe li gelek cihan da xemlandîye. Herwesa di pergirafeka dîtir jî da amaje bi şîretekê dî ya Babê xwe diket.

“ piştî lêxistnê cir - cir û rapelkandinê bê mîfaye” (Babê Nazê, 2012: 11).

Anko demê tiştekan bi serê mirov dihêt divê bi waq'yane serederîyê ligel biket. Herwesa Babê Nazê vê şîretê jî li ser zimanê Babê amajê pêdiket di romanê da:

“Heger lehî rabû û tu di nav de bî , gewdê xwe sist bike û xwe pêre berde , xwe pêre berde heya tu bigêhî kendalekê yan jî qiraxekê .. ”...Di vê berî ku tuş rabe tu barke, berî av bê bin te di vê tu rê li ber merzîb û cukan bigrî. Bi mêranya xwe di vê tu şêr bî, di karûbarê xwe de di vê tu bi sivk bûna pilinga bî û bi deyaxa xwe de, dive tu deve bî. Û dikonebûn û hîkmeta xwe de, di vê tu wek rovî bî ...” (Babê Nazê, 2012: 17).

Bi vê çendê jî amojgarîgarîyên Babê xwe li bîra xwe dînit ka dê çawa ew kawdanên ketîye tê da ji derbazbît. Bo me xweya dibe Babê Nazê gelek ketîye bin badora Babê xwe da. Eve jî tişteka normale ji ber ku di xêzan da pitir zarok dikevîne bin bandora dayîk û bavên da ji ber ku xêzan qutabxana êkê ye zarok tê da perwerde dibin. Dîsan amaje bi şîretekê di hatîye dan lê ji layê pîra Babê Nazê ji dayîka wî ra li demê zarokî dibêje:

“kesê ji qeflê dimîne didin guran” (Babê Nazê, 2012: 23).

Bi vê çendê jî bi keça xwe daye dîyarkirin ku divê her dem mirov bi gel û miletê xwe re bît. Eger ne wê li berpêyan biçe. Kewate da ku her kesek bihête parastin divê di nav civak û gelê xwe da bît. Herwesa amajê bi şîretekê di ya Babê xwe diket dema di got:

“çi bi serê mirov bê, ji encama kirinên wî bi xwe ne” (Babê Nazê, 2012: 32).

Bi bîrînana van şîretin Babê xwe mirov hest pêdiket ku romannivêş her weku xwe beramberî Babê xwe, xwe neguhdar dibîne ku hemî ew şîret Babê ku li nivîskarî hatinekirin pêgîrî pê ne kirîye di jîyana xwe da. Heger ne wê ne ketiba rewşeka weha da. Herwesa amajê bi şîretekê di jî diket li ser başî û xirabîyê:

“Heger mirov xêrê bike, wê xêr bê pêşîyê. Heger ew xerabîyê bike, wê xerabî bê pêşîyê...” (Babê Nazê, 2012: 34).

Herwesa Babê nivîskarî şîretan lê diket li ser girîngîya bawerîya bi Xwedê di jîyan mirovî da û di dinyayê da. Di vê peregirafê da dibêje:

“ Kurê min jibîr neke, dinya li ser qiloçê gamasî ava bûye. Ew bi xwe li ser mûyekê ye û tenê bawerî wê dihêle. Heyîna dinyayê û windabûna wê, li ser bawerîyê û nebawerîyê

ye. Gava bawerî ji dinyayê rabe, vêga wê dinya wek dîwarê ji hevketî bihelosê. Gava Xwedê Adem û Hewa anî ser rûyê erdê, wî ew li ser vî bingehî anîn. Heger wan bawerî neşkanda, niha emê hemû di bihiştî de bana. Ji bo ku dinya bidome û nebawerî bi ser nekeve, Xwedê her tişt du çêkrîne. Jin û mêr, du ling dest û du çav... Her du tişt hevdû radigrin heger yek ji wan xwe bêxêr bike, yê din jî, bi xwe re çirûk dike” (Babê Nazê, 2012: 35).

Li vir jî Babê wî weku şîretkarekê şîretan li kurê xwe diket. Vîyaye giringîya bawerî di jîyanê da bi wî bidete nasandin. Ka girîngîya wê di jîyanê da çende eve jî dibin bandora aynî îslamê da ji ber ku Babê wî bi xwe jî mela bû. Hewildaye zarokê xwe bi perwerdeyeka aynî perwerde biket. Herwesa amajedaye rolê jin û mêran di civakê da bi rêya her dû yan xêzan dihête parastin û ragirtin. Herwesa şîretên xwe dirêjî pêdidit, dibêje:

“ Kurê min, weha jî dive tu jibîr nekî ku du rengên bawerîyê hene, yek bi têkêlîyê, yek jî, ji bêtêkêlîyê ye. Bawerîya pêşî ji neçarîye, ji qelsîyê ye, her çî ya din ji qîneta mirov bi wî û mêranîya wî ye. Li ser vê tiştê mînak di jîyanê de pirin: Piçûkanî di qonaxa zaroktîyê de, mirov nikare bê têkelî bijî, dive ew li ser bawerîya bi bav û dê bijî û têkelîyê li ser wan deyne. Lê di pêla xortanîyê de, wê heqê mirov tunebe, bi çavpanî li destê dê û Babê binêre. Çavpanî, heger li ber destê mirovan be jî, bê rûmetîye û di nava mexlûq de, şitla dêlîtîyê dişkive” (Babê Nazê, 2012: 35).

Bi vê çendê jî şîretê li kurê xwe diket. Pêdivîye dijîyê gencatîye da pişt bestinê li ser xwe biket. Bê ku piştbestinê li ser kesên dewirberê xwe biket. Li ser vê mijar jî mînakek jêra dibêje:

“ Bala xwe bide rewşa gur û kûçik. Bi xwe dibêjin ku her du celebekin, lê yê pêşî da ser rîya bi bawerîk bê têklî, nexwest toqa dêlîtîyê dihustûyê xwe xe û heya- heya ma li çolan. Niha jî bi zikekê têr û yekê birçî jîyana xwe didomîne. Lê herçî kûçik wî di destipêkê de çavên xwe ji bo têrbûna zikê xwe pan kir û gava tuqa dîlîtê xist hustûyê wî, bê deng terîya xwe hejand û bi vî awayî ew di destê xwedîyê xwe de ma kurê min bawerîya gur ji mezinatîya gîyanê wî ye û ya kûçik ji nefş şikenandinê ye. Bawerîyek bi rûmet ji bawerîyek çav şikenandinê çêtire. Birçîbûna gur, ji têrbûna kûçik çêtire. Heger xwedîyê kûçik mirove. Lê belê xwedîyê gur xwedaye û çawa be Xwedê, ji xwedî mezintire” (Babê Nazê, 2012: 36).

Bi vê çendê jî şîretê lê diket divê di jîyanê da pişbestinê li ser xwe û Xwedê biket, ne pişta xwe bi mirovan girêbidet. Herwesa berdewamîyê dide şîret xwe amojgarîgarî lê diketî dibêje:

“ Kurê min balinde û tulûrên dinyayê û weha ji tebayên wê bi hovîtîya xwe çawa bin naghên toza mirov, loma jî tu carî bi kuranî, tu xwe nespêre mexlûqên toxmê xwe ” (Babê Nazê, 2012: 36).

Li vê re jî amojgarîye li kurê xwe diket ku pêdivîye çî caran bi çav kureyî bawerîya xwe bi her mirovekê neînêt di jîyanê da. Ji ber hinde jî dibêje:

“ Lê heya çûk, keroşk û xezal bi bê bextî bên kuştin, wê mirov jî, bi destê mirov bê kuştin ” (Babê Nazê, 2012: 37).

Bi vê çendê jî Babê wî kurê xwe ji kuştina mirovan bi destê mirovan agehdar diket. Û kurê xwe ji hovîtîya mirovan hişarkirîye. Bi rengê nerastewxwe vê arîşa civakî berçav û pesend naket ku mirov bi kuştina mirovî rabît. Ji ber ku kuştin di ayînê îslamê da jî gunehka mezin hatîye qelem dan. Herwesa şêretêk û serpêhatîyeka dî da dibêje:

“ Bi xwezîya kes nagehe baqên kezîya. Xêr û bêr tenê di karê destê de ne. Lê jibîr meke ne her dest qencî jê tê û hemû dest ne wek hevîn. Destê li jorê bilind, ji yê nizim çêtire, yanî destê ku dide jyê ku distîne baştîre. Piştî vê hedîsa pêxember ” (Babê Nazê, 2012: 40).

Li vir jî badora ayînê îslamê li ser Babê Nazê dîyardibît demê hedîsa pêxemberî (s.x.l) li ser girîngîya karkirinê di jîyanê da bo dete dîyarkirin. Pişra jî serpêhatîyeka gelêrî jêre dibêje her li ser vê mijarê:

“ Di bêjin ku di heyamê berê de bazirganekî zengîn hebû. Lê belê dunûdakî wî tenê hebû. Rojê ji rojan mirovê bazirgan ji kurê xwe re got: Piştî çendekê di vê karwanê me bi rê keve, ez dixwazim ku tu vê carê ji şûna min bi karwan re biçî: Bazirganîya berê jî, li ser qantir devan bû û pir dirêj dikşand: Carna di navbera bajarekî û bajarekî de, sê meh dikîşand kurê bazirgan gotina Babê xwe li erdê nexsit, barê sed qantir û devan ji caw û pertelan bar kir û li peyayên xwe re da ser rê. Bazirganê dewlemend kurê xwe birêkir, jibo ku ji alîkî bicerbîne û ji alîkî din ve wî dixwest kurk bi karê xwe bide naskirin. Lê bazirganê biçûk paşî sê rojan ji çûna xwe, li Babê vegeerîya. Bi vegeera karwanê xwe ya ne

di wextê xwe de, bazirganê mezin ma matmayî û ji kurê xwe pirsî: *Te xêre kurê min, çima hûn weha zû vegerîyan? Lawk jî bersîva xwe da: Ma ji bilî xêrê wê çi hebe? Li devê rîya xwe, min ku gurekî melûl û mirarî li ber qefekê ku xwe ramdandibû û hema - hema ruh tê de mabû dît. Di heman demê de, min şêrekî ku dabû pey xezalekê dît. Şêr û xezal bi alî zinar de dihatin. Gava li hêla bezê, xezal giha qiraxa zinar, nema karibû xwe bigirta û ji jor ve hate xwarê. Xezal bi gewdekê mirî li ber gurê bê hal ket. Gava gur dît ku gepa wî hatîye ber devê wî, hêdî - hêdî xwe kişxand heya giha ser beretê. Şêrê ku gepa wî ji devê wî ketibû, li qraxa zinar bê ku bikaribe tiştêkî bike, ji neçarî ma seknî û li nêçîra xwe ya di devê gur de dinerî... Bavo, gava min ev hikmeta Xwedê dît, min emir da peyayên xwe ku serê karwan vegehin û min ji xwe re got, dêmek Xwedê rizqê wî gurî anî ber devê wî, bê ku tiştêkî bike, ma çi koranî bi çavên me hatî ku em bi mehan li rizqê xwe bigerin! Û min ferman da peyayên xwe ku serê karwan bizivîrin. Bi bihîstna gotina lawê xwe, çav di anîya bazirgan de bûn mîna bizotan. Û bi xeyd, ji kurê xwe re got: de rabe ser xwe û ji nuve bide ser rîya xwe! Ma çima di berhevdana rizqê xwe de tu dixwazî bi gur bî, lê tu naxwazî bi şêrê serê çîya bî? " (Babê Nazê, 2012: 41).*

Bi vê ser pêhatîya folklorî dîsan Babê vîyaye girîngîya kar kirinê di jîyanê da bi kurê xwe bi det naskirin. Babê Nazê di romana xwe "Stokholmê Te Çi Dît Bêje" gelek şîret û pend û serpehatên folklorî di romana xwe da bi karînayne. Bi vê çendê jî vîyaye hikmeta miletê xwe û folklor û kultûra miletê xwe bi xwandevanê navixwe û bîyanî bide nasîn. Herwesa dibêje ji mêjeve hatîye gotin:

"Gava mirov dikeve tengayê, yan Xwedê bi bîrtê, yan jî bav û dê" (Babê Nazê, 2012: 43).

Babê Nazê jî Xwedê û bav û dayîka xwe li bîra xwe ênane. Demê dihête tawanbarkirin bi guştinê bi bêbextî. Romannivê tuşî havîbûn bûye li koçberîye şîretên Babê xwe li bîra xwe înane. Dîsan Babê wî şîretekî dî lê diket dibêje:

"Kurê min, rewşa tajî û keroşkê ne wek heve û nabe yek. Keruşk direve û tajî bi pey dikeve, rev û peyketin neyekin, ya pêşî ji neçarî û ji rewşek tenge. Û herçî peyketin jî, ji bitirîyê ye, neçarî û bitirbûn ne wek hevin" (Babê Nazê, 2012: 47).

Vê serpehatîye jî bi rewşa ew ketîye têda girêdet ku dê rewşa bersiv danê daye û her dem rewşa kesê di pirse xurtire. Ji ew kesê ku bersivê didit. Ji ber ku Babê Nazê di

rewşa bersivdanê û bergêrîkirinê da bû. Beramber pirsên komîsarî di vekolîna pêra dihate kirin. Herwesa amajê bi şîretea dîtir ya Babê xwe daye dibêje:

“Çala ku tu avê jê vexwuy, nabe tu keviran pavêjî wê ” (Babê Nazê, 2012: 51).

Bivê şîretê jî dete dîyarkirin di nav kultûrî me da wesa ye dema me av û nanê mala êkê xarin êdî naçîbît mirov nexweşî bigehînte wê malê. Vîca Babê Nazê jî vîya bêjîte komîsarî me jî av û nan Swêdê ya xarî ye çawa em di nexweşîye bigehînin serokwezîrê we. Eve ne ji kultûra meye ya em li ser hatîne perwerdekirin li ser mezin bûyîne. Romannivê weku kesekê ruşnibîr û xudan tecrîbe di jîyanê da dihête berçavan ku ava zanyarîyên xwe bi dû rêya wergirtîye. Ya êkê bi rêya ew xêzana têda perwerde bûye ji dayîk û Babê xwe. Ya duwê jî birêya xwandina xwe çî li Sûrya û çî jî li derveyî welatî Rusya berî koçberî Swêdê bi bît. Herwesa li ser mijara koçberî vê şîreta Babê xwe li bîra xwe dinit:

“ Birako, heger hat û kevir ji cîyê xwe leqîya , wê bi zehmetî bikirin be cîyekê nû ji xwe re bigire .. Wext divî ” (Babê Nazê, 2012: 58).

Ev jî wê çendê dîyardiket demê kesek ji welatê xwe derbikevît û koçberî welatekê dîtir bibît. Bi zehmete hetaku xwe ligel welatê lê koçber bîye biguncînt. Vê çendê jî wext pêdivê. Taku bişêt xwe ligel kultûrî welatê nû guncînt. Vê çendê jî wext pêdivê. Taku bişêt xwe ligel kultûrî welatê nû bi guncînit. Her weku Babê Nazê li welatê koçberî rû bi rûyê gelek derd û nexuşîyan bûye taku hatîye tawanbarkirin bi kuştinê jî. Herwesa amajê bi şîretea dîtir Babê xwe diket dibêje.

“ Heger kurmê darê ne ji darê be, dar kurmê nabe” (Babê Nazê, 2012: 59).

Romannivê dibêje dujminê mirovî her mirov bixwe ye. Her mirov bi xwe bi destê mirovekê dîtir dihête kuştin. Herwesa bi wê ramanê jî dihêt heger miletek yan civakek di nav xweda êgritîbît. Kes nikart nexweşî bigehînt wan. Lê heger ne êgritîbên dê bi xwe dujminatîya hev biken nexuşîyê bigehînin hevûdû. Herwesa li ser zimanî jî dibêje.

“ Gava ziman dişe'te, ling dişemite... ” ...Zimanê te hespê teye, heger tu wî biparêzî, tê xwe biparêzî” (Babê Nazê, 2012: 63).

Li vêrê jî romannivêş girîngîya zimanê û axivtinê dete dîyarkirin. Daku mirov bişêr rewiştê xwe bi parêzît. Divê mirov li zimanê xwe hişyar bît ka çi dibêjît. Mirov dikart bi rêya zimanê xwe bergêrî ji xwe biket. Herwesa amajê bi şîretekê dîtir jî daye li ser zimanê Katîya Rûsî dibêje:

“ Heger tu gelekê bizanibî, tê zû kal bibî! Ma te ev serpêhatî ya Rûsî nebhîstîye? - Heger bê henek be... Lezê neke, ” tu çiqasî bijî, tê weqasî bibînî ” (Babê Nazê, 2012: 88).

Herwesa Lîza Rûsî jî şîretekê li Bêkes diket, dibêje:

“ Ma te ne bihîstî ye, ” mirov bi çi bîşe, bi wê jî dikare xwe derman bike ” (Babê Nazê, 2012: 120).

Li vêrê jî karêgerîya kultûra Rûsî li ser romannivêşî xwe ya dibe ku amaje bi gotineka wan daye. Ji ber ku romannivêş xwandina xwe li Rusya bi dawî îna bû. Bu demekê li wî welatî ma bû û zimanê Rûsî jî zanêt ketîye bin kartîkirina kultûr û edebîyeta Rûsî da. Bi vê çendê jî ew jîngeha romannivêş têda jîyayî, karêgerîya xwe li ser kirîye. Ev çende jî di nav romana wî “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” dîyar dibe. Herwesa amajê bi şîretên dayîkê bo keçekê Kurd diket di vê peregrafê da dibêje:

“ Keçê por kurê, duxînê li ber sist neke û xwe bi dest ve bernede! ” (Babê Nazê, 2012, 117).

Ev axivtine dihête gotin ji layê dayîkê ve bu keçê. Ji ber girîngîya namîsî li dev keçê ku divê bi her rengî xwe biparêzît. Ji her kiryareka sêksî ne di çarçovê jîyana hevjinî da bît. Di nav kultûrê Kurdan da girîngîyeka mezin bi vê çendê dihête dan ku nabît keç ji dervey jîyana hevjinî xwe nêzîkî karekê wesa biket. Ji ber ku peywendî bi namusê ve heye. Heger keç vî sinorê derbaz biket. Dibe bihête kuştin. Ji ber ku bi hêleka sor dihête zanîn di nav civaka Kurdî da. Bêkes dibêje ez tirsim ji ber mayîna min di xaniyê Lîzaye ve bêjine min " mêrê xwedîya malê " Katya jî vî gotin û serpêhatîya Kurdî dibêje:

“ Yê ku here kura hedada wê çirûskên agrî lê kevin? ... Min deverekê xwandîye yan jî bihîstî ye ” (Babê Nazê, 2012: 132).

Li vir jî bo me dîyardibît. Ji encamê têkelî di navbera netewîyên cîyawaz da. Karêgerî li ser her du layan dibe. Weku çawa bandora kultûr Kurdî li ser Katya dîyar dibît.

Demê wê serpehatiya Kurdî vedigire. Bêkes jî di bersîvê da dibêje Katya jî berisîva wî dide. Weku vê peregrafê da dîyardibît:

“ Pîsîyê hişk bi mirov ve nazelqe... Tu şaşî, di heyamê me de her tiştî dikarin bi mirov ve bilezqînîn û heya terîya jî ...” (Babê Nazê, 2012: 132).

Bi vê dîyalokê ji bû me dîyardibît ku di çavê xelkê de Bêkes weku hevjinê Lîzayê dihate dîtin. Her çende wî nevyaya ye ev nav bikeve ser wî. Herwesa babê wî şîretek din da jî dibêjît:

“ Di karê cinsê benê adem de du cinas pir pîsîn, yek jê ewe ku jin dizîyê bike û yê din jî ku zilam xwe bide” (Babê Nazê, 2012: 39).

Li vir jî amajê bi du karên ne dirust ji layê civakî û dînî ve ne cihê pesend kirinê ne daye. Ew jî karê dizîyê û lîwatê ye ku ji gunehên mezin dihêne hijmartin. Herwesa amajê bi şîret û pendeka dîya Kurdî diket li ser zimanê Babê xwe dibêje:

“Tavên bihara xwe şil meke, tavên payîza xwe girîwu neke!” (Babê Nazê, 2012:148).

Babê Nazê di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” gelek pend û serpehatên Kurdî bi karînayîne. Bo xemlandina romana xwe. Ê bo bihêzkirina axivtina xwe digel komîsarî da. Bi vê rengî di vê romanê da hindêk ji kultûra Kurdî bi xwandevanê bîyanî dete nasîn ku Kurd jî xudan kultûrin û ji milletên resen li deverê. Bi vê çendê jî romanvisî vîyaye romana xwe biket xwedîkek ku xwandevanê bîyanî hindêk ji kultûr û folklor Kurdan bizayinit. Ê xwandevanê Kurd jî bi kultûra Ewropîyan bidet nasîn. Daku xwandevan berawirdîyekê di navbera her dûyan da biket. Bi vê çendê jî karîgerîya her dû jîngeha navixweyî û ya bîyanî li ser romannivê xuya bûye vê çendê jî di nav romana wî da rengvedaye. Herwesa Babê Nazê amajê bi şîret û axivtina mirovekê 60-70 salîyê demê qelaçîyan yan jî çîyayîyan diket li ser zordariye ku dibêje çênabît mirov zordarî li ser xwe qebûl biket. Çi mezin çî biçîk be, heger xwe ew zordarî birna mirîşkekê jî bît. Dive peregrafê da dibêje:

“ Mirîşk bi me ve nehiştine .. Raste buhayê mirîşkê tûneye... Heger mirovek di derî re dirbasî mala min bibe, gurandina berxekî jê re wê neyê berçavên min. Lê ku mirov di pencerê re derbas be, êdî birina mirîşkekê jî zore. Ji ber ku çî bi darê zorê bê sitendin,

nexweşe. Birina tiştan, bi darê zorê nayê qebûl kirin. Heger tu îro zordariya biçûk qebûl bikî, tê dûre, sibehê ya mezin jî qebûl bikî û ev pîstî ye” (Babê Nazê, 2012: 152).

Babê Nazê jî beramber tawanbarkirina xwe bi bêbexî. Bê deng ne bûye. Vîyaye dengê xwe û nerazîbûna xwe birîka romanê bidete dîyarkirin. Hewildaye bi rengekê hunerî û di çarçovê romanê da û êşa xwe parçek ji jîyana xwe. Digel kultûr û êşa milletê xwe bi xwandevanê navixwe û bîyanî bidete nasên û bêxîte berçavan. Herwesa Babê Nazê amajê bi şîretekê dî ya Babê xwe diket demî dibêje:

“ Çi bi serê mirov bê, ji encama kirinên wî bi xwene... ” (Babê Nazê, 2012: 32)

Her weku Babê Nazê xwe bi kesekê gunehkar dibînit. Beramber Babê xwe û şîretên wî ew li wî kirîne berçav wernegirtine ji ber vê yekê jî ev çende bi serê wî hatîye. Bi vê cendê jî bo me xuyaye ku Babê Nazê ketîye bin bandora civakê û mifa paşxana folklorê Kurdî wergirtîye.

Romannivêş Babê Nazê dî romana “Xweşîya Bi Êş” da amaje bi hindêk şîret û gotinan kirîye sebarek çend mijarekan ji wan jî derbareyî evînê dibêje:

“Ma ne hezkirina ji dil, ne pîvan û ne sinoran dizane....”Dûre, ewî ev ravekirin dida vê gotina hişmendîyê: “dîyare ji ber vê çendê, evîn hemû qonaxên temenan dide ber xwe ...” ji nîşkave, Şahîn ji aşopê çû ketwarê. Ewî ji xwe re digot: “ erê evîn hemû qonaxên jîyanê dide berxwe, ji ber ku kore û bêhişe ” (Babê Nazê, 2016: 9-10).

Ji gotinê dîjî li ser mijara evînê dibêje:

“Evîna ji dil, herdem şermokîyek xwe heye, lê tevî weha jî, ew nayê veşartin ... Axavtina bi xwe re jî, egerê evîna nedîtîye û geryana ji bo hêvîyê ye ...” (Babê Nazê, 2016: 11).

Dîsan li ser vê mijarê dibêje:

“Heger yek carekê dil bigre, carek din nikare ...dema yek dil digire kor dibe” (Babê Nazê, 2016: 66).

Herwesa amajê bi şîretekê diket li ser zêde axivtinê dibêje:

“Bê dengî, ne kêmi axavtina ciwan girîngîya xwe heye ” ... Wey Xweda! Çi bextîyare, ew kesê bi xwesteka xwe hizra xwe dike! Erê ez pê dizanim axavtina pir, rê li ber hizra digire” (Babê Nazê, 2016: 11).

Herwesa romannivêş li ser zimanê Sûlavê amajê bi girîngî danî bi ciwanîya gîyanî det ne tenê girîngî danê bi rûxsarê mirovan weku amojgarîgaryekê dibêje:

“Ma ne gîyanê ciwan, kesatîyê jî ciwan dike. Û ez dibêjm mirovî xwedî gîyanêke ciwan, heger, ew bi qelafet û rengê xwe nexweşik be jî, ew jî kesê sipehî, sipehîtir dibe” (Babê Nazê, 2016: 17).

Herwesa amajê bi şîretekê dî jî diket dibêje:

“Tu çi bixî beroşê, tu yê wê jê derîni” (Babê Nazê, 2016: 20).

Herwesa romannivêş amajê bi hindêk rengên mirovan diket ku ji mirinê natirsin ji jîyanê heznakin wan cure mirovan bi me dete nasandin bi dîyaloka di navbera Medya û Sûlavê da dibêje:

“-Erê, kesên weha hene ku hez ji jîyanê nakin û ji mirinê natirsin.-Kî ne gidî?-Bi matmayîn Medya pirsî. - Rahîb û sufî ne. Bi gotinek din, ew mirovê bîrewere ku xwe li dinyayê mêvan dibîne, ew dixwaze zû bi zû ji vê dinyayê barbîke, loma jî, ji mirinê natirse .-Ma rahîb û sofî normalin ?-Erê , ew ehlê Xwedê ne û ji bo bawerîya xwe, xwe dikin qurban” (Babê Nazê , 2016: 46).

Li vir jî bandora civakê ew jîngeha civakîya Babê Nazê tê da jîyayî dîyardibît ku ji binemalaka oldar bû û ji şarezaya wî li ser rahîb û sofyan dîyardibît. Herwesa romannivêş amajê bi amojgarîgaryeka dîjî diket li ser rastyê dibêje:

“Gotina ciwan, her dem di rastîyê deye” (Babê Nazê, 2016: 58).

Dîsan gotineka dîjî dibêje:

“Axavtina ciwan tavloya hizrê ye ...” (Babê Nazê , 2016: 66).

2.2.3. Perwerdekirin

Ji ber ku Babê romannivêsi Babê Nazê mela bûye ji xêzaneka dîndar bûye. Ji ber vê yekê jî ji layê Babê ve bi perwerdekirineka ayînî hatiye perwerdekirin. Ravekirina vê ayetê dixwune:

“Heger me ev Qur’an daxistbûya li ser çiyakî, ji tirsaxwedê te yê wî xoz û lerz bidîta "bi bîr anîna vê ayetê pêre - pêre ravekirina Babê jî bi bîrê hat: " mirov mexlûqê Xwedê yê herî mezin û bê 'are, ew xweşkitrîn û mekruhtirîn mexlûqê wî ye” (Babê Nazê, 2012: 10).

Herwesa di romanê jî da amajê bi wê çendê diket ku ji binemaleka dîndare dibêje ez bi xwe ji malbatek dîndarim. Ev çende jî wê çendê dîyardiket romannivêsi ketîye bin kartîkirina ew jîngeha di nav da jîyayê. Herwesa gotina Babê xwe jî amajê pêdiket dibêje:

“Xwedê li ser me hemûyaye, tiştê jê nayê veşartin, ji xeynî wî, kesek tiştê di dilê mirov de nabîne ” (Babê Nazê, 2012: 33).

Ev jî bandora ayînê îslamêye li ser romannivêsi dupadiket. Ji ber ku di maleka dîndar da hatiye perwerdekirin. Vê çendê jî di nav romana wî da rengvedaye weku dive peregrafa serî da me amaje pê daye. Babê Nazê şîreta Babê xwe li bîra xwe dînit li demê zarokî ku Babê wî li wî kirîne:

“ Heger mirov li çolê be hawakê bê bextî bêkuştin - Babê bi xwe jî wateya bê bextîyê jêre rave dikir - kuştin bêbextî yanî kuştin paşveye. Heger mirov dujmin be jî, çê nabe ew ji paşve bê kuştin. Di heyamê berê de û heya niha jî mirovê mîrxas nikare destê xwe ji paşve ji yekê bilind bike, loma jî berî ku ew here dujminê xwe, ew gazî dike û dengê xwe dighîne wî û hînga ceng dibe bêminetî. Helbet, wê Xwedê bide dayîka yekî ji wan û yê kujdar, erê kuştin kirîye û destê wî buye bi xwîn, lê dilê wî ne reşe û nabe navê bê bextîyê li pey keve... û ew çol û axa ku bi bê bextî xwîn li rijyaye qebûl nake. Ji ber vê bê bextîyê erd û asman diheje û dînya xezeba xwe dibarîne û di cîyê cî de ba û bavîsokek weha radibin ku qriş û qal û tomkan li ber xwe dibe. Kes xuyînî bi ku de here, her tomik bi pey dikevin. Ewê li pey herin, heya ku ew pêrgî mirovekî bibin. Ew mirovê pêregî hatî bi rîya tomikan nas dike ku ew kesê direve kujdare. Hînga ba û bavîsok nema erdê didêrin û tomk

jî li cîyê xwe dimînin. Dinya vê xezebê bi ser kesê xuynî yê bêbext dibarîne. Çunkî bêbextî birayê bênamusîyê ye. Axa helal jî bê namusîyê pesend nake” (Babê Nazê, 2012: 39).

Bi vê çendê jî Babê Nazê vîyaye bi xwandeveanê bîyanî bêjît Kurd ne mirovên bê bext û kujdarin. Her ji zarokatîya xwe wesa hatine perwerdekirin ku kuştin gunehka mezine, ew kesê mirovekê bi kuştin Xwedê xezeba xwe li ser wî kesî dibarînt. Bi her rengêkê hebît dê hête aşkerakirin. Ji ber ku Xwedê kuştina mirovan bi destê mirovan heram kirîye ji gunehên mezin dihête hijmartin. Babê wî her ji zarokatîya wî ji kuştina mirovan agehdar kirîye ku gunehka mezine Xwedê xezeba xwe li wî kesî diket yê bi karê kuştinê rabît. Herwesa Babê niviskarî şîreta lê diket berî biçe Ewropa dive peregrafê da dibêje:

“ Heger mirov li fehişyê bigere, li her derê gunehkarî wek li Ewropa heye. Loma ez rê didime te û wexra te ya xêrê be. Xwendina xwe bik, lê dîne xwe jibîr neke ... (Babê Nazê, 2012: 64).

Ji ber ku Babê wî mela bûye şîret lê kirîye ku li dîne xwe û xwandina xwe agehdarbit. Helbet ji ber ku miletê Kurd miletekê dîndare. Ji ber vê çendê jî Babê wî şîret ji berî her tiştêkê li ser dîne wî lê diket dibêje ji dîne xwe hişyarbe.

Herwesa Babê wî dibêjit sê heqê te li ser min hebûn yê êkê navekê xweşe. Min li te kirîye yê dû jî dîne te ye. Min bi te daye nasîn. Yê sîyê jî dibêje ew bû

“ Ku min jînek ji te re banîya. Lê ev heqê te bi sûç, yan bê sûç, di hustuyê min de maye. Nedûre bi çûna xwe tu keçek şîr helal ji xwe re bibînî û bîne” (Babê Nazê, 2012: 65).

Li vêrî jî bû me xuya dibe ku romannivêş ketiye bin bandora Babê xwe ve ew jîngeha tîda jîyayî. Vê çendî jî di nav romana wî da rengvedaye. Bi vê çendê jî bo me dîyardibît ku roman jî renigvedana civakî diket. Romannivêş jî dikevîte bin kartêkirina ew jîngeha civakî ya tîda dijî. Her ji yekem qutabxane ku ew jî xêzane. Herwesa Babê wî dibêje:

“Ez rastîya dinyayê bi te bidim naskirin... Leyse, dema tu sibehê herî ba dêlêka karxanê û tê wê li ser rastîya wê bibînî. Ewê negehê xwe bi dermana şaytokî bike. Heger nefsa te bilind be, bi dîtina rengê wê yê qezûzî, tê nema bixwazî pêre razê. Û her çî malên

qumarçî û 'areqçîyan, mîna tembûrê valane, lê malên mezinên wan weku dibêjin: Hundir bi qurbana ji derve be. Bi dîtina halên wan, mirovê 'aqildar wê bigehê hikmetekê ku destê xwe nahavêje kaxezên lîstikê û pişka 'areqê nexê devê xwe” (Babê Nazê, 2012: 66).

Bi vê çendê jî Babê wî ji her sê gunehên mezin agehdar diket ku di dînê îslamê da bi gunehên mezin dihêne navkirin ew jî zina , 'areq û qumar. Vîyaye kurê wî xwe ji van her sê gunehan dîrbêxît. Daku di dinya û axareta xweda serkeftî û serferazbît. Dûrbît ji nexweşiyên jîyanê. Herwesa di derbareyî jinan da Babê wî şîretan lê diket dibêje:

“ Ji bo ku tu xwedî malek tebût bî, berî her tiştî dive tu jina xwe kedî bikî... erê pêdivîye tu mîna çêlekwan, wê kedî bikî û kedîbûna jinan karê herî zehmete... ” (Babê Nazê, 2012: 67).

Li vêrê jî Babê wî şîretê li kurê xwe diket. Dibêjitê divê tu bi vîyana xwe jina xwe bi xweve girê bidî û bi xwe ve girê bidî bi rêya vîyana di navbera te û wê da. Herwesa berdewamê dete şîretên xwe di derbareyî jinan da bu kurê xwe dibêje:

“ kurê min ji bîr neke jin weke mahîna kehêle, heger siwarê wê nekone be, ewê serî jê bistîne û li deverekê din siwarê xwe bavêje. Jin bi her tiştê xwe mîna mahîne ye. Li ser rûyê 'erdê, tu efrandin ji jinê û mahîne sipehîtir tuneye. Weha jî ji wan bê bextir nîne. Heger mahîna xwe bide ya xirab wê pişta siwarê xwe bişkîne û ku jin xwe bide ya xirab ewê serî li mêrê xwe bigerîne û bigotinekê, ew dikare avahîya ku bi salan hatîye ava kirin, helweşîne. Ji ber vê yekê dive tu tucarî wê ji ber çavan wînda nekey. Dive her û her çavê te lê be. Dan û standina bi wê re mîna, dan û standina bi avê reye, kengî dibe lehî û bi agir reye, dema gur dibe, loma jî dive mirov hişyarî be wîhay ji xwe he be. Siwar dema li çem dixê, hevsarê mahîne sist dîke û carna jêre berdide, lê her û her dive mahîna pê bihse ku dawîya hevsar di destê siwar daye. Erê kurê min şaş nebe, heger dest li ser jinê nebe, ewê bibe bizin û wê rake devîyan û xwe. Ê her şivan wê ji bo te bêje ku cir ji cira biznan nexweştir nîne. Hegeri tu bixwazî jina te jin be û tu jî stûna malê bî, tu carî hevsarê jinê ji destê xwe bernede! Ê gotina min ya dawî li ser jinan: Jina dêlik tobe dîke, lê ya derewker, wê nikaribe dev ji 'adeta derewa berde. Ji ber vê yekê, yeke weha li ber deryê xwe nehewîne. Heger ew dayîka zarokên tebe, wê wan li ser şêrê heram xwedî bike û şîrê heram ku di demaran da bigere, êdî wê cewrikên kûçkan ji zarokên te çêtir bin” (Babê Nazê, 2012: 67).

Li vir jî romannivês bi rêya şîreta Babê xwe tişkê dixîte ser berixwedana zelumê Kurd bu jinê û çawanîya serederîkirinê ligel jinê dê çawa bêt. Herwesa Babê wî wî ji jina derewker agehdar diketî. Her weku bêjît qet çênabît tu bi jineka derewker ra hevjinê pêk binê wî ji van cure jina agehdar diket. Babê Nazê egerî bîrînana van şîretên Babê xwe sebarek jina bo vê egerî dizivîne. Dive peregrafê da dibêje ji ber ku:

“Dibe ku Lîza wek jin, hemû xisletên Babê yên ku li ser jinan gotbûn, têde dihatin gewdekirin û wî tiştî hela bû ku bi berferhî di şîretên Babê de mijûl bibe” (Babê Nazê, 2012:78).

Ji ber ku Lîza ew jin bûye ku agehdarî daye polis li ser mijara ne hatina wî bu malê li şeva kuştina serokwezîr Swêdê. Ev agehdarkirine jî bi bûye eger vekolînê ligel Babê Nazê li ser vê mijarê. Ji ber vê çendê jî cîhanbînîya wî sebarek jina û bi taybet jî derbare Lîza gorankarî bi ser da hatîye. Herweku Lîzaye jineka derewker dibînit. Ji ber agehdarkirina wê bo polîsan di derqehqê wî da. Ji ber ku nehatina wî wê şevê bû mal bi mijara kuştina Olof Palme girê dabû. Bûye eger vekolîna polîsan ligel Babê Nazê li ser mijara kuştina serokwezîrê Swêdê. Herwesa xwe weku neguhdar dibîne beramber Babê xwe. Ji ber ku guhdarîya şîretên Babê xwe nekiriye. Sebarek jinan û derbareyî hemî ew şîretên cur bi cur li wî hatînekirin. Di hemî layenê jîyanê da. Herwesa ji ber ku şîret kirin jî êk ji rêkîn perwerdekirinê Babê wî şîretê lê diket dive peregrafê da dibêje:

“Kurê min her kes kurê Babê xweye. Ew jî bi êşandinê dêşe û bi xweşîyê keyfxweş dibe. Her kes xwedî laşî û ruhe, dive tu tim bi dilrehmî li mirov binerî...” (Babê Nazê, 2012: 37).

Li vêrê jî dîsan romannivês amajê bi wê perwerdekirin kirîye ya pê hatîye perwerdekirin. Ji layê Babê xwe ve ku şîret li wî dikir divê tu her dem ligel mirovan bi rehim bî çunku hemî mirov weku êkin bi xweşîye keyfxweş dibin bi nexweşî û êşandin diêşin. Her weku dibêjê vîca divê tu çî caran nexuşî negehîni çî mirovan. Mebesta romannivês dibe ew bît bijîte xwandevanî erê kesek weha hatibe perwerdekirin dê çawan bi karê kuştinê rabît. Herwesa dayîka Bêkes şîretê li zarokên xwe diket dibêje:

“ Ji bîr nekin, çawa dînya ji şer xalî nabe, weha jî ji xêrê “ (Babê Nazê, 2012: 27).

Herwesa romannivês dibêje:

“ Wê jî bi çîroka xwe her agirê hovîtîyê di hinava zarokên xwe de vedimrand”
(Babê Nazê, 2012: 22).

Bi vê rengê ew perwerdekirina pê mezin bûye romannivês bi xwandevanî dete dîyarkirin ku her dem şîret ji layê dayîk û Babê wî ve lê hatîne kirin her dem ehlê xêr û başî bîn beramber mirovan.

Di romana “Xweşîya Bi Êş” da jî mijara perwerdekirinê hatîye azirandin. Demê Babê Sûlavê li ser giringîya xwandinê amojgarîya lê dike û dibêje:

“Li ser nîrxê xwandinê di keça xwe ra, axivî: Keça min, heta ji min bê ezê harikarbim ku tu xwandina xwe bibe ser û bi xebata mejîyê xwe nane xwe bixwe... newe ku min û nivşe min ku ji sipêdê heya évarê bi xudana enîya xwe nan dixwen”(Babê Nazê, 2016: 20).

Ev çende jî gorankarîyeka başe di nav civaka Kurdî da ku rê bi keçe jî dihête dayîn ku bixwînît ku berî niha gelek rê bi keçe nedihate dayîn. Romannivîs divê romanê da hewil daye êş û xweşî û hevîyên keçe di nav civakê da bixête berçav. Herwesa romannivîs amajê bi girîngîya poşîna keçe di nav civakê Kurdî da dike. Di dîyaloka navbera Babê Medya û Mamostayî da xuya dibe:

“Ji bo çi pêdivîye keça min bi por girtî bête xwandinê? Babê Medyayê pirsî.-Ma tu ne mislimanî? -Mamoste jî ev pîrsa xwe kir.-Evca Dînê me wesa dixwaze.-Dîn çi dixwaze, min elaqedar nake, lê yase çi dixwaze, ezê ligora wê bikim... Tiştê ku tu qutabîyan dixwazî ne yasayîye” (Babê Nazê, 2016: 12).

Ev çende jî ji ber ku civaka Kurdî civakeka oldare her dem giringîyê bi cil û bêrg û poşîna keçe dihete dan. Gelek caran rewîştê keçe li dîf awayê cil û berg û poşîna keçe dihete pîvan. Lê sedema vê çendê li def Medyayê dîyar dike û li def Sûlavê jî ku keçeka porgirtîyê dîyar dike. Di vê pragirafê da

“Binemala Medyayê bi Ewropîtîya xwe dihate nasîn û ya Sûlav ser vê rêya guhartinê, bi gotinek din, çava gundayetî, weha jî bajetî té de dihate ditîn” (Babê Nazê, 2016: 25).

Ji ber ku Medya di malekê da hatîye perwedekirin ku kêmtir ketîye bin bandora qeyd û benden civakî. Berovajî Sûlav jî di malekê da hatîye perwerdekirin ku pitir bandora qetd û benden civakî li ser têne xuyakirin.

2.2.4. Derdên Koçberîyê

Romannivês amaje bi arîşa koçkirinê kirîye di romana xwe ya “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da. Romannivês di jîyana xwe da gelek caran koçber bûye. Çi koçberîya navixwey ji gundekê bo gundekê dîtir her di zaroktîya xweda. Ji ber karê Babê wî ku mela bûye ku siruştê kar wî wesa diwxast. Her weku dive peragrafê da amajê pêdiket;

“ Herdem ez bê cî û war bûm. Hîn biçûkanî, dema ez nû gehiştîm xwe nas bikim, mala me ji gundê zaroktîya min rabû û barê xwe li gundekê din danî. Li vira jî ji neçarî, di demek kurt de, me çend mal guhertin, paşî bi hukmê karê Babê ku karê wî meletî bû, di navbera demekê û demekê ne tenê mal lê gund jî diguhertin” (Babê Nazê, 2012: 54).

Dîvda jî koçberîya wî bu xwandinê bu welatê Rusya. Piştî تمام kirina xwandinê li Rusya vedigere Sûrya. Li dîvda jî ji ber nebûna azadîya sîyasî û ruşnibîrî li Sûrya koçberî welatê Swêdî dibe. Ev romane jî her li jîyana koçberî nivêstîye koçkirin yan awarebûn birîtye “ ji veguhastina ji cihêkê cografi bu êkê dî li dîv pêdivîyatîyên jîyanê û berjewendîyên jîyarê” (Dewlet Mihemed, 2013: 26). Ji ber ku Babê Nazê yek jiwan kesan bû. Ji ber nebûna azadîya sîyasî û ruşnibîrî li bajêrên Kurdistan li Sûrîyayê penabirîye ber jîyana koçberîye. Li jîyana koçberî jî rûbirû gelek nexuşîyan hatîye ji wan jî gunehbarkirina wî bi kuştina serokwezîrê Swêdê. Ji ber ku pitir destê gunehbarkirine pitir berev koçberan ve dihat arastekirin. Yek ji wan kesan ew bi xwe bû. Her weku dive peregrafê da:

“Bûyera kuştina serokwezîr, ew xistbû xir û cirek gîyanî û ne tenê ew herweha mirovên cî û kesên bîyanî jî. Lê rewşa yên dawî xirabtir bû, lewra tilêyên gunehbarîyê ber bi wan ve diçûn” (Babê Nazê, 2012: 12).

Helbet vê gunehbarkirina wî bi kuştinê li jîyana koçberîyê. Karêgerî li ser rewşa derunê wî kirbû. Ev bûyere jî kirîye hevênê avakirina romana xwe. Êk ji wan asteng û arîşên dikevîte dirêya koçberan da ew jî nezanîna zimanê wan welataye ku koçber koç dikenê. Romannivês dive peregrafê da amaje pêkirîye. Helbet

“ ne zanîbûna zîman, di vê warê de, rola xwe ya nebaş dilîsit. Wî xwest hinekê rewşa xwe bi wan bide nayasîn ku ew ne kujdare û berî niha li cem polis bû, lê zîmanê wî negerîya. Bêkes di nav xwe de got : " loma dibêjin her zîmanekî bi zilamekîye” (Babê Nazê, 2012: 31).

Li vir romannivês bi giring dizanît ku koçber ew welatê lê dimînit. Xwe fêrî zîmanê wî welatî bikin. Bi vî rengî dê şît xwe ji gelek arîşên jîyana koçberî dûrbêxît. Romannivês egerî hatina xwe bu Swêdî bi vî rengî di romanê “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da dîyar dike.

“ - li gora sîstema xwandinê li Sovyetê, xwêndkar paşî temambûnê, pêwîste vegere welatê xwe... Rewşa îro , ... pir nexweşe û pranîya xwêndekarên Kurdan nekarin vegezin welat, ji ber vê yekê ew li Ewropa belav dibin” (Babê Nazê, 2012: 69).

Romannivês egerî nezivirîna xwe bo welatê xwe bo ew rewşa welatê wî tê da derbazbît dizivîne. Ji ber nebûna azadîya sîyasî û ruşnibîrî li welatê wî. Penabirye ber jîyana koçberîye li welatê Swêdê. Ji ber ku dî wî serdemê da dî dezgehê ragehandina Swêdê da navê Kurdan weku kujdar derbazdikir, romannivês vê çendê rexne diket ji komîsar ra dive paragrafê da dibîjît:

“ lê wê gunehê we tê de hebe, heger hûn li cem xwe, rê li ber kuştin û pîskirina navê me negerin. ... Lê îro, di rewşa nû de, li welatê we bê şikence, bê darê zorê Kurd ji ber navê xwe direve , ...lê bi saya rojname û televîzyona we, karê dujminê me diçe serî û bi ser dikeve” (Babê Nazê, 2012: 48).

Ji komîsar ra dibêje pêdivîye rê li ber vê çend bihêtegirtin. Bi vî rengî navê Kurdan neînîn. Ji ber ku çî pependîya min û Kurdan ne dîr û nêzîk bi kuştina serokwezîrê we ve nîne. Ew şik û gumana we di derbare Kurdan da neraste. Xweya ye romannivês bi nebaşî derketina navê Kurdan pir êşîyaye li wê serdemê da. Evê çendê jî romannivês bi eşkencedaneka derunî wesif diket dijî miletê Kurd ku neb kêmtî eşkencedana gîyanî ye. Herwesa dibêje:

“ bêrîbûna ji welat zore komîsar û xwezî te bizanîba çiqasî dijware, dema navê netewa mirovî bi xerabî derdikeve!” (Babê Nazê, 2012: 49).

Bi vê çendê jî rexnê li helwestî ragehandina Swêdî digirît. Ji ber ku bê belge Kurd bi kuştinê tawanbar dikirin. Herwesa romannivêş egerî koçberîye bu Ewropa dîyardiket dive peregirafê da dibêje

“ çî ji ber birçîbûn û çî ji ber zor destîyê, li her çar alîyê dinê xelk digrin ser Ewropa ” (Babê Nazê, 2012: 58).

Romannivêş egerî koçberî bo du hukaran di zivirînit ji ber bîrsatîyê. Anko ji ber nebûna 'edaletî di nav welatî da ku pîranîya cara dibe egerî bîrsatî û hejarîyê. Û zor destî û nebûna azadîya sîyasî û ruşnîbîrî dibe eger kesên ruşnîbîr ji ber ne azadîya ruşnîbîrî û daku bişên berhemên xwe bi azadane belav biken. Penayê diben ber jîyana koçberîye û koçberî Ewropa dibin. Herwesa romannivêş wênê Kurda li wî serdemê li Swêdê ka bi çî rengî dihatine amajekirin li ser zimanê Lîza bi me dete nasîn. Demê Lîza dibêje:

“ - heger her tim demançe dibin çengên Kurdan de be, lê yên ku tîn mala min dive şûşe di ber wan de bin ” (Babê Nazê, 2012: 79).

Rengekê nerastewxwe rexne li Kurdan hatîye girtin ku her gav demançe dibin çengên wan dane. Anko kuştinê diken. Herwesa behsê kultûr xwe jî kirîye ew jî meşrub vexwarine. Romannivêş egerî vê çendê bo me dete dîyarkirin li ser zimanê qehremanê xwe Bêkes di romanê da demê dibêje.

“ Bêkes mebesta girêdana demancê bi navê Kurdan, sipart kuştinên ku berî niha li Swêdê û li hinek welatên din, bi destê Kurdan qewmîbûn... Ji ber vê yekê, bi gotinên Lîzayê êşîya û li ber xwe ket. Lê tevî weha jî, wî Lîza ne lomand. Belê di nav xwe de got " hoho! Rojname û televîzyon çî dikin û çî nakin... ” (Babê Nazê, 2012: 79).

Her ev çende jî bo polîsan agehdarkirina Lîzayê li ser nehatina Babê Nazê li şeva kuştina serokwezîr Olof Palme bi cidî wergirtibû. Û vekolîn ligel Babê Nazê kir bû li ser mijara kuştinê. Bêkes ramana navê xwe ji Katya ra dete dîyarkirin dibêje:

“ Bêkes û bi Kurdî mîna xwe yanî bê xwedî ” (Babê Nazê, 2012: 86).

Romannivêş serkeftî bûye di hîlbijartina navê qehremanê xwe da bi navê Bêkes. Naveke derbirîne ji rewşa jîyana wî diket li jîyana koçberîye li welatê Swêdê. Ji ber ku

demê hatîye tawanbarkirin bi kuştinê hest bi bêkesîya xwe kirîye li welatê koçberîye. Herwesa Katya Rûsî jî egerî koçberîya xwe dîyar diket dibêje:

“ bi her awayî min dixwest welatekî din bibînim ... ” (Babê Nazê, 2012: 97).

Li vir jî romannivêş weku berawirdîyekê di êxîte navbera egerî koçberîya Kurdan û Rusyan da. Bo welatê Swêdê ya Kurdan ji ber hejarî û ne azadî ya sîyasî û ruşnibîrî ye. Lê ya Rûsan her çawa bît ne ji ber egerî sîyasî û bê dewlet bûnê ye. Çunku welatê wan heye. Lê ya Kurdan rewşa wan cudaye. Êk ji arîşên dî li jîyan koçberî rûbirûyê awaran dibêt ew jî nebûna cihê aknicî bûnê ye. Romannivêş li ser zimanê Lîzaye vê rewşa Babê Nazê yan jî Bêkesî dîyardike demê dibêje min ji Vêra ye bihîstîye:

“ Tu li vira li ber deryayî, bê malî... Lê tiştên din ez dikarim û heger tu bixwazî, ez dikarim oda kurê xwe bi kirê bidim te? ...Bêkes... li Lîza vegerand: Ez spasîya te dikim... Bi rastî jî ez bê xanî me ” (Babê Nazê, 2012: 122).

Bi vê çendê jî romannivêş rewşa koçberan dêxîte berçavan ku Bêkes jî nimuneke ji wan. Li dîvda jî romannivêş dîyar diket ku Bêkes ji ne çarî razî dibe. Bi pişnîyara Lîzaye dibêje:

“ paşî van gotinan bi çend rojekî, Bêkes ji ne çarî mala xwe bi koçberî di çentakî biçûk de, li xanyê Lîza dan ” (Babê Nazê, 2012: 125).

Ji ber ku berî wê demê Bêkes ji ne çarî ji ber nebûna cihekê berdewam her şevêkê bi mêhvanî li mala hevlekê diboran ji ber vê çendê jî bi pişnîyara Lîza razî bû ku bi kirê dixaniyê wê da bijît. Arîşa aknicê bûn ji wan arîşên mezin li despêka çûnê bu welatê koçkirî rûberîyê koçberan dibe li jîyana koçberîye. Romannivêş jî ev çende di romana xweda dîyarkirîye. Herwesa ji ber ew nakokên di navbera Lîza û Bêkes da dîsan ji mala wê derdikeft her weku dibêje:

“ ew derket û tu rê li ber neman ji bilî bi mêvanî rojekê li ba wî hevalî be û rojekê li cem yê din be, heya ku odak, bi dest keve. Wê roja ku Bêkes ji mala Lîza derket bi şev, li ber nivê şevê serokwezîr bi destê hinekan hate kuştin ” (Babê Nazê, 2012: 145).

Di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” romannivêş amaje beşek ji jîyana xwe ya taybet û jîyana xwe ya zarokatîyê û jîyana koçberîyê daye. Ji ber vê çendê jî berev romana jîyanama xwe ve çûye. Hewildaye jîyan û rewşa xwe û milletê xwe û rastî û resenayetîya

kultûrê miletî bi xwandevanê navxwe û bîyanî bide nasandin. Sereray nebûna cihekê ku lê binecihbibît. Di ser wê çendê ra jî dihate tawanbarkirin bi kuştina bê bêbextî. Eve jî arîşa herî mezin bû ketîye pêşîya Babê Nazê li jîyana koçberîye. Ji wan arîşên dîtir dihîne pêşîya kesê koçber ew jî xerîbî ye. Xerîbûn ji dayîk û bav û dost û hevalan û ji welatî. Romannivês jî dive peregrafê da amaje pêkirîye:

“ Xerîbtî... Xerbtî ma ji êşa wê girantir heye? - Bi vê mijûlbûnê peyvên dayikê yên pêşîn çîroka wê bi bîra Bêkes hatin: " Xwedê mala xerbtîyê xirab bike, jê nexweştir tuneye... Talbûna wê wek zilindarê ye, êşa wê girane û bê dermane. Loma jî Xwedê te'ala mirna li xerbtîyê kirîye pileya mirina şehîdan” (Babê Nazê, 2012: 91).

Dîsan amajê bi derdê xerîbî diket li ser zimanê Katya Rûsî dibêje:

“ Hîn tu nû hatî, te tenhahîyê xerîbtîyê nedîtîye. Şevên zivistanê yên dirêj û bê pêjînîya ji derve rûhê min ji devê min derdixîne... ji êvarî, her kes wek çirikan dikevin qolên xwe û li ber televîzyonê rûdinên heya hişk dibin, paşî ditemrînî û radizên. Ma ev jîyane? Erê ez ji te diprisim eve jîyane?” (Babê Nazê, 2012: 96).

Sereray derdê xerîbîye romannivês amajê bi jîyana rutînîya li welatê Swêdê diket. Bizarîya xwe sebarete jîyanê li ser zimanê Katya derdibirît. Her çende romannivês di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” pitir li ser kesayetê serekê romanê ku Bêkes diaxvît. Û cîhanbînîya xwe li ser zimanê Bêkes derdibrît. Belê roman jî bi hemî kesayetên xwe ve û cîhanbînîya wan ve jî di roman da. Ji afrandina romannivêsî ne û derbirînê ji cîhanbînîya romannivêsî diken. Bi hemî îdolojîyên xwe ve derbirînê ji cîhanbînîya nivêserî diket. Babê Nazê jî di romana xweda girinkî bi fredengîyê di romana xweda daye. Hewildaye her kesatîyek bi azadane derbirînê ji îdolojî û cîhanbînîya xwe biken. Bi taybet jî li ser zimanê kesayetê serekî di romanê da. Hewildaye civakekî azad di romana xwe da ava biket. Her kesek derbirînê ji cîhanbînîya xwe biket. Û bikevine di dîyalokê û hevdişîyêda ligel hevdû di nav romanê da. Her kesek jî bergêrî ji îdolojîya xwe biket. Katya ku êk ji kesayetê romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” daye ku ji koka xwe Rûsî ye û hatîye Swêdê û xîzan li despêkê ligel kesekê Swêdî pêkêna bû. Lê niha jî hatîye berdane, ji ber derdê tenyahîyê kesek dî koçber bi hevalîna li mala xwe xudan diket. Weku romannivêsî bi me daye nasandin dî vê romanê da. Dîsan romannivês li ser zimanê Katya ji derdê xerîbî û tenyahîyê bi vê rengî derbirîye dibêje:

“ wey xwezî te zanîba min di tenihayî yê de, çi êş û derd kişandî ye! Tu dizanî xerîbitî bi xwe rengêk ji rengên tenihayî yê ye, lê ku li xerîbê mirov bi tena xwe be, îca tekanîya wê du qat dibe, min dît, bila Xwedê bike tu nebînî! Tiştêkê seyre, heya dîwarên mala mirovî li ber çavên wî dibin ên xerîban, peşkê baranê li xerîbîyê bi hawakî din dibare... Her tişt di guhên mirov de bang dike: Tu û van dera? Here cîyê ku tu jê hatî ! ” ... Bi rastî jî wan welatê xwe ji xwe re xweş kirîye, ma çi heqê me li wan heye ? ” (Babê Nazê, 2012: 98-99).

Romannivês bi rengêkê gelek ciwan wesfa nexweşya xerîbî kirîye. Bêguman eve jî bo serbora romannivêsî bi xwe dizivrît. Li jîyana koçberî û li xerîbî burandîye. Lewra şîyaye bi rengêkî gelek ciwan derbirînê ji hest û cîhanbînîya qehremanên romana xwe biket. Herwesa romannivês amajê bi rewş û xerîbîya Bêkes diket. Ka ketîye di çi rewşeka derunîya alozda ye. Dibêje:

“ Bêkes jî bi xemgînî ji bingehê polîs derket. Vê carê jî hemû caran bêtir dilê wî bi wî şewtî û hîn bêtir hest bi xerîbîya xwe kir. Bi gava pêşî jî kelegirî ew girt, lewra kes bi xwe nedît ku gazinên xwe pê bike û ya dilê xwe jê re bêje. Piştî çûna sedek erd, wî bê şerm hefsar ji hêstirên xwe re berda ” (Babê Nazê, 2012: 149).

Romannivês bi rengêkê gelek balkêş ew barê derunê qaremanê romanê ketî ye têda bi me dete parvekirin. Evê çendê jî hêlaye em bi başî hest bi derunî ya lehengê yan kesayetî serekî romanê bikin. Romannivêsî giringîyeka taybet bi derunya kesayetê serekê romanê daye ku Bêkese. Bi vê çendê jî mirov hest bi mezinahîya karêgerîya tawanbarkirina nivêserî bi kuştina bêbextîyane diket ku rûberûyê êş û heyecaneka derunîya mezin bûye. Bi vê giringîdana bi derunîya kesayetîya romanê. Em hest bi karêgerîya edebî Rûsî li ser romannivêsî dikin. Ji ber ku romannivêsî xwandina xwe li welatê Rusya di biwarê edebîyatnasî da bi dumahîk êna bû. Ê bi edebîyata Rûsan daxbar bû û berhemên wan jî xwandî bûn. Em dişên bêjîn romannivês ji dû kanîyan av vexarîye ji kanya folklorê Kurdî û ji kanya edebî Rûsî. Karêgerîya her dukan jî dê vê roman da berçav dibe. Romannivêsî gelek pend û serhatîyên Kurdî dê vê romanê da bikarînayîne. Herwesa giringîyeka taybet bi derunîya kesayetîyên romana daye li jêr karêgerîya edebî Rûsî da. Herwesa piştî ku biryar day ji mala Lîza ye derket, dibêje:

“ wî biryarek weha stend, tevî ku dizanî li Stokholmê dîtina xanyekê pir dijawabê ”
(Babê Nazê, 2012: 139).

Li vêrê jî dîsan behsê arîşa aknicîbûnî diket ku ji arîşên mezine dikevîte rêya koçberan da. Êk ji wan arîşên dikevîte rêya koçberanda li jîyanê koçberîye regez persitî ye, beramber koçberan. Babê Nazê di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amajê bi vê arîşeyê di nav civaka Swêdî da diket. Di vê peregrafê da amajê pêdiket:

“ Lê belê bi dîtina wêne û vekolîna pêre her tilên gunehbarîyê bi aliyê porreşan ve diçûn. Ê peyva " porreşan " di rojên dawî de ji ser zimanên piraniya xelkên cî da nediket " girtina mirovekî ji ber rengê wî, rengê ji rengên hovîtiya mirovane ... ” (Babê Nazê, 2012: 14).

Bi vê çendê jî rexnê li xelkê Swêdê digire ku bi çavekê nizim temaşeyî koçberan diken. Ê bi porreş bi nav diken. Li vir jî romannivês tîşkê dxîte ser egerekê dî tawanbarkirina xwe. Ew jî ji ber ku kesekê koçbere û porreşe. Dîsan romannivês li ser zimanê Katya jî amajî bi regez persitî û berixwedana Swêdîyan bo koçberan diket dibêje

“ li vira jî tevî ku nasnama min Swêdî ye, her ez di çavên xelkê de bîyanî me. Rîya ku min qetandîye hîn li pêşîya teye ... ” (Babê Nazê, 2012: 99).

Bi vê çendê romannivês têwanîna Swêdyan sebarek koçberan bi giştî dîyardiket ka bi çi reng û awayî ye. Heta ku nasnama wî welatî jî bi dest xweve bîn. Lê her bi çavê bîyanîyan temaşerojnam wan diken. Herwesa romanivês li ser zimanê kesekê ku bi navê hunermend bi me daye nasîn. Amajê bi regez perstîya wî diket demê dibêje:

“ - ez tişteke tê naghim çima komonîst tên welatê kapîtalîstan? Bo nimûne, ez bi xwe dijî komonîstame û ez ji welatê wan hatme cem hevalê hizra xwe. Lê hûn komonîstin ji şûna ku hûn herin... Kê ji te re gotî ye, ko ez komonîstim? - Bêkes gotina wî birî û pirsî : - min bihîstîye... -Te nerast bihîstî ye. ... - Hema hûn Kurd hemû komonîstin û li vira , li welatê demokatan hûn direyîn .. Bi peyvan " reyandinê " hêrs hate Bêkes ... ” (Babê Nazê, 2012: 135).

Li vir nîv rastî û renga regez peristyek di axiftna hunermend da dîyardibît. Ji ber romannivês “di salê 1861 tevî refên hizba şîw'ya Sûrya bi bû” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 07.04.2019). Pişra jî dest ji endamtya vê hizbê berda bû. Bi vê çendî jî Bêkes

nîneratîya dengê romannivêsi diket di nav romanê da. Bêkes derbirîn ji cîhanbînîya romannivêsi diket. Belê demê hunermend dibêje hîn Kurd hemî komonîstin. Eve jî regez persitî ye beramber Kurdan. Ji ber ku dibe hindê Kurd komonîst bin lê giştandina vî navî ser Kurda ne cihê rastî ye. Û bihna regez persitê jê dihêt. Dîsan romannivêsi helwestî Lîza bi me dete nasandî weku xudana malê dibêje:

“ ev çî ye? - Lîza bi ser wan de hat û got - çî cîyê ku Kurd lê hebin, tim gengeşa politîkî li wir vedibe... Bese! - Wê berê xwe da hunermend û jê re got : - Qey tu dixwazî şeva min xera bikî ?” (Babê Nazê, 2012: 136).

Ev tîrwanîna Lîza weku rexnegirtinek beramber Bêkesî ye. Lê dîsan nêzêkî rastîye ji ber ku pîrsgirêka Kurdan û qedera wan bi sîyasetê ve girê daye. Ji ber vê yekê jî piranî di kombîn û dîyalokên di navbera xwe da yan jî di navbera xwe û bîyanyan da. Çi ji layê wan bi xwe ve yan jî ji layê kesî beramber ve. Mijarê dibene ser danustandina sîyasî. Weku di vê romanê jî da romannivêsi amaje pê daye. Dê vê romanê da romannivêsi tîrwanîna bîyanyan sebarek Kurdan li welatê Swêdê bi me daye nasîn. Ev romane weku belgenameyeka mêjûy ye. Rengvedana jîyana Kurdan li koçberî li welatê Swêdê di nav xweda hembêzkirîye. Bêkes demê bo cara duyê jî diçîte şevbîrîka Lîzayê dîsan axiftina xwe ya cara pêşîn bi rengê sitran dibêje

“ - Kurd bi tîfingê dibin, bi demançê dibin, ew ne karê mine, çekdarîya min şûşeye ... Çekê xwe deyine ser masê û xwe teslîm bike!” (Babê Nazê, 2012: 108).

Li vir mebesta Lîza bi şûşê û şûşa meyxweşi ye lê dîsan bi vê çendê jî romannivêsi dete dîyarkirin ku Kurd di çavê Lîza da weku kujdar dihatin temaşekirin. Lê bi rengê henekî amaje bi vê çendê kirîye. Ev çende jî li jêr bandora ragehandina Swêdê da. Herwesa romannivêsi amaje bi rastîyeka dîya jîyana koçberî kirîye. Ew jî arîşa nezanîna zimanê welatê koçbere daku bikart regeznama wî welatî û parê sosyalê wergirt, pêdivîye beşdarî xolên fêrbûna zimanê bibît. Weku romannivêsi di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da jî amajê bi wê çendê diket ku Bêkes diçûye xwandina zimanê Swêdî.

“ her sibeh Bêkes diçû xwandina ziman” (Babê Nazê, 2012: 138).

Herwesa êk ji egerîn derketina xwe jî bo komîsar bu wê çendê vedigerînit ku neşîya li mala Lîzayê bixwane. Di ve peregrafê da

“ ... *Li ser pîrsa komîsar : " Çima tu roja kuştina serokwezîr ji mala Lîza derketî? "* *Bêkes weha bersîva xwe da : " min nikarîbû xwandina xwe bikira û li mala Lîza rehetîya xwe bîstanda...*” (Babê Nazê, 2012: 146).

Herwesa ji ber mijara tawanbarkirina xwe bi kuştinê qaremanê romanê Bêkes hest bi bêumîdîyê kirîye. Helwestê xwe beramber mirovan derbirye û mirin li bîra xwe îname. Herwesa amajê bi rewşa xelkê Swêdê jî diket ka ketine dî çî rewşeka derunî da. Weku dive peregrafê dîyar dibe:

“ *bawerîya xwe bi awakî din li ser mirov digot : " erê mirov bi 'aqil, dêm û spehîbûna xwe bi ser hemû mexluqan dikeve, lê di rêya xerabîyê de ji hemû mexlûqan hovtîre " ..., ji ber ku bûyera kuştina serokwezîr ew xistbû xir û cîrek gîyanî û ne tenê ew herweha mirovên cî û kesên bîyanî jî...li ber kamîra bi temaşekirina melyonan hêsr û rondik dihatine xwar û diherîkîn*” (Babê Nazê, 2012: 11- 12).

Bi vê çendê jî romannivêsbêhvî bûna Bêkesî qehremanê romanê dîyardiket. Bi vê çendê jî em dikarin bêjin pitir roman li jêr sîbera rêbaza realîzmê da hatîye nivêsin. Romannivêsbêhvî jîyana koçberîye û resenatîya mîletê Kurd berçav kirîye. Bi taybetî jî dibin sêhwana realîzma rexnegrane da hatîye nivêsin. Û digel hindêk taybetmendîna realîzma sosyalsîtî jî têda dîyardibin. Lê her dibin rêbaza realîzmê da hatîye nivêsin rastîya jîyanê de vê romanê da rengve daye.

2.2.5. Kultûr

Helbet her gel û civakê di cîhanê da kultûrê xwe yê taybet heye û bi wê taybetmendîya heyî dihête nasîn. Mîletê Kurd jî xwedan kultûrê xwe yê taybete. Kultûr ji civakê bo civakê dî dihête guherîn kultûr hemî layên jîyana mirovan vedigire. Mirov her ji despêka ji dayîk bûna xwe ji layê xêzan û civakê ve dihête fêrkirin. Kewate kultûr bi rêya bumaweyî (îrsî) nahête veguhastin. Belku bi rêya fêrbûnê ji dundehekê bu dundehekê dihêne veguhastin. Bi vî rengî kultûr hatîye pênasekirin “ew komeke pêkhatîye ji zansit, bîr û bawer, huner, akar, yasa û rêz û seruber û hemî ew fêrbûn û 'adetên mirov wek endamek ji civakê werdigirî” (Cîhan Îsma’îl, 2011: 16). Herwesa bi vî rengî jî dîsan kultûr hatîye pênasekirin “ bi ramana rêkxistina roşenbîrî û dab û nerîta dihêt ku ji dundehekê bu dundeheka dîtir di nav civakê da cihgîr dibe” (Hesen îwsif, 2013: 86). Kewate her civakê kultûrê xwe yê taybet heye ku derbirîna jî rêyeka taybet bo jîyanê diket. Ji ber ku

mirov di koka xweda gîyandarekê civakîye û hejî bihevira jîyanê diket “ eger çî civak ji komeka kesan pêkdihêt ku pêkve li devereka cografiyayî dijîn, lê kultûr sîstem û şêwazê jîyana van kesane” (Cîhan Îsma’îl, 2012: 20). Kewate kultûr ew rêk û şêwazê jîyanê ye ku xelkê her civakekê li ser diçin, û ji dundehekê bo dundehekê dihêne veguhastin bi rêya fêrkirinê di nav xêzan û civakê da. Romana Babê Nazê jî “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” jî heligira kultûr û dab û nerîtên Kurdewarî ye. Bîr û bawerî jî beşek ji kultûrî yan çandê dihêne hijmartin û di ve peregrafê da amaje pê kirîye:

“ li nav zarokan dilîst, ji nişkave zingînî bi guhan ket û bi bazdan çu dev dayîka xwe û jê pirsî : " yadê, wa dayîkê çima guhên min wek darê têlên darê dikin zing - zing? " Dayîk bi wî re girinjî û got : " netirse kurê min, mana xwe yek qala te dike. Heger zingînî ji guhê rasê tê, mana xwe bi xêrê qala te diken û ku ji guhê çepê bê, dibe hinek bi nebaşî qala te diken” (Babê Nazê, 2012: 12).

Babê Nazê vîyaye xwe û miletê xwe bi xwandevanê bîyanî û navixweyî û komîsarî bidet nasîn di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da amaje pêkirîye.

“ wî dixwest her tiştî bêje, her tiştî, da ku ew nasbiken ew ne mirovekî bê koke û rehê dara wan ne li ser tehtê şîn hatiye û ne bêbere. Lê bi çî hawî wê bikarbe vê tiştî bêje wî ne dizanî” (Babê Nazê, 2012: 22).

Ji ber vê çendê jî weku helwest wergirtinek beramber ewa bi wî ve hatiye girêdan... Penabiriyê ber nivêsa romanê weku alavekê bu bergêrî kirinê ji xwe û miletê xwe. Her weku vê çendî li despêka romanê da û di gotarekê da binavê "gotine divê " da. Armanca nivêsa xwe dîyardike dibêje: “ Bi taybetî vî tiştî hişt ku ew êş û zora ku gehîşt me, derxînim ji derve. Vê êşê, weha xwe da dilê min, heta min nikarîbû gotina xwe negota. Min gotina xwe, ne tenê bi qîjînî got, lê heya ji min hat, min xwest perçek ji kultûra Kurd, çî baş û çî xerab, realîtek objektîf, di hindek qehremanên çîrokê de berceste bikim” (Babê Nazê, 2012: 7).

Bi vê çendê jî parçek ji jîyana xwe û xêzana xwe parçek ji rastyê û digel xeyala xwe têkel kirîye. Em şên bêjîn qehremanê romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û kesayetê serekî di romanê da ku bi navê Bêkes bi gelek xeslet û taybetmedîyên xwe dişibehe xudanê romanê bi xwe ku Babê Nazê ye ji ber vê çendê jî roman pitir berev romana jîyanama xweyî ve çûye. Ji ber ku rastî û xeyala xwe têkel kirîye. Ji ber ku jîyanama xwe ji

taybetmendîyên wê rast goyîye. Dîsan ji ber ku dibe romannivêş neviyaye bi rastewxwe hemî nehênîyên jîyana xwe basbiket. Ji ber hindê penabirîye ber romana jîyanama xwe ku pîtir azadîya derbirîna nehênîyan heye ku li ser zimanê qehremanan cîhanbinîya xwe derbibirît. Romannivêş jî bi vê çendê jî aghdare ji ber vê çendê jî li pêşekîya romana xwe da di gotara "gotinek divê" amaje bi vê çendê kirîye dive romanê da dibêje: "Weha realîtiya jîyanê tevî xeyalî dibe, heya hindê xwandevan, di karin bibêjin ku Bêkes filane, Katya filanê ye û Comerd filanoye. Helbet, tiştê ji rastyê têde heye, lê nayê wê wateyê ku ew kesên heyîna wan di jîyanê de hene, beşdarên bûyerên çêrokê ne. Heger tenê, çarçova jîyana nivîskar û nimûnan, çarçeva roman û çîrokan be, êdî ewê ne berhemên edebî bin" (Babê Nazê, 2012: 8).

Herwesa di nav romanê jî da amaje bi vê mijarê kirîye ku pê nexweş bûye li ser jîyana xweya taybet baxvît bu komîsar dive peregrafê da dibêje:

"bê ku zanibe çima, ev pris bi Bêkes tal û nexweş hat. Dibe ji bo ku ew neçar bû tiştên jîyana xwe yê taybet ji kesên nenas re, çî wergêr û çî komîsar, bide xuya kirin... " Komîsar kê ev heq daye te ku nehînen jîyana min nasbikî?" (Babê Nazê, 2012: 46).

Li vêre jî romannivêş ku ne bi dilê wî bu li ser jîyana xweya kesokî baxvît. Belku her ji ber vê egerê jî bit. Penabirîye ber romana jîyanama xweyî daku bi rengekê nerastewxwe li ser zimanê kesayetê romanê û qehremanê romanê hizir û hest û soz û cîhanbinîya xwe sebarê tawanbarkirina xwe bi bêbextî bi azadane derbibrît bê berçav wergirtina hêlên sor. Herwesa romannivêş gelek girîngî bi derunî kesayetê romanê daye. Bi taybetî jî kesayetê serekê romanê Bêkesî. Gelek menelokên wî di vê romanê da amaje pê kirîne. Herwesa ev romane weku menelokekê ew dîyaloka di navber Bêkes û komîsar da peydabûye bi me dete nasandin. Herwesa ew menelokên di navbera Bêkesî û Lîzayê û Katya û kesayetên li şevbirîkên mala Lîza di navbera Bêkes û berhev bûyanda derketîne bi me dete nasîn. Di nav da jî beşek ji kultûra Kurda û şîretên Babê xwe û kultûrê bîyanî bi me dete nasîn. Romannivêş penabirîye ber serpehatîyên Kurdewarî. Ji layekê ve vîyaye kultûra milletê xwe bi komîsarî û xwandevanî bîyanî bidete nasîn. Ê jilayekê dîtirve ev serpehatîye weku hikmeta milletê xwe bikarînaye. Di wê vekolîna komîsarî pêra kirî. Li ser mijara kuştina Olof Palme serokwezîrê Swêdê da pêra hatîye kirin. Axivtina xwe pê nexşandîye û bergirî ji xwe kirîye. Sebarê wê tohmata bi wî ve hat bû girêdan. Vê serpehatîya Kurdewarî vedigêrît dive peregrafê da:

“dibêjin carekê mirovek û cehişka xwe li çole û berîyê winda bûn. Piştî çend rojan mêrik pir birçî bû. Ji xwarina cehişkê pêve tişteke li ber nema. Lê belê di dîne wî de goştê keran heram bû. Loma seraser nikarîbû biryara xwarina goştê wê bistîne. Li dora wê diçû dihat, her li fetwayekê digerîya. Û ji birçîbûna, fetwayek ji xwe re dît. Wî ji xwe re got: Ma ev ji ku cahişke! Ev xezale û guhên wê yê keroşkane. Dûre wî mirovî bi keroşkî cehişka xwe xwar... ” Bêkes bi temambûna çîrokê ji wergêrî re got: Ji komîsar re bêje, bela ew ji bê çareyî duvikan bi min ve neke” (Babê Nazê, 2012: 45).

Bi vê çendê jî romannivêş dê vê romanê da ji layekê ve mifa ji pend û serpêhatîyên miletê xwe wergirtîye. Û axiftina xwe pê nexşandîye daku bergêrî pê ji xwe biket. Ji layekê dîtir ve hikmeta miletê xwe bi komîsar û xwandevanê bîyanî dete dîyarkirin dê vê romanê da. Herwesa nivîskarê Daxistanî Resul Hemzetov jî di romana xweda ya binavê “Daxistan Welatê Min” beşek mezin ji kultûrê welatê xwe di vê romanê da dîyardiket. Babê Nazê jî daxbarbûna xwe bi vê romanê dîyardike dibêje “ romana daxistana min ya Resul Hemzetov gava min xand. Gelek ewî ser kultûra miletê xwe nivîsandîye derxistî ye. Lê min jî gelek hizr kir. Ez çawa bihêlim hikmeta çem miletê Kurd heye bi dem xweya kirin, min “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” nivîsand” (bi Babê Nazê re hevpeyvîn: 2019). Li vêrê jî romannivêş armanca xwe ji nivêşîna romana xwe dîyardiket ku vîyaye hem helwestê xwe û peyama xwe ya nerazîbûnê bi rêya romanê derbibrît. Hem jî vîyaye kultûr û hikmet miletê xwe dîyarbiket. Bi vê çendê jî romannivêş ketîye bin bandora ew jîyana li zarokatî di nav da jîyaye. Karêgerîya kultûr û folklorê Kurdan li ser dîyare bi vê çendê jî pend û serpêhatîyên kurdewarî di nav romanî da rengvedaye. Û cihekê berifre ji romanê bi xweve girtî ye. Herwesa romannivêş tişk êxistîye ser kultûra Rûsî jî û giringî dan bi roja ji dayîk bûnî û aheng gêranî bi vê helkeftê dibêje:

“Îşev Lîza em daxwazî cem xwe kirine... - Kîjan Lîza? Ma çend Lîza li cem te hene? Comerd bi trane got. - Merema min Lîza kî ye? -ew yek Rûsî ye û min carekê qala wê ji bo te kirbû. ... - Û îşev çejina bûyina kurê wê yê bi tenê ye, ji ber vê yekê her kesê nas û ne nas da'wet kirîye” (Babê Nazê, 2012: 72).

Helbet Ewropî giringîyeka taybet bi roja ji dayîk bûnê diden. Û bi vê helkeftê ahengê digêrin û dost û hevalên nêzîk li hevdicivin û ahengê digêrin û kêkê qet diken. Eve jî weku beşek ji kultûr wane. Bêkes jî di wê şevê da Lîza nasdike. Herwesa romannivêş amajê bi kultûrkê di bejdarbûnê di şevbirîkên Rusyan da diket li welatê Swêdî. Ew jî birina

meyxweşî ye digel xwe bo mala ahengê mebesta peyva çek dive peregrafê da meyxweşî ye:

“ Çek ê ku kirîbû bi hevalê wî re bû. ...Wî bi lez destê xwe havêt kîsê di destî hevalê xwe de û şûşa vodka da Lîza ye ” (Babê Nazê, 2012: 79).

Her çende di civaka Kurdî da mey vexwarin bi karekê xirab dihête danan ji ber ku civaka Kurdî civakeka dîndare. Lê di civaka rojavayî da mey vexwarin tiştê normale û beşek ji kultûra wane. Herwesa amajê bi kultûrekê dî jî diket ew jî sizayê dereng mayineye ji ahengê Lîza dibêje:

“ tenê siza dereng hatinê bi tîtala şevbêrkên vexwarnê li welatê xwe, du peyale mişt vodka ji Bêkes û Comerd re da girt û got: - Ev sizayê derengîya we ye, de vexwun û bi yekcarê peyalên xwe bi ser xwe de dakin ” (Babê Nazê, 2012: 80).

Ev çendê jî weku beşek ji kultûra rojavayî li jêr karêgerîya jîngeha civakî da. Vê çendê jî di nav romana Babê Nazê da rengvedaye. Ji ber ku romannivêş li jîyana koçberî jyaye û ev romane jî li Swêdê nvêşî ye. Karêgerîya vê jîyana koçberî jî di nav romana wî da dîyardibît. Ji ber ku roman weku janrekê îsfencî ye. Di karî hemî janrên dîyên edebî di nav xweda hembêz biket. Dê vê romanê jî da stran li ser zimanê Lîza derbazdibîn weku beşek ji kultûra wan dê şevbirîkan da dê vê peregrafê da amaje pê hatiye dan:

“ gava Lîza bi rengê stranî got : - Heger vexwarin hat, emê vexwen, heger mirin hat emê bimirin û ku xurt bîn, emê dîlan bikin ” (Babê Nazê, 2012: 80).

Herwesa romannivêş amajê bi helbestekê jî diket li ser zimanê Lîza yê;

“ niha wê Lîza helbestên xwe bixwîne. ... Bo azadîyê ezê xwe bi qurban kim. Ji bo heskirinê ezê azadîyê bi qurban kim. -Welatê min, heger tu asman ba, minê stûn danîban bin te...heger tu derya ba- Minê wek vodka te vexwarba ” (Babê Nazê , 2012 : 93-94).

Ji ber ku Lîza Rûsî jî li jîyana xerîbî dijîya li welatê Swêdê vîyana xwe bu welatê xwe dîyardiket. Herwesa romannivêş li ser zimanê Lîza girîngîya azadîyê jî di jîyanê da dîyardiket ku amadeye sera azadîyê jîyana xwe jî biket qurbanî azadîyê. Dibêje bo azadîyê ez xwe bi qurban kim. Herwesa amaje bi kesayetîya Lîza jî kirîye taybet di warê

evînî da ku dibêje ji bu heskirinê ez azadîyê bi qurban kim. Eve jî girîngîya evînê dijîyana Lîza da berçav diket. Belku her ev egere jî bît. Êk ji wan egera ji ber têkçûna peywendîya evînê di navbera Bêkes û Lîza da. Weku tolhildanek agehdarî dabte polîsan. Ji ber ku beşek ji kultûra rojavayî di şevbêrîkan da meyxweş vexwarin û stran û helbest gotin û reqîs û dîlan kirine. Her weku Lîza ji mêhvanê xwe yê şevbêrîkê ra di bêjit:

“ bese rabin... Rabin em dîlanê bikin... Îvan musîqa... tangu, ez dixwazim tangu bireqsim... Ez dixwazim” (Babê Nazê, 2012: 92).

Herwesa li ser zimanê Katyayê qala kultûrê Swêdê jî diket di warê xarinê da bi me dete nasîn dibêje:

“ erê wek Swêdîya, eger ew ne li ser kîsê xwe bixwun, kesek mîna wan nikare bixwe” (Babê Nazê, 2012: 86).

Herwesa romannivês li ser zimanê Bêkesî hest bi cîyawazîya di navbera kultûrê şevbêrîka da di nav kultûrê Rûsî û Swêdê da kirîye û li welatê xwe jî lewra dive peregrafê da dibêje:

“ heta vexwarina vira jî, ne wek ya wê derê ye... Negutinên noşê û ne bi hev naskirin... mîna di civaka vir de, weha jî di şevbêrîka wan de, her kes bi xwe dikeve” (Babê Nazê, 2012: 90).

Romannivês amajê bi cîyawazîya kultûrî diket di navbera jîyana li welatê xwe û li Rusya û li welatê Swêdê da.

Romannivîs di romana “Xweşîya Bi Êş” da amajê bi kultûrên Kurda dike. Ev jî mijara gêrana ahengêye bi helkeftîna pêkînana hevjinîyê li roja şehyanê da. Dibêje;

“Lê tenê xwastekê, ji derveyî rûtînê bu ku ew jî ne lidarxistina davetê bû. Hindekan jî, ev dispartin temênê zavayî ku êdî nelgora daveta û runiştina li têniştina bûkêye. Dîyare, ji ber vê çendê, li ser xwasteka bûkê pêdivî bû, ji şuna dawete ew biçin bajêreke din û li wir, li motele sê rojên hingivînî derbas bikin (Babê Nazê, 2016: 83).

Herwesa li vir jî amajê bi dîyardeka nû dike ku bûye kultûrek di nav civakê da. Ev jî li cihê darxistina şehyanê bihelkeftina pêkînana jîyana hevjinîyê. Bûk û zava diçine

bajêreke din yan welatekê din bo derbaskirina heyva hingivînê. Weku romannivîs di vê romanê da jî amaje pêkirîye. Ev çende jî di nav kultûrê Kurdan da nêrîtekî nûye.

2.2.6. Qelsatî û Destvekiribûn

Romannivêsi dîsan di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amaje bi van her du arîşên civakî daye demê dê vê peregrafê da amajê bi qelsibûna Comerdî diket:

“ şîvek belaş ” yan ” fravînek belaş ” ji devê hevalê xwe dibihîsit. Loma jî, ew li ser guhertina Comerd dima matmayî berî her tiştî guhertina di warê çikûsîyê de. Bêkes çikûsîya hevalê xwe nedida rûyê wî, lê belê ji xwe re digot : ” me'qule ku pare weha mirov diguhere û pîs dike? ” (Babê Nazê, 2012: 74-75).

Ev çendê jî bi rewîstekê nebaş dete dîyarkirin di nav civakê da ku bi rêya kesayetîyeka romanê ev rewîşte di kesayetîya Comerdî da berceste kirîye. Bo xwandevanî existîye berçav û ji vî rewîştî haydar kirîye. Herwesa di peregrafeka di jî da amajê pê diket û demê Comerd dibêje:

“şuşak min heye, heger tu heqê wî bidî ezê te ji vê tengavîyê xilaskim” (Babê Nazê, 2012:76).

Dîsan dê romana xwe da amajê bi destvekiribûnê jî diket. Di vî warî da amajê bi şîreta Babê xwe diket demê dibêje:

“kurê min tu carî bawer neke ku mirovê destvekrî û çav fireh, bikarebe bibe xwedî mal.. ” Bêkes di nav xwe de, gotinek li ser peyva Babê xwe zêde kir û got : ” û ehmeqê mîna min jî nabe xwedî mal ” (Babê Nazê, 2012: 75).

Ji ber ku qelsibûn û destvekrîbûn jî her dû ne başin. Lê navnicî bûn di navbera her dûyan da başe. Romannivêsi xwandevanî ji her dûyan haydarkirîye.

2.2.7. Hejarî û Deyîndarî

Di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amajê bi van her dû arîşa kirîye. Li ser zimanê dayîka Bêkes amajê bi hejarî diket dibêje:

“ jinka ku ez li cem bûm, pir feqîr bû. Pirê caran nan tune bû em bixun. Loma rojekê bi destê min girt û ez anîm mala seydayê gund. Seydayê gund jî apê we bû” (Babê Nazê, 2012: 27).

Romannivêş dê vê romanî da amaje daye çîroka dayîka xwe dîroka serdemê zarokatîya wê û jîyan û rewşa hejarîya xelk têda derbaz dibûn. Herwesa romannivêş amajê bi hejarî û rewşa jîyana koçberî diket. Amajê bi hejarîya Bêkes û Comerd diket ji ber hejarîya xwe li ser guyan li tiştan digerîyan dibêje:

“ - her êvar, paşî ku reş diket erdê hevalê min Comerd li ser ser guyê nêzîk mala xwe li qerpol û pitkên kevin digerîya. Carna, gava ez lê dibûm mêvan, min jî harîkarî pê re dikir” (Babê Nazê, 2012: 70).

Li vir rewşa jîyana koçberî ya xwe û xêzanên Kurd bi xwandevanî dete nasîn ka di çi rewşê da dijîyan. Dîsan di romanê da dî perekrafeka dîtir da amajê bi hejarî û dest kurtîya xwe li jîyana koçberî diket:

“ dema ku Bêkes destê xwe avêt para û meyxweş kirî, hesabê birçîbûna du rojan kir” (Babê Nazê, 2012: 108).

Li vêrê da amajê bi nerastexwe dete wê çendê ku ji ber hejarî û dest kurtîya pareyî hindê caran bîrsî jî maye. Ji ber hindê jî bi zimanekê dijwar û rexnegriane ji komîsar ra dibêje:

“ -tu dibînî komîsar, em li welatê we gehîştin kîjan rewşê? Ew kesên ku rojekê ji rojan, li welatê xwe serê xwe ne tenê ji bo malê dinyayê ne çemandin û weha jî ji ber zordestîyê, niha jî qirêja we dide hev, bi destê xwe mîna mirîşkan bi lapuşkan di nav pîsîyê de dîvepelxînin. Te niha naskir, çima min digot " her çî yê ku di sikakên Stokholmê de ser çavên xwe digrin ne bi wataya xwe dize yan jî kujdare. " Lewra herçîye li ser ser guyan jî digere, rûyê xwe ji xelkê vedişêre. Mane bese komîsar, tu hîn daxwaza çî dikî?” (Babê Nazê, 2012: 71).

Li vêrê da hejarîya xwe li jîyana koçberî dîyardiket. Amajê bi vê arîşê diket li jîyana koçberîye. Herwesa her weku komîsar pisyar ji Bêkes kir bît te bo çî seruçav xwe digirtin? Û berisiva wî didet ji ber hejaryê û ji şerma lê gerîyanê li ser ser guyan.

Seruçavên xwe veşartin da kes nasneket. Herwesa romannivês amajê bi arîşeka dîtir jî daye ew jî deyindarîye. Deyindar bûna Bêkes ligel Comerdî li jîyana koçberîye:

“ loma jî Bêkes fîyeta şûşê avêt ser deynê xwe yê ku ew ji hevalê xwe, pê deyindar bû ” (Babê Nazê, 2012: 76).

Romannivês rewşa xwe ya aborî li jîyana koçberî bi me daye nasandin ku di rewşeka aborîya ne baş da bûye ji ber hindê jî deyindar bûye. Eger em rewşa Bêkes di romanê da bi ya romannivêsî Babê Nazê bideyin hesbandin.

2.2.8. Dizî û Fêlbazî

Romannivês dîsan dê romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amaje bi du arîşên di jî dizî û fêlbazîye kirîye. Li jîyana koçberî li dev Lîza yê ji ber ku ew ji koçber bû li welatê Swêdî dijya dê koka xwe da ji Rusyayê bû weku romannivês bi me daye nasandin. Demê Lîza dibêje:

“ xelk wek min dikin ne wek te, ez mûçeyê dînbûnê distînim... Heger karê reş bi dest min nekeve yan peyda nebe, ez wek te dest vala namînim, ez diçim dizîyê... ” Erê Lîza bi serxweşî qala dizîtiya xwe kir, lê bawerîya Bêkes bi gotinên wê hat, çunkî wê rojekê erê û yekê kincên ne li gora xwe danî û dûre difrot. Ji wê rojê û pê ve Bêkes biryara ku ji malê derkeve stend”(Babê Nazê, 2012: 138-139).

Dîsan romannivês behsê fêlbazîya Lîza diket daku muçeyê bistînit xwe dixiste qalbê dînan. Yan jî dibe nexweşîya derunî inabite xwe bi vê rêyê daku muçe ji dewletê wergirtibit. Herwesa Katya bi vî rengî fêlbazîya Lîza şilove diket ji Bêkesî ra dibêje:

“ ev bûne pênc sal ku Lîza bê ku kar bike, mûçe distîne. Her sal pêdivîye vî çaxî, ew raportê li ser nexweşîya xwe ji lîjina doktoran bistîne, ji ber vê çendê, berî çûna li wir bi hefteyekê xwe dûrî her kesî dike ji bo ku karîbe bikeve kirasê dînan” (Babê Nazê, 2012: 133).

Dîsan li vir romannivês behsê êk ji egerê derketina xwe diket ew jî ji ber ku Lîza jineka dizîker bû. Dîvda jî di vê romanê da amajê bi du egerên di jî diket ku girêdayî xîyanetê ne û razana Lîza bi kurekê genc li şevêkê û li şevêka dîtir ji digel dû zelaman.

Dibêje eve bûne eger ez ji mala wê derkevim. Herwesa romannivêş dê vê peragrafê da dîsan behsê fêlbazîye diket li ser zimanê Lîzayê dibêje:

“di vî warî de, Fînî û Qereçî xurtin. Berî çendekî di rojnamê de nivîsand bûn ku yekê Fînî xwe li ser pênc sosyala nivîsandibû û pare ji her pêncan jî distend ...” (Babê Nazê, 2012:123).

Herwesa romannivêş amajê bi wê fêlbazî diket. Ya Lîza fêrî Bêkesî kirî bû wergirtina parê sosyala xanî Lîza dibêje:

“jê hesantir tu neye. Tê xwe li ser mala hevalekî binvêşî wê sosyal kirêya xaniyê hevalê te bide û ji ber ku tê ne li mala wî be tê para nede wî, lê tê bidî min ...” (Babê Nazê, 2012: 123).

Li vêrê romannivêş rewşa koçbera dîyardiket ku jîyana xwe bi rêya ew parê jê sosyalê anko çavdêrîya civakî li welatê Swêdê werdigirin. Jîyana xwe bi wî pareyî derbaz diken. Bêkes jî yek ji wan kesan bû ku li ser parê sosyal jîyana xwe derbazdikir. Dê vê romanê da romannivêş hewildaye romana xwe biket xwedîkek û rewş û derdên jîyana koçberî bi xwandevanî bidet dîyarkirin ku romannivêş bi xwe jî li welatê Swêdê koçber bû.

2.2.9. Eşkencedan û Nebûna Azadîyê

Dê romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amaje bi van her dû arîşan kirîye despêkê behsê welatê Swêdê diket dîvda jî behsê welatê Sûrya diket. Weku berawirdyekê di navber wan da diket. Li vêrê amajê bi ew vekolîna li welatê Swêdî pêra hatîye kirin diket, dibêje:

“ axavtin û vekolîna polîs ya bê îşkence pêre, nema her tişt li cem wî bibûn sipî, yan reş” (Babê Nazê, 2012: 38).

Dîsan dî vê peregrafê da dibêje:

“ wey Xweda! Polîsê ku berê xwe dide vekolînê, biyê ku hizra îşkencê têkeve dilê wî, çiqasî mezîne !” (Babê Nazê, 2012: 44).

Li vir romannivêş weku pesindayinekê sersurmanîya xwe bi polîs Swêdê dîyardiket. Dê vê peregrafê da jî egerê vê gotina xwe dîyardiket.

“ Bêkes ev tiştê ha got, lewra ew bi xwe di du vekolînên polis, ên ne wek hev derbaz bibû. Vekolîna pêşî li welat pêre hatbû kirin û polisê wê deverê destpêkê bi nermayî pêre axivî, da ku ew li xwe û hevalên xwe mikur bê, lê dema ku naskirin bi vê awayî nagihê armanca xwe, seraser serederîya xwe guhert û ew da ber lêdanê û bi her awayî hate îşkence kirin” (Babê Nazê, 2012: 44).

Babê Nazê di hevpeyvîna xwe jî da amajê bi girtina xwe li Sûrya diket û dibêje “ li Sûrya sala 1962 bo demê sê rojan ez hatim girtin vekolîn gel min kirin. Li sala 1964 bû demê heyvekê ez hatim girtin û vekolîn digel min kirin û hatime eşkencedan jî. Ji ber egerên sîyasî û tevlibûna min digel hizba şîw'ya Sûryayê” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn: 2019). Dîvda jî amajê bi vekolîna pêra hatiye kirin li Swêdê li ser mijara kuştina serokwezîrê Swêdê Olof Palme dibêje:

“ vekolîna dûyê, ya ji ber pirsê kuştina serokwezîr bû. Bi çûna cem polis, bê ku bixwaze vekolîna pêşî ya li welat bi bîrê hat. Ji bo vê yekê wî texmîna îşkencê her li vira jî dikir” (Babê Nazê, 2012: 44).

Romannivê berawirdîyek êxistîye navbera Sûrya û Swêdê da. Herwesa behsê rewşa Kurdan diket li Sûrya. Ji ber nebûna azadîya sîyasî û ruşnibîrî ka di çi rewş dane ser wê eşkencedan û zilim û zorî dest ji Kurdatîya xwe ber nedane dive peregrafê da dibêje:

“ kesên me bi êşkencê dihatin kuştin û xwe ji navê xwe bêrî ne kirin” (Babê Nazê, 2012: 48).

Herwesa romannivê bi diyaloka Bêkes bi komîsyar ra tîşkê dîxîte ser nebûna azadî li Sûrya dibêje:

“ ma tu yê çawa tê bigihî, heger tu tûşî mehrûmkirinê ji mafên mirovayetîyê nebûye? ! Lê herçî Kurd, di heya em ji navê xwe mehrûmin û nabe ku em navê xwe li zarokên xwe bikin. Te niha naskir, boçî mirovê Kurd du navûne? Navekî fermî li cem hikûmetê heye û navekê din li malê ye” (Babê Nazê, 2012: 47).

Bi vê çendê jî romanvê weku ruşnibîrekê behsê rewşa Kurdên li Sûrya diket ku ji mafên xwe yê mirovayetî hafîne bê barkirin. Di vê romanê da “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” ne tenê bergêrî ji xwe diket. Belku bergêrî ji milletê xwe jî diket. Herwesa romannivê amajê bi ne azadîya zimanê Kurdî diket li Sûryayê ji komîsar di bêjît:

“ heger di dibistanê de li ser peyvek zimanê xwe, te felaqek bi xwara? Lê em dive dibistanê de derbazbûne û tevî weha jî navê me, zimanê me li ber çavên me reş nebûye ”(Babê Nazê, 2012: 48).

Dîsan romannivêş behsî girîngîya zimanî diket li ser zimanê Bêkesî dibêje:

“ ho û ho ziman .. Tu çi dikî û çi nakî !! Heger ew bê parastin, gel tê parastin. Erê bi parastin zimanê xwe gel xwe diparêze û weha jî zimanê spehî, xwedîyê xwe spehî dike...” (Babê Nazê, 2012: 63).

Romannivêş girîngîya zimanî bu xwandevanî dîyardiket. Dete dîyarkirin bi parastin zimanî gel û millet têne parastin nasnama xwe berze naket. Herwesa bi zimanekê spehî û rehwan dikarît bergêrî ji xwe û milletê xwe biket. Herwesa tîşk êxistye ser mijar û nişanên bê dewlet bûnê ji komîsar ra dibêje:

“ lê yê te, tenê Swêdek te heye û bi şanazî tu xwe pê bi nav dikî. Lê ez bê welatim tevî ku welatê min heye, ez lalim tevî ku zimanê min heye û ez windayî me, tevî ku nav û warê min heye ... Komîsar te niha zanî ez kîme?” (Babê Nazê, 2012: 49).

Li vir romannivêş bi rengê balkêş rewşa xwe û milletê xwe bi nebûna azadî li Sûrya bi komîsarî û xwandevanî dete dîyarkirin. Romannivêş di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” hewildaye êşa xwe li jîyana koçberîye û êşa milletê xwe li Sûrya bi komîsarî û xwandevanî bi dete dîyarkirin. Dîsan romannivêş li ser zimanê Bêkes amajê bi rewşa Kurdan li Sûrya diket dibêje

“ lê tu dizanî ku roj bê girî li ser gelê me naçe ava? ” (Babê Nazê, 2012: 50).

Herwesa amajê bi berxwedana Swêdîyan bu koçberan û nişanên bê dewlet bûna xwe diket dibêje:

“ komîsar. Xwezî te zanîba, çiqasî ez xwezîya xwe bi rewşa serxweşê we tînim! Ew di meşa xwe de, ditewitihin, lê lingên wan li ser bingehê hişke, çunkî axa bin lingên wan axa welatê wane. Erê ew ditewitihin, lê di çavên we de ew ji me sipehîtir dimeşin. Kincê wan ên qelêrî û madên wan ê qezûzî, di çavên we de, ji me xweştir û paqijtrin. Û” hîr hîra ” wan li ber guhên we ji wişwiş û pista me nizimtire... Ez xwezîya xwe bi wan tînim, lewra ew xwedî welatin, lê ez ?” (Babê Nazê, 2012: 57).

Li vir romannivêş amajê bi têrwanîn û berixwedana Swêdîyan diket. Dibêje serxweşê wan evê li cada dimîn di çavên wan da bi qedirtirin ji wan kesên koçber li welatê Swêdê. Herwesa romannivêş amaje bi curekê dî eşkencedanê kirîye di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” ew jî eşkence dana derunî ye li demê vekolîna komîsarî ligel Bêkes li ser mijara kuştina serokwezîr Swêdê Olof Palme dibêje:

“ vekolîna polîs pêre, li ser kuştina serokwezîr, ji hemû rengên eşkencan dijiwartir bû ” (Babê Nazê, 2012: 52).

Ji ber ku Babê Nazê dê hevpeyvîna xwe jî da dibêje “bo demê 10 heyvan vekolîn ligel min berdewam kir. Her demekê bu demekê dihatime xastin bo bingehê polîsan bû vekolînê yan polîs dihat bo vekolînê ligel min li ser mijara kuştina Olof Palme û li jêr çavdêriyê da bûm” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn: 2019). Her çende tuşî eşkencedana gîyanî nebûye. Lê ev vekolîn û çavdêriya dum dirêj ligel romannivêşî bû wî weku eşkencedanka derunî bû. Ji ber vê çendê jî romannivêş dibêjin ji hemî eşkencedana dijiwartir bû.

2.2.10. Berdan

Babê Nazê di romana “Stokholmê Te Çi Dîtîye Bêje” amajê bi arîşekê diket. Di nav civaka Swêdî da ew jî arîşa berdanê ye. Helweşandina xîzanê di navbera jin û mêran da. Demê dive peregrafê da Katya dibêje:

“-na, min yekê Swêdî kir, lê piştî çend salekê me hev berda” (Babê Nazê, 2012: 98).

Dîsan dî vê peregrafê jî da amaje bi vê mijarê kirîye dibêje:

“ piştî berdana mêrê xwe, min nikarîbû bi tena xwe bimînim. Loma " mirovê te " bi min re dijî û li ser hala de. Ez wî xwedî jî dikim...” (Babê Nazê, 2012: 95-96).

Her weku dî romanê da ji bo me dîyar bû Katya bi xwe jineka Rûsî bû li despêkê hevjinî gel kesekê Swêdî pêkîna bû niha jî hatiye berdan. Daku xwe ji derdê tenyahî rizgar biket, kesekê li mala xweda xudan diket. Romannivêş hewildaye vê romanî da ne tenê behsî arîşên xwe yên kesokî biket. Belkî behsê arîşên civaka Kurdî li Sûrya diket. Herwesa jî behsê arîşên koçberî li welatê Swêdê jî diket. Weku arîşa berdanî di nav civaka Swêdê

da. Anko romannivês ketîye jêr karêgerîya jîngeha civakê Kurdî, Rûsî û Swêdî da. Vê çendê jî di nav romana wî “Stokhumê Te Çi Dît Bêje” rengve daye. Dîsan romannivês amajê bi vê arîşê diket di nav civakê Swêdî da. Birêka ew dîyaloka di navbera Katya û Bêkesî da dibêje:

“-çima îşev Îvan ne wek her care ?-Jina wî ji bo vexwarin û şevbêrkên ji dervî malê, ew berda...-Him ...-Bêkes got û di nava xwe de mijûl bû : " min got zirna wî şikestî ye ! " (Babê Nazê, 2012: 137).

Lê romannivês di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da piranî arîşe êxistine ber çavê xwandevanî helwestê xwe yê rexneyî beramberî wan ragehandîye. Bê ku amajê bi çareserkirina wan bidet. Bi vê çendî jî em dikarin bêjin ev romane romannivêsî li jêr sihwana rêbaza realîzmê da nivêsyê bi taybetî jî realîzma rexnegrane.

2.2.11. Mafê Jinê û Neazadîya Wê

Romannivês di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amaje daye rewş û mafê jinê. Demê dayîka Bêkes behsê jîyana xwe diket dibêje:

“ paşî ku temenî min bû 12-13 salî, seyda mehra min li xwe birî, ji bo ku xwe ji nezera heram bihemîne. Dûre bi du salan, ez anîm. Sal nezîvirî birayê we yê herî mezin çêbû ” (Babê Nazê, 2012: 28).

Li vir romannivês amajê bi şukirina dayîka xwe daye di jîyekê biçûk da. Lê tenê êxistîye berçavan bê ku tiştê li ser bêje. Herwesa Katya Rusî behsî rewşa jîyana xwe diket dibêje:

“ Katya keserek ve da û got :-helbet ku zarok û mêrekê min wek ên xelkê hebûna, wê rewşa min ne weha bûya... Ma ne ez zarokan naînim. Di keçanîya xwe de û paşî ku mêr kir, her min zarok ji ber xwe dibrin û niha jî ez nema di karm wan bînim ” (Babê Nazê, 2012: 97).

Romannivês di vir da tişk xistîye ser du mijarîn di di nav çivaka Swêdê da. Ew jî ji ber birina zarokan di jî gencatîyê da. Ê dîvda jî serencam dibe egerî nebûna zarokan li demê ew dixwazin. Ev jî weku arîşeka civakî ye di nav civakê rojavayî daye amaje pê kirîye. Ji ber ku romannivês li Rusya xwandibû. Ê zimanê Rûsî dizanî. Ji ber wê çendê li

jîyana koçberî jî pitir nêzikî revenda Rûsî bû. Û têkelî koçberên Rûsî dibû li Swêdê. Ji ber vê çendê jî du kesayetîn romana wî yên serekî jî Rûsî ne. Bi navê Katya û Lîza. Herwesa di romanê jî da behsê rewşa jina Rûsî jî diket. Li ser zimanê Katya Rûsî dibêje:

“ jinên ku hatine vira piranîya wan di restoran û meyxana de kar dikirin, tu li Sovyetê mayî û tu dizanî ku kesê li van cihan kar dike, bi rêya dizîyê bi hezaran rûbîlan dicivînin, lewra bi asanî, bi 24 hezar markî bi yekî Fînlendî şû dikin û ji welat derdikevin. Ew para didin ji bo ku derkevin û vaye tu dibînî, niha ew li virin û bê mêrin ” (Babê Nazê, 2012: 98).

Dê vê romanê da romannivêş amajekirîye bi rewşa jina Rûsî çawan dihêne Swêdê. Çawan şûdiken pişra jî dihêne berdan ji ber ku hevjinîyeka berjewendî xazîye bi pare şûdiken. Romannivêşî xwandevanê bîyanî ji rewşa jina Rûsî û civaka Swêdî jê agehdar kirîye ka dî çî rewşê daye. Herwesa Katya bi vî rengî behsê rewşa xwe diket dibêje:

“-çima ... çima ma tu nabînî em rojên xwe dispêrin hev û mayne nîv mirov! Hîn nûhî û tu dikarî nede ser şopa me ” (Babê Nazê, 2012: 111).

Herwesa romannivêş amaje da berixwedana jinê bu zelumî demê Katya di bêjite Bêkesî

“ ez dizanim hûn zilam toxmî teresin ji bu şehweta xwe, hûn dikarn hezar derewa bikin û ya baş ewe ku ez û tu tenê dost bin ... ” (Babê Nazê, 2012: 112).

Li vir romannivêş cîhanbînîya Katya jî bi me daye nasandin ka bi çî rengî temaşeyî zelumî diket weku jinekê.

Jin di nav civakê da rolekê girîng di nav civaka Kurdî da digêrt û bi nîva civakî dihîte danan. Romannivêş dê romana xwe “Xweşîya Bi Êş” da ruberekê berfire daye arîşên keçê û kesayetên romana xwe jî dû keçan helbijartine. Piranîya romanê jî li ser zimanê Sûlav û Medya vegêrîyaye. Romannivêş ronahî xistîye ser mijara keçê û zordarîya li ser keçê li ser zimanê Sûlav dibêje:

“Zordarî mêrxasîya tirsonekaye ...” bi vê bîranînê, wê bi dengê bilind got “wey Xweda! Ev gotin çiqasî, bi rastî hatîye gotin! Ma zordarîya hemberî keçê li mala Babê û hemberî wê piştî şûkirinê, çî mêrxasî têde heye ...ma ev zordarîya ha ne

ji ber tirsê ye? Heger ne ji ber tirsê be tu yê çi nav lê bikî? Erê bavo çawa wan nav jêre dîtîye û dibêjin: " mêrxasîya ji bo namûsê ..." ya baş gerek ev nav lê bikira: " mêrxasîya ji bo pepûkitîyê ..." û çi cara ku Sûlavê diket rewşa weha ya axavtina bi xwe re, ewê her dem, xwe di xewnê de didît" (Babê Nazê , 2016: 13).

Romannivês amajê diket li ser zordariya li keçê dihête kirin çî li mala babê da yan jî piştî şûkirinê dimala hevjinî da. Dîsan jîyana xwe weku xewnekê wesf diket di nav civakê da. Cîhanbinîya Sûlavê sebarec civakê derdibrît û bi xewn û zîndan wesf diket dibêje:

"ez dizanim , xewn , xwe xapandine ... Ma gelo jîyana me, di civaka me de , ne xwe xapandine ? Her kes pê dizane ku civaka me zindane, ligel weha jî, jîyana xwe ya rûtînî didomîne. Ez bi xwe, di hundirê xwe de, xwe didirînim, ji ber ku civaka me, ji min re zindana di hundirê zindanê daye. Loma jî ez dixwazim asîman ji bo min bibe sînor. Dive sînortîya bê sînor de, her dem, ez li hêvîya dengê ku ji dûr ve gazî min bike û bê li ber min rûnê û destê min ji min bixwaze, neku ji Babê min ..." (Babê Nazê , 2016: 13-14).

Romannivêsi civaka Kurdî bi zîndan wesf kirîye. Ji ber ku azadiya keçê hatîye sînordarkirin. Herwesa romannivês cîhanbinîya Sûlav sebarec civakî derdibrît dibêje:

"bê dengîyê bişkênim û bi vê ezê kilîta dilê xwe vekim. Lê heta ku ez di hinava xwe de, ne azad bim, ezê nikarbim xwe, ji qeydên civakî rizgar bikim û ezê, di windakirina xwe de bimînim" (Babê Nazê, 2016: 14).

Romannivês dibijît pêdivîye her keçek ji xwe dest pêbiket despêkê xwe dihundira xwe da azadbiket. Dîvda jî xwe ji qeyd û bendên civakî rizgarbiket. Helbet romannivês di nav civakê da jîyaye. Derd û êşên keça Kurd bi çavê xwe dîtîne ev jî bandora xwe li ser wî hiştîye û di nav romana wî "Xweşîya Bi Êş" da rengvedaye. Herwesa romannivês li ser zimanê Sûlavê têrwanîna zilaman bu jinê di nav civakî da êxîstîye ber çavan û rexnediket û dibêje:

“ ma ne ez dizanim, heger hûn bibhîzin jî, hûnê bi xemsarî guh lê bikin û bi çî şeweyî wê dengê êşa min neyê we. Ji ber ku keç li mala Babê xwe pepûke û ji derveyî malê tenê laşe, cîyê gevez û vezelandina weye” (Babê Nazê, 2016: 15).

Bi vê çendê jî rexnê li zelaman digire dibêje tenê weku laş temaşeyî jinê diken. Bu têkirna hezên xwe. Ne weku mirovek xudan her mafek ku yeksan bît ligel zelumî û temamkera zelumî bît di nav civakî da. Ji ber vê çendê jî xwesteka yaxîbûnê djî civakê li dev peydadibe û dibêje:

“ lê xwestekê weha bi min re peyda dibe ku ez xwe şilfî tazî bikim û li pey mijê, ber bi asîmanan ve bifîrm , ji bo ku her kes min bibîne” (Babê Nazê , 2016: 15).

Ev çende jî weku helwest wergirtinekê da ku civak têrwanîn û berxwedana xwe bo jinê biguhurît weku mirov lê bihête nerîn, netêne weku laş bihête temaşekirin. Herwesa romannivês jî egerê vê çendê jî dîyardiket li ser zimanê Sûlavê dibêje:

“civak bi dab û nerîtên xwe, nahêle tîrêjên ronahîyê xwe bighînin me”(Babê Nazê, 2016: 16).

Anko romannivês egerê ne azadiya jinê di nav civakî da bo dab û nerîtên civakî dizivîne. Gelek caran dibine rêgir di rêya azadiya jinê da di nav civakî da. Romannivês weku kesekê ruşbîr û xudan serbor sedemê paşvemayina civakê Kurdî ne azadiya jinê di nav civakî da beramber herêmên din jî cîhanê bo sê egera dizivîne li ser zimanê Sûlav dibêje:

“Sê eger bûn ji dab û nerîtên ku bi sedan salan weku xwe diman, qamçî ku ew jî di destê sitemkarî de bû û tirs ku ew jî ji ber qamçî û neguhertinê, ev jî rastîye ku tehle” (Babê Nazê, 2016: 16).

Helbet jî dab û nerîtan karêgerîya mezin li ser civakê Kurdî kirîye bi taybetî jina Kurd di nav civakê da. Ji ber ku milletê Kurd gelek bi dab û nerîtan ve girdaye gelek caran dibine rêgir di rêya azadiya jinê da di nav civakê da. Romannivês bi xwe bi aşkerahî cîhanbinîya xwe derdibrît berawirdîyekê di navbera Sûlav û darê da diket dibêje:

“Sûlavê weku vê darê bi dû tiştan dihate dîtin, ciwanî û tenihayî. Û bi dû tiştan jî ji hev cuda dibûn, azadîya darê û li ber sira bayê, govenda pel û şaxên wê û ya wê rewşa civakî û hesta nuxûmîye” (Babê Nazê, 2016: 18).

Romannivês amajê bi rewş û neazadîya jinê diket di nav civakê da. Herwesa rexnê li civakî digrît li ser zimanê Sûlav dibêje:

“Civaka me jî, bi çi şeweyî naxwaze, ez xwe ji jîyana mirî rizgarbkim ...heger mirovê azad, di jîyana xwe de, carekê dimire, em keç di civaka me de, rojê deh caran dimirin !ez jî , piştî xwe nayasîna xwe , jîyana xwe mirî dibînim , ji ber ku paşeroja min bê asoye” (Babê Nazê , 2016: 18).

Bi vê çendê jî ji ber ew rewşa jin di nav civakê da dijî. Kesayetîya romanê Sûlav rewşa xwe bi mirinê wesf diket. Ji ber ku ne azade di nav civakê da.

“Mayîna bi xwe re, ne hovtîye, lê ne pesendikirna zordarîya civakê ye” (Babê Nazê , 2016: 30).

Gelek caran demê keç şûneket weku helwest wergirtinekê ye beramberî civakê ji ber ku nevêt bê dilê xwe jîyana hevjinê pêk bînit. Herwesa Medya birêya xwandina bîranîn û namên hevaleka xwe amajê bi rewşa wê keç diket û Medya û Sûlav jî xwe nêzîkî rewşa ew tê da jîyayî dibîn û dibêje:

“namên keçekê ne û li ser her tiştî ne ...lê azadîya wê bi her awayî sînor kirî bû ...hema bêje, ew di mala xwe de kole bû...ne xeme, ezê hindekan ji wan bo te bixuyinim . Ji Sûlavê re, ev keça ku axivtin li ser çê bû, pir bala wê kişand û bê ku nama bibihîze, tiştêkê xwe têde dît” (Babê Nazê, 2016: 32-33).

Sûlav serpêhatîya jîyana xwe weku bîranênîn wê keçê dibînit ku Sûlav jî di heman kawdanan da derbazbûye di nav civakî da. Romannivês bi rêya xwandina van naman rewşa keçê û neazadîya wê behisdiket. Babê Nazê amajê bi perwerdekirna keçê diket di nav civaka Kurdî da li ser zimanê Sûlavê dibêje:

“Bav û dîya min, ez wesa perwerde kirbûm ku ez ji ber mêytîya xwe şerm bikim. Lê mêytî û şermokî, di laşî min de, li hev nedikirin û heta carna bi hev re diketin şer. Û dema mêytîya min, xwe ji şermoktîyê rizgar dikir, mala me tundî ev

mêyîtî, di min de vemirandin. Êdî, min nema hez ji xwe û regeza xwe dikir , ji ber ku her sal bi wir de diçûn, zordarî bêtir ji layê binemalê ve , li min dihate kirin”(Babê Nazê , 2016: 39).

Ji ber ku demê keç di mal da mezin dibe û bigehîte jîyê qeyrebûnî gelek caran ji layê xîzana wê bi xwe ve jî dikevîte ber rexnê. Herwesa romannivês cîyawazî dixîte navbera keçê û kurî di nav civakê da ka bi çî têrwanîn dihîne temaşekirin li ser zimanê Sûlavê dibêje:

“ lê dîsan sê peyvên ku her dem li ser zimanê dayîka min bûn : " keçkanî , şermokî û gunehî " , ew xaçerêk jî , dihate girtin û wê di van peyvên de , ev hizr didît , keçkanî û şermokî nîşana perwerdekirinê ye û şerefa binemalê ye û gunehî jî , tenê ji bo keçkan bû. Kurk çî bikra jêre ne dibû guneh, jêre dibû şaşî û şaşî jî her dem tête dirustikirin lê gunehê me, dibû egerê dinya xirabûnê û xwelî serê me keçan ... ” (Babê Nazê, 2016: 39-40).

Li vir romannivês behsê têrwanîna civakî bo keçê û bi mezin dîtina xeletîna wê ku necihê lê borînê ne di nav civakî da taybet jî heger peywendî bi namusê ve hebît. Herwesa romannivês amajê bi wê hevrikîya gîyanî ya li dev Sûlav di navbera razîkirina hezên xwe yê mîyatîya û razîkirina civakê da dibêje:

“ û gava pêşîn ji vê hevrikîyê ji memkên min dest pê dibit ... Li gel ku ez ji wan re dibêjm : " mane bi serhildana we , wê mêyîtî ji min bibare , ev jî wê bihêle bav û birayên min, min bixin nav kefen ...ji ber vê çendê , xwe xuz bikin û ezê we bi konê xemgînîyê binixumînim ... ”(Babê Nazê , 2016 : 40-41).

Romannivês ronahî xistye ser hestên Sûlavê û mîyatîya wê ji ber dab û nerît û yasa û rêsayên aynî û civakî ji ber bav û birayên xwe nikarî bi azadane derbirînê ji mîyatîya xwe biket. Û hestên xwe yê sêksê têrbiket. Ji ber ku heger we biket dê kevîte ber sizayên civakî. Ji ber ku di nav civakê Kurdî da her peywendîyeka sêksê ji derveyî çarçovê xêzanê bît nahête qebûl kirin. Gelek caran dibe egerê kuştina keçê yan jî di baştirîn kawdan da marekirina keçê ye li kurî, belê keç ji layê dayîk û babê xwe ve dihête bê barkirin nikarî êdî serdana mala wan biket. Eger eve keç bît. Lê heger jin bît dihête kuştin. Herwesa romannivês amajê bi rewşa keçê di nav civakî da diket dibêje:

“tenê awirtek heye ku ew jî li ser zarok û keça Kurde . Ew çawa ji dayîka xwe çê dibin digrîn û weha jî, hemû jîyana xwe, bi xwe re digrîn ... Û jîyana me nimûnak berçavaye ...” (Babê Nazê, 2016: 45).

Romannivês bî rêya vê romana xwe û kesayetên di nav romana “Xweşîya Bi Êş” da ku Sûlav û Medya û keça hevala Medya amajê bi jîyan û rewşa jin û keça Kurd diket ku ne ya azade û êşa wê dixîte ber çavî xwandevanî û qêrîna wê û gazîya keç û jinê digehniye civaka Kurdî û haydar diket ji rewşa di nav da dijî. Romannivês amaje daye arîşeka dî di nav civakî da ew jî hizra xwe kuştina jinê di dîyaloka navbera Medya û Sûlavê da dive peregrafê da amaje pê kirîye:

“-hizra xwekuştinê, cem te peyda bûye? Sûlav hema bi awakê alavî got :-na, ma ne dînê îslamê vê heram dike ? ...Lê xwekuştin ku îslamê qedexe kirîye, tişteki başe ...” (Babê Nazê, 2016: 49).

Gelek caran keç hizr dî xwekuştinê da diket yan xwe dikujît ji ber wan pirsgirêkên dikevine di rêya wê da. Gelek caran demê keç hez ji kurekê diket. Mala keçê razî nabin keçê bidin wî kurî keç penayê bete berxwekuştinê. Herwesa romannivês amajê bi wê çend diket ku xwekuştin dînê îslamê da hatîye heram kirin. Xwandevan ji mijara xwekuştina keçê hişyar kirîye. Herwesa romannivês birêya xwandina namên keça hevala Medya ku Medya namên wê dixuyinit bu Sûlav civakê dêxîte ber rexnekarîya xwe dibêje:

“Medya bi Xwedê, ev dîrûtîya ku girtîye ser civaka me, pirê caran min didehifîne, ez di rûyê her kesî de biqîrm û bêjim, xwe xapandin ji bo çî ye, hela bêjin! Hûn keça xwe dikujin û dibêjin, wê xwe sotandîye û hûn bi zordarî wê didin şû, hûn dibêjin wê bi dilê xwe kirîye ...bîst û çar se’atan, axavtina we li ser şerefê ye... ew şerefa di nav lingan de” (Babê Nazê, 2016: 50).

Romannivês li vir jî amaje kirîye bi xwe sotina keçê di nav civakî de piranîya caran jî peywendî bi evîndarî ve heye demê xîzana keçê bê dilê wê dene kesekê ku hejê neket. Yan jî hej kesekê biket xîzana keçê razînebît bidene wî gencî. Dibe eger keç penayê bete ber xwe sotinê di nav civakî da. Herwesa romannivês amajê bi hevala Medya diket ku dibîranînên xwe da bo Medya nivêsi bû ku hizr dê xwesotandinê da kirîye. Ji ber ku di jîyê sinêlîye da tuşî destidîrjîya sêksî bîbû

keçaniya xwe ji dest dabû. Û dîvda jî dil ketina wê ji gencekê fileh ra. Ewê keçe jî bi vî rengî hestin xwe dijî civakî derbirîne dibêje:

“ bi Xwedê Medya xwestekê weha bi min re çê dibe, ez li nik peykerê Xanî xwe rîs bikim û bi lîtrek benzîn di destan de , li gel şixartê û berî ku ez dakevim kolana ku diçe nav bajarî, ez li gel helbestvanê me baxvim : ha ! Ma tu nizanî çî bi serê mem û zîna te hatîye, nûha jî bi serê me têt, careke din vegere jîyanî û Mem û Zîna xwe vejîne, ji bo ku li vê dinyayê bi miradê xwe şa bibin... Û yên min jî şabûna min, bi mirna mne ...û bi vê gotinê ez xwe berdidim ser kolanê û bi qêrîn, li wan kesên ku li laşê min dinerin, dibêjim “binerin, erê li şerefa li nav lingan binerin ...binerin! Û hûn çî navî li min bikin, bikin, lê ez ji we paqijtirim û şereftirim! Û ji ber vê çendê, ez xwe dikujm ...piştî vê axavtinê ezê lîtra benzînê li ser serê xwe birjînim û bi şixartê agir bi xwe xînim ” (Babê Nazê: 2016: 50-51).

Li vir romannivê amaje bi dastaneka Kurdî jî kirîye ew jî dastan mem û zîne ye ku ew jî dû evîndar bûn negehişine mirada xwe. Ev keçe jî bi helbestvan Ehmedê Xanê ra dikevîte dîyalokê dibêje " ha ! Ma tu nizanî çî bi serê mem û zîna te hatîye, nûha jî bi serê me têt. Romannivê bi amajedanê bi dastana mem û zîne ronahîyê dixîte ser mijara azadîya jinê ku mêjoyeka dîrokî heye. Heta nuke jî keç ne azade di nav civakê da. Heta nuke jî nikarî bi dilê xwe jîyana hevjinê pêkbînit. Ji ber rîsa û dab û nerîten civakî û ‘eşayirî. Babê Nazê bi civaka Kurdî karêgerbûye. Hest bi arîşa jin û keça Kurd kirîye. Vîyaye bi rêya romana xwe xwandevanî ji arîşên keç û jinê agehdarbiket. Herwesa romannivê amajê bi wê çendê diket keç ji ber tîrsa dû hêzan nikarî hest û hezên xwe yê mêyatîyê têt biket di nav civakê da dibêje:

“ hêza li jor ku her tiştî dibîne ku ew jî Xweda bû û hêza li jêr ku her tişt ji bo wê qedexe dikir, ew jî civak bi dab û nerîten xwe bû . Ev jî, dibû egerê vemrandina agirê , di hinava xwe de ” (Babê Nazê , 2016: 60).

Sûlav egerê nevemirandina hezên xwe yê mêyatî di nav civakê da bo du egeran dizvirîne. Êk ji tîrsa Xwedê, du jî ji tîrsa sizadan û qedexekirin û dab û nerîten civakî. Herwesa romannivê di dîyaloka di navbera Medya û Sûlav da. Sûlav civakî dêxîte ber rexne kariya xwe demê Medya dibêjit:

“di dema xwe de nivîskarkî nivîsîbû : ” xwestek Babê hizrê ye ...”-tu çi dibêjî ? Em û hizir! -Bo çi na?-Heger hizr ji xwestekê çê bibe, hema emê av û av biçin ...-Keçê xêre? Ha , tu çi ravekirinê didî vê peyvê ...-Medya ma tu nizanî ku di civaka me de , çi zilam û çi jin xwestek yeke , têr bûna zik û berzikê ye ...Medya kenîya û got :-bi rastî tu feylesofti ...-Ma çi felsefê , di vir de heye ? Tenê rastî ...loma jî em hene û tunene ...” (Babê Nazê, 2016: 67-68).

Li vir romannivêş li ser zimanê Sûlavê civakê dixîte ber rexnekarîya xwe ku pitir gringêyê bi têrkirina hesta bîrsîbûnê diden ew jî xarin û sêkis. Dibe ev çende li dev hindek kesan armancek bît lê mirov nikarît. Giştandinê biket li ser hemî endamên civakê. Helbet têrkirina hesta bîrsîbûnê xarn û sêkis ji pêdivyatîyên leşê her mirovekê ne, lê divê diçarçûvê yasa û rêsayin civakî da bihêne têrkirin ne ji derveyî vî çarçoveyî bît. Anko têrkirina hesta sêksê di çarçovê jîyana hevjinê da bît ne ji derveyî çarçovê hevjinê bît çunku li wî demî bi berelayî dihête hijmartin. Herwesa romannivêş amajê bi Medya diket û dibêje:

“Medya, ez dizanim binemala te, ji mêjve, qeydên dab û nerîtan dirandine, loma jî tu keçêke azadî” (Babê Nazê, 2016: 40).

Romannivêş amaje bi dû keça kirîye Medya ku ne keftîye jêr qeydên dab û nerîtên civakî û Sûlav jî keftîye bin qeydên civakê.

2.2.12. Hevrezbazî

Romannivêş di romana xwe da amajê bi vê arîşê bi rengekê aşkera di nav civaka Swêdê da diket. Di navbera keçê û keçê da. Dê romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” . Herwesa amajê bi vê arîşê di nav civaka Kurdî jî da diket di nav romana “Xweşîya Bi Êş” da belê bi rengekê veşartî ne bi aşkerahî di navbera keçê û keçê da. Hevrezbazî ew jî hezkirina regezê mê bo mê ye weku di nav romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da romannivêş amajê pê daye li ew şevbîrîka li mala Lîza hatîye darxistin.

“ Lîza dîsa xuya bû. Jineke ji xwe ciwantir hembêz kir. Her dûyan jî destên xwe bi awakê sêksî li laşên hev digerandin. Ji nişkave ew jinka ku ji Bêkes nenas bû û bi Lîza re hembêzkirî bû” (Babê Nazê, 2012: 103).

Romannivês wesa dete xuya kirin ku Bêkes weku berhevbûyê wê şevbîrîkê ev dîmene dîtîne. Anko ev dîyarde û arîşe di nav civakê Swêdê da. Tişteke bi aşkerahî dihête encam dan bê berçav wergirtina pîver û bihayên civakî û rewîştî. Ji ber ku dibe ev di civaka wan da bi azadîya takekesî ve girêday bît. Bi tiştekekê asayî û normal dihête dîtî. Dibe gelek egerên vê çendê hebên. Û ji civakekê bo civakekê egerên xwe yên cîyawaz hebin. Ji wan jî têhnîbûna sêksî, berdan, dereng şûkirin, têkçûyna hurmûnatan û tirs ji regezê beramber û azadîya sêkisiya bê sinor gelek egerên dîtîr... Dibine egerê serhildana vê dîyardê di nav civakî da. Romannivês amaje bi vê çendê kirîye weku rasîyeka civakê Swêdî. Anko romannivês ketîye bin bandora civaka Swêdê vê çendê jî di nav romana wî da rengvedaye “babetê sêksî û bêbarbûn jî, êk ji babetên gelek girînge di jîyana mirovan da! Gelek mêşki mjûl diket û fişarê dîxte ser nivistinê û hemî comgeyên dî yên jîyana rojane ya her kesî çî jin bît yan zelum” (Ebdulrahman Bamernî, 2015: 81) eger ev têrkirina heza sêksî ne diçarçowê xêzanê da bêt. Ne navbera dû hevjinê da bêt. Bi derkeftin ji yasa û rêsayên civakî dihête hijmartin. Herwesa romannivês dîmenekê dîyê hevrezbazîyê bi me dete nîşan dan di vê peregrafê da demê jina bi navê Birgîta jî;

“ wê jî bi awakê bilez xwe tazî kir û serê xwe xist nav şeqê Sonya. -Ev bê exlaqîye, Comerd got û bi destê jina xwe girt, berê xwe da derî ku derkeve - erê bê exlaqîye... erê... Katya got: Her rojhelatî rojhelatî ne... Biner Birgîta çî dike... Niha Sonya wê nade bi sed zilaman ...” (Babê Nazê, 2012: 104).

Li vir romannivês amajê bi helwestê Comerdî Kurd diket ku raste beşdarî ahengê bûye. Û beşdarî dîlanê û mey vexarnê bûye. Lê her rêsayên wî yên civakî jî sinorek hebûye. Ji ber wê çendê ji şevbîrîkê derdikevît. Ji ber wê çendê jî Katya dibêjit her rojhelatî rojhelatî ne. Romannivês amajê bi cîyawazîya kultûrî di navbera rojava û rojhelatê daye. Bi taybetî di mijara hevrezbazî da civakê rojavayî da weku ji romanê dîyardibît bi tiştekekê normal dihête dîtî û berixwedan. Belê di civakê Kurdî da bi bê rewîştî dihête qelem dan. Weku reftareka ji derveyî yasa û rêsayin aynî û civakî dihête temaşekirin.

Babê Nazê di romana xwe “Xweşîya Bi Êş” da amaje bi mijara hevrezbazîya di navbera keç û keçê da kirîye. Gelek caran demê keç dimîne neşîkirî dibe qeyre dibe egerê hinek ladanên civakî weku hevrezbazîye di navbera keç û keçê da bo têrkirina xezên xwe yên seksî. Her çende ev çende di nav civakên

Kurdî da wek dîyardeke ne berbelev û ber cave. Her weku di nav civake Ewropî da heye. Weku Babê Nazê di romana “Stokholmê Tê Çi Dît Bêje” da amaje pê kirîye. Lê dibe di nav civkê Kurdî da ev dîyarde bi veşartî pişt perdan hebe. Her weku Babê Nazê di romana “Xweşîya Bi Êş” da bi veşartî di navbera Sekîne û keça hevala Medyayê da amaje bi vê mijarê kirîye di vê paragrafeda:

“Hevrikîyê ji memkên min dest pê dibit ... ” Lê pirê caran , bi ya min nakin , loma jî ez neçar dibim berê xwe bidim hevala xwe , ji bo yarîya bi wan bike ...ji bu Xwedê , Medya xwe ji min nexeyîdîn û ezê cara pêşîn danpêdanê bi vê rastîyê bikim , hîn berî te , hevala min Sekîne , ev lîstik bi min re dikirin” (Babê Nazê, 2016: 41).

Bi vê çendê jî romannivês hindek derencamên dereng şukirina keçê di nav civakî da êxsîfîne berçavan weku hevrezbazîyê. Herwesa dî peregrafeka dî da jî amaje bi vê mijarî kirîye behsê evîna wê keçê bi Sekîne ra diket li despêkê belê piştî şikirna Sekîne dibêje ligel Medya hevrezbazî encam daye û dibêje:

“çî li mala me û çî li mala wan, me ev yarîyên evînî bi hevi re dikirin û kengî wê şûkir, evîna min û te dest pê kir ...” (Babê Nazê, 2016: 42).

Romannivês amajê bi vê mijarî diket di nav civaka Kurdî da bi renegekê nêhênî û veşartî li pişt perdan. Lê behsê civaka Ewropî jî diket li ser zimanê wê keçê dibêje

“Medya, tu dizanî, piştî şûkirina Sekîne, ewê çî ji min re got? Ewê got lîstika bi keçê re, ji ya zilaman xweştire ... Ê nuka ez tê gihîştim ji bo çî, li Ewropa keç bi keçê re şû dike ...” (Babê Nazê, 2016: 43).

Romannivês amajê bi wê çendê diket ku dîyarda hevrezbazî dî civakê Ewropî da gehîştîye qunaxekê ku heta keç ligel keçê jîyana hevjinê pêk bînit. Romannivês vîya xwandevanî haydarbiket ku dereng şokirna keçê di nav civakî da derecamên xirab lê dikevin. Dibe egerê ladanên civakî weku hevrezbazîyê di nav civakî da. Romannivês li ser zimanê Medya dibêje Sûlavê ew namên keça hevala Medya ez dixuyinim ji gelek layan ve tu ew weku êkin, dibêje:

“Ez dizanim , tu û ew, çî binvîs û çî bi hizrên xwe weku hevin ...ne xeme, de ka ez vî laperî jî bixuyinim” (Babê Nazê , 2016: 44).

Romannivêş dî vê romanê da li gelek cihan da bi me dete dîyarkirin bi renekê ne rastewxwe. Ew namên keça hevalê Medya ku Medya dixuyinit. Her name û bîranînên Sûlavê bi xwe ne. Belê daku bişêt bi aşkerayî danpêdanên xwe ji hevala xwe re û bi me jî bidet aşkera kirin. Penabirîye ber wê çendê ku bîrînên keçekê ne. Ji ber danpêdana hindê nehênyan gelek zehmete weku destidrêjîkirinê û hevregzbazîyê di nav civakî da. Ev çende jî li jêr bandora qeyd û bendên civakî da.

2.2.13. Hevalînî

Hevalînî tiştêkî pîrozê di nav civkê da gelek caran herkez bi hevalê xwe tê naskirin. Di romana “Xweşîya Bi Eş” da jî romannivîsî amaje bihevaltîya navbara Medya û Sûlavê kirîye. Gelek caran keç gelek nêhênîyên jîyana xwe, xem û xweşî û nexweşîyên xwe arîşên jîyana xwe bo nezîktirin hevala xwe behs dike. Wek di romanê da di navbera Medya û Sûlavê da dîyardibe.

“ Di qonaxa amedehîyê da roj bi roj axaftin dihate ser babetê evînê. Destpêke bi şermokî bû, dûra girte ser hemû babetan. Û çî caran ku malê hev diditin, ev pirsîyar dihat kirin: “Ha tu evin çavanî?” Her dem Sûlavê bi yek besîv bû: “Ez û evin” (Babê Nazê, 2016: 28).

Herwisa Medya û Sûlav soza hevalînîyê didin hevdû û dibêjin:

“Deka em soz bidin hev. Em her tiştî ji hevira bibêjin çî baş û xirab û çî zanîn çî nezanîn” (Babê Nazê, 2016: 30).

Ev keça hevala Medyayê bi rêya bîranînê xwe gelek nihênîyên xwe bo Medyayê behs dike. Dîsan Medya û Sûlav jî gelek nêhênîyên jîyana xwe bo hevdû parvedikin. Kilîla dilê xwe bo hevdû parvê dike. Li ser gelek mijar û arîşên jinê qeydû benden civakê di nav civakê da bihevira dikevîne danûstandinê rawîşkarîyê li ser gelek mijaran jî hevdû werdigirin.

“Erê jîyan bihorî jibo pîremêran firehe û toz digire ser û kenge sirek ba radibe. - Hedî hemû bûyerên girîng û negirîng di jîyan wî da serên xwe radikin û ew çî bi dilxweşî çî bi eş li wan vedigere. Êşa wî pirtir dibe ji ber ku ew dizanê, rê ji vegeêre nemaye. Lê jîyana Sûlavê ya derbasbûyî ne ew panava fireh bû û her tişt, li ber çavên wî bû û xweş tête bîra we. Ev gava pêşîn di jîyanê da avêt” (Babê Nazê, 2016: 20).

Romannivîs jîyana Sûlav û Medyayê di nav civakê da û ew pisgirekên keftîne di rêya jîyana wan da bi xwandevan dide xuyakirin di romana “Xweşîya Bi Eş” da. Gelek caran romannivîs bi vî awayî berhemên xwe dinivîsin. Ev bîranînên jîyana xwe da borandine her qonaxa zarokatîye ta qonaxa gencatîyê jîyan koçberîyê ji nivîskar Babê Nazê ra bûne keresteke mezin. Xizmeteka mezin pêşkeşî romannivîs kirîye ku berheme xwe li ser wan ava bike. Bi rêya menelukeka navxweyî vegere serdemê jîyana xwe ya borî û wan bûyerên jîyana xwe bîra xwe bîne di nav berhemên xwe da amajê pêbike. Her weku di romana xwe ya “Stokholmê Tê Çi Dît Bêje” Babê Nazê parçek ji jîyana xwe tê da xistîye berçavê xwandevanan. Herwisa Babê Nazê mifa ji jîyana kesên dewrûberên xwe di nav civakê da jî wegirtîye. Her weku derbareyî romana “Xweşîya Bi Eş” da dide xuyakirin ku ev roman “Ji bîranînê serpêhatîya du keçan yek li Duhokê dijî yek jî li niha derve dijî ku serpêhatîyên evîna xwe bo Babê Nazê vegerandine. Romannivîs jî serpêhatîya evîna wan herdu keçan kirîye hêvênê afrandina romana xwe ya bi navê “Xweşîya Bê Êş” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Her wisa romannivîs Babê Nazê sebareb babet û mijarên ku romanên xwe da bikaranîne da dibêje “çikasî xeyala nivîskar berfireh be rastîya civaka Kurdî ji xeyala wî berfirehtire. Ez bixwe wan tiştan dinivîsim yên di nav civakê da dibinim û min diêşînin” (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn, 2018). Kewate nivîskar bi rêya romana xwe derbirîn ji êşa xwe li jîyana koçberîye kirîye di romana “Stokholmê Tê Çi Dît Bêje”. Dîsan jî di romana “Xweşîya Bi Eş” da derbirîn êşa jina Kurd kirîye di nav civakê da. Ev pisgirekên dikevîne pêşîya keçê di nav jîyana civakî da.

Bi vê çendê jî em dişên bejin romana “Xweşîya Bi Êş” li jêr sîhwana rêbaza realîzmê da hatîye nivîsîn bi taybetî jî li jêr sîbera realîzma sosyalîstî û rexnegirane da hatîye nivîsîn. Romannivîs êş û azar û hevîyên keçekê Kurd bi peyvên wêne kirine û rexne li qeyd û bendên civakê girtine. Di ve romanê da ku qehremana romanê Sûlavê sererayî wan astengên hatine pêşîya wê di nav civakê da bêhêvî nebûye û her geşbîn bûye bi paşerojê li dumahîka romanê jî jîyana hevjinîyê bi dile xwe ligel Şahîn pêkanîye. Her çendê bi temenê xwe jê mezintir bûye. Roman pitir li ser dîyaloke hatîye avakirin. Dîyaloka di navbera Medya û Sûlavê da cîhanbînîya wan derbareyî civakê xistîye ber çavê xwandevanan. Babê Nazê babetê romana xwe ji navênda civakê hilibijartîye û ronahî xistîye ser nêxwaşî û arîşeyên civakê. Hewil daye civakê li pisgirekên jinê di nav civakê da agahdar û hişyar bike. Bi vê çendê jî em dikarin bêjin romannivîs Babê Nazê bi civaka di nav da jîyayê û karîger bûye. Hewil daye karvedan û karîgerîyê jî li civake bike.

Xwandevan ji arîşên di nav civake da hişyar bike. Egerên neazadîya keçê di nav civakên Kurdî da di romana “Xweşîya Bi Êş” vedigerîne bo xwe girêdana Kurdan bi qeyd û dabên nêrîtên civakî dizvirîne ku bi yasayên nenivîskî têne hijmartin di nav civakê da.

2.2.14. Evînî

Evîndarî jî dîyareka civakî ye di nav her miletekê da çî civak ji vê dîyardê bê behrinîn. Çunkî jîyan bê evênî dibe jîyanka bê binyat. Ji ber ku evînî xala despêkê ye bu hizirkirinê dipêkînana jîyan hevjinî da. Xwedê vîyan û mihebet û hezjêkirin xistîye di navbera kiç û kuran da. Daku hizir dipêkênana hevjinî da biken û berdewamî bi jîyanê bihête dan. Her weku Xwedayê mezin di Qur’ana pîroz da dibêje: “Ji nîşanên (qudreta) Xwedêye ku ji bo we, ji we bi xwe jin afrandine dakû sebir û hedana we bi wan bê û hezkirin û lihevbanîn di nav bera we de peyda kirîye. Bêguman di vê da ji bo miletekî ku bifikirin îbret hene (Sûreya Rûm: 21) . Romannivês Babê Nazê jî di romana xwe “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” amaje bi vê mijarê daye demê romannivês amajê bi axaftinên Lîza diket dibêje:

“ Xwedîya malê bang keça ku bi Bêkes re dipeyvî, kir-evê mine, xwe neêşîne ez wî nadim te ... -Te ji kengî ve, ew kirîye? Bi xwe nayê bîra min ku te yekê weha ji xwe re kirîbû. ... Bi hêrs û xeyd ji Katya re got: -bi serê te neketîye, min kirî ye yan jî min ji xwe re dîtîye... min ji te re got û hew” (Babê Nazê, 2012: 82).

Dî vê danûstandina navbera Lîza û Katyayê da bo me dîyardibît ku Lîza weku evîndarê xwe temaşeyî Bêkes diket. Ê bi çavên xîrê li Katya temaşediket. Demê ligel Bêkes diaxvît. Ê bi aşkera nerazîbûna xwe dîyardiket dibêjit ew yê mine. Li vê roman da romannivês amajê bi Lîza diket. Bê sansor hestên xwe yên evînî beramber Bêkesî derdibrît. Eve jî azadîya jina rojavayî bi me dete dîyarkirin ku ji layê dab û nêrît û kultûrî ve jina rojhelatî azad tire. Kêmtir ketîye bin bandora civakî da. Eger em berawirdîyê biken di navbera Sûlavê da di romana “Xweşîya Bi Êş” da ku pitir ketîye bin karîgerîya dab û nerîtên civakî da. Ê bi vî rengî hestên Bêkes bi me dete dîyarkirin demê Bêkes dibêje Lîzayê û berawirdîya Lîza û Katya jî di ciwanîye da dîyardiket.

“-lezê neke dibe ku şaş bî ...-Ez mêra ji çavên wan nas dikim û ez zanim çî dibin te de heye. Erê Katya bi sipehîbûna xwe û ciwanbûna xwe pir dûrî Lîza bû” (Babê Nazê, 2012: 83).

Romannivês bi me dete dîyarkirin ku Lîza ji Katya ciwantire. Lê Lîza bi xwe bawer bû Bêkes weku evîndarê xwe dihesiband. Dîvda jî romannivês azadîya di hest derbirînê da li dev Lîza bi me dete nasîn bê sansor û li berçav girtina yasayên aynî dab û nerîtên civakî Lîza dibêje Bêkesî:

“ Lîza devê xwe bir ber guhê Bêkes û got :-ez îşev te daxwazî textê xwe dikim. Tevî ku rengî dawetkirina Lîza ne wek yê serxweşan bû, lê Bêkes her ev tişt tede dît. Loma jî, bersiv bi " erê " da ku ji alîkî ve dilê wê nehêle û ji layê din ve jî wî nedixwest ku Lîza babîsokê lê rake ” (Babê Nazê, 2012: 101).

Bêkes razîbûna xwe jêra dîyarkiriye. Belê Bêkes her xwe nêzikî Katya pitir didît û danûstandin pitir bi wê ra dikir li şevbirîkê da, romannivês dî vî peregrafê da bi me daye dîyarkirin demê Bêkes bi Katya ra dîlanî diket:

“ devê xwe anî ber guhê Katya, dîlana xwe domand û ramûsanek ji piştta guhê wê dizî ” (Babê Nazê, 2012: 102).

Herwesa romannivês astê berev pêşçûna peywendîya navbera Lîza û Bêkes bi me daye nasandin dive peregrafê da:

“ - min ji te re negot tê îşev mêvanê textê min be? Bi rastî jî va tu hatî, pêwîst nake tu herî wira tu xêr di wir de nemaye. Bi van gotinan Lîza xwe avêt ser Bêkes, tevî ku wî Lîza hembêz kir, lê her û her wênê Katya di serî de bû û li ber çavên wî mîna rew-rewkan diçû û dihat ” (Babê Nazê, 2012: 106).

Li vir romannivês wesa dete dîyarkirin. Her çende bi Lîzayê ra razaye lê her dilê wî pitir ser Katya hebû. Li vir romannivês tişk xistîye ser peywendiyên sêksî di navbera Bêkes û Lîza da bê ku jîyan hevjinîyê pêk ênabît. Dîsan vêrê amaje daye azadîya jina rojavayî û azadîya sêksî di nav civakê rojavayî da. Herwesa bandor û karîgerîya vê çendê li ser kesên koçber jî ku Bêkes bi nimûne nîşan daye. Lê dîvda jî Bêkes poşmanîya xwe bi razana gel Lîza ra derbirî ye dibêje:

“ dema ku Bêkes xwe bi Lîza re di nav cîyekî de dît, dilê wî ji wî xelîya û di nava xwe de tif xwe kir û bi lome ji xwe re got : " ma ez û ew ” (Babê Nazê, 2012: 106).

Belê dîvda jî her li ser peywendîya xwe bi Lîza ra berdewam bu dibêje:

“ lê belê, li gel weha jî, berî ku derkeve telefona Lîza jê xwest û bi vê awayî rêya vegeê jî ji xwe re hişt. Her ku roj bi wir de diçûn, nexweşkibûna Lîza ber çavên wî sivk dibû ji bilî te kanyê, nezanîna zimanê Swêdî û şikenandina şehwetê, hiştibû ku ew her tiştê mekruh di Lîza de jibîr bike û li telefonê xe ” (Babê Nazê, 2012: 107).

Li vir jî romannivêş dibêje tenê Bêkes ji bû berjewendîya xwe ya kesûkî û têrkirina şehwetê berdewamî daye peywendîya xwe digel Lîza yê neku ji ber evîni bû û dil ketna wî bû digel Lîzayê. Belku evînek bu pitir têrkirina cesedî bû. Ji ber nebûna cihî li jîyana koçberîye. Nezanîna zimanê Swêdî. Ji berku dîvda jî dî xanyê Lîza da dimînit. Ne bû avakirina xîyêzanekî bû digel Lîzayê. Evînek bû li ser berjewendîyê hat bû avakirin. Herwesa Bêkes demê bû cara duwê jî diçûte şevbirîkî li mala Lîza xwe nêzîkî Katayê diket:

“ Wî çavên xwe gerand û biryara ku cîyekê li teniştê Katya bigre, stend. Wî cîyê xwe girt ne girt, Lîza bi çavnebarîya jinan li wan nerî: Bi alî wan ve çû mîna ku " helbestekê " ji yê xwe bixwune got: Hezkirina ji dîtina pêşî dijware. Herçî hez bike dimîne bê cî û ware ”(Babê Nazê, 2012: 109).

Li vir jî romannivêş amaje daye çavnebarîya Lîzayê beramber Katayê û bi rengê nerastewxwe Bêkes haydardiket dibêje: Heger “ herçî hez bike dimîne bê cî û ware ” anko heger tu dilê xwe bidî Katya êdî nema cihê te li mala min dimîne. Demê Katya dibêjite Bêkes şeva xwe bi jina bi navê Îva ra biborîne. Bêkes hestê xwe beramber derdibrît dibêje:

“-çima ne bi tere ?” (Babê Nazê, 2012: 111).

Katya jî bi vî rengî hestî xwe beramberê wî derdibrît û dibêje:

“-bi xwe ez nizanim çima bi dîtina pêşî, dilê min li te rûnî! Ji nerîna pêşî jî min naskir ku tu dilpakî, lê wek her zîlamê rojhelatî, tu jî merê şehweta xweyî... Ma ne wehaye? Te dît ez çî hozanvaneke derûnî me?” (Babê Nazê, 2012: 112).

Li vir her çende Katya daxbarbûna xwe bi Bêkes dîyardiket. Lê her jê ditirst dibêje tu jî rojhelatî mêrê şehweta xweyî. Bi vî rengî jî romannivêş têrwanîna jina Rûsî jî sebarete zelamê rojhelatî bi me dete nasîn ka bi çî awayî temaşe diken. Herwesa romannivêş amajê bi şerê di navbera Lîza û Katya diket li ser evîne dive peregrafê da:

“ Lîza li ser serê wan rawestîya û bi hêrs bi ser Katya rabû : -tu her dêlikî... Tu çi wazê xwe li kurikî dikî! Maji ber van gotinan Bêkes vecniqî û negîha bi xwe bihse, heta Lîza şeqamek helweşand Katya” (Babê Nazê, 2012 : 113).

Bi vê çendê jî romannivês bi me dete dîyarkirin ku çavnebarîya Lîza beramber Katya gehiştîye çi astî ku ditirsîya Bêkesê jê bistîne ku bi evîndarê xwe zanî. Bi vê çendê jî bo me dîyardibit evînî di navbera Lîza û Bêkes da yek layî bûye. Ji ber ku Bêkes di dilê xweda pitir ji Katya hesidikir. Evîna wan pitir ji ber berjewendîyeka hev pişk bû. Eger armanca evînê ne hilbijartina hevpişka jîyanê bît. Mebest pê pêk ênana xîzaneka bextewer bît. Tenê armanca jê têrkirina hezên sêksî bît. Weku em dê vê romanê da dibînin, di navbera Bêkes û Lîzayê da. Ji dervey çarçovê yasay û aynî bît. Tenê rêkefitneka navbera du kesan bît. Bêhest kirin bi berpirsîyaretîyê beramberî hev du. Dî dûmahîka wê bîte riq û kîne di navbera evîndar da. Derencamê wê jî dibe xîyanet di navbera her dû layan da.

Mijara sereke di romana “Xweşîya Bi Êş” da evînîye. Herwesa jî di nav da jî amaje kirîye bi gelek arîşên civakî yên peywendîdar bi keçê ve di nav civakî da kirîye. Romannivês babetê romana xwe ji navenda civakî helibijartîye. Ew jî keç û prisgirêkîn dihêne di rîka wê da di nav civakî da. Dê vê peregrafê da amaje bi mijara evînî kirîye:

“ eve bûye pênc sal ku mamoste Şahîn , hevîna xwe wînda kirîye. Ligel ku dû zarokên wî bibûn xwedî mal û zarok, û temenê wî hema bêje bi ser şêst salî ketbû, lê her jineke din, ji bo xwe nexwest û mabî. ... Dûre, bi xwe jî, bi gotina hişmendekî li xwe vedigerand: “mane evîn hemû temenan, dide ber xwe ...” . Dive dema dawî de, Şahîn ji vê hizrê re bû piştgir” (Babê Nazê, 2016: 5-6).

Mamoste Şahîn her çende temenê wî bûye şêst salî hizr di pêkînan hevjînê da diket. Lê ew arîşa ketîye li pişya wî ya êkê ew jî mezinatîya temenê wî ye. Ya duwê jî ew keça li dûr dilê xwe nedît bû. Lê belê

“dema berî demekê keçeke ku nivê temenê wî kirbû, di heman destgeha karê wî de, dest bi xebata xwe kir ...erê êdî wan bi çavên dilbijokî li hev dinerîn, lê wan , di xwe de nedidît , awran derbasî gotinan bikin. Dîyare Şahîn ji ber temenê xwe û Sûlavê ji ber şermokîya xwe” (Babê Nazê, 2016: 6).

Romannivês bi xwandevanî dete dîyarkirin ku her du kesayetîyên serekîyê romanê bi navê Şahîn û Sûlav dilê wan ketîye hevûdû li cihê karê wan li zankoyê. Romannivêsi evîndariya du evîndara vegêraye. Di nav da jî tîşxistîye ser ew pirsgirêkên dikevîne pişîya keçê di nav civakî da ku dibîne egerê dereng şûkirna wê. Şahîn dilê wî dikevîte Sûlav ji ber vê yekê ligel xweda dikevîte menelokeka navixweyî dibêje:

“ ez te dixwazim ... Û ez doza lêbhorînê ji te dikim , ji ber ku ez sînore xwe derbas dikim “ (Babê Nazê , 2016: 7).

Herwesa dê vê peragrafê jî da romannivês amaje bi vê mijarî kirîye:

“lê Sûlavê, hesta xwe ya evînî, bin dest dikir ku dibû egerê neyê dîtî û tenê ew bi hev re bimînî. Vê jî dihişt, ew bikeve mitala di tenihayîya xwe de” (Babê Nazê, 2016: 11).

Li vir romannivês tîşxistîye ser banadora civakî li ser keça Kurd û Sûlav nûneratîya keça Kurd diket di romana “Xweşîya Bi Êş” da. Di nav civaka Kurdî da heta ku dilê keçê bikevîte kurekê jî nikarî bi rastewxwe biçe û ji wî kurî ra hestên xwe aşkerabiket. Divê pêngava pêşîn ji dev kurî destipêbiket, kur hestên xwe bo keçê derbibrît. Belê di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” Lîza bi azadane hestên xwe derdibirît beramber Bêkesî. Ev çende jî dizivrite ve bû civaka Kurdî ku civakeka oldare û li dîv yasa û rêsayên civakî diçit. Babê Nazê amaje bi evîna keçeka dijî diket di romana “Xweşîya Bi Êş” da ku hevala Medyaye bi rêya xwandina namê wê ji layê Medya ve bu Sûlav û romannivêsi bi me daye nasandin ku Sûlav û Medya her êk ji wan ji hindêk layenên jîyana wê ve xwe wekî wê dibînin. Dive peregrafê da amaje bi evîna wê kirîye:

“ew pirs ku her dem pê dêşîya-Eve çi bû gidî?- Dû tişt bûn, hez kirina wê ji xortekî fileh û peydabûna hizra xwekuştinê pêre... Sûlavê xwe negrit û seranser pirs ji devê wê hate xwarê:-eve çawa hez ji yekî fileh kir? Ewê pirsî û bi xwe çû ravekirinê -heger keça fileh dişet bi mirovekê musulman şû bike bêyî ku dîne xwe biguhere, lê gencê fileh ku keça musulman ji xwe re bîne, merce ew bibe musulman. Dibe ji ber vê çendê xwesteka xwe kuştinê pêre çê dibû?” (Babê Nazê, 2016: 48).

Li vir romannivês amajê bi evîna vê keçê diket. Hezjêkirina wê bû kurekê fileh. Ji ber ku ev çende di nav civaka Kurdî da ji derveyî yasaên aynî û rêsayên civakî ye. Hizr dî xwe kuştinê da kirîye. Eve jî arîşeka dîye di nav civaka Kurdî da. Demê arîşek dihête pêşa keçê çî careserkirinê nebînit. Ji derencamê bîhvîbûnê penayê bete ber xwe sotinê. Romannivês xwandevanî bi arîşa xwesotina keçê di nav civakî da haydarkirîye. Romannivês cîhanbinîya xwe sebarete evînê derdibirît li demê Sûlav pirsyarê ji Medya diket dibêje:

“Başê tu di evînê de çî dibînî ?- Resenîya mirovî rastî û derewa wîji ber vê çendê, mirov ji bo evînê digeryanê deye”(Babê Nazê , 2016: 57).

Li vir jî romannivês bi rengekê balkêş wesfa evînî diket. Dete dîyarkirin resenetîya mirovî di evînê da dîyardibît. Ka di evîna xwe da rast goye yan jî derewîne. Herwesa romannivês amaje bi çarenivêse hevala Sûlavê Medya diket dibêje:

“Ji xwe, Medya bi xwesteka xwe şûkir û li Ewropa xwendina xwe berdewam kir. Sûlavê jî, ligel ku gelek kelem ketin ber rîya wê û bi destxistina macistêra xwe bû mamoste li zankoyê” (Babê Nazê, 2016: 69).

Ji ber ku Medya keçeka azad bû di nav civakê da. Ji xêzanekê bû bav û dayîk wê azadî dabûyî bi azadine şûbîke gehîştîye xwesteka xwe. Medya û xîzana wê gelek dab û nerît û rêsayin civakî li ber çav wernegirtin. Herwesa li demê Sûlav jî li zanko Şahîn dibînit dilê wê dikevîte mamosta Şahîn bi vê rengî romannivêsi bi me daye dîyarkirin:

“wey Xweda, piştî wîqas sal, tu ji ku ji min re hatî?” Lê temenê wî yê mezin nehşit ew xuyizka xweşîyê daqurtîne, ji ber ku dû tiştan rê li ber dilê wê girt, mirovekî weha, bê hevjin nabe, û ewê tu carî nebe hevjinê duyemîn. Hevjinê duyemîn, her dem ji bo hevjinê yekemîn êşeke û belake” (Babê Nazê, 2016: 70).

Herwesa romannivês behsê arîşa firejinîyê diket ku Sûlavê nexastîye çî caran bi ser jineka dî da şu biket. Ji ber ku hevjinê dûmîn, dibe cihê nexuşê bû hevjinê êkê wê jî nexastîye bi vî rengî hevjinîyê pêk bîne:

“lê piştî çend rojekê, agahîyên wê li ser mamostê ku dilê wê lerezandî bû, çê bû ku ewe bûye nêzî pênc salan, hevîna wî çûye rehmetê” (Babê Nazê , 2016: 70).

Piştî bihîstina vê xeberê êdî hêvîyek ji bo Sûlavê çêdibe. Lê her arîşek dikevîte pêşa wan ew jî mezinîya temenê wan bû romannivêş amajê pêdiket dî vê peregrafê da:

“yê wî dighê şêstî û yê min jî bi ser sîhî dikeve ... û li vir, pirsra anîna zarokan dihate berçavên wê, êdî bi helwestek pesendikîrî ji xwe re got : " heger ew kal bibe, ezê berdemamîya jîyana xwe, di zarokên xwe de bibînim” (Babê Nazê , 2016: 71).

Li vir jî bi bîrînana zarokan cîyawazîya temenî di navbera xwe û Şahîn da li ber çav nagrît. Ji ber ku heza dayîkatîyê Xwedê di nav derunê her keçekê da çandîye. Daku berev avakirina hevjinê û xêzanê ve biçê. Mamosta Şahîn daxwaza hevjinîyê ji Sûlavê diket dibêje:

“ heger tu bibêjî " erê ", ezê bêm destê te, ji binemala te bixwazim di berisiva xwe de, lez meke û ezê çend rojekî li hêvîya bersiva te bimînim ...erê raste, ez gavek dûrî 'aqlan davêjim lê bizanibe, heger min 'aqlê xwe wînda kiribe, ew jî ji ber ku min hez ji te kirîye ...” (Babê Nazê , 2016: 72).

Ji ber ku armanca evîniyê divê pêkînana jîyana hevjinîyê bit. Ji derveyî vê armancê em neşên nav lê bikeyin evînî. Tenê dibe hezeka gîyanî bu têrkirina hezên netêrkîrî ji derveyê çarçovê xêzanê. Ev çende jî di nav civakê da cihê rexnegirtnê ye

“dayê, mamostakî, li cîyê xebata min, dixwaze bê mala me û destê min ji te û Babê min bixwaze...hindik mabû dayîk, ji ber xweşhalîyê bilîlîne, ji ber ku ji mêjve, li hêvîya mizgînîyek weha bû û baş pê dizanî mayîna keçê li mala Babê kembaxî bû, loma jî pirsra şûkirina keça wê pirsra pirsra bû û bê şûkirna wê çawa Sûlavê dêşand, weha jî bav û dê” (Babê Nazê, 2016: 75).

Li vir romannivêş bi me dete dîyarkirin ku demê keç dibe qeyre yan jî digehîte jîyekê mezin şîneket. Li mala Babê xwe da bimînit. Ne tenê keç bi vê çendê dîşit. Belê dayîk û bav jî bi vê çendê dêşin. Bandora xwe li ser xêzanê hemyê diket. Romannivêş dî vê romanê da bi rêya çîroka Sûlavê amajê bi arîşa qeyrebûnê di nav

civakî da diket. Hewildaye egerên vê arîşê dîyarbiket. Û çareserîyê jî bo vê arîşê dîyarbiket. Ligel ku Sûlav razîbûna xwe li ser Şahîn derdibrêt û dibêje:

“ mala me pesendikir, ez şû bi te bikim, lê mercek min he ye û kengî tu mercî pesend bikî, were min, ji binemala min bixwaze .-Ev merc çî ye ?-Ezê di namê de, ji bo te binivîsîm” (Babê Nazê , 2016: 80).

Her çende Sûlav razîbûna xwe li ser Şahîn derbirîye. Lê mercek hebûye mercê wê jî dê vê peregrafê da amajê pê diket Sûlav qewîyatîya Medya bîra xwe tînt cihbecih diket demê dibêjîtê heger kesek te bixazit

“lê kesê ku bi pazde - bîst salan ji te mezintir bit, tu vê yekê jê bixwaze,” emê tenê heyvekê, bi hevre bimînin û dive demê de, pêdvîye tu xwe nêzî min nekî û neyê nav cîyê min û piştî heyvekê min berde. Heger mercê te pesend kir şû pê bike ji ber ku nîşana hezkirina wî ji bo te ye . "Ji xwe, Sûlavê ev mercê dawî, di nama xwe de ji bu mamoste Şahîn, bi heman şêwe nivîsbû” (Babê Nazê, 2016: 81).

Mamosta Şahîn jî evî mercê Sûlav bi vî rengî şîrovediket:

“ewî ji xwe re got : "hebe, nebe, ewê keçanîya xwe wînda kirîye û bi şûkirinê, ewê nekeçanîya xwe yasayî bike û bi berdanê ewê rê ji bergerîyana sêksî bike. Heger ne weha bit, dê bi çî bête ravekirin." lê di heman dem de, ewî di Sûlavê de, ev xislet nedidît, çawa ji ber reftarîya wê, weha jî, ji ber pêwendî û perwerda wê” (Babê Nazê, 2016: 82).

Li vir romannivê egerkê dî qeyrebûna keçê di nav civakî da dîyardiket. Ew jî ji dest dana keçanîya keçê ye ku çî bi dest dirîjîkirina zordarî bît yan jî bi her awayekê dîtir bît ku ev çende jî dibe rêgir dirêya şûykirina keçê da. Çunku di nav civaka Kurdî da keça keçênîya xwe ji derveyî çarçovê hevjinî ji dest dabît. Di nav civakê da kes amade nîne hevjinîye ligel pêkbînit. Her çende Şahînî hest bi hebûna arîşeka weha kirîye dibe Sûlav ne keç jî be lê ji ber evîna xwe razîbûye jîyana hevjinî ligel Sûlav pêk bînit. Dive peregrafê da amaje pêkirîye:

“Şahîn ji xwe pirsî: " heger hokar ev bin, evca çare çî ye ? " Ewî, dawîya ma dawî, çare di bersîva bi " erê " dît û di "nayê" de, bê berpirsyarî-Ez mercê te pesend dikim û sipêdê em tîn xwazgînîya te” (Babê Nazê, 2016: 82).

Romannivês bi vî rengî amajê bi helwestê Sûlavê diket:

" ne tenê tu bi temenê xwe mezinê, weha jî bi gîyanê xwe " û hêsr ji çavên wê hatin xwarêEw girinjî û got :- em li hêvîya wene" (Babê Nazê , 2016: 83).

Herwesa piştî razîbûna dayîk û Babê Sûlavê mamosta Şahîn û Sûlav jîyana hevjinî pêkênan:

" eve cara pêşîn bû, hest bi ciwanîya xwe kir û xwe weku bûk dît. Lê tenê, ew rûniştina li teniştaya zavayî, li hola dawetê jê kêmbû. Ji xwe, ev rûniştina bûkê bi xemla bûkanîyê, li teniştaya hevjinê paşerojê, her dem ji Sûlavê re dibû cîyê balkêşîyê û heta xwestek û hêvî. "Ma keç heye ku ne li hêvîya vê rojê ye?"(Babê Nazê, 2016: 84-85).

Eve jî xewna her keçekê ye ku ligel hezkirîyê dilê xwe jîyana hevjinê pêkbînit. Ew kesê ku bi dilê wê bît û bi razîbûna dayîk û Babê wê bêt. Sûlav jî li şeva şehyana xwe li jûra Şahînî hestên xwe yê evîne beramber Şahîn derdibirît dibêje

"-tu dizanî eve bûye çend sal ez li te digerîyam û vaye min tu dît. Ez qurbana te bim min bistîn!! Erê min bistîn, tirs û şermoktîyê ji min birevîne û min bike ya xwe, û xwe bike yê min!"(Babê Nazê, 2016: 87).

Qahremana vê romanî ku Sûlav bû gehîştîye mirarda xwe û bi dilê xwe jîyana hevjinî pêkînyaye ligel Şahînî. Her çende keçek bu jîyê wê gehşit bo 30 salî jî lê qed bêhevî nedibû ji jîyanê ji ber qeyrebûna xwe.

2.2.15. Xîyanet

Xîyanet arîşeka civakî ye romannivês di romana "Stokholmê Te Çi Dît Bêje" amaje pê kirîye. Demê evîndarîya di navbera regezê nîr û mê da li ser berjewêdîyên kesokî bît. Ne li ser berjewêndîyeka hevpişk bît. Ne bûn armanekeka pîroz ne bo pêkînan xêzanê bît. Tenê bo têrkirina hezên kesokî bît. Dê derencamê wê bîte xîyanet di navbera her dû layan da. Romannivêsî dî vê romanê jî da amaje bi xîyaneta Bêkes û Lîza beramberî hev kirîye. Demê li şeva dûyê Bêkes hevnasîne bi jina navê Îva Swêdî kirî dê vê peregrafê da:

" çawa ewê li mala Lîza bi jinek din xew bike. Lê rê bi xwe li ber vebû û fersend bi xwe hat? Gava Lîza û mêvanê nû li oda razanê derî li paş xwe ve girtin ... Bêkes jî bê tirs

Îva hembêz kir û bi ramîsanen çû devê wê. ...Got ji jor re nahêle û ji jêr dengî nake !”(Babê Nazê, 2012: 116).

Dîvda jî romannivê amajê dete nexweşîya Îva yê:

“ bê tirs bi Îva re çû nav nivîna. Lê belê hiç ne di bala wî de bu ku wê sînga wê bê pêsîr be. Îva jî bi xuya kirina 'eyba laşê xwe, bi hêrs û qêrîn def da Bêkes, xwe qlûpand ser zikê xwe û bi kîn girîya... dosto rabe! Rabe te hevala min xeyîdandîye, ma min ji te re ne got ku ew nexweşe ?” (Babê Nazê, 2012: 117-118).

Ji ber ku Lîza bi vê bûyera navbera Îva û Bêkes zanî bû bi vî rengî nerazîbûna wê dete dîyarkirin:

“ toxmê we zilaman, toxmekê seyre ,-bi van gotinan Lîza girnîjî - heya hûn her tiştî ne kin debara we nabe... Ma kê ji te re gotîye ku tu pêl terîya pişikê kî? Ma tu nizanî wê dev li te ke? ...Ne wek cara berê Lîza bi qedir û me'rîfet pê re daxvî” (Babê Nazê, 2012: 119).

Li vir romannivê bi me dete dîyarkirin ku êdî peywendîya navbera Lîza û Bêkesî wekî berê nemaye. Nakokîyan di navbera wan da despêkirîye demê dî vê peregrafê da amajê pê diket:

“ Lîza dîsa bi rijdî peyîvî -'adeta min ewe ku min dostanî bi yekê re danî, dostanîya min pêre dayîmî ye... Bêkes di nav xwe de got:" dostanîya çî û halê çî! Îca ew ji min kê maye ku ez vê keşkulê ji xwe re bikim yarîk! "-adetek min he ye heger mirov paşî min dest bavête jinek din, ez nema wî bi yartî qebûl dikim... " Te ne go min tu qebûl kirîye? "-Bêkes di nava xwe de got. ...tenê tê dost û birakê mala min bî... Deryê malê li ber te vekirîye û kengî tu bixwazî tu dikarî bê û heya bi yarîka xwe re jî li vira razê” (Babê Nazê, 2012: 121).

Li vir romannivê dete dîyarkirin ku Lîza weku yarî xwe temaşeyî Bêkes dikir. Li piştî vê bûyerî êdî berê xwedana wê hatîye guherîn. Êdî tenê weku dost û bira temaşe diket. Belê ser vê bûyerî ra jî her weku Lîza bi berçav wernegirtîye. Lê borîye ji ber hindê jî dibêjît were xanê min ve bijî di oda kurê min ve ez bi kirê bidem te. Lîza dibêje:

“ ezê bêjim, ew yarikê mine,- dîsa Lîza kenîya-carna li vira radizê... Min digot qey hûn Kurd mêrxasin ...” (Babê Nazê, 2012: 123).

Dîvda jî Bêkes diçîte xanê wê ve dijî. Peywendîya navbera wan da berev başî diçîte ve. Her weku dî şevbêrika roja qazancê da Lîza bi vî rengî hestê xwe beramber Bêkes derdibrît:

“ her du destên xwe vekirin bi mezacê xweş Bêkes hambêz kir û ew maçî kir. ...- Were, dilovanê min were... Îşev roja qazanca mine. ... Hîn ew ne ghiştibû dengê Vêra hatê : " bes maçî hev kin! Ma nebese?” (Babê Nazê, 2012: 127).

Lê demê Vêra dibêjît binerin bi ramûsana hevûdû sor kirine bi vî rengî Lîza bersîva wê didet;

“ tu gotinên vala dibêjî !-Lîza gotina xwe bi xeyd got -Bêkes tenê birakê mine... (Babê Nazê, 2012: 128).

Li vir jî romannivêş ew gorankariya bi ser hestên Lîza da hatiye beramber Bêkes amajê pê diket. Piştî dîtina Bêkes ligel Îva ya Swêdî. Pişra jî romannivêş amajê bi tîrwanîya Bêkes diket li ser mayina xwe li mala Lîza ka çawa hizir diket xelk çî dibêjin ser vê mijarî. Demê li dur vê mijarê Bêkes bi Katyayê ra diaxvît û dibêje:

“-ez xwe naxeydînim, lê ez ditirsim rojekê wê hinek bêjin , " mêrê xwedîya malê. "- Mane weha ye? Katya got û dîsa bi gotina xwe re kenîya” (Babê Nazê, 2012: 132).

Bi vê çendê jî romannivêş wesa bi me dete dîyarkirin ku dî çavê hevalê Lîza da Katya jî yek ji wan Bêkes weku hevjinê Lîza hate dîtîn. Her çende Bêkes vê çendê li ser xwe qebûl jî neket. Lê ew bi xwe jî metirsîya gotina tiştêkê weha li ser xwe dîyardiket. Lê piştî Bêkes dihête xanê Lîza ve. Ê Bêkes bû cara duwê bi jinekê ra dibînit. Ew jine jî Katya bû. Lîza gelek tore dibêt ji Bêkes her weku dive peregrafê da dîyardibît:

“ dema Lîza jê re got : -ji hevala xwe ya delal bipirse îşev tu yê çendayî? Bêkes li ber xwe, li ser textê xwe Katya şilfî tazî û şaq vekirî mîna rew-rewka dît hîn ew weha bû, Lîza rê nedayê ku hizir bike yan tiştêkê bêje, ew bi ser xwe de dehifand û got:-her toxmê we hemûya yeke, jê bipirse tu yê çendayî ?- Bi gotina xwe Lîza bi qehir derî li paş xwe girt û derket” (Babê Nazê, 2012: 138).

Romannivêsi li vir jî bi me dete dîyarkirin ku Lîza li ser mijara xîyaneta Bêkes bi Katya ra gelk ji Bêkes ture bûye û qehirîye Lîza dibêjît" tu yê çendayî". Anko ma tu evîndar û hevjinê minî yan jî yê Katyayê piştî vê bûyerî romannivêsi dibêje Bêkes biryar da ji mala Lîza derkevît her weku di vî peregrafê da dîyar diket dibêje:

“ ji wê rojê û pêve Bêkes biryara ku ji malê derkeve stend wî biryarek weha stend, tevî ku dizanî li Stokholmê dîtina xanyekê pir dijure, ji bilî vê tiştî du bûyerên din hiştin ku ew berê wextê ji mala Lîza derkeve ”(Babê Nazê, 2012: 139).

Piştî xîyaneta Bêkes bi Lîza ra romannivêsi li ser zimanê Bêkes behsi dû xîyanetên Lîza diket. Ji bilî dizîyên Lîza egerî derketina xwe ji mala Lîza bû van dû xîyanetan dizivîne ya êkê demê Lîza ligel kurê Tanya dibînit û dibêje:

“ Lîza dibin kurekê 14 -15 salî vezilandî ye. Her wê lawik, bi ser xwe de, dikşand û hişkişî xwe dikir ” (Babê Nazê, 2012: 140).

Demê Bêkes vê dîmenî dibînit bi vê rengî helwestê xwe derdibrît:

“ û hîn ew negiha xwe gunehkar bike yan jî bi ser Lîza de rabe û wê pis bike ” (Babê Nazê, 2012: 140).

Li vir romannivêsi bi me dete dîyarkirin ku Bêkes jî bi xîyaneta Lîza digel wî ture bûye. Eve jî êk ji egerê derketina wî bû ji mala wê. Eve jî wê çendê dîyar diket ku peywendîyeka evîn di navbera wan da hebûye. Ji ber ku her dû jî bi xîyanekirinê li hevdû ture bûyine. Bûye egerê têkçûna peywendîya evîniyê navbera wan da. Bûyera duwê jî demê dû mêhvan dihêne mala Lîza û Bêkes bi vê rengî wan dibînit:

“ li odê dît ku her dû mêvan şilfî tazî ne û bê hiş razane. ...- Bela dengê min xweş bê te ev şeva dawîye ku ezê li vira bim. ... Dûre heya destê sibehê xewê rîya xwe di çavên Bêkes de nedît. Ew ranediza, lewra wî xwe bi mana li vira gunehkar dikir. Ew nikarîbû razê, çunkî di navbera demekê û demekê de, her Lîza dikir qarîn û carin”(Babê Nazê, 2012: 144).

Lê vêrê romannivêsi li ser zimanê Bêkes bixwe behsê wê rewşê diket. Yaku Lîza ketîye tê da piştî Bêkes dibêjît ez êdî mala te da najîm. Lîza jî wê şev her dikir qarîn û

carîn. Wesa xweya dibe ku Lîza pê nexweş bûye Bêkes ji dest bidet. Lewra ketîye rewşeka weha da. Ji ber vê çendê jî ev dîyaloke di navbera Lîza û Bêkes da derbazdibît:

“ ez dibînim... Min naskir ku tê nema bi mala min qayîl bî ... Lê belê , gerek dostanîya me dom bike û derêyi mala min her car li ber dostê mîna te vekrîye-Spas ... Ez vaye derdikevim, niha ez çente bi xwe re nabim, lê roja duşembî ezê bê m bibim. Ew derket û tu rê li ber neman ji bilî bi mêvanî rojekê li ba wî hevalî be û rojekê li cem yê din be, heya ku odak bi dest keve”(Babê Nazê, 2012: 145).

Romannivês egerê derketina Bêkes di mala Lîza ve girêdaye bi xîyaneta di navbera her dû evîndaran da. Ji ber ku wê şeva Babê Nazê ji mala Lîza derdikevît. Venagerîte malê û wê şevê serokwezîr dihîte kuştin. Û Lîza jî polîsan li ser nehatina Bêkes wê şevê agehdar diket. Ji ber vê çendê navê Bêkes dikevîte deftera polsan û vekolîn ligel dihîte kirin weku dive peregrafê da dîyardibît:

“ wê roja ku Bêkes ji mala Lîzaya derket, bi şev, li ber nivê şevê serokwezîr bi destê hinekan hate kuştin . Paşî sê rojan ji bûyera kuştina serokwezîr Bêkes vegehiya malê da ku hûr û mûrên xwe li mala Lîza bibe û wî nizanîbû ku roja dûyê ji kuştinê, Lîza tîlefon ji polis re vekrîye û agahî daye wan ku mirovekê Kurd bi navê Bêkes li cem bû û ji şeva kuştina serokwezîr nehatîye malê. Bi vê danana agahî, Bêkes kete deftera polis, bê ku ew zanibe. Tenê gava ew hate mala Lîza, ewê bi car car jê re got :-polis li we Kurdan digere û li te jî ... -Li min? Bêkes bi tirs pirsî .-Erê li te ...-Çima li min ?-Ez çi nizanîm, here cem polis bela ew ji te re bêjin çima. Bêkes negehişt tiştê din bêje, Lîza yekser çentê wî da dest, mişta malê jî stend û derî li pey girt. Bêkes derket... zû bi zû, bi harîkarîya hevalê xwe, li ser cîyê xwe polis agehdar kir. Li ser pirsî komîsar" çima tu roja kuştina serokwezîr ji mala Lîza derket? Bêkes weha bersîva xwe da : " min nkarîbû xwandna xwe bikira û li mala Lîza rehetîya xwe bistenda ..." (Babê Nazê, 2012: 145-146).

Bê vê çendê jî roman bi xwe berev dumahêyê ve diçit. Romannivês dete dîyarkirin li ser zimanê Bêkes ku Lîza gileya wî kirîye agehdarî daye polîsan. Romannivês egerê vê çendê jî bi renekê nerastewxwe bi me dete gotin ew jî ew nakokî û xîyaneta navbera her dûyan da peîdabûy ye. Bûye egerê wê çendê ku Lîza weku tulvekirinekê beramberî xîyaneta Bêkes beramberî Lîza ligel Katyayê. Polis li ser nehatina wî li wê şeva Olof Palme hatîye kuştin agehdarkirine. Bûye egerê tawanbarkirina Bêkes bi bêbextî bi kuştinê.

Û ji ber ku Kurd bû ev jî hiştîye axiftina Lîza bi girîngî werbigrin û vekolînê ligel biken û li bin çavdêrê da bimînêt. Ji ber ku xîyaneta di navbera evîndaranda dibe egerê rîq û kînê ew evîna wan bo hevûdû hebûye hemî dibe rîq û nevîyan. Û gelek caran layenê xîyanet lê dihête kirin hizrê di tolvekirinê da diket çî her bi xîyanet kirinê bît. Weku dîvda em dîvê romanê da dibîn xîyaneta Lîza jî beramberî Bêkes. Yan jî tolvekirineka mezintir weku ya Lîza beramberî Bêkes encam day ew jî tawanbarkirina wî bi kuştina bi bêbexetîyane. Weku me gotî heger evînî li ser binemayin ne dirust bihête avakirin û ne ji bu armanceka pîroz bêt û pêkînana xîzanê bêt. Û dixweş û nexweşyan da ligel hevibijîn. Û lêborîn navbera wan da hebît û her kesek tinê berê xwe bidete berjewendîya xwe ya kesokî bê hizrkirin di kesê beramberê xwe da dê derencamê xirab lê kevin dibe egerê xîyanetê û jêk vebûnê weku romannivês dîvê romanê da bi me daye nasandin ku evînyek bo li ser berjewendîya hevpişk hat bûye avakirin. Ji ber wê çendê jî derencamên xirab lê ketîne. Herwesa dibe jî Lîza ji ber bi destxistna xelatê hatîye terxankir ji layê polîsan ve agehdarî dabîte polîsan lê ev çende ji layê romannivêsî bi ser Lîza ve nehatîye paldan, lê demê li dumahîka romanê vê axiftnê dibîjite jineka Swêdî demê temaşeyî wî diket. Dibêjîtê hilu rabe polîsan haydarbike da xelatî bi destvebînî. Divê peregrafê da amaje bi vî xelatî kirîye di romanê da:

“ bi van ramanan ew negîha biryara polis di derheqê kesê ku kujdar bigre an cîyê wî bi polis bide nasîn, wê xelatekê bi 500000 kron bistîne û bixuyne” (Babê Nazê, 2012: 15).

Romannivês ev romane îxistiye berçavê xwandevanî da ku ew serbora bi serê wî hatîye bi me bidete nasîn. Û xwandevan jî mifaye jî wergirît di jîyana xwe ya di nav civakî da. Bi me dete nasîn ku çî bûye eger heta jîyana wî li jîyana koçberî gehiştîye qonaxeka weha. Hewildaye rastîya jîyana koçberî resenayetîya çanda milletê Kurd bi xwandevanê bidet dîyarkirin û ew serbora bi ser wî hatîye di çarçovekê hunerî da di nav romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” bi me dete nasandin. Her weku vîyaye bêjît li Stokholmê çî bi serê min hatîye bi bîne. Bu me dîyar dibêt ku egerî agehdarkirina Lîza li ser Bêkesî ji ber tolehdanê û xîyaneta evînyê bû. Û egerê vekolîna polîsan jî bi Bêkes ra pitir ji ber Kurd bûna wî bû.

2.2. 16. Nexşên Erotîkî

Romannivês Babê Nazê di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da ku êk jiwan romanaye ku babetê xwe ji serbora jîyana romannivêsi bi xwe li jîyana civakî li koçberîye wergirtîye. Û rastîya jîyana koçberî bi hemî başî û xirabîyên xwe ve berçav diket. Ji ber ku civaka Kurdî dab û nerît yasa û rêsayên xwe hene. Civaka Kurdî jî hindêk hêlên sor hene nabît gav di sera bihête havêtin. Ji wan jî, axiftin li ser kiryara sêksi bi tiştêkê şerm û ne layêq dihête hijmartin. Dive romanê da, nexşitên erotîkî yan sêksi cihekê baş bi xwe ve girtîye. Babê Nazê azadî daye pênusî xwe li ser hemî layenê jîyana koçberî axiftîye ji wan jî kiryara sêksi ye. Gelek caran nivêser weku tehedeyekî civakî bi kar dînit. Divêt hêlên sorên ku ji layê civakî ve bo hatîye dana derbazbiket. Hindêk caran jî rûdanên romanê wê çend dixazît û romannivês jî xwe jê nadete alî weku rastyeka jîyanê di nav romanê da amajê pêdiket. Ji ber ku “sêkis êk ji babetên here qedexe kirîye û bi aşkrayî di nav komelgehê da nahête behiskirin ... ku kartêkirina wê ya dû sere. Ne behiskirna wê, rêzgirtne li dab û nerîtan û ji layekê dîve, dû dilêye peyda diket û dahênanê dikujît û komelgehî paşvemayî dihêlît” (Ebdulrahman Bamernî, 2015: 83) dê amajê bi hindêk wan peregrafa deyin ku di romanê “Stokholme Tê Çi Dît Bêje” da nexşên erotîkî êxsiyane berçav.

“Heger yê di nav çîpên kalo de, di nav çîpên pîrê de ba, wê pîrê biba kalo” (Babê Nazê, 2012: 34).

Herwesa jî demê Babê Bêkesî dibêjîtê di dînî de heya tune ye van axiftina li ser jina bu vedgêrît:

“Heger devê jinê biçûk be, wê 'ewreta wê jî biçûk be, herweha jî, heger kuyizeka kopikî be, wê 'ewreta wê mîna kutilka têr guşt be. Lê herçî jina ku 'enîya wê bi pore, ewê quduş be û berî her kesî ewê serê te bi xwe” (Babê Nazê, 2012: 65).

Romannivês bi me dete dîyarkirin ku ew taybetmendîyên Babê Bêkes li ser jinan bu gotîn hemî di Lîza da dîtin weku vê peragrafê da amajê pê diket:

“Dibe ku Lîza wek jin, hemû xisletên Babê yên ku li ser jinan gotbûn, têde dihatin gewdekirin û wî tiştî hêla bû ku bi berferehî di şîretên Babê de mijûl bibe. ... Bo çî bi peywendîyên xwe re, ez pêre dîr çûm?” (Babê Nazê, 2012: 68).

Her weku li vir poşmaniya xwe jî dete dîyarkirin bi nasîna Lîza ku ew bûye egerî tawanbarkirina wî bi mijara Olof Palme serokwezîrê Swêdê. Babê Nazê di nav roman xwe da behsî sêksî kirîye weku rastîye ka jîyanê li Swêdê li jîyana koçberîye. Herwesa romannivê amajê bi gotinên Lîza diket dibêje:

“Zilam hertim dixwaze, lê ne hertim dikare. Jin hertim dikare, lê ne hertim dixwaze, lê ez hertim dixwazim û hertim jî dikarim ...” (Babê Nazê, 2012: 106).

Bi vê jî romannivê amajê bi derbirîna sêksî ya azadane ya Lîza diket. Dîvda jî romannivê amajê bi azadane ya hestên sêksî diket ji layê Îvane ve demê Lîza helbesta xwe dixuyînit Îvan vê hevokê lê zêdediket û dibêjit:

“-heger xurt bèn emê razên...” (Babê Nazê, 2012: 112).

Herwesa romannivê li ser zimanê Bêkes behsê şeva xwe razanê bi Lîza diket li şeva êkê li şevbirîkê li mala Lîzayê. Û xwe digel mêhvanê şeva duwê berawirdiket û dibêje:

“Pêre - pêre ji nemêraniya xwe bi Lîza re şermkir û bikeser ji xwe re got: “ Hema çawa be ewê ne wek min û wê şevê be !” (Babê Nazê, 2012: 119).

Li vir romannivê amajê bi axiftina Bêkes diket ku ji layê kiriyara sîksî ve hest bi lawazîya sêksî kirîye. Beramber Lîzayê gelek caran ev çende jî dibe egerê nakokî navbera jin û mîran da demê heza layenekî û ji layenekê pitir bît. Herwesa romannivê amaje bi dîmekê dî îrotîkîyê Lîza daye û bêbarbûna sêksî li dev Lîza dîyardiket demê Bêkes wê dibînit dê vê peregrafê da:

“Wî dît ku Lîza bi kirasê şevê û “nêrê” lastîk di dest de bi alî wî tîne. Bêkes ji cîyê xwe rabû û bi xeyd ji Lîza re got : -îca ev çî ye ?-Ev ... Ev ji we hemû ya çêtire ... Ez wî nandim bi we û ...hûn sê zilamên, lê hûn çarîka vî tiştî nikarn bikin... Bêkes sar ma û Lîza bi serxweşîya xwe ve, bi alî wî de hat:-heya ji wan nayê ku vê bi kar binin, deka tu wî bi kar bin, da ku tu hunerê wî nasbikî!” (Babê Nazê, 2012 : 143).

Li vir jî bo me xwuya dibe ji egerê nebûna hevjinê berdem ku jin ligel bijît. Kiriyara sêksî ji derveyî sînorî hevjinê dibe egerî berelayêya sêksî û bêbarbûn û tihmî bûna sêksî;

“Rojekê bi vekirna derî, axîn û ofîn, bi hev re, ji oda razanê ya Lîza, li ber guhên Bêkes ketin. ... Wî bi nav axîn û ofînan de dengê Lîza nas kir: " were ... Lawkê dilê min were ... Of ... Hîn bêtir xwe bîne û bibe... Were eferim ... Ay ... of ... Eferim lawikê dilê min, eferim tu ji zilamekî çêtrî ... 'Eferin ... ” (Babê Nazê, 2012: 139).

Herwesa romannivês amaje bi dîmenekê dî erotîkî kirîye li şevbirîka li mala Lîza dive peregrafê da:

“bi gotinên Îvan , Sonya hîn gerimtir bû, şerwal jî ji xwe kir. Lîza bi gêjtîyê li Sonya dinerî û hayê wê dikir. Di nav peyvên: " biravo ... Eferim " ên civatê her dû jinan xwe şilfî tazî kirin û mîna jin û mêran ketin hembêza hev”(Babê Nazê , 2012: 103-104).

Romannivês bi me wesa dete dîyarkirin ku ev reftarên henê bi renekê aşkerahî hatine encam dan û li berçavên hemî amadebûyên şevbirîkê û dest xweşî jî li wan hate kirin li ser van reftarên hevregezbazî di navbera jin û jinê da. Bi van dîmena romannivêsî destxistîye ser azadîya sêksî di nav kulturê rojavayî da li welatê Swêdê. Herwesa romannivês dîmenekê dî jî berçav kirîye her li şeva şevibêrîkê:

“Mirovê hunermend xwe şilfî tazî kir û ew jî kete nav wan. Jin lê hatin hev û rohinya ku hebû hate vemrandin û xelkên tazî pitir bûn û mîna pêlên deryayê da dihatin û da diketin” (Babê Nazê, 2012: 104).

Herwesa romannivês amajê bi wê çendê diket ku piraniya berhevbuyan tevî vê berelayêya sêksê bûyne û jin û zelum bi hevra dî vê şevbirîkê da. Herwesa romannivês amajê bi dîyaloka di navbera Bêkes û Katya da diket û demê wê jî vîya tevî komê bibît. Di vê peregrafê da:

“Katya bi awakî alavî destê xwe avêt krasê xwe ku ji ber xwe bike. Bêkes rê nedayê, ew hembêz kir, rahşitê û berê xwe da cîyekî din ... Li ser text her Katya digot:-ma çi cîyawazî heye, çi li vir û çi li wira? -cîyawazî ewe, ez naxwazim ku em mîna heywanan li hev kevin. Dive her tişt bi sînor be. -rojhelatîyo, rojhelatîyo hûn her tiştî dixwazin bi dizî bikin Hûn wek pişkulê bi zêr pêçayê ne ... ” (Babê Nazê, 2012: 104-105).

Li vêrê jî romannivês cîhanbîna Katya û Bêkesî bi me dite dîyarkirin ku li dev Katya ew reftarên sêksî wê şevbirîkê bi tişteki normal dihatine dîtin weku beşek ji kultura rojavayî. Lê dê çavên Bêkes da bi derbazkirina sînoran û binpikirina hêlên sor dihatine dîtin

dibêje" ez naxwazim ku em mîna heywanan li hev kevin dive her tişt bi sînor be ". Ev çende jî cîyawazîya kulturî dîyardiket. Di navbera Bêkes û Katya da ji ber ku Bêkes ji rojhelatêye dibin bandora kultûrê rojhelatî da maye. Ji ber ku di kultûra rojhelatî da dibin bandora dînî da mayne. Helbet dînî da wesaye heger kesek çend gunehan jî biket. Divê nehênîya wan guneha parêzit û rîklamê bû neket. Daku hindek kesên di jî çav li wî neken. Dîsan şahîdan li ser xwe peydaneket. Û ji ber ku delve heye ji wan gunehan tubebiket. Lê Katya bi vî awayî têgehşîtiye dibêjîtê" rojhelatîyo hûn her tiştî dixazin bi dizî biken... hûn wek pişkulê bi zîrî pêçayî ne .." Ev axiftina wê weku rexneyekê jî dihîte berçav dibêje dûryatî li dev rojhelatîya heye. Li piş çav û veşartî ne wek hevin. Ya dilê û derunê wan da cudaye ya li ser zimanê wan û ew reftarê diken. Ya fere bizanîn armanca nivîskarî çîye bi karînana van wîne û nexşên erotîkî di nav romana "Stokholmê Te Çi Dît Bêje" da. Romannivêş berisiva vê pirsê didet li ser vê mijarê dibêje "pirsê tu bixazî nexazî. Ew cêgehê bûyer têda derbazdibin û kartêkirina xwe li rûdana diket digel naverukê. Tu hizra xwe bike emê bêjin cihekê yan siqayekê weku Stokholmê li Swêdê tu bidê xweyakirin. Weku yan jî tu li bajêrekê Kurdan bî li Sûrya ev yek durî 'aqle. Ya duwê min xwest ez bidem xuyakirin. Berî her tiştî ew tiştê Ewropî xwe pê didin xuyakirin. Û rastîya wan çîye. Û ew tiştê em vedişêrn û rastîya me çîye. Ye'nî em bêjin mumkine weha tê kirin. Nabêjin sedê sed yan sedê nud lê nizbeka mezin ji gencên rojhelata navîn peywendîyên wî sêksî hene lê vedşêrit. Yek neşê bêt min çikirîye yan bidet xuyakirin. Lê nivêser heqê wî nîne vê tiştî veşêre. Gerek wê rastîyê dîyarbike. Ê min pirsê bi karînana sêksî di romanê da armanca min ne ew bû ez sêksî bidem xuyakirin. Na armanca min ez wê rastîyê bidem xuyakirin. Di hindirê wê rastîyê da ew arîşa ku hatîye ser Kurdan. Em bêjin Kurd weku çî hatine xuyakirin.

Di rastî da ew çine û ji ber vê yekê tu bixwazî nexwazî berawirdîyeke çêdibit. Tu bixwazî nexwazî jî ser vî esasî ye ne ku min kir armanc. Ji xwe re di pirosa pêşkeftina bûyeran da. Ev hatîye pêşîya min. Min xwe neda alî" (Bi Babê Nazê ra hevpeyvîn Waar TV: 2015). Anko armanca romannivêş pitir weku dete xuyakirin. Berawirdîyekê biket navbera kultûrê Kurdî û Ewropî da ka rastîya wan çîye û rastîya me çîye. Herwesa Vîyaye rastîya jîyanê li Stokholmê bi xwandevanî bi dete xweyanikirin. Helbet ev tiştê ku nivêserî amaje pê kirîne. Di roman xweda ne durî rastîyêne. Herwesa di nav van mijaran da destxistîye ser ew arîşa hatîye serê romannivêşî bi xwe. Egerî tawanbarkirina xwe û Kurdan bi kuştina serokwezîrê Swêdê Olof Palme. Kewate romannivêşî têşxistîye ser

babetê sêksî dê vê romanê da weku rastîyeka jîyana Swêdê ew azadiya sêksî dî vî warî da ku li rojava heye .

Kewate romannivês vîyaye êşa xwe û miletê xwe birêya romana xwe bi xwandeveanê bîyanî û navxwe bidet nasandin. Bi regekê rastîya jîyanê û resenetîya miletê Kurd û kultûrê Kurdan tê da daye dîyarkirin. Herwesa rastîya jîyana koçberî û rastîya jîyana rojava û kultûra wan bi xwandeveanê Kurd daye nasandin. Herwesa egerê li pişt tawanbarkirina xwe jî bi kuştinê dayne xuyakirin. Rastîya jîyanê tevlî xeyala xwe kirîye. Ê berhemekê hunerî di çarçovê romanê da dibin sîbera rîbaza realîzmê da nivêsyê. Bi tabyetî jî dibin sîbera realîzma rexnegirane da. Ji ber ku bi awayekê vekirî gelek arîşên di nav civakê Kurdî û li jîyana koçberî li Swêdê êxsiîfîne berçav û rexne lê girtîye yan jî êxsiîfîne berçavan. Romannivês bi rêya amojgarîgarên Babê xwe hewildaye çareserî jî bo wan arîşan dîyarkirîye. Ê xwandevean ji wan arîşan agedarkirîye. Bi vê çendê jî derd û derman ji dîyarkirîne. Ê nîşanên rêbaza realîzma sosyalsîtî jî têda bercestdibin lê pitir kevtîye di çarçovê realîzma rexnegrane da. Em dikarîn bêjîn Babê Nazê romannivêsekê realîstê dijware ku hêla sor ji bo wî nine, sê koçkeya “dîn, siyasyet, sêkis” di civakî da xistine ber têwanî û rexneyên xwe û cîhanbînya xwe bi rêya vê romanê ser van mijaran derbirîye. Bi vê çendê jî em dikarîn bêjîn romannivês ketîye bin karîgerîya jîngeh û kultûra civakê Kurdî û civakê Rûsî û Swêdî da. Bandora civaka Kurdî û Rûsî û Swêdî li ser xweya dibe pirtir kesayetên serekên romana wî ji van her sê civakane. Romanvis vîyaye bi rêya romana xwe “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” arîşên jîyana koçberî û rastîya kultûra wan bi xwandeveanê Kurd dete nasandin. Dîsan peyama xwe bigehînite xwandeveanê Swêdî û Rûsî û rastî kultûra Kurdan bi wan bidete nasandin. Ê bû Swêdîyan bidet dîyarkirin ku Kurd ne mirovên kujdarin weku di ragehandinê da dihête baskirin.

Herwesa egerê gileykirina li ser xwe bi wan bidet ser rastikirin. Ka sedem çî ne û jî ber çîye û bidet dîyarkirin çî peywendîya wî bi kuştina Olof Palme ve nebûye. Romannivês romana xwe weku alavekê bikarênaye daku qêrîn û cîhanbînîya xwe êşa xwe bigehîne xwandeveanê bîyanî û navxwe. Beramber tawanbarkirina wî bi bêbextîyane. Ka li jîyana koçberî çî bi ser wî hatîye bo me di ve romanê da vegêraye. Herwesa romannivês di romana xwe da giringî daye firedengîyê her kesayetek bi azadane cîhanbînîya xwe derbirîne bitaybetî jî kesayetên serekî di romanê da Bêkes, Lîza, Katya, Komîsar. Civakekê azad di romana xwe da afrandîye. Dîyalok û menelok tê da gelek hatîye

bikarînan. Herwesa gelek pend û serpêhatîn Kurdî dî vê romanê da hatîne bikarênan. Amaje bi gelek arîşên civakî kirîye di nav civakê rojavayî da û arîşên dihîne pêşîya koçberan li jîyan koçberîye. Romannivê Babê Nazê bi civaka Kurdî û bîyanî karêgerbûye vê çendê jî di nav romana wî “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da rengvedaye. Lê herwesa jî beramber civakê bê helwest ne bûye ew arîşên di nav civakê da pê êşyaye derbirîne û di nav romana xwe da dîyarkirîne û cîhanbînî û têwanînên xwe yên rexneyî sebare wan mijaran ragehandîye. Çi di nav civaka Kurdî da bît yan li jîyana koçberî li welatê Swêdê bît. Romannivê Babê Nazê mijara tawanbarkirina xwe bi kuştina Olof Palme serokwezîrê Swêdê kirîye hevênê avakirina romana xwe “Stokholmê Te Çi Dît Bêje”. Di nav da jî têşk xistîye ser arîşên jîyana koçberî li Swêdê. Û gelek mijar û arîşên dîtir.

Rohat Alakom di gotara xwe da ya bi navê “Di Romana Swêd De: Koçberîya Kurdan” amajê bi mijara kuştina Olof Palme diket dibêje “dî salên 1980 ya da çawa tê zanîn rewşa Kurdan li Swêdê gelek baş nebû. Hin kesên Kurd ji alîyê Kurdên din ve hatbûn kuştin û kuştina Olof Palme jî avêtibûn ser Kurdan. Kurd wek kesên kujdar hatbûn nasîn. Polîsê Swêdî ji ber van buyeran şek û gumana xwe ya derbareyî Kurdan de zêdetir û tîrtir kiribûn. Dê dawîyê da derket holê ku tu têkelîyên Kurdan bi kuştina Olof Palme tune. Lê belê dîsa jî Kurd di Medyayê da kujdar û gunehkar dihatin nîşandan” (Rohat Alakom, 2018: 9). Ji ber vê çendê jî mijara kuştina Olof Palme bûye cihê girîngî dana romannivê Swêdî bi xwe jî di nav romanên wan da amaje bi mijara kuştina Olof Palme kirîye û behsê Kurdan jî kirîye ji wan romannivêsan jî “Yek ji wan krîmnologên navdare bi Leif G.W. Persson jî dî romaneka xwe ya ser mijara kuştina Olof Palme de cih dide Kurdan” (Rohat Alakom, 2018: 9).

Di romana “Xweşîya Bi Êş” da jî Babê Nazê amaje bi hinek nêxşeyên erotîkî kirîye. Her weku ronahîyê diêxîtê ser derbirînên hestên Sûlavê;

“Gava pêşîn ji vê hevrikîyê ji memikên min dest pê dibit. Ji ber ku ew bi şeweke weha sere xwe radikin, heta dibin egerê, ez bi wan ra bikevîm şer ” (Babê Nazê, 2016: 40).

Her wesa dîmenekê dîtir di navbera Sekîne û Sûlavê da amaje pê kirîye.

“Hema seranser xwe avêt hembesê min û bi ramîsana... Dibe ji ber vê çendê, min xwe ji ber nêda alî û ew ji lêvên min çû gerdana min û ji gerdenê daket ser hinarkên sînga

min û bi mijandina memikê, av bi dev û nav seqê min ket û bi dest avêtina 'evretê, listika pê re, hestek bi helçûnê bi min re çê bû û min nedizanî bi çi nav bikim” (Babê Nazê, 2016: 42).

Romannivîs amajê bi derbirîna hestên Medyayê jî diket, deme dibêjît;

“Ne çavên min ji xortan têr dibe û neji guhên min ji pêsendayîne (Babê Nazê, 2016: 66).

Li vir romannivîs amajê bi taybetmendîyeka keçe diket ku pitir hez jî pêsendayîne dike.

2.2.17. Qertbûn Yan Qeyrebûn

Babê Nazê di romana xwe “Xweşîya Bi Êş” da cihekê fireh daye vê arîşe di nav civakê Kurdî da. Arîşa “qeyrebûnê anko gehîştina kçe bou jîyekê ku ji xwe bitirsît êdî delîva şûkirinê bu nehêt ...bo nimûne li civakê gunda dema kiç bigehît jyê 25 salîyê û şû neket. Lê li civakê bajêrî û kiça xwandewar û fermanber û xudan hêvî û armancên paşerojê ev dîtine ya cûdaye...û pitrî ya buçûna li ser wê radwestin ku ev jîye 30 salyê dest pê diket ...” (Beyar Bavî, 2014: 97).

Romannivês Babê Nazê di romana “Xweşîya Bi Êş” da wek mînakek di nav civakê Kurdî da Sûlav êxistîye berçavan amaje bi arîşa qeyrebûnê kirîye. Sûlav weku kiçeka qeyîre di vê romanê da xistîye berçavan di vê peragrafê da amajê pê diket dibêje:

“Bi rastê jî, Sûlavê ji sinêltîya xwe, heta qertbûna xwe ku bi ser sîh salî ketibû, her dem şermoktî jêre dibû heval û weku poşîyê wê digirt ser rûyê wê” (Babê Nazê, 2016: 6).

Romannivês li ser zimanê Şahînî ji egerê qertbûna Sûlavê di nav civakê da dipirse dibêje:

“Eve çi hiştîye ev keça mişt mêyîtî qert bibe?” (Babê Nazê, 2016: 7).

Romannivês li ser mijara qeyrebûnê li ser zimanê Şahîn dibêje:

“Ev bûye çend sal ku li ser temenê sîh salîya Sûlavê re derbas bûne. Û salên piştî sîh salî ji bu keçê nasnama bê zaroktîyê ye û di malê de hustuyê bav û dayîkê de, mayîn. Ev ji dibû gengeşa, di nav pîrejinên cîranan de. Sûlavê jî ev qonaxa xwe ji bo şûkirinê ya dawî didît, lê bi çi şeweyî rê nedida şûkirina bê hezkirin, erê Sûlavê tengavî di paşeroja xwe de, didît, lê her ew bê hêvî nedibû” (Babê Nazê, 2016: 9).

Romannivês bi me dete dîyarkirin êk ji egerê qeyrebûna Sûlav ew jî nexastîye bî hezkirin jîyana hevjinê pêk bînit. Demê keç digehîte jîyê qeyrebûnê û şîneket. Dibe cihê pê axiftina civakî û her kesek jî egerê neşûkirina wê bi rengekê ravediket. Dikevîte ber rexneya civakî. Lê Sûlav her geşbîn bûye bê hêvî nebûye. Romannivês amaje bi arîşeka dîtrijî kirîye ew jî cîyawazîya temenî di navbera Sûlav û Şahînî da ku gelek caran dibe egerê arîşan di navbera hevjinan da û netêgehiştina wan li hev dû romannivês amaje bi vê arîşê jî kirîye li ser zimanê Şahînî dibêje:

“Heger hat û min Sûlavê ji xwe re anî, ez dişem weku tête xwestin bi dilêma xwe ya evînê rabim ? Mane her sal bi wir de biçin, dê pîrîtî ji min bifûre û jintî ji wê, evca emê bi çi şeweyî li hev biguncin?” (Babê Nazê, 2016: 10).

Ji ber ku cîyawazîya temenî eger gelek bît gelek caran dibe sedemê pîrsgirêkan di navbera jin û mêran da. Romannivês xwandevan ji vê çendê hişyar kirîye. Romannivês hest bi êşa keça Kurd kirîye. Hewildaye dî vê romanê da amajê bi çend arîşan biket ku dihêne pişîya keçê di nav civakê Kurdî da. Babê Nazê dê vê danûsatandina di navbera Medya û Sûlavê da tîrwanîna civakî bû wan keçîn dereng şûdiken dîyardiket:

“ Sûlavê bi rijdî çû ser vê pîrsê :-keçê welê , tu dibê qey, em çê bûne, tenê ji bo ku em şû bikin ...mabê şûkirin çê nabe .-Ma tu nizanî, keça ku şû neke , xelk bi çavên xerabîyê lê dinern .- Gunehê wê çî ye, heger kes wê nexwaze ?-Weku dab, ji ber dû sedeman, wê naxwazin , yek jê ne ciwanîya wê û ya din jî , ji ber sîstibûna derpîyê wê loma jî, di hustûyê Babê xwe de dimîne ...” (Babê Nazê , 2016: 29).

Li vir romannivês du egerên qeyrebûna keçê di nav civakî da dîyardiket. Êk ne ciwanîya keçê dû jî neciwanîya rewîştê keçê. Birastî jî mijara qeyrebûna keçê mijareka girîngê cihê girîngî pêdanê ye romannivês Babê Nazê di nav romana xwe

da amaje pêkirîye. Sûlav amajê bi heşkirna xurtekê bu wê diket lê ji ber ku kesekê nexwandevan bû bi evîna wî razî nabît dive peregrafê da romannivês amajê pêdiket:

“Min heta amadeyî xwend û nuka, ez li dikana Babê xwe karê xwe dikim ...- Mirovekî weha, wê çawa keçeke xwenda pêre şû bike?” (Babê Nazê, 2016: 64).

Li vir romannivês amajê bi egerkê dî qeyrebûna keç diket. Ew jî demê keça xwedan birwaname naxazît bi xurtên nexwandevan ra hevjinî pêk bînin. Lê Sûlav li ser helwestê xwe bû ku bê hezkirin wê şuneket dayîka wê dibêjît:

“keçê heta bîst salîya xwe, heger tu şû nekî, tu yê heta - heta bê mêr bimînî.” ...dayê ji serbora xwe ya jîyanê, rastî bi keça xwe re didît, lê rastîyek din hebû, mayîna keçê li mala Babê, mirin bi xwe bû” (Babê Nazê, 2016: 76).

Romannivês egerê dereng şukirina Sûlavê dî vê peregrafê da dîyardiket:

“Sûlavê çend merc ji bo şûkirina xwe, danîbû ber mala xwe: “ ewê tu carî şû bi yekî, bi jin neke.” ...mercî düyem jî ew bû: “şûkirina bi hezkirin “û mercê dawî jî, şûkirna piştî bi dawîbûna xwendna li zankoyê” (Babê Nazê, 2016: 76).

Romannivês amajê bi wê çendê diket demê keç mercan li pîşya hevjinîya xwe danît, dibe egerê qeyrebûna keçê di nav civakî da. Dîvda jî bi neçarî gelek caran razî dibe weku jina düyemîn şîbiket Yan jî şî bi kesekê ji xwe mezintir biket weku dî vê romanê da romannivêsî êxistîye berçavan. Romannivês ronahîyê dixîte ser arîşeka dîtir di nav civakî da demê dayîk dibêje:

“-navê wî çî ye, jî ç 'eşîrê ye?-Navê wî Şahîne, lê ji çî 'eşîrê ye, min 'elaqeder nake ...û tu baş nerîna min li ser van pirsan dizanî” (Babê Nazê, 2016: 78).

Gelek caran egerê 'eşîretgerayî jî dibe sedemê qeyrebûna keçê ji ber ku gelek caran 'eşîretê neamadeye keça xwe bidete kesekê ji derveyî 'eşîreta xwe. Her çend kur û keçê hez hevûdû jî kirbît. Lê niha ev çende di nav civakê da berev kêmbûnê çûye. Gorankarî bi ser civakê da hatîne. Sûlav jî dibêje 'eşîreta wî min peywendîdarnaket. Herwesa romannivês amajê bi egerekî dî qeyrebûna keç di nav civakî da diket dibêje:

“Bi hatina xwazgînîyan, li mala Babê Sûlavê weku tête xwestin axavtin çê bû, weha jî li hev hatin weku tête xwestin, li ser razîbûna bûkê bi dîyarîyan” (Babê Nazê, 2016: 83).

Gelek caran xwastna keçê bû gelek dîyarîyan û zêran dibe egerê ku genc neşyên berev jîyana hevjinê pêngavê bihavêjin. Ev çende jî dibe egerê qeyrebûnê keçê di nav civakê da.

2.2.18. Destdirêjkirin Yan Laqekirin

Destdirêjkirin yan jî tundutîjîya cesedî ji layê regezê nêr li ser regez mê ji layê sêksî ve. Anko tundutîjîya ji layê sêksî ve beramer keçê di nav civakî da. Laqekirin anko “kiriyara dest lédana endamên sêkisîye, çi bi karîna hêz bît yan ne, bê razî bûna regezê mê, bi taybetî demê qurbanî ya tundutîjî beramber dihête kirin ji 16 salî biçûktirbît” (Kanyaw Rehman, 2015: 122). Romannivês Babê Nazê di romana xwe “Xweşîya Bi Êş” da amaje bi vê tundutîjîya sêksî kirîye. Li demê Medya bîranîn û namên keça hevala xwe bû Sûlav dixuyinit. Vê nihênîyê bu aşkera diket û dibêje:

“Medya bibhore, ez dîsan vedgerim zaroktîya xwe, dema ez deh salî bûm, hîn ez di qonaxa seretayî de bûm, belak hate serê min û min nedişîya harîkarêy ji kesê bixwesta. Ê heta niha jî, li gel ku ez qutabîya zankoyê me, ez newêrim wê bînim ser zimanê xwe ... Lê cara pêşîn ezê ji bo te bêjim: di wê deh salîya xwe de, ez tûşî desdirêjîya sêksî bûm . Ewî xwe, ji paş ve gîhand min û bi destê xwe, bi nav lingên min dilîst. Ew kes jî kurê xalê min bû û wê çaxê şazhde - hevdeh salî bû. Erê min xwe wêrek didît, lê min ceger nedbir xwe danpêdanê bi vê bûyerê bikim. Ez dizanim gelek ji keçên me, bi şêweyekê ji şêweyan, teherûşî wan têtêkîrin û weku min hemû xwe bê deng dikin” (Babê Nazê, 2016: 36-37).

Romannivês amaje bi vê arîşê kirîye di nav civakî da. Bê guman destdirêjkirin beramber keçê heye di nav civakî da lê bikêrî ye û yan jî bi nihênî û veşartî dimîne. Çunku aşkerabûna wê dibe egerê kuştina keçê gelek caran yan jî derkeftina nav û dengê wê bi nebaşî û êdî kes amadenabît jîyana hevjinîyê ligel pêk bînit. Her çende ev çende bi zordarî jî beramber keçê bihêtekirin. Lê her tinê ya baca

vê çendê didet keçe di nav civakê da. Weku dê vê romanê da romannivês xistîye berçavan.

“Ji ber vê çendê, ez dibêjm, wê rojek, ji rojan hemû endamên laşê keçkê jêre bibin ‘ewret. Û ev jî, wê tenê êşê bi xwe re bîne” (Babê Nazê, 2016: 37).

Bi vê çendê jî romannivês vîyaye xwe nêzîkî navenda civakî biket. Êş û janên keça Kurd dêxîte berçavan. Ka di çî rewşê da dijî . Çî arîşe rûberûyê wê dibin di nav civakê da. Keça hevala Medya bi vî rengî hestên xwe piştî vê destidirêjîya li ser wê derdibrît.

“Bi vê rûdanê, ez bûm keçeke şermîn û kesatîya min, diqonaxa sinêltyê de , pir lewaz bibû û min tirse mezîn ji regezê mêr hebû ... Her min ji zilaman tirs hebû, ji ber ku min ew weku ginaweran didîtin” (Babê Nazê, 2016: 38)

Piştî vê rûdanê diqonaxa sinêltyê da bûye eger ku ji regezê mêr li berçavan reş bibît tirs ji vî regezî hebît. Ewe jî dibe êk ji egerên qeyrebûna keçe di nav civakî da ji ber ku nikarît şûbiket dê nihînya wê aşkera bît. Ji ber ji dest dana keçanîya wê kes ne amadeye jîyana hevjinê ligel pêk bînit. Ev çende jî dibe cihê êş û janeka mezîn bu keçe di nav civakî da.

ENCAM

Babê Nazê ji romannivêsen despêkê tê jimartin ji Kurdên Surîyayê, dest avêtiye afrandinê bi zimanê Kurdî wek çîrok û romanê û warên curbicur di biyavê amadekirin û wergerê da.

Her ji kevin da feylesof û hizirvan mijûlî pirsê peywendîya di navbera edeb û civakê bûn. Du têrwanînên cîyawaz peyda bûnê şaşî di her du nerînan da hene ya dibêje huner ji bo civakê masaxere, yan din ku dibêje armanca hunerê, huner bi xwe ye. Ji ber ku ji hunerê ra, çawa ciwanî pêwiste wiha ji pirsên civakî û exlaqî û ne bi şaşîye ka çawa armanca edebî ciwanîye wiha jî zanîn û perwedekirine bo hişyarkirina civakê.

Zaravê rexna civakî bi rêjeyî nû ye belê weku hizir kevne piştberstine li ser hokarên derveyî tekistê diket bo şirovekirina berheman. Rexneyeke damezrandîye li ser şirovekirineka civakîyane di berheman da. Rexna civakî li peywendîya navbera edeb û civakê vedikole. Ji layê rexnegiran ve bi gelek rengan hatîye pênasekirin, lê hemî li ser regvedana civakê û kartêkirina dulayenî ya di navbera edeb û civakê da rawestîyayîne. Rexneyeka civakîyaneye di berhemê da anko civak rêyeke bo şirovekirina berheman.

Rexna civakî ji encamê berevpêşçûna rexna mêjûjî serhildaye. Hinek ji binemayên xwe yê destpêkî ji wê wergirtine ku hişyarîya mêjûyî hatîye guherîn bo hişyarîya civakê. Belê rêh û rîşalên despêkî bo rexna civakî dizvirine bo hizrên Eflatûnî û Jan Bates Fîko û Madame Distal û Sant Bîf û Hîpolît Tain û serdemên nû jî da bo hizrên Hegel û Marxî.

Ji encamê berevpêşçûna rexna civakî çend araste jê peyda bûnê. Wek arastê dîyalektî, arastê binyatgerîya pêkhateyî, arastê sosyolojîya edebî, arastê sosyolojîya tekistê edebî her yek ji wan bi renekê cîyawaz berê xwe dane pêwendîya navbera edeb û civakê ji pêşengên wan jî Corch Lukaş, Lusyan Gordman, Mikail Bahtîn û Bîr Zîma ne.

Pêgîrbûn xwe girêdana nivîskare bi têrwanîna dîyarkirî ve di jîyanê da. Nivîskar bi hemî rengan bergîrîyê jê dike di berhemên xwe da. Nivîskar hewil dide bi

rêya berhemên xwe civaka xwe hişyar bike û arîşên di nav civakê da çareser bike. Edebê pêgîr edebekê armancdare ji bo xizmetkirina civakê. Romanê jî pitir şîyanê rengvedana arîşên civakê hene.

Rexna civakî çend binemayek afrandinê da ku berhem li ber ronahîya wan bê şîrovekirin. Dakokîyê li ser wê çendê dikin ka çawa nivîsînê rivişteke civakî wergirtîye. Berhem dikujîyê wê yê civakî ra tê vekolîn û girîngîyê bi naveroka berhemê edebî dide. Têrwanîna romannivîsî derbareyê arîşeyên civakî di nav romanê da dixêne ber çavan bi mebesta hişyarkirin û gûherîna civake berev baştir.

Babê Nazê mijarên romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” navenda civakê û li jîyana koçberîye hîlbijartîye. Ev arîşên di nav civake da hatine pêşîya wî kirine hêvînên romana xwe. Bi rêya romana xwe derbirîn ji êşa xwe û milete xwe kirîye. Di “Xweşîya Bi Êş” da jî mijarên romana xwe ji navenda civake hîlbijartine. Derbirîn ji êş û neazadîya keçê û dabû nerîtên civakî kirîye ku ji encamê qeydû benden civake hatîye tepeserkirin. Neşyayê bi azadane derbirîne ji hesta mêyatîya xwe bike.

Babê Nazê di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşîya Bi Êş” da li ser zimanê kesayetîyên romanê derbirîn ji têrwanîn û cîhanbînîya xwe kirîye derbareyî jîyana koçberîyê û jîyana keçên di nav civake da. Romannivêş pitir weku rewşenbîrekê tete xuyakirin ku vîyayê bi rêya romanê xwandevanî ji pîrsgirekên di nav civakê da hişyar bike. Dîsan vîyaye peyama xwe bigihîne xwendevanî û kultûra Kurdan bi bîyanîyan bide nasandin û xwendevanên navxweyî ji jîyana koçberî û rewşa keçan haydar bike.

Babê Nazê bi civaka di nav da jîyayî karîgerbûye û vîyaye bi reya herdu romanên xwe karîgerîyê li civakê bike. Helwesta xwe bi rêya romanê beramber ev zilma ku li wî hatîye kirin bi jîyana koçberîye û li keçê di nav civaka Kurdî da hatîye kirin radigêhîne. Di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” pitir ketîye bin bandora civaka Kurdî û civaka bîyanî da. Lê di romana “Xweşîya Bi Êş” da jî ketîye bin bandaora civakê Kurdî da.

Romannivêş Babê Nazê realîstekê dijware û hêla sor ji wî ra nîne. Bi azadane li ser zimanên qehramanên herdu romanên “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” û “Xweşîya Bi Êş” da rexnên xwe arestêyî civaka Kurdî û bîyanî dike. Babê Nazê di romana

“Stokholmê Te Çi Dît Bêje” li ber sîbera realîzma rexnegiranê da nivîsiye û qehremanê romanê reşbîne. Romana “Xweşîya Bi Êş” jî li ber sîbera realîzima sosyalîtî da nivîsiye û qehremana romanê geşbîne.

Babê Nazê di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” gelek pend û serpêhatiyên Kurdî bikaranîne. Dakû kultûr û resaneyatî û hikmeta milete xwe bi xwandavanên bîyanî bide nasandin. Gelek nexşên erotîkî wek rastîya jîyana koçberîye xistine ber çavan.

Ziman di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” pitir peyvên bîyanî tê da hatine bikaranîn weku peyvên zimanê Erebi û Tirkî. Di romana “Xweşîya Bi Êş” da jî zimanekê petî hatîye bikaranîn.

Babê Nazê pêgîrbûye di herdu romanên xwe da bergirî kirîye ji xwe û miletê xwe û keçê di nav civakê da. Bê helwest nebûye, bi rêya romanê helwestên xwe ragêhandine derbareyî wan mijarên di nav civakê da pê êşîyaye bergirî ji azadiya keçê di nav civakê da kirîye. Romannivês giringî bi firedengîyê daye kesayetiyên di herdu romanên da bi azadanê derbirîn ji xwe kirine. Hizir û bîrên hevdij hatine derbirîn.

Romannivês li ser zimanê qehremanên romana Bêkes û Sulavê derbirîn ji cîhanbînîya xwe kirîye, derbareyî arîşên di nav civakê da. Di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” pitir menelok li ser romanê zale û giringî bi derûnîya qehremanên romanê Bêkesî hatîye dan. Di romana “Xweşîya Bi Êş” da giringî bi qehremana romanê Sulavê hatîye dan û menelok li ser romanê zale.

Di romana “Stokholmê Te Çi Dît Bêje” da jina rojavayî ya azade di derbirîna hestên xwe yên evînîye da û kêmtir ketîye jêr qeyd û bendên civakê. Lê di romana “Xweşîya Bi Êş” da keçên Kurd pitir ketine jêr qeyd û benden civakî û bûne rêgir di rêya azadiya wê di nav civakê da.

Babê Nazê hewil daye bi rêya herdu romanên xwe pirsyaran ji laye xwandevanî ve biarzîne derbareyê arîşeyên di nav civakê da ne ku bersîvan pêşkeş bike. Pitir armanca wî hişyarkirin û guherîna civakê ye berev baştir. Wênê civakê Kurdî û bîyanî kêşaye bi peyvan. Anko romanên wî weku mîmberaka civakêne ji

civakê bo civakê. Rengvedana arîşe û pîrsgirekên civakê kirine. Weku dokumantasyonekê civakî têne danîn. Anko weku kernevalekêne dijî dab û nerîtên civakîne û yasayên nivîskî û nenivîskîyên civakî.



ÇAVKANÎ

- Qur'ana Pîroz û Wegera Wateya Wê Ser Zimanê Kurdî*, (2016), (Amadekar: M. Huseyîn Êsî û yd.), Çapa Heftemîn, Weşanên Aryan, Stênbol.
- Aware Kemal Salih, (2012), *Rexney Kumelayetî û Piraktîzekirdinî Le Şî'rekanî Goran Da*, Belavkirîn Ekadimîya Kurdî, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr.
- Azad Ebdulwahid Kerîm, (2013), *Rexney Edebî Xwêndneweyekî Ekadîmîyaneye Bo Rêbaz û Mêtode Rexneyekan*, Ç. Êkî, Lebilawkirewekanî Yekêtîy Nûseranî Kurd - Leqî Kerkuk, Çapxaney Karo, Kerkuk.
- Azad Ebdulwahid Kerîm, (2015), *Sosyolojîya Şî'ri Kurdî Le Rûy Pêwere Akarîyekanewe*, Ç. êkê, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Lebilawkrewekanî Liqî Kerkukî Yekêtî Nûseranî Kurd, Hewlêr.
- Azade Muntazirî û Mihemed Xaqanî û Mansure Zirkob, (2012), *el-Naqid el-Îctma'î Lil edeb Neşetuhu we Tetewure*, Mecle Îzaat Neqdîyeh (Fasilet Muhkemet), al-Eded al-Sadis.
- Babê Nazê, (2012), *Ferhenga Têrmên Wêjeyî*, Çapxana Hewar, Rêveberîya Çap û Belavkirinê Duhok, Duhok.
- Babê Nazê, (2012), *Stokholmê Te Çi Dît Bêje*, Rêveberîya Çap û Belavkirinê - Duhok, Duhok.
- Babê Nazê, (2016), *Xweşîya Bi Êş*, Çap û Belavkirin, Kitêbxana Cizîrî, Duhok.
- Babê Nazê, "Peywendîyên Edeb Bi Civakê Re", *Kovara Metîn*, J. 179, 2009, Duhok.
- Bedewih Tebane, (1984), *Qezaya el- Nenqid al-Edeb*, Dar el-Merîx lîl Neşir, el-Rîyad.
- Bengîn Îbrahîm Hemê, (2014), *Rexna Civakî Di Romanên Hesênê Metê Da*, Beşê Ziman û Çanda Kurdî, Zanîngeha Mêrdîn Artuklu, Mêrdîn.
- Besam Qutus, (2011), *Derwazeyekî bo Mitodekanî Rexney Hawçerx*, W.: Mihemed Tatanî, Ç. Êkê, Berêweberayetî Xaney Wergêran, Silêmanî.
- Bextîyar Seccadî, (2000), "Rexney Edebîy Hawçerx", *Kovara Raman*, J. 51, Hewlêr.
- Bextîyar Seccadî, (2000), "Tîyor û Rexney Edebîy Markisîstî", *Kovara Raman*, J. 49, Hewlêr.
- Beyar F. Zîma, (2013), *al-Nas we al-Mucte' Afaq I'lim Îctma' al-Naqid*, Ta al-Ûla, el-Minazime el-'Erebîye li-Tercume, Bîrut.

- Bul Aran û Alan Vîyala, (2013), *Sosyolojîya el-Edeb*, T.: Mihemed Elî, Ta el- ûla, Dar el-Kitab el-Cedîd el-Mutehidet, Bîrut.
- Bunwa Dunî, (2005), *el-Edeb we al-Îlitzam Min Baskal îla Sartir*, T.: Mihemed Birade, Ta: el-ewil, lil Meclis al-a'la lil- Seqafet, el-Qahire.
- Cabir 'Usfur, (1981), "Qraet Fî Lusyan Coldman 'En al-binîwîye al-tevelîdiye", *Fusûl*, al-Miceled al-Ewil al-Eded al-Sanî, Misir.
- Can Ayf Tadiye, (1993), *al-Neqid al-Adebî fî al-Qarin al-Îsrîn*, T.: Qasim al-Miqdad, Minşurat Wazaret Alsaqafe - Alm'hed al-alî Lil-finun al-meserhiye, Dîmişq.
- Cîhan Îsmâil 'Umer, (2011), *Şîret û Şîretkarî Di Hozana Ya Civakî Nalbendî Da*, Têza Lîsansa Bilind Koleja Adabê, Zankoya Duhokê, Duhok.
- Çarliz Birêslêr, *Rexneyî Edebî û Qutabxanekanî Pêşekîyek Bo Tîyorî*, Ç. Êkê, Dezgehê Çap û Blawkirina Aras, (2002), Hewlêr.
- Derya Cemal Hewêz, (2013) , *Cîhanîbînîy Şîrî Hawçerxî Kurdî (Kirmancî Nawerast) Le Başurî Kurdistanda*, Têza Doktora, Fakultîya Zanistên Mirovayetî , Zanko Koye, Koye .
- Dewlet Mihemed Ehmed, (2013), *Rengvedana Awareyîyê Di Hozanên Mela Xelîl Mişextî Da*, Têza Lîsansa Bilind, Fakultîya Zansitên Mirovayetî, Zankoya Zaxo, Zaxo.
- E'bdî Hacî, (2008), *Çend Tîyorekên Rexna Edebî*, Ç. Êkê, Dezgehê Spîrêz, Duhok.
- Ebdulhadî Ahmed al-Firtosî,(2009), *Teîl al-Nas al-Rîwayî fî Zawe Îctima' al-Nas al-Edebî*, Ta .: al-Ûla. al-Naşir: Beyt al-Hikme, Baxdad.
- 'Ebdulkerîm Mistefa, (2012), "Sosyolojîya Edeb", *Kovara Rûgeh*, J. 5, Zaxo.
- 'Ebdulkerîm Mistefa, (2015), "Rexna Civakî Bo Karê Edebî", *Kovara Peyv*, J. 70, Duhok.
- E'bdulrehman Bamernî, (2015), "Sêkis Di navbera Wirjandî û Huner û Edebîyatê Da Romana (Neyîya Bendemanê) Wek Nimune", *Kovara Peyv*, J. 70, Duhok.
- E'bdulwehab Şe'lan, (2007), *el-Menhec el-Îctima'î we Tehevulate*, Ta. el-Ewil, 'Alim Elkutub el-Hedîs lîl Neşir we el-tewzî', Ûrdin.
- 'Ebudallah Hisnî we Turic Sihrabî, (2017), *el-Neqid al-Edeb we Nezerîyate*, Ta. el-Ewel, Temuz lîl Îtba't we el-Neşir we el-Tewzî', Dimesq.

- Ehmed Mehmud 'Ebdula, (2016), *Şî'rekanî Samî 'Ewdal Lerwangey Sosyolojîyewe*, Têza Lîsansa Bilind, Fakultîya Perwerde, Zankoy Koye, Koye.
- Ehmed Seqir, (2001), *Tarîx al-Naqid û Nezerîyatetihî*, Merkez al-Îskenderîye lil-Kitab.
- Ehmed Yasîn, (2015), *Binemayên Rexneya Edebî Di Rojnamevanîya Devera Badînan Da Rojnameya War Wek Nimûne*, Ç. Êkê, Çapxana Xanî, Duhok.
- 'Elî Cewad al-Tahir, (1979), *Miqedime Fî al-Naqid al-Edebî*, Ta. al-Ûla, Almuasset al-Erebîye lil-Dirasat wal-Neşir, Baxda.
- 'Elî Tahîr Hisên, (2008), *Rexneyî Bunyadgerî Le Tîwrewe Bo Piraktîzekirdin Rexney Şî'rî Kurdî Bo Nimûne*, Têza Doktora, Kolêcî Ziman, Zankoy Silêmanî, Silêmanî.
- Emel Dîbo, (1982), *al-Îltizam fî Şî'ir Bedir Şakir el-Îsyab*, Risale Mancistir, Dairet el-luxet el-'Erebîyeh, el-Cami'e al- Amrîkîye, Bîrut.
- Emin Abdulkadir, (2008), *Têkist Di Navbera Gotara Rexneyî û Rebazên Edebî Da*, Ç.Êke, Weşanên Yekitîya Nivîkarên Kurd, Duhok.
- Enîse Ehmed al-Hac, (Dîrok nîne), *al-Îtcah al-Îctma'î Fî el-Neqid el-Riwa'î Fî el-Mexrib el-E'rebî Dirast Fî Neqid el-Neqid*, Kulîyet el-Adab we el-Luxat û el-Finun, Cam'ie Wihran, el-Cezayir.
- Eta Qeredaxî, (2017), *Geran Lenêwan Waqî' û Xeyalda Xwêndnewey Helibijardeyek Le Romanî Kurdî*, Ç. Êkê, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî.
- Faiq Mistefa û E'bdudul Riza Alî, (1989), *Fî al-Neqid al-Adabî al-Hedîs Min Ailaqat û Tetbîqat*, Ta. 1, Mudîrîye Dar al-Kutub lîl-Tiba'e wal- Neşir - Cami'e al-Musil, Musil.
- Fuad Reşîd Mihemed, (1995), *Nawerokî Komelayetî Hunrawey Kurdî Duway Cengî Cîhanî Yekem Ta Kotayî Cengî Cîhanîy Duwem*, Têza Lîsansa Bilind, Kolêjî Perwerde - Îbin Ruşdî, Zankoy Bexda, Bexda.
- Fuad Reşîd, (2005), *Rexney (Rexney Romanî Kurdî)1973-1999*, Belavkirîyên Kitêpiroşîya Soran, Çapxane Rûn -Silêmanî, Hewlêr.
- Fuad Umer Elî, (2004), *al-Îltizam Fî Şî'ir Mihemed el-Tehamî Dirase Tehlîlîyeh*, Risale Mancistir, Kulîyet el-Adab, el-Cami'e al-Îlamîyeh, Xeze.
- Hejar Silêman Ehmed, (2015), *Rehendî Rexneyî Komelayetî Le Şî'rekanî Hacî Qadir û Bêkes Da*, Têza Lîsansa Bilind Koleja Ziman, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr.

- Helîm Yûsiv, (2011), *Romana Kurdî*, Çapa Yekem, weşanên Ronahî, Amed.
- Heme Mentik, (2018), *Mîtodekanî Rexney Edebî Rexney Edebî Le Rûyî Tîyorîyewe*, Ç. Êkê, Nusîngehî Tefsîr Bo Çap û Belawkirdinewe, Hewlêr.
- Hemîd Lil Hemedanî, (1990), *el-Neqid el-Riwayî we el-Îdolojîya Min Sosyolojîya el-Riwaye îla Sosyolojîya el-Nas el-Riwayeh*, Ta.: el-Ûla, el-Merkez el-Seqafî el-'Erebî, Bîrut.
- Hesen Yusif Bîrêjî, (2013), *Rehendî Komelayetî Le Romanekanî 'Etayî Nehayî*, Berêweberayetî Çapxaney Roşnibîrî, Hewlêr.
- Heval Selîm Teyib, (2006) , *Bunyadgerî Di nav Rexna Kurdî da Ji Destipêkê Heta Sala 2003*, Ç. Êkê , Dezgeha Spîrêz Ya Çap û Weşanî , Duhok .
- Hevpeyvîn Bi Babê Nazê Ra, *Baregayê Êketîya Nivêserên Kurd Li Duhokê*, Duhok, 2018/11/22 Demjimêr 4:30 PM.
- Hevpeyvîn Bi Babê Nazê Ra, *Kenalê War* 2017/3/13, <https://www.youtube.com/watch?v=rHDk2I118zs>, Jê girtin: 09.07.2019.
- Hevpeyvîn Bi Babê Nazê Ra, *Mala Hevalê Wî Îbrahîm Li Duhokê*, 2019/4/7, Demjimêr 30:30 PM.
- Hevpeyvîn Bi Babê Nazê Ra, *Kenalê Dinya* 2013/11/24, <https://www.youtube.com/watch?v=jyOLYRyBT8k>, Jê girtin: 09.07.2019.
- Heyder Hacî Xidir, (2005), *Rexne û Îdolojya*, Ç. Êkê, Le Bilawkrawekanî Senterî Lêkulênnewey Fîkrîy û Edebî Nima, Hewlêr.
- Hîmdad Husên, (2010), *Derwazeyek Bo Rexney Edebî Nuwê Kurdî*, Ç.Duwê, Dezgay Tuwêjînewe û Blawkirdinewey Mukiryani, Hewlêr.
- <https://www.turkedebiyati.org/edebiyatta-sosyolojik-elestiri/>, Jê girtin: 09.07.2019.
- Î'zeddîn Îsma'îl, (1978), *al-Adab wel-Finun*, Ta. al-Sab'e, Dar al-Fikir al-'Erebî, Metb'e al-Se'ade, Cih nîne.
- Îbrahîm Xelîl, (2002), *Fî el-Neqid we el-Neqid el-Elsinî*, Dar el-Kindî Lil Neşir we el-Tewzî', Ûrdin.
- Îbrahîm Mehmud Xelîl, (2003) , *al-Naqid al-Edebî al-Hadîs min al-Mihakat îla al-Tefkîk*, Ta . al-Ûla, Dar al-Museyeret lil-Neşir û al-Tezî' û al-Tiba'et, 'Uman.
- Îbrahîm Seydo Aydogan, (2014), *Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Çapa Yekem, Weşanxaneya Rûpelê, Stênbol.

- Îhsan Mihemed Elhesen, (2012), *Însklopîdîyayî Komelnasî*, W.: Dana Mela Hesên, Ç. Êkê, Dezgehê Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî.
- Întîsar Necîb Cuqî, (2016), *Şi'r û Mêjû Piraktîzekirina Mîtoda Rexna Mêjûyî Li ser Hozana Nû Ya Kurdî Devera Behdînan (1970-1991)*, Ç. Êkî, Dezgehê Spîrêz, Duhok.
- Îrîna Rîma Mikarîk, (1951), *Danişnamey Nezrîye Hay Adeb Mu'asir*, T.: Mihran Mihacir we Mihemed Nebewî, Çapa Yekem, Mussesî Întîşarat Axa, Îran.
- Îzeddîn Bubîş, (2003), "Deqê Romanê û Şilovekirna Civakî", W.: 'Îsmet Mihemed, *Kovara Peyv*, J. 26, Duhok.
- Jan Pol Sarter, (2009), *Edeb Çîye*, W.: Mistefa Xefûr, Ç. Êkê, Dezgay Tiwêjînewe û Belawkirdinewey Mukiryani, Çapxaney Xani, Duhok.
- Kake Mem Botanî, (2008), "Îltizam Le Edebî Nûwêy Kurdîda", *Kovara Nûserî Nûwê*, J. 42, Hewlêr.
- Kanyaw Rehman Hemed, (2015), *Rudawe Sîyasî û Komelatîyekan Le Romanekani "Kerîm Kake" Da*, Têza Lîsansa Bilind Koleja Perwerde, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr.
- Karzan Kerîm Emîn, (2009), *Arastekani Rexney Şi'ri Kurdî*, Têza Lîsansa Bilind, Kolêjî Ziman, Zankoyî Selaheddîn, Hewlêr.
- Kemal Me'ruf, (2012), *Tîyore Nûyekanî Rexney Edebî*, Berêweberêti Çap û Bilawkirdinewey Silêmanî, Çapxaney Lerîya, Silêmanî.
- Komeka Nivêsera, (2009), *Komel Nasî Edebîyat*, W.: Hadî Mihemedî, Berêweberêti Çap û Belawkirdinewey Silêmanî, Silêmanî.
- Komeka Nivîskaran, (2006), *Mêtoda Komelnasî Edebîyat*, W.: Hadî Mihemedî, Çapxaney Şivan, Duhok.
- Lîjîney Edeb Le Korî Zanyarî Kurdistan, (2006), *Zarawey Edebî*, Belawkirewey Korî Zanyarî Kurdistan, Hewlêr.
- Lusyan Goldman, (1981), "Îlim İctma' al-Edeb al-Wazih we Muşkilat al-Menhec", *Fusûl*, al-Muceled al-Awil al-E'ded al-Sanî, Misir.
- Mecdî Wehbe û Kamil al-Muhendis, (1984), *Mu'cem al-Mustelhat al-E'rebîyeh Fî al-Luxat el-Edeb*, Ta.:al-Sanîye, Libnan.
- Mecmu' Min el-Kuttab, (1984), *el-Binyewîye el-Tekwinîye û el-Neqid al-Edebi*, Rac' t.: Mihemed Sebîla, Ta. al-Ûla, Musesesat el-Ebhas el-Erebîye, Bîrut.

- Micmu'e min al-Kutab, (1997), *Medxil îla Menahic al-Neqid al-Edebî*, t.: Rizwan Zaza, Sîlîsle 'Alm al-Me'rîfe, Kuwayt.
- Mihemed Latîf Ebdulrehîm (Babê Nazê), (2010), *Tîyorîya Edeb*, Ç. Êkê, Çapxana Zankoya Duhok, Duhok.
- Mihemed Xenîmî Hîlal, (1962), *al-Edeb al-Miqarin*, Ta. Alxamse, Dar al-Udet Al-Seqafiye, al-Rawza.
- Mixtar Welîd 'Ezawî, (2014), *Mefhum al-Îltizam înde Îmadedîn Xelîl Fî Kitabîhi Muhawlat Cedîde Fî el- Neqid al-Îslamî*, Rîsale Mancistir, Kulîyet el-Adab we el-Luxat, Camî'e Qasdî Mirbah Wirqilet, el- Cezayir.
- Nahîde Husên 'Ebdulrehman, (2010), *Layenî Sîyasî û Komelayetî Le Çîrokekanî Hesenî Qizilcî Da*, Têza Lîsansa Bilind, Kolîjî Perwerde, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr.
- Nebîl Raxib, (2003), *Mewusu'et al-Nezarîyat al-Edebîye*, Ta. al-Ûla, al-Şeriket al-Misrîyet al-Almîye lil-Neşir Mektebet Libnan, Libnan.
- Necim Elwenî, (2017), *Tîyorî Komelnasî Roman*, Ç.1, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr.
- Necm Elwenî, (2018), *Cîhanbînîy Nûser Le Romanî Zengdanewe Mehabad Qeredaxî da*, Ç. Êkê, Hewlêr.
- Newzad Ebdula Bamernî, (2007), *Îdolojîya Di Hozanên Cegerxwîn Da*, Ç. Êkê, Çapxana Xanî, Dezgehê Spîrêz, Duhok.
- Newzad Ehmed Eswed, (2015), *Ferhengî Zarawekan Edeb û Zaniste Mirovayetîyekan*, Ç. Êkê, Nawendî Xezelnûs, Silêmanî.
- Newzad Ehmed, (2009), *Seretayeki Le Bareyî Sosyolojîyayî Me 'rîfe*, Berêweberêtî Çap û Blawkirdinewey Silêmanî, Silêmanî.
- Nimetullah Hamid, (2011), "Xwandineka Civakî Bo Komele Çîroka "Lê Lê Weso" Ya Çîroknivîs Yûnis Ehmedî", *Kovara Peyv*, J. 58, Duhok.
- Nurî Hemudî al-Qeysî, (1979), *al-Adîb we al-Îltizam*, Dar el-Hurrîyeh lil-Îtîbah, Bexda.
- Omer Dewran, (2010), "Roman", *Kovara Wêjeyî*, Çandî, Hunerî, h. 30, Amed.
- Omer Dilsoz, (2010), "Bi Romanûsan ra Guftûgo", *Kovara Wêjeyî*, Çandî û Hunerî, h. 30, Amed.

- Orhan Pamuk, (2016), *Romanûsî Sade û Romanusî Bîrkereweh*, W.: Bekir Şiwani, Ç. Êkê, Nawendî Belawkirdinewey Endîşe, Çapxaney Endîşe, Silêmanî.
- Perêz Sabîr, (2006), *Rexney Edebî Kurdî û Meselekanî Nûwêkirdinewey Ş'ir*, Ç. Êkê, Dezgay Çap û Belawkirdinewey Aras, Hewlêr.
- Pîyar Zîma, (1991), *al-Naqid al-Îctma'î Nahwe Îlim Îctima' lil Nas al-Edeb*, T 'Aydet Lutfî, Ta. al-Ûla, Dar al-Fikir lil Dirasat û el-Neşir û el-Tewzî', Qahire.
- Qusêy al-Hisên, (2009), *Sosyolojîyete al-Edeb Dirase al-waq'e al-Edebîye ala Zew'îlim al-îctima'*, Dar al-bihar Bîyrut, Libnan.
- Racêr Wêbistir, (2006), "Rexney Markisîstî," W.: 'Ebdulxaliq Ye'qûbî, *Kovara Raman*, J. 110, Hewlêr.
- Rêbîn Xelîl Qadir, (2009), *Mêtudî Rexney Tewawkarî (Altekamlî) Le Rexney Edebî Kurdî da*, Têza Lîsansa Bilind Kolejî Ziman, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr.
- Rêbîn Xelîl Qadir, (2011), "Mitodî Rexney Komelayetî Le Lêkolînewey Edebî da", *Kovara Raman*, J. 167, Hewlêr .
- Reca 'Îyd, (2000), *Felsefet el-Îltizam Fî al-Naqid al-Edeb Beyne el-Nezerîye we el-Tatbîq*, el-Naşr: Meneşet al-M'earif, Celal Hizî we Şurkayeh, el-Îskenderîyeh.
- Refîq Şiwani, (2008), *Edeb Komele Wotarêkî Edebî*, Ç. Êkê, Çapxaney Wezaretî Roşnibîrî, Hewlêr.
- Resul Hemed Resul, (2013), *Cîhanbînî Le Romanî Kurdî da Kirmancî Xwarû Salî (2000-2010)*, Berêweberêtî Çap û Belawkirdinewey Silêmanî, Silêmanî.
- Rînih Wîlîk û Ostin Warîn, (1987), *Nezarîye al-adeb*, T.; Mihyedîn Subhî, Ta. 2, al-Muasset al-'Erebîyat lil-Dirasat û al-Neşir, Beyrut.
- Robêr Îskarpît, (1999), "Erkekanî Komelnasîy Edebîyat", W.: 'Ewla Behramî, *Kovara Raman*, J. 39, Hewlêr.
- Robêr Îskarpît, (2018), *Komelnasî Edeb*, W.: Hîmdad Husên û Senger Nazim, Ç. Êkê, Nawendî Awêr Bo Çap û Belawkirdinewe, Hewlêr
- Rohat Alakom, (2018), "Di romana Swêdî de: Koçberîya Kurdan", *Kovara Nûbihar*, h.144, Stênbol.
- Rûweydî Edelan, (2018), *el-Menahic el-Neqdîyeh el-Mu'asreh*, Mihazirat Miqyas, Kulîyet el-Adab we el-Luxat, Cam'ie Mihemed el-Sidîq Bin Yehya- Cîcil, al-Cezayir.

- Sart Qocîl, (2016), *el-Neqid el-Sosyolojîy Fî el-Mexrib el-Neqid el-Riwayî we al-Îdoloja Ll "Hemîd Lihemîdanîy" Enmujcen*, Muzakeret Mukmelet nîl Şehadet el-Mastir, Kulît al-Adab we al-Luxat, Cam't el-'Erebî Bin Mehîdî Um Albeqawî, al-Cezayîr.
- Sebrî Hafîz, (1981), "al-Edeb û al-Muctem' Medxel îla I'lim al-Îctima' al-Edebî", *Fusûl*, Meceret al-Naqid al-Edebî, al-Muceled al-Ewel al-'eded al-Sanî, Misir.
- Selah Fazil, (1980), *Menhec el-waq'ît Fî al-Îbda' al-Edeb*, Ta.: al-Salîse , al-Naşr Dar al-Mi'arif , al-Qahira.
- Selah Fazil, (2005), *Menahic al-Naqid al-M'uasir*, Ta. Alxamîse, Atlas lil-Neşir û al-Întac al-A'lamî, al-Qahîre.
- Semîr Se'îd Hicazî, (2001), *al-Naqid al-Adebî al-Mu'asir Qeçaya û Aticahate*, Ta.1, Dar al-Afaq al-Erebîye, al-Qahire.
- Seyîd el-Behrawî, (1992), *'Îlim Îctma' al-Edeb*, Ta.: al-Ûla, Dar Nubar, al-Qahire.
- Seyîd Yasîn, (2007), *al-Tehlîl al-Îctmaî lil Edeb*, Ta. al-Salis, Dar al-Îyen lîl Neşir, al-Qahire.
- Simîr Se'îd Hicazî, (2001), *Qamus Mustelhat al-Naqid al-Edebi el-Mu'asir*, Ta.: al-Ûla, Dar Alafaq al-'Erebîye, al-Qahîre .
- Siruşt Cewher Hewêz, (2015), *Pabendibûn Le Şî'rî Kurdîda Kirmancîy Xwarû 1950-1975*, Têza Lîsansa Bilind, Fakultî Zaniste Mirovayetîyekan, Sikulî Ziman, Silêmanî.
- Şewqî Zaîf, (1972), *al-Behs al-Edebî (Tabî'te, Menahcih, Ûsule, Mêsadire)*, Ta. Alsab'e, Dar al-Marif, al-Qahîre.
- Şiltax E'bud Şerad, (1988), *Midxil îla al-Naqid al-Edbî al-Hedîs*, Ta.1, Dar Mecid Lawî Lî-Neşir, 'Uman.
- Şukirîye Resul, (1989), *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, Metab' al-Te'lîm al-'Alî Arbîl, Arbîl.
- Şukrîya Ezîz al-Mazî , (2010), *Tîyorî Edebi* , W.: Serdar Ehmed Gerdî, Ç.êkê, Çapxaney Mardîn, Hewlêr .
- Têrî Îgilton, (2008), *Markisîzm û Rexney Edebî*, W. 'Ebdulxaliq Ye'qûbî, Ç. Êkê, Dezgehê Çap û Belavkirina Aras, Hewlêr.
- 'Umer Mihemed al-Talib, (1993), *al-Mezahib al-Neqidîye Dirase û Tatbîq*, Dar al-Kutub lil Tiba'e û al-Naşir, Musil.

- Umyemir Nesîme û Sîlîlî E'mart, (2015), *al-Îtizam Fî Şi'r el-Qebaîlî " Me'tub Lunas "* "Enmuzecen ", Risale Mancistir, Kulît el-Adeb û el-Luxat, Cami'e Ebdulrehman Mîreh " Bicabe " , el-Cezayîr.
- 'Usman Yasîn, (1998), "Goldman û Bunyatgerî Pêkhatûy", *Kovara Raman*, J. 23, Hewlêr.
- Welîd Qesab, (2017), *Menahic el-Neqid al-Edeb el-Hedîs Ruye Îslamîye*, Ta. el-Salis, Dar el-Fikir, Dimeşq.
- Yehman Mihemed E'bdalrehmin û Qeherman Es'ed, (2017), *Derwazeyek Bo Rexneya Edebî*, Ç. Êkê, Dezgehê Nalbend yê Çap û Weşanê, Duhok.
- Zozan Sadq Se'îd, (2015), *Pêgehê Îdyolojîyayê Di Romana Kurdî da Devera Behdînan (2003- 2008) Lidîf Metoda Bunyatgerîya Pêkhateyî Ya Lusyan Goldman*, Têza Doktorayê, Kolêja Zansitên Mirovayetî, Zankoya Duhokê, Duhok.

JÎYANAME

Mohammed Issa SALIH, di sala 1986'an de li gundê Nordîna li devera Sindîyan bajara Zaxoyê ji dayîk bûye. Perwerdeya xwe yî seratayî li navçeya Derkarê biriye serî û amadeyî li Zaxo taman kiriye. Zanîngeh jî Zaxo beşa Ziman û Edeba Kurdî li sala 2011 da qedandîye. Pişt ra ji wek Vekoler di heman beşê da dixebite.

Di asteka bilind da Kurdî û Erebi û ta radekî jî Firansî dizane.

